


# HÊZ Ü BEDEWIYA PÊNÛSÊ

Mehmed Uzun



NÜDEM



# HÊZ Û BEDEWIYA PÊNÛSÊ

Mehmed Uzun

Weşanêن NÛDEM

Weşanên NÛDEM: 3  
*Hêz û Bedewiya Pênlîsê*  
Çapa Yekem 1993

© Weşanên Nûdem  
Pergala berg û rûpelan: Nûdem  
Wêneya bergê: Magritte  
ISBN: 91-88592-02-2

*Ferîd, Necmettin, birayêñ delal ên gorbehiş, min dixwest romana we biniwîsim û pêşkêşî we bikim, lê welê dixauye ku ew ê ji min neyê, ji lewra ez vê kitêba xwe ku li ser hêz û bedewiya pênuşa ku we ewçend jê hez dikir, pêşkêşî bîranîna we dikim*

**M.U.**



# Çend gotin li ser Mehmed Uzun

Firat CEWERÎ

Digel ku Kurdistan di dema nêzîk de nebûye dewlet, sazgehêن xwe yên milî ava nekiriye, bi sal û demên dirêj zimanê kurdî qedexe bûye û nebûye zimanê perwerde û nivîsandinê, dîsan kêm be jî kurdan ji nava xwe, bi ïnad şâîr û nivîskar derxistine. Lê şâîr û nivîskarêñ ku ji nava kurdan derketine jî, ji ber gelek sedemêñ nas û nenas, wan şâîrtî û nivîskarî ji xwe re nekirine kar, piştî demekê dev jê berdane, li dû xwe berhemek, an jî berhemine netemambûyî û stûxwar hiştine. Yanî di nava nivîskar û şâîrên kurdan de berdewamî çênebûye. Di dîroka Kurdistanê ya nêzîk de, mîna ku gelekî xuya û eşkere ye, ekola *Hawarê* ya herî navdar, xwende, zana û têgihîştiye. Vê ekola ku hewl daye da berhemêñ nûdem biafirîne, tenê di destpêka xwe de maye, paşê ji hev de ketiye, ew kabiliyetêñ mezin di nava bêdengiyê de winda bûne. Digel ku me îro bi wê ekolê çavêñ xwe vekirine, îlham û xwesteka nivîsandinê ji wê ekolê stendiye, em dibînin ku ew ekola ku dikarîbû di dîroka Kurdistanê de şoreşek, an ronesanekê edebiyata kurdî bikira, bi tenê çend berhemêñ stûxwar ji me re hiştine. Lîbelê wan hêvî, bawerî û xwestekeke muezem a xwendin û nivîsandina kurdî li dû xwe hiştine. Nivşê ku îro bi kurdî dinivîsîne, deyndarê wê ekolê ye. Yek ji nivîskarêñ vî nivşê nû *Mehmed Uzun* e. *Mehmed Uzun*ê ku hê di salêñ xwe yên biçûk de dikeve nava tevgera şoresger û bi enerjiyeke xurt ji bo bidestxistina

mafê gelê xwe li ber xwe dide, di demeke kurt de dibe xwedî berpirsiyarên mezin, loma ew tê girtin, tade û neheqiyê dibîne û bi salan di girtîgehan de radîzê. Lê tade û neheqî, girtin û lêdan çavên vî xortê nûgihişti natirsîne, berevajiya wê, gir û nefreta wî li hember dewlet û sazûmana neheq xurt dike, ew bal û meyla xwe berdide ser ziman û edebiyata xwe. Gava *Mehmed Uzun* ji navâ pencêñ cûntaya 1970'yi difilite û tê berdan, ew çavtirsiyayî nabe û li mala xwe rûnanê, lê bi hêvî û coşeke geş xebata xwe berdewam dike. Bi kemilandina salêñ wî re, berpirsiyarî û têgihîstina wî jî dikemile, ew di sala 1976'an de li Ankarayê dibe berpirsiyarê kovareke bi navê "Rizgarî". Yanî gava ew dibe berpirsiyarê kovarê, ew hê tenê 23 salî ye. Ev xortê 23 salî dibe xwedî berpirsiyariyeke mezin, herçiqas di salêñ xwe yên destpêk de bi tenê qurbanê îdeolojiya xwe be jî, paşê hêdî hêdî menfeeta gelê kurd bi tevâyî dixe pêşıya îdeolojiyê, bi gotinêñ tûj û tewş yên di derheqa gelê kurd, ziman, edebiyat û kultura kurdî de naxape, mîna *Celadet Bedir-Xan, Kamûran Bedir-Xan, Nûredîn Zaza* û gelekêñ din, bi pirsa kurdan ya herî girîng, yanî bi ziman û rola zimêñ ji bo hebûn, yekîtû û azadiya gelê Kurdistanê dihese. Lê herçiqas ew bi wê yekê dihese jî, ew li Tirkiyeyê nikare zêde vê fikra xwe têxe piratîkê, bi hevdudîtin, civîn û munaqeşeyen bi hin şexsiyeten kurd yên kurdîzan û nivîskar re tête ser. Lêbelê dewlet û peyayêñ dewletê pêxîla vî xortî bernadin, vê carê ji bo berpirsiyariya wî ya kovarê wî digirin, heyşt mehan di girtîgeha Ankarayê de dihêlin. Hema ku ew vê carê tê berdan, ji bo ew careke din nekeve xefika wan, ew mecbûr dimîne welatê xwe terk dike, berê xwe dide welatekî biçûk, ku bi hezaran kîlometre ji welatê wî dûr, yanî koçî Swêdê dike.

*Mehmed Uzun* li Swêdê dîsan dihere û tê, car caran dikeve polemîkên siyasî, berberiyê bi hin rêkxistin û tevgerên kurdî re dike, lê pir tê re naçe, hîsêñ dûrbûna ji welêt û sirgûnê wî bi

zimanê wî ve bêtir girê dide, kurdayetteya wî xurttir dibe, bi tunebûn û jariya edebiyata kurdî dihese. Herçiqas ew dest bi nivîsandina helbestan dike û helbestên xwe di bin navê *M. Ferzend Baran* de di kovara xwe "Rizgariya Kurdistan" de diweşîne jî, ew hêdî hêdî ji helbestnivîsandinê bi dûr dikeve, giraniyê dide ser nivîsandina ceribandin û romanê. Romana wî ya pêşî "Tu" di sala 1974'an de derdikeve. Piştî wê *Mehmed Uzun* li dû hev "*Mirina Kalekî Rind*" (1987), "*Siya Evînê*" (1989), "*Rojek Ji Rojêñ Evdalê Zeynikê*" (1991), kurdiya piyesa nivîskarê Îngilîz yê bi nav û deng *Herold Pinter* "*Zimanê Çiyan*" (1990), "*Destpêka Edebiyata Kurdi*" (1992), "*Mirina Egîdeki*" (1993). Ji çend salan vir ve jî ew li ser romana xwe ya bi navê "*Bîra Qederê*" ku ji xebat û jiyanıa *Celadet Bedir-Xan* pêk tê, dixebite.

*Mehmed Uzun* bi van pirtûkan nayê ser, bêî ku ew ferqiyeta îdeolojîk têxe navbera partî û rêkxistinên kurdan, ji bo ku bibe mînaka yekîti û biratiya kurdan, ci bigire di piraniya kovar û rojnameyên kurdan de dinivîsîne. Em carna *Mehmed Uzun* di nava rûpelên *Armancê* de dibînin, carna di nava rûpelên *Kurdistan Pressê de*, carna *Berbangê*, carna *Welat*, carna *Berhem*, carna *Azadî*, carna *Nûdem* û hwd. Ev pirtûka di destên we de ji wan nivîsaran pêk hatiye.

Em di van nivîsarên *Mehmed Uzun* de dibînin ku ew ji her celeb dijminatiya kurdan dûr e, ji bo yekîti û berbihevhatina kurdan her tim xwestiye hewayeke pozîtîv ava bike, xwestiye bibe sembola başî û qencyî. Digel pir asteng û zehmetiyan, wî karê xwe yê nivîskariyê domandiye û hê bi salêñ xwe yên ciwan bûye xwedyiyê navekî nemir û cihekî bi rûmet.

Gava em rewşa Kurdistanê ya îro didine ber çavan, qîmeta nivîskarên nola *Mehmed Uzun* zêdetir dibe. Kurdistan wêran e, zilm û stemkariyeke bêhawе li ser gelê kurd heye. Tirs, xof û

kuştin li Kurdistana îro jiyana rojane ye. Zimanê kurdî hê ji qedexebûna xwe ya heftê salane didomîne, kultura kurdî dimire, folklor û stranê gelêrî winda dibin. Li Kurdistanê sazgehêن milî, akademî, ensîtu û weşanxaneyên kurdan yên ku bikaribin bi xurû pêşî li vê pêla asîmîlasiyonê bigire, nîn in, piraniya ronakbîrêن kurdan yên li Tirkiyeyê ji vê yeka han bêqîmet û nehewce dibînin. Loma, wek me got, hebûna mirov û nivîskarêن mîna *Mehmed Uzun*, di rewşeke wilo de ji bo me kurdan çirûska hêvî û hêviya avakirina edebiyateke kurdî ya nûjen û nemir e. Ger em hê dûrtir neçin, ev nêzîkî bîst salêن *Mehmed Uzun* e ku bi pêñusa xwe li ber xwe dide. Wî mîna gelek ronakbîrêن kurd yên din nekir û edebiyat bi tirkî nenivîsand, lê bi zanebûn pêñusa xwe ji bo zimanê kurdî, ji bo avakirina edebiyata kurdî ya nûjen li ser kaxezê çerixand. Erê, edebiyateke nûjen... *Uzun* îro bi giranî li dû pîvanêن edebiyatê yên gerdûnî ne. Ji ber ku ew dixwaze edebiyata kurdî bike perçeyek ji edebiyata dînyayê. Ew motîvên kurdî, an ji jiyana şexsiyetê kurd yên jibîrbûyî dike mijarêن romanêن xwe, uslûb û stîlên cihê yên gerdûnî bikar tîne, romana kurdî a nûjen dike xwedî nav û şexsiyet. Ne ku berî *Mehmed Uzun* bi kurdî roman nehatine nivîsandin. Belê, hem berî wî, hem ji pişû wî romana kurdî hatiye nivîsandin. Lê cihê *Mehmed Uzun* yê taybetî ew e, ku ew hem nivîskarekî berdewam e, hem ji romannivîskarekî hevdemî ye. Ew bi motîv û dîroka rewşenbîriya kurdî, carna di bin tesîra ûslûb û stîla *Carlos Fuentes* de dimîne, carna ji mirov di romanêن wî de li şoperiyêن *Faulkner* rast tê.

Ew qîma xwe bi edebiyata basîd û rojane nayne, bi xurtî li dû qaîde û uslûbêن nûjen digere. Ji ber vê yekê ye ku ew pir dixwîne. Ji bo xwenûkirin, pêşdeçûyin û afîrandina edebiyateke bedew, ew baweriya xwe bi xwendina pir tîne. Ew hem rojhelaî, hem ji rojavayiyan dixwîne; hem klasîkêن kurd, hem yên cîhanî, hem ji

modernîstan dixwîne.

Loma roman û ceribandinê wî dibin gerdûnî. Yanî mîna tama kurdî, di wergerên zimanên biyanî de jî eynî tamê didin û carna tameke hê xweştir... Essaiya wî ya bi navê "Welatê Xerîbiyê" di kovara edebî ya swêdî "90 Tal", di ya almanî "Lettre International", di ya îtalî "Lettera internazionala"ê de hate weşandin. Ev kovarê edebî li welatên xwe di nava kovarên herî baş de têne hesibandin.

Di danasîna kovara swêdî "90 Tal" ya di *Dagens Nyheterê* de, esseyâ *M. Uzun* di kovarê de mîna nivîsa herî balkêş hate pêşkêşkirin. Herweha di wergerên almanî û îtalî de jî, rexneyên baş wergirtin.

Heçî romanên *Mehmed Uzun* in, ji niha ve sînorêne Kurdistanê gav kirine, bi xurtî werdigerin zimanên biyanî. Wek tê zanîn, berî bi demeke kurt, du romanên wî "Rojek Ji Rojê Evdalê Zeynikê" û "Siyâ Evînê" li Sûriyê bi erebî derketin. Li ser van herdu romanên *Mehmed Uzun*, di kovar û rojnameyên Sûrî û Filistîniyan de, nivîsên cihêreng derketine, gelek nivîsên pesintijî li ser wan hatine nivîsandin. Herweha romana wî *Siyâ Evînê* jî wê di bihara îsal de li Tirkîyeyê bi tirkî derkeve. Ew roman ji niha ve ji aliyê gelek nivîskar û rexnegirên tirkan ve tête pesinandin. Niha jî haziriya ku romanên *Uzun* wergerin zimanên ewrûpayî tête kirin.

Em dibînin ku *Mehmed Uzun* yek ji wan kurdan, belkî jî yê pêşî ye, ku berhemên wî ewqasî werdigerin zimanên biyanî, ew ewqasî dibine gerdûnî.

*Mehmed Uzun* di danûstandin û xebatên xwe de jî gerdûnî ye. Ew li Swêdê hem bû nivîskarekî jîr û jêhatî, hem jî di danûstandin û têkiliyên xwe de bilind bû. Ew endamekî aktîv yê PENa Swêdî ye, endamê cûhgir yê komîta Karger ya Yekîtiya Nivîskarên Swêdê ye û heval û dostê gelek nivîskarên navdar û gerdûnî ye.

Ji ber ku ev pirtûk bi xwe wê *Mehmed Uzun* bi gelek hêlên wî

ve bide dest, heta ji min hat min pêşgotin kurt girt. Min ne bi armanca analîza li ser romanên *M. Uzun* ev çend rêz nivîsandin. Hêvîdar im wê hevwelatiyekî din rojekê li ser xebat û romanên vî ronakbîrê kurd ê bi ber, raweste û wan bi hemû hêlêن wan ve bi kurdan bide naskirin.

Ev pirtûka ku nivîskêr bi "*Hêz û Bedewiya Pênûsê*" navandiye, ji nivîsên wî yên ku berê di kovar û rojnameyên kurdan de hatibûn weşandin, pêk tê. Herçiqas ev nivîs berê hatibin weşandin jî, ez bawer im ku wê haya gelek hevwelatiyên me ji van nivîsan tune be. Ji ber ku gelek ji van nivîsan ji zû ve, an jî di destpêka salên 80 de hatine weşandin. Nivîskar di van nivîsarên xwe de bi giranî li ser rewş û rola ronakbîrên kurd radiweste û di gelek waran de nêrînên balkêş pêşkêş dike.

Ji bilî nivîsarên wî yên balkêş ku di *Berbang* û *Armancê* de hatibûn weşandin, mirov di hevpeyvînên bi wî re, yên ku di kovarên cihê cihê ; mîna *Bergeh*, *Wan*, *Welat*, *Berhem*, *Azadî* û *Nûbiharê* de hatibûn weşandin, nêrîna nivîskêr ya dinyayê, armanca nivîsandina wî ya bi kurdi, rola ziman û edebiyatê di hişyarkirina gelê kurd de û motîvên romanên wî nas dike. Bi weşandina vê berhema han, em wek Weşanxaneya Nûdemê gelekî bextewar û kêfxweş in. Em hêvîdar in, hûn ê jî bibin şirîkêñ bextewarî û kêfxweşîya me.

## Apê Tevger û Edebiyata Kurdi

Her ziman û edebiyat bi hin nav û kesan ve tê nasîn. Yan jî, ji bervajiyê. gava meriv qala hin nav û kesan dike, wenatekî, zimanekî û edebiyatekê tê bîra merivan. Herweki ku Victor Hugo ziman û edebiyata klasik û Jean Paul Sartre ya nûjen ya fransizan: Goethe ziman û edebiyata klasik û Henrich Böll ya nûjen ya almanan; Firdewsî ziman û edebiyata klasik û Sadiq Hidayet û Ehmed Şamlû ya nûjen ya farisan tînin bîra merivan.

Herweha hin navên kurdi jî ziman û edebiyata kurdi tînin bîra merivan. Ew bi ziman û edebiyata kurdi re bûne yek. Bê şik, mezintirîn nav ku bi ziman û edebiyata kurdi ya klasik re bûye yek, Ehmedê Xani ye. Ev yeka him ji bo zaravayê kurmancî û him jî ji bo zaravayê soranî rast e.

Lê belê, herçî edebiyata kurdi ya nûjen e, ji ber perçebûna welêt, 1923, riyên zaravayê kurmancî û soranî ji hevûdu vediqetin. Zaravayê kurmanci bêgav dimîne û nikare tevgerên ges yêñ edebî bîne pê, -ji bili tevgera **Hawar'ê**.

Meriv dikare bibêje ku kovara Hawar'ê ku di gulana 1932-an de dest bi weşinê kir, di tarîxa nûjen ya edebiyata kurdi (ya ku bi kurmancî tê nivisîn) de tevgera heri girîng e. Hawar'ê hejmara xwe ya dawîn, 57-an, di 15'yê tebaxê 1943-an de weşand. Ne hewce ye ku meriv li vê derê, bi dirêjî, behsa vê kovara hêja bike. Lê bi kurtî, Hawar'ê ziman û edebiyata kurdi di bin wan rewşen pir dijwar de parast û ew ges kir. Wê rê da û alîkarî kir ku gelek navên kurd bibin hozan,

nivîskar û qelemşorêن heja.

Ji ber vê yekê, gava meriv qala edebiyata kurdî ya nujen dike, bi baweriya min di şûna navekî de ekolek tê bîra merivan: ekola Hawarê ku bi dû Hawarê re du kovarên din, Roja Nû û Ronahî jî weşandin.

Edebiyata me ya nûjen û navê Hawar'ê û nivîskarêن wê bi hev re bûne yek. Min li derekî din jî nivisibû: bi xêra ekola Hawarê ye ku em iro bi kurdî dixwînin û dînîvisin. Mihemed Bekir ku iro, li Swêdê, dest pê kiriye û kovarê ji nû ve diweşîne, navên nivîskarêن Hawarê di pêşgotina xwe de, weha bi rêz dike:

Celadet Bedir-Xan, Rewşen Bedir-Xan, Dr. Kamiran Bedir-Xan, Osman Sebrî, Qedrican, Cegerxwîn, Mistefa Botî, Qedri Cemilpaşa, Dr. Nuredin Zaza (Yusif), Lawê Fendî, Ehmed Namî, Hesen Hişyar, Bişarê Segman, Nêrewan, Reşîd Kurd, Goran, Tewfik Wehbî, Evdîlxâliq Esiri, Sakir Fetah, Hevîndê Sorî, Pirot, Lawekî kurd...

Di van salên dawîn de, gelek kesên vê ekolê, wekî Kamiran Bedir-Xan, Hesen Hişyar, Tewfik Wehbî, Cegerxwîn, Nuredin Zaza çûn rehmetê. Bi qasi ku ez dizanim, iroj, ji ekola Hawar'ê bi tenê du kes dijin; Rewşen Bedir-Xan û Osman Sebrî. Herdu jî, iroj, kal û pîr in û li ser 80 salî ne.

**Hawar** ji aliyê Mir Celadet Bedir-Xan dihat weşandin. Celadet Bedir-Xan serok, pêşeng, plançêkcr û sernivîskarê kovarê bû. Û navên din yên vê ekolê li doraliyê wî civiyabûn. Lê kesê ku heval, hogir û şagirtê wî bû û pê re dimeşîya, bi her awayî alîkarî li kovarê dikir, Osman Sebrî bû. Osman Sebrî navê duduyan ya vê ekolê bû. Li ser Hawarê xebat û weşîna wê, gelek caran. ez bi Osman Sebrî, Rûşen Bedir-Xan, Cegerxwîn û Hesen Hişyar re peyivîme. Li gora van xeberdanan, Osman Sebri him wekî nivîskar, alîgir, rêvebir û him jî, pîr caran, wekî karker di weşîna kovarê de besdar bûye.

Yanê bi gotineke din, keda Osman Sebrî di nûkirin û

vejandina ziman û edebiyata kurdî de pir e. Piştî ku dengê Hawar û Ronahi'yê hate birîn û Mir Celadet Bedir-Xan çû rehmetê, 1951, Osman Sebrî xebata xwe domand. Mixabin, êdî wî keys nedî ku kovareke weki Hawar'ê biweşîne, lê wî her ji kovar û rojnameyên kurdî re nivisî û di xebatê li ser ziman û edebiyatê de besdar bû. Ew îroj jî, digel ku destê wî bi qelemê nagire, hê dinivise. Bi alikariya doraliyê xwe.

### **Zimanekî zelal, baweriyeke xurt**

Min Osman Sebrî, cara yekemin, di havîna 1977-an de dît. Ez û rehmetî Necmettin Buyukkaya çûn mala wî. Mala wî li Şamê, li Taxa Kurdan bû. (Ew hê jî li eynî malê dijî.) Gava em çûn, li oda wî ya rûniştinê 5-6 kesên dinjî, li nik wî bûn. Piştî xeberdana bi qasi du saetan çend tiştên wî bala min kişandin; zimanê wî yê zelal, baweriya wî ya wekî pole, digel salê xwe serwextiya wî, tecrubê wî yên dewlemend û nefsbîcûkiya wî

Ji wê rojê û vir ve, ez pir caran çûm mala wî û pê re peyivîm. Tiştên ku roja yekemin bala min kişandibûn, bi wext. hîn xurttir bûn.

Zimanê Osman Sebrî zimanê Hawarê ye. Yanê zimanekî paqij, zelal, hêsan û edebî. Dewlemendî û xweşîya zimanê kurdî di şîhîr û nivîsarên Osman Sebrî de baş dixuyin. Nivîsarên wî yêن li ser nêçir û neçîrvanên Kurdistanê yan jî nivîsarên wî yêن li ser Yêzidiyan dewlemendiya zimanê wî û nivîsarên wî yêن li ser şexsiyetên navneteweyî wekî Selehedînê Eyûbi hostetiya wî ya bikaranîna zimanê kurdî baş nişan didin. Gava meriv li wi guhdarî dike yan jî nivîsar û şîhîrên wî dixwîne, meriv ji kurdî hîn bêtir hez dike. . . Zordariya dijmin welê kiriye ku em îroj nikarin bi hesanî, bi kurdî binivîsin. Û gava em dinivîsin jî, piraniya caran, tiştên em dinivîsin, ji aliyê zimên dikulin. Ew naherikin û dewlemendî û xweşîya zimanê me baş nişan nadîn. Di demeke weha malkambax de, zimanê Osman Sebrî dibe wekî dilopa

baranê ku li ser axake qiraç dibare. Meriv pê kêfxwes û di eynî wext de serfiraz dibe. Pir caran, pir kes welê bawer in ku gava meriv zimanekî hêsan bi kar bîne, hingê meriv ji zanîna xwe tiştin winda dike. Bi baweriya min, ev dîtin ne rast e. Ji bervajiyê. bikaranîna zimanekî hêsan hostetî û zanîna merivan nîşan dide. Yek ji armancêñ Hawar'ê ev bû; bikaranîna zimanekî hêsan da ku xwendevanêñ kurd bikaribin bixwînin, tê bigihêñ û lê vebin.

Osman Sebrî jî bi hosteti, li gora vê qayidê dinivise. Bi baweriya min, hê jî di nav kurdan de kesî wekî wî fabilêñ evçend delal nenivisîne. Li Kurdistanê her kes ew şêr, gur, rûvî û hirçen ku Osman Sebrî di fabilêñ xwe de dide peyivin baş fahm dike. Dewlemendi û zelaliya zimanê wî bala kurdnasan jî kişandiye. Gava wan qala nivîskarêñ kurd kirine yan jî berhemêñ nivîskarêñ kurdan di antolojiyan de berhev kirine, wan cîhekî berz dane berhemêñ Osman Sebrî.

Baweriya Osman Sebrî jî wekî zimanê wî ye: xurt, bi coş, zelal û bêşik. Ew bi xelasî û rizgariya welêt, serfiraziya gelê kurd û pêşketina civat, ziman û edebiyata kurd bawer e. Û ew vê baweriya xwe bi awakî pir hêsan û zelal tîne zimên. Him bi qise û him jî bi niviskî. Rizgariya welêt, xelasiya gel, pêşvebirina ziman û edebiyatekê... evana qise û idiyâyen pir giran in û izahkirin û salixdana wan dijwar e. Jê re wext û hunernlendi divê. Ev sebir û hunermendî, bi zêdeyi xwe, li ba Osman Sebrî heye. Tu kesî tu carî nedîtiye. nebihîstiye û nexwendiye ku wî çavê xwe kutaye û rûyê xwe badaye. Di her rêza wî de, di her rûpeleke berhemêñ wî de, her gav, xurtî, mîranî, jîri û mîrxasiya însanê kurd heye. Carina vekirî û rast bi rast, carina jî li pey bûyer, serpêhatî û salixdanan. Nivîsarêñ wî yên ku di vê hejmarê de diweşin, nimûnêñ vê yekê ne. Ji bo wî, her kurdekî lehengeki ye û welatê kurdan jî warê lehengan e.

Xurtî û lehengî ne bi tenê di nivîsar û şîhîrêñ wî de

hene. Herweha ev tişt di şexsiyeta wî de û di her rûpeleke jiyana wî de jî hene. Her gava ku ez derim ba wî, ez li ser kaxizên biçük notin jî dînîvîsim. Notêñ ku ez ji xeberdan û gotinêñ wî werdigirim û dînîvîsim, niha çendine ji wan notan li ber min in. Yek jî wan notan weha ye;

*"Apê Osman Sebri: 18 caran girtîxane û girtîbûn, bi qasî 10 salan li girtixanan mayîn, 2 car bi salan, 7-8 caran bi mehan... û di ser de jî çend caran sîrgunî..."*

Jiyana wî têkoşîneke bêrawestan û sîrgûniyeke dirêj, pir dirêj e. Û ew şahidê tarîxa me ya nûjen e jî. Ji lewre, ji bo min, navê wî, teví navêñ din yên nîvîskarêñ Hawar'ê, bi tarîxa siyasi û edebî ya nûjen re bûye yek. Gava ez navê wi dibihişim yan jî wî dîbînim, serihildana Şêx Seîd, Partiya Xoybûnê, şoreşa Agiriyê, kovarêñ **Hawar û Ronahi'yê**, serihildana Berzanan, damezirandina Partiya Demokrat a Kurdistana Sûriyê, kovara Çiya li Ewrûpayê û hwd... têñ bira min.

Gava meriv bi tenê behsa aliyê wî yê edebî û hunermendî bike, hingê meriv hin aliyêñ wî yên din ji bîr dike. Ew ne bi tenê hozan û nîvîskar, lê di eynî wextê de siyasetvan, şoreşger û şervan e jî. Jixwe wî, pêşî, dest bi siyaset û şervaniyê kiriye. Ziman û edebiyat bi dû re hatine. Ew di nîvîsara xwe, kurtebiriya jiyana xwe de, behsa destpêka riya siyaset û şervaneyê dike. Ew iroj jî li ser eynî riyê ye. Digel ku salê wî, iroj, 84 e û nexwêş e, ew wekî xorkeki 18 sali, bi meraq, best û daxwaz guhê xwe dide bûyerên welêt, ji heval û dostêñ xwe li ser tevgera kurdî agadarî werdigire û bi şev û roj bi wan re munaqaşe dike.

Meriv dikare bibêje ku umrê wî yê dirêj li ser riya felat û rizgariya welêt derbas bûye.

### Apo

Kurd Osman Sebri bi peyva APO bi nav dîkin; Apê Osman Sebri. Ew apê tevger û edebiyata kurdî ye. Ji bo

ku qedrê wî bigirin û rêz û rêzdari nişan bidinê, kurd jê re dibêjin Apo. Zarok jî, kal jî jê re weha dibêjin. Ew "the grand old man"ê edebiyata kurdî ye. Her gava ku ez çûme mala wî, çend kes li nik wî bûne; gundi, karker, xort, xwendevan, ronakbîr, hevalên wî yêñ kevn, jin û zarok. Mala wî cîhekî nas e û deriyê wî hertim vekirî ye. Bi kurtebirî, ew ji xelkê ye û di nav xelkê de dijî. Gelek caran zarok û nasên wî xwestine ku ew derkeve Ewrûpayê. Lê wî qebûl nekiriye. Li hember van pêşniyaran, wî her gav weha gotiye; "Ez jî ïnsanên xwe bi dûr nakevim. Gava ez ji wan bi dûr kevîm, ez dê bimîrim."

Herwekî ku dî nivîsara wî ya kêlekê de jî berpêş dibe, ew ji malek dewlemend tê. Lê ew qureti û maxrûriya ku meriv pir caran li nik serdestan dibîne, pê re tune. Jixwe herçend wî li dijî dijminên gelê kurd şer kiriye, ewçend jî wî li dijî serdesten kurdan ku nokerî û bindestiya dijmin kirine, şer kiriye. Ew vî aliyê xwe jî di gelek şîhîr û nivîsarên xwe de baş salix dide.

Herwekî tê zanîn, nivîskarî karê tenêbûnê ye. Nivîskar bi tena serê xwe rûdine, difikire, dixebite û berhemên xwe diafirîne. Berhem bi hezar û yek zehmetî diafire. Hezar tişt tên bîra nivîskar. Wext, bûyer, mesele, meriv dikevin nav hevdû.

Mêjî û bala nivîskar ji mesele û doran û rojane bi dûrdikevin û xwe li doraliyên berhemê tekûz dikin da ku berhem biafire. Yanê tenêbûna nivîskar şertê esasî ya afirîna berhemân e. Pir caran min meraq kiriye ka Apê Osman Sebrî kengê berhemên xwe diafirîne! Ji ber ku min wî bi tenê neditiye, her gav kesine li nik wî hebûne. Li gor ku ew dibêje, jiyana wî her bi vî awayî derbas bûye. Yanê, ew him nivîskar e û bi tena serê xwe berhemên xwe diafirîne û him jî bi şev û roj bi ïnsanên xwe re ye. Ev jî ne tiştekî hindik e...

Li vê derê, meriv divê dilovaniya wî ji bîr neke: Dilovanî û hezkirineke xurt ji bo welat, gel, ziman û edebiyata kurdi. Û ji bo zarokên kurd. Dilovanî û

hezkirina wî xwestirîn di şîhîrên wî yên ji bo zarokan de dixuyin. Zêde nayê nasin, lê wî gelek şîhîrên zarokan jî nivisine. Ji ber ku ew ji zarokan pir hez dike û wan dahatûya welêt dibîne.

Min li jor qala keda wî kir. Lê bi ya min, digel ku sihîr û nivisarên wî di kovar û rojnamên kurdan de weşiyane û hêjî diweşin, keda wî baş nayê zanîn. Ne bi tenê keda Apê Osman Sebrî, herweha ked û xebata nivîskarêñ din yên Hawar'ê jî baş nayê zanîn. Çima?... Hemzeyê Muksî, berpirsiyarê kovara Jin'ê ku di salêñ 1918-19-an de li Stembolê weşiya û niha ji nû ve, ji aliyê M. Emin Bozarslan diweşe, sala 1919-an, di hejmara 19-an ya Jin'ê de pêşgotinekê ji Mem û Zin a Ehmedê Xanî re dinivise û tê de weha dibêje: "Ji eserên wî tê zanîn ku Ehmedê Xanî, wek Firdewsi ji bo milliyeta xwe xebitiye, temamê hebûna xwe di we rê da serf kiriye. Eserên Ehmedê Xanî di Kurdistanê da pir birûmet in. Her kes bi rêzdarî navê wî dibêje û bi rêzdarî qala wî dike.

*Belam di dereca te'sîrê da negîhaye Firdewsi: Lewra Firdewsi bi qelema xwe Iran vejand. Ehmedê Xanî nehişt ku Kurdistan bi temamî bimire; ew ji mirina edebî rizgar kir, lê belê bi temamî venejand. Lewra dema Firdewsi ji bo fikra wî bikeys bû û dest dida; dema Ehmedê Xanî pir û pir berbat û dijwar bû..."*

Ew dema pir û pir berbat û dijwar, ev sê sed sal in, hê ji dewam dike. Lê belê, iroj, me guherînekê divê. Şert û mercen roja me, herçî dem berbat û dijwar e, dest didin ku em bêtir û xurttir xwedî li şexsiyeten xwe yên netewî û xebat, ked û eserên wan derkevin, wan bêtir bidin nasîn û ji xebat û eserên wan bêtir kelk werbigrin.

Ji lewre di zincîra nivîskarêñ kurd de cîhekî Apê Osman Sebrî yê xas heye. Teví vê kurte-danasinê du nivîsarên wî yên dirêj û du nivîsar jî li ser wî têñ weşandin. Nivîsarêñ Hemreş Reşo û rehmetî Dr. Nuredin Zaza ji kitêba "**APO, Gotinêñ Xav, Nepijin bê**

**tav**" ku ji şihîrên Osman Sebri pêkhatiye, hatine girtin. Kitab ji aliye Hemreş Reşo hatiye amadekirin. Ú nivisara Apê Osman Sebri "Kurtiyek ji Destpêka Jîna Min" heta niha li tu derî neweşiyaye. Berî niha bi 4 salan, gava ez çûbûm mala wî, wî ev nivisar dabû min da ku ew di demeke rind û bi munasebeteke rind were weşandin.

Ez bawer dikim, kêfa Apê Osman Sebri jî ji vê heyama ku em tê de ne, re tê. Ji ber ku edebiyata kurdî bi pêş dikeve ú zimanê kurdî hîn bêtir ú firehtir bi kar tê. Ú munasebet (hincet) jî ev e ku nivîskar ú xwendevanên kurd divê Apê Osman Sebri, bi pênuşa wî, binasin.

Di newroza 1985-an de, ew ji Qanadê Kurdo re nameyekê dinivîse ú newroza Qanadê Kurdo ku hingê li Leningradê nexweş e, pîroz dike. Di cîhekî nama xwe de, Apê Osman Sebri weha dibêje; "Va ye ez jî gîhîştîme koça jînê ya paşîn. Ji ber ku rîya xebatê di warê zimên da heya demeke nîzîk li ber me hatibû dadan û iro jî ne serrast vekirî ye, me nikarî bi kêrî gel ú zimanê xwe bêñ. Niha jî ji ber pîrbûnê nema serê min di warê raman ú nivîsandine da ji min re dibe alîkar. Ew serê ku di nava pêncî ú du salan da hejde caran ketiye zîndanên Turk ú Fransiz ú Ereban, yekcar westiyaye, nema bi kêrî raman ú nivîsandinê te. Em Kurd bûn goriya şâsiyên bav ú kalêñ xwe ú hê jî di nav wan şâsiyan da vedipirtikin... Zor mixabin ku em nikarine ji bo hişyarkirina gel gavine fireh ranin. Ji ber ve yekê ye ku bi destêñ vala ú dilekî xemgîn dê biçim gorê."

Ew ji nefsbîcûkiya xwe van rêzan dinivîse. Ew dibêje ku serê wî westiyaye ú nema bi kêrî ramanan tê. Lê hê jî, iroj, gelek keç ú xortêñ kurd derin ba wî ú jê dersêñ kurdî digirin. Hê jî gelek siyasetvanêñ kurdan derin ú pê re li ser meselêñ siyasi ú edebî dipeyivin. Ew dinivîse ku di warê zimên de ew bi kêrî gelê xwe nehatiye. Eger ew bi kêrî gel nehatibe, ma kî hatiye?

Ew dînivîse ku ew bi destine vala dere gorê. Ma kî  
dikare evçend rûmet, qedir û eser li pey xwe bihêle û  
here? Koçeke weha ji çend kesan re nasîb dibe?

Tu her bijî, Apê Osman Sebrî...

**Kurdistan Press**, hej. 74, 1989

## Dermanê Birînê Reş û Musa Anter

"**Birîna Reş**", piyesa Musa Anter, di sala 1965 an de weşıya. Di rûpela duwemîn a kitêbê de, nivîskar dibêje; "Min ev pirtük sala 1959, li Stembolê, li Harbiyê, di hucra 38 de, wextê ku ez girtibûm nivisibû..."

Em wan salan bînin bîra xwe; serihildanên kurdan [1925-28-30-36-38-41-42...] bi xwîn hatibûn şikestin. Gelê kurd car bi car qetl bûbû. Mij û dûmana şewatê ji welêt radibû.. Tirs, xof û sawê kirassê xwe rakişandibû ser welêt. Bi sedan, bi hezaran bîrewer, rînas û ronakbîrên kurd hatibûn kuştin, ji welêt hatibûn bi dûrxistin û dengê wan hatibû birin. Zimanê kurdî û her tiştê ku tekiliya wî bi kurdî û kurdîtiyê hebû, hatibû qedexekirin... Gelê kurd şîna xwe girêdabû... Welâtê xirbe û kavil digiriya, Neçarî, belengazî û bêgaviyê nefes li insanên kurd çikandibû.

Di rewşeye weha kambax de, gotina "ez kurd im" bi serê xwe gaveke mezin bû... Mûsa Anter "Birîna Reş" di rewşeye weha kambax de û di ser de jî, li zîndanên eskerî, nivîsi.

Hêjahî û qîmeta berhem û eseran li gora dewr û deman e. Di hin deman de peyvek, gotinek nivîsin şoreş e, bi rûmetirin tişt e. Di hin deman de, bi cîldan kitên nivîsin jî ne tu tişt e. Tiştê ku berhema Musa Anter "Birîna Reş" dike nemir û hêjahîyeke giranbiha didiyê, ew dewr û dem e. Di wê dewr û dema kambax de ku kesî newêribû gotina "kurd" bi lêv kira, ku kesî nikaribû rêzek bi kurdî binivisiya, hingê Musa Anter piyeseke [şanoyeke] hêja bi zimanê kurdî nivîsi.

Eger ez ne şaş bim, "Birîna Reş" kitêba yekemîn bû

ku piştî damezrandina Komara Tîrkiyê, 1923, bi zimanê kurdî dihat nivîsin û weşandin. Carina şîhîrine û rîzina bi kurdî li derina diweşîyan. Lê mîna kitab, "Birîna Reş" bû ku bi zimanê kurdî ronahî didit û cihê xwe yê birûmet di tarixa pêşveçûna ziman û edebiyata kurdî de werdigirt.

Em ji tarixa tevgerên çandî û ronakbîrî yê neteweyan dizanin ku ronakbîr û pêşewa ew kes e ku gavên nû davêje, rê vedike û rê nîşan dide. Gava rê vebû û rê li ber merivan diyar bû, kesen ku xwe bidin ser rê, pirr in. Lê hêjatîrin gav û kirin ew tişt e ku meriv rê veke. Digel her celeb dijwarî û kîmaniyê, meriv bikaribe afîrîn, berhem û eserên nû û pêwist bîne pê... "Birîna Reş" û nivîskarê wê Musa Anter misalên vê yekê ne.

Musa Anter di kurte-pêşgotina xwe de dibêje; "Li rohilatê [Kurdistanê, M. U.] birînên reş pir in. Wek bîrova çavan, êşa zirab, kotîbûn û ya ji wan gişan dijwartir û diya wan, jartî û nezanî..."

Piyesa Musa Anter dermanê birînên reş e. Jarî û nezanî jahreke bêeman e ku dikeve can, ruh û bedenên gel û neteweyan û wan dike dîl, wan ji hev dixîne û wan dikeşerpeze û peregendeyên ber deriyên serdest û zordaran. Dermanê jarî û nezaniyê ronahiya perwerî, medeniyet û xwendin û nivîsin e. Nivîskar piyesa xwe li ser vê daxwaz û armancê ava kîrîye. Ew bi zimanê xwe yê xweşik nezanî, paştemayin û belengaziya civata kurd salix dide. Gundê Zoravê, Mala Zîno û Biro nimûneyên rebeniya civata kurdî ne. Lê li milê din, lawê wan Bedo ku qehremanê piyesê ye, ronahî ye. Ew hêviya pêşeroja civata kurdî ye. Ew nimûneyê perwerî, xwendin û pêşveçûnê ye. Ew dibe doxtor [bijîşk] û birînên insanên kurd derman dike. Ew dibe dermanê birînên reş...

Gava min Musa Anter, cara pêşîn, li girtîgeha eskerî ya Diyarbekirê dît, 1971, hingê gunehê min pê hat. Ez xortekî 18 salî, ew apekî 55-56 salî bû. Porê wî

spî bû û ew li ser riya kalbûnê bû. Lê piştî ku min ew ji nêzîk ve nasî, min fahm kir ku ez şaş bûm. Musa Anter ne ew meriv bû ku meriv gunehê pê bianiya. Ji bervajiyê, wî bawerî dida merivan. Wî bi gotin, lebat û tevgera xwe bawerî û germahî direşand ser girtîgehê. Wî girtîgeh, warê bîhntengî û gumanan, qulipandibû û kiribû warê kîf û henekan. Girtîgeh jê re bûbû seyrangeh. Gundiyên bîhnteng û bişik û biguman xwe dispartin wî û derd, keser û gumanên xwe bi gotin, henek ûşiretên wî derman dikirin. Nivîskarê "Birîna Reş" li girtîgehê jî li ser riya armanc û mebesta piyesa xwe bû.

"Birîna Reş" xwediyyê cîhekî pîroz e. Daxwaz, armanc û mebesta wê pîroz e. Loma ew divê ji bîr nebe û car bi car, ji nû ve, bê weşandin û belavkirin.

## Dengê Heş, Mêjî û Wîjdanê

Niha, gava ez vê kurte-nivîsara ku ez bi hênceta xelatên rojnamevan û nivîskarê kal û delal, apê kurdan Musa Anter, dînîvîsim, dilê min dîsan bi şewat e. Apê Musa di tariya şevê de, li kuçeyeke teng û bêdeng, li Diyarbekirê hate kuştin. Niha jî mîrkujên çavşor û rûrêş hevalê delal Mehmet, parlementerê kurd ê DEP'ê, însanê jêhatî Mehmet Sîncar kuştin. Eynî mîna kuştina Apê Musa, Mehmet jî qetl kîrin; di kuçeyekê de, bi bêrikên tarî û neyar, bi xayintî û hovî. Loma bîhna min teng, dilê min bi leyân e.

Berî niha bi demekê jî 37 nivîskar, şahîr, hunermend û ronakbir li bajarê Siwasê, li ber çavêن bi hezaran kesan, şewitandin. Berî wê jî, dîsan yekî din, yek ji rojnamevanê herî jîr ên Turkiyê Ugur Mumcu bi bombekekê kuştin û bedena wî lîme lîme kîrin. Û niha jî her roj bi dehan xort, merivêن herî jîr, serwext û pêşketî yêن Turkiyê, bi guleyêن xayîn û xwînxwar têن kuştin û di nav xwînê de vedigevizin...

Li Turkiyê, bê west û rawest, xwîn diherike, bîhna xwînê bi ser Turkiyê ketiye. Li Turkiyê wahşet, zor û zordarî bûne serdest, Turkiye bûye welatê jan, keser, dînî û hovîtiyê. Û tişte ku herî zêde meriv pê xemgîr dîbe jî ev e; zordaran bir û baweriyêن xwe yêن kirêt bi civatê dane qebûlkîrin, civata Turkiyê jî, hêdi hêdi, niha wahşet, zor û zordariyê qebûl dike û welê bawer dike ku mesele û pîrsên civakî û neteweyî dê bikaribin bi zor û zordarî, bi şewat û kuştinê çareser bibin. Lê mixabin e ku gava civateke weha ku zor û zordariyê qebûl kiriye, pesindariya kuştin û hovîtiyê dike, jê re li çepikan dixe, kîjan celeb dîbe bila bibe kuştin û

qetlkirinê mîna serketin û serfiraziyê dibîne û bi mîjî  
û zimanekî hov û milîter li mesele, bûyer û pirsan  
dînihêre, hingî wê civatê, bi destê xwe gora xwe kolaye  
û ew ketiye ser riya jihevketin û windabûnê. Tarîxê ev  
yeka hanê, car bi car, nişanî me daye. Ji lewre ez  
dibêjim, birînên Turkiyê kûr in û roj bi roj jî xedartir  
dibin.

Di rewşike weha nexweş de ku Turkiye roj bi roj hîn  
xurtir ber bi gola xwinê tê kêşandin, bivê-nevê, meriv  
Musa Anter bi bîr tîne. Jiber ku Musa Anter li hember  
zor û zordariyê, wahşet û hovîtiyê dengê heş û wîjdanê  
bû. Jiber ku iro hem kurd hem jî tîrk, hemû Turkiye,  
hewcedarê dengê mîjî û wîjdanê ne, hewcedarê Musa  
Anteran in. Iro li Turkiyê, kesên ku karên dewletê  
digerînin, bi kêfxweşî û maxrûrî behsa hejmara mirî û  
kuştîyan dikin û welê bawer in ku gava ew hîn pirtir  
meriv bîkujin, problem, gelş û pirsên Turkiyê, nemaze  
yêñ neteweyî û siyasi, dê çareser bin. Dengê  
karbidestan ne dengê mîjî û wîjdanê ye. Zihniyeta ku  
hê iro jî hebûna kurdan nas nake, huwiyyeta kurdi  
nabîne, hê jî ji kurdêñ Turkiyê re (ku hejmara wan ji  
deh milyonan zêdetir e) radyo û telewizyoneke kurdi,  
xwendin û perwerdeyîya bi zimanê zikmakî, kurdi pir  
dibîne, bêşik, ne dengê heş û wîjdanê ye. Diyar e ku tu  
pêwendiyêñ mîjî û wîjdanê bi zihniyetêñ weha re nîn  
e. Ev nêrin û zihniyet, dengê zor û zordariyê, dengê  
dînî û şâşiyê ye.

Musa Anter, nivîskarê kal û keserkûr ê kurdan,  
hertim, bi xurtî, li dijî dengê zor û zordariyê ku her bi  
qîreqîr e, derket û li hember vî dengê çewt ew bû dengê  
nerm ê mîjî û wîjdanê. Digel ku pirî caran hêjhî û  
giranbihayiya lebat û xebatên wî nehatin dîtin û  
fahmkirin, digel ku zor û zordariyê pirî caran nefes lê  
çikand, digel ku hertim rê lê hate girtin... Wî hergav  
rexne li siyaseta resmî ya Turkiyê ku li dijî kurdan  
dimeşîne, girt û vê siyasetê mîna siyaseteke nerast,  
bêmîjî û bêwîjdan dît û bi nav kir. Û wî her xwest ku

Turkiye, hê ku wext heye û dereng nebûye, dev ji vê siyaseta xwe ya bêkêr û bêmane berde û bi riyên medenî mafêن neteweyî, demokratik û însanî yêن kurdan bide. Wî her got ku bi tenê siyaseteke weha nû, medenî û adilane dikare bibe riya mêtî û wîjdanê û bi tenê bi vê riyê Turkiye dikare, ji bervajiyê perçebûn û qelsiyê, bibe quwet û hêzeke demokratik û însanî. Musa Anter di hemû nivîsar û makalên xwe de, bi şêweyê xwe yê rengin û bi misalên gelek balkêş, her li ser van mijaran rawesta.

Civat hewcedarî wîjdan û dengên wîjdanê ne. Siyaset û siyasetvan (bi taybetî jî yêن karbidest), jîber gelek sebeban, dikarin wîjdan û riyên wîjdanî bidin alî. Ew dikarin bêwîjdaniyêن gelek mezin û hov li dar xin, dikarin bikevin nav geremola xwînxwarî û terora siyasi. Lê belê, li hemberî wan hewcedariya civatê bi dengên wîjdanê heye; dengine wisan ku bikaribin nerazîbûna civatê nîşan bidin, li dijî neheqî û çewtiyan bisekinin, liberxwedan, wekhevî, aşitî û biratiyê biparêzin. Eger di civatekê de dengên weha, bi hin awayan, hatibin birîn, zordarî perda xwe ya res kişandibe, wîjdan qetlkirî be, hingî ew civat ketiye bin nîrê wahşet û zordariyeke nedîti ku bi tenê ji bo xirakirin, kuştin, hilweşandin û şewitandinê ye. Civatekê ku wîjdana xwe winda kiriye û bêwîjdan maye, nikare pêşerojeke serfiraz û mesûd jî ava bike. Civateke weha pêşeroja xwe û xweşî û serfiraziyêن pêşerojê jî, bi destê xwe, kuştîye. Musa Anter di nivîsarên xwe de, bi taybetî di yêن salêن dawîn de, her behsa van babetan dikir. Û jîber vê bîr û baweriyê bû ku wî her dengê xwe bilind dikir, bi úsliba xwe ya rengin, lê di eynî wextê de kesertijî, li dijî bûyer, pêwendî, fikir û siyasetên neînsanî dinivisi.

**Biranînê Musa Anter**, ji du cîldan hatiye pê, ji gelek aliyan balkêş û bikêr in; di nav wan rûpelên biranînan de panoramaya jiyaneye dirêj, westiyayı, keserkûr û balkêş heye, lê bi qasî vê, di nav wan

rûpelan de rûmet û mezinahiya dengekî ku her hewl daye bibe dengê wîjdanê heye. Di nav wan de dewlemendiya hest û ruh a tecrûbeyeke hêja, spehî û dirêj ku bi hezar zehmetiyan hatiye pê, heye. Ew rûpel bi xweşî û heza meriv û merivahiyê ve hatine neqîşandin. Kesên ku Musa Anter dinasîn, dizanîbûn; ew hosteyê lêgera xweşî û rindîyan bû. Di welatekî mîna Turkiyê de ku jî aliyê civakî, siyasi û çandî, ji bo mîjîyekî xebatker (nemaze eger ev mîjî di ser de kurd e) dûjeheke rasteqin e, wî tiştên xweş, rind, hêja û bikêr didîtin û herweha ew bi hinêñ din re jî parve dikirin. Digel her dijwarî û kirêtiyê, wî şenahî, xweşî û dewlemendiya dil direşand der û dora xwe. Rêzeke Seydayê Ehmedê Xanî, henekeke kurdî ya gundiyyêن Stîlîliyê, destaneke qedim a kurdî yan jî straneke Hafiz Burhan ew kêfxweş û mesûd dikir. Li Turkiyê ku hemû xweşî û bedewiyêñ insanî hatine qetlkirin, bê guman, xweşîyan peyda kirin û di ser de jî xweşîyan pardarî jiyanekê kirin pir zehmet e û jê re hunermendî û hostahiyeke mezin divê. Musa Anter baş bi vê hunerê dizanîbû.

Çiqas derd, kul û misûbetên ku dikarin bi serê ronakbireki/ê kurd de werin, bi serê Musa Anter de jî hatin; jiber huwiyeta wî ya kurdî, ew hertim hate eşandin û perçiqandin, bi şexsiyeta wî hate lîstin, hemû rê û derî lê hatin birîn û girtin, kar û şixulêñ ku wî dikarîbû bikirana, jê hatin girtin, hate girtin, kete girtixaanan, işkence dît, xebat û berhemên wî yên edebî û çandî hatin talankirin, bi tenê hate berdan. Lê digel van hemû nexweşî û kirêtiyan, wî ne dev ji huwiyeta xwe ya neteweyî ne jî dev ji hez û hezkirina insan û insanetiye berda. Haya wî ji mezinahî û bilindiya ahlakî û wîjdanî ya kar û xebatêñ xwe hebû. Ew bi heq bû û li ser riyekê rast bû. Bi vê dîtin û baweriye, ew bi sebra Ayib û metanete Musa xebitî. Li gora wî, Turkiye welatê jan û dînîtiyê, pût û pûtperestan bû, doraliyê Turkiyê bi yasax û qedexeyan ve hatîbû rapêçandin.

Lê, tevî vê, wî ji Turkiyê hez dikir. Jiber ku gelê kurd ku wî ji hebûna xwe zêdetir jê hez dikir li ser wan axan dijiya. Ew ewladê gelê kurd bû. Gelê Tirk ku wî bi rastî jî jê hez dikir, dîsan, li ser wan axan dijiya. Heta nefesa xwe ya dawîn jî, ew ji bo wekhevî, biratî û serfiraziya gelên kurd û tirk xebitî. Musa Anter bi jan û mîna destanên kurdî bi keser bû; jiber ku gelê kurd ku ew lawekî wî bû, li Turkiyê di bin nehqî û zordariyeke pir û pir mezin de bû. Nîrekî wisan kambax li ser stûyê gelê kurd bû ku li dînyayê tu derî tiştekî weha hov û neînsanî nedihate ditin. Mafekî herî biçûk ê demokratik û însanî jî li gelê kurd zêde dihate ditin. Jiber vê zilum û bêwîjdaniyê, jan û keser ji çavêن Musa Anter dixuyan, tevî ku ken û henek jê kêm nedibûn... Wî hemû jan û keserên gelê xwe yê bextreş û belengaz di ruh û canê xwe de his dikir û pir pê diêşîya. Lê di eynî wextê de, ew bi huwiyyeta xwe ya kurdî serfiraz bû û bi kêfxweşî ji bo welat, gel û axa bav û kalan dixebeitî. Wi kurdbûna xwe mîna kahniyeke dewlemendî, kêfxweşî û serfiraziyê didît.

Albert Camus di ceribandineke xwe ya edebî de behsa yek ji navêن nas ên mîtoloziya yewnanan Sisyphos dike û pesna hest û daxwaza Sisyphos ya jiyanê, kîn û nefreta wî ya li dijî mirinê û bîhnfirehî û nefsbiçûkiya wî ya li hember zor û zordariyê dide; Sisyphos ku Xwedayêن wê demê xezebêن mezin lê kirine, mehkûmî cezayekî mezin bûye. Ev divê latekî mezin bi gir û kaşekê de gêr bike û lat derxe ser lütkeyên gir. Lê gava ew lat derdixe ser gir, hingê lat ji aliyê din ve ber bi jêr gêr dibe û dere. Sisyphos divê careke din, bi sebr û metanet, rahêje lat û wî hilkişîne jor. Careke din, careke din... Karê wî her weha berdewam e. Karê wî, cezayê wî ye. Lê ew vî cezayê neaqlî û ne wijdanî, bi heş, azîm, sebr û xebatkariya xwe, diqulipîne ser karekî hêja û giranbiha. Xweda û meriv êdî bi rêz û rêzdarî li sebr, azîm û xebatkariya wî dînihêrin. Ew bi ser dikeve û karê wî êdî kêfxweşî û

serfiraziyê didiyê. Kar û şixulên Musa Anter ji kêfxweşî û serfiraziyê danê. Ew di xizmeta gelê xwe yê mezlûm de bû, wî ziman, huwyet û çandeke bindest û perçiqî diparast, lê xwedî derdiket û ji boyê dixebeitî. Di demekê de ku êdî herkesi digot, "bi kurdî gotinek ji nayê nivisîn", wî şanoya xwe "**Birîna Reş**" bi kurdî nivisi û ferhengeke kurdî-turki anî pê û ew yadîgarî gelê xwe kirin. Wî nivîsar û berhemên xwe bi gotin, stran, wêje û zargotina kurdî neqîşandin. Wî bi serfirazî ev gavêن pêşin avêtin. Ma ji gavêن pêşin û pêşengiya heyamên nû xweştir, serfiraztir û rindtir tiştekî din heye? Van xebat û gavan dil û mîjîyê wî bi dewlemendiya xweşî û bedewiya ruhî vegirtin. Wî ji, mina Sisyphos, kevir û latêن giran, digel her zehmetî û bêçaretiyê, hêdî hêdî hilkişandin gopik û lütkeyan...

Dîsan Camus, di kurte-gotara xwe ya Stockholmê de ku gava Xelata Nobelê werdigire, bi hênceta xelatê, li ser berpirsiyariya nivîskar û ronakbîran radiweste; "nivîskar dikare xwe di nav civat û komeke biheq û jîr de bilebitîne. Ev ji bi tenê dikare bi van herdu berpirsiyariyêن ku mezînahiya hunerê tînin pê, bibe; rastî û azadî. Karê hunermend, perwerdeyî û berhevkirina girseyen gel e. Loma ji ew nikare bibe hevalbendê/a koletî û derewan..." Meriv pir bi rehetî dikare bibêje ku nivîskarı, rojnamevanî û jiyana ronakbîri ya Musa Anter ji koletî û derewan pir bi dûr bû. Wî li hember koletî û derewan, rastî û azadî parast, doza masfîn huwyet, ziman, çand û hebûna kurdan kir û ew xwestin, Turkiyekî demokrat ku tê de azadî û serbestî ne luks in, dil kir. Wî bi dil û can têkoşîna van tiştan kir. Gava meriv li bend Û nivîsarên wî (ji yêن "**Ileri Yurt**" ku di sala 1959-an de li Diyarbekirê dest bi weşînê kir heta yêن "**Ozgür Gündem**"ê ku wî heta mirina xwe tê de dinivisi) dinihêre, hingî meriv hîn baştır Musa Anter dinase û dibîne ka ew çawan dilekî bi kel û coş, mîjîyekî serbest û azad û dengekî însanî û wijdanî bû.

Jiber vê yekê ji, ev xelatên ku bi navê wî û ji bo bîranîna wî (ku ez ji di heyeta jûriya wê de me), niha, têن dayin, gelek girîng in. Nav û bîranîna Musa Anter divê were jiyandin û car bi car vejandin. Meriv divê hewl bide ku eser, berhem û xebatên wî yên ronakbîrî hertim zînde û nûjen bîmînin. Prensip û qayideyên wî yên jiyan, nivîskarî û rojamevaniyê divê hertim li ber çavan bin da ku hem nifşen nû jê kelk werbigirin hem ji iro, di Turkiya roja me de, pir pêwistî û hewcedarî bi wan heye. Lê belê ev xelatên rojnamegeriyê ne bi tenê ji bo van tiştan girîng û di cih de ne, herweha ew ji bo ev tiştên jêrîn ji pir girîng in; ji bo protestokirina ew dest, tili û zihniyeta bêwijdan û xayin ku nivîskarekî kal ê 76 salî, di tariya şevê û kuçeyeke teng de, dide ber gulan û di nav xwîna sor de dihêle; ji bo parastina mafê jiyanâ meriv û azadiya wî ya fikrî; ji bo parastina daxwazên biheq ên neteweyî û demokratik ku kurd lê dozê dikin û Musa Anter ji têdikoşıya; ji bo daxwaza wekhevî, biratî û yekitiya kurd û tîrkan û ji bo Turkiyekî ku tê de tolerans û aşîti heye û hemû insan xwedî mafênen xwe yên bingehîn in... Ji bo an hemû tiştan xelatên Musa Anter girîng in...

Careke din ez hevalên ku xelat wergirtine, pîroz dikim û umreki dirêj û berdewamiyeke dewlemend ji Xelatên Rojnamegeriyê yên Musa Anter re dixwazim.

## Ibrahîm Ehmed û "Jana Gel"

Di tarixa edebiyata kurdî ya nûjen de sê kovar/rojname hene ku qet ji bîr nabin; **Hawar**, **Gelavêj** û **Riya Teze**. Ev hersê weşanên kurdî di warê parastin û pêşvexistina ziman û edebiyata kurdî de nemir in. Û di ser de jî, wan mektebên (ekolên) edebî bi navê xwe anîne pê û xizmeteke bêhempa ji bo ziman û edebiyata kurdî kirine. Îro herkes behsa "*ekola Hawarê, ekola Gelavêjê û ekola Riya Teze*" û endamên wan dike. Gava meriv behsa Nûreddin Zaza, Qedîcan, Osman Sebrî û h.w.d. dike, bi carekê, kovara **Hawar**'ê tê bîra merivan. Gava meriv behsa Şakir Fettah, Piremêrd, Elladdin Seccadî û h.w.d. dike, bi carekê, kovara **Gelavêj**'ê tê bîra merivan. Herweha çaxa meriv behsa Casimê Celil, Heciyê Cindi, Erebê Şemo û h.w.d. dike, bi carekê, rojnameya **Riya Teze** tê bîra merivan.

Herwekî ku tê zanîn, bi dû serê yekemin yê cîhanê û avabûna Komara Tirkiyê re, welatê Kurdistanê di navbera Turkiye, Sûriye, ïran û Iraqê de bû çar perçê. Mîna welatê Kurdistanê, ronakbîrên kurdan jî ku Stembol ji bo xebatên xwe yên siyasi, çandî û ronakbiri kiribûn mesken, ji hev ketin û her yek bi alikî de çûn. Gelekêن wan hatin kuştin û bi darvekirin. Hinêن wan, ji ber sawa terora dewletê, bêdeng man û xwe dan ser ilim û îrfana İslamiyetê. Yêن mayîn jî ji Turkiyê bi dûr ketin û bi derine din çûn. Piraniya ronakbîrên ku bi zaravayê kurmancî dipeyivîn, bi aliyê Lubnan û Sûriyê ve çûn. Yêن ku bi zaravayê soranî dipeyivîn, çûn Kurdistanâ Iraqê. Û yêن ku bi zaravayê kurmancî dipeyivîn û bi aliyê serheden ve çûn, li welatê Qefqesê, tevî kurdêن wan deran, bi hev re, civateke kurdî, bi qasî

200-300 hezar kesi, anîn pê.

Ronakbîrêñ kurdan, tevî xebatêñ xwe yên siyasi, xebatêñ xwe yên çandî, edebî û ronakbîrî jî, digel bi hezaran zehmetî, domandin. Kurdêñ Lubnan û Sûriyê xwe li dora kovara **Hawar'ê** (1932-1946) civandin. Kurdêñ Kurdistana Iraqê pêşî xwe li dora kovara **Jîn'ê** ku Pîremêrd gerînendiya wê dikir, û paşê jî li dora kovara **Gelavêj'ê** (1939-1949) xwe civandin hev. Kurdêñ welatê Qesqesê jî xwe li dora rojnama **Riya Teze** (1929-) civandin. Ev hersê weşan, ji bo ronakbîrêñ kurdan, bûn reh û demarêñ jiyanê, bûn mekteba perwerdeiyiyê, bûn kursiya hal û hewalê ziman, çand û edebiyata kurdî, bûn warê xîret, xebat û afîrînê.

Ji van weşanan Gelavêj, bi rêberiya Ibrahim Ehmed, 1914, li Suliymaniye, hate dinê û ekola wê ava bû. Bi xîret û xebata Ibrahim Ehmed, kovar bû kovareke nemir. Wî û hevalên wî Pîremêrd, Faîk Bêkes, Elleddin Seccadî, Evdulla Goran, Mistefa Saib, Hemîd Fereç û h.w.d. deh salan, bêyî ku navber bidinê, bêwest û bêrawest, Gelavêj weşandin û gencîneyeke nemir yadigarî ziman û edebiyata kurdî kirin.

Belê, berî ku em behsa nivîskariya Ibrahim Ehmed û romana wî "Jana Gel" bikin, me divê ku em behsa xizmetêñ wî yên çandî û edebî û mamostetiya wî bikin... Navê Ibrahim Ehmed, li hemû Kurdistanê, navekî nas û diyar e. Ew bi pênuş û heşê xwe, bi xizmet û têkoşîna xwe, bi berhem û eserêñ xwe, nas e. Wî hem xebata siyasi hem xebata çandî, edebî û ronakbîrî kiriye; hem bi sedan nivîsar û bendêñ siyasi nivîsine û hem jî berhemêñ edebî (kurte-çîrok û roman) afirandine. Wî şexsiyata siyasi û ya çandî/ronakbîrî gîhandiye hev û ew kirine yek.

Çima?

Bersîva wî, ji bo vê yekê weha ye: "digel ku min nedixwest, ez rakêsiyam nav xebata siyasi. Min nikarîbû xwe li dervayê xebata rêkxistinî û siyasi rabigirta..."

I. Ehmed di xebata xwe ya çandî û edebî de jî riya zehmettirîn daye ber xwe. Ew baş dizane kuedebiyata kurdî ya niviskî, bi qasî ya devkî, ne bi hêz û quwet e. Ew dizane, di edebiyata niviskî de jî, pexşana kurdî, bi qasî şihîrê, ne bi quwet e. Ew dizane, di pexşana kurdî de jî, şêweyên nûjen mîna roman, piyes, kurte-çirok, bi qasî destan, efsane û çirokan, ne bi quwet e. Loma wî nivisîn û afîrîna roman û kurte-çirokêñ kurdî daye ber xwe. Wî xwe ji destan, efsane, çirok û şîirêñ gelêri daye alî û şêweyên nû yên edebî ku di edebiyata kurdî de hê baş nehatine ceribandin, kiriye karê xwe. Wî kar û xebatêñ din ên edebî biçük nedîne, lê yên herî dijwar dane ber xwe.

Romana **Jana Gel** mîsala vê yekê ye. Jana Gel romana yekemîn e ku bi zaravayê soranî (kurmanciya xwarê) hatiye nivisîn. Bi vî aliyê xwe, çapbûn û derketina wê, bûyereke tarîxî ye. Bi afîrîna romana Jana Gel, edebiyata kurdî ya ku bi zaravayê soranî tê nivisîn, gaveke tarîxî avêtiye. Nivîskar bi xwe, di dawiya romanê de, behsa serpêhatiya nivisîna romana "Janî gel" dike. Roman, berhema bûyer, qewimîn û tevgerêñ li Kurdistanê ye. Wan tesîr li nivîskar kiriye û nivîskar jî xwestiye bergeheke neqîsandî ji bûyer û tevgerêñ welêt derxîne û berpêşî xwendevanan bike.

Roman, li ser serpêhatiya maleke kurdî ava dibe. Bav, Camêr Bayiz ku qehremanê romanê ye, ji aliyê dujmin, piştî raperîneke xwînî li bajarekî, tê girtin û bi qasî deh salan li girtîxanêñ dijmin dimîne. Bi dû berdanê re, Camêr Bayiz vedigere bajarê xwe û dikeve pê mala xwe. Di nav wan deh salan de, wî bermaliya xwe Kalê û lawê xwe Hêwa nedîne. Ew li wan digere, li pey wan e. Lê ew nexuyane. Li gora gotinan, ew cûne gundekî merivanêñ xwe. Lê, ew bi şik e. Mala wî ya ku li bajêr bû, ji aliyê dijminan ve, bi erdê re yek bûye. Nîvê bajêr hatiye kavilkirin. Jiyana civakî nemaye. Xelkê bajêr bêdeng û bitirs e. Li her derî leşker, zabit û sîxwurêñ dijmin hene. Destê wan dirêj, quweta wan bêpayan û guhê wan

vekiri ye. Li milekî dijmin heye, li milekî jî tevgera azadixwaz yê welêt. Serekî bêeman dewam dike. Camêr Bayiz xwe ranagire û dikeve rê da ku here gund û mala xwe bîne bajêr. Lê ew xwe nagihîne gund. Li rê, pêşî, ew tûşî êrişen dijmin dibe. Balafirên dijmin, li ber çavên wî gundekî dikin kavil û jinek dikujin. Ser bi qayidên xwe dewam dike... Li rê, paşê, Camêr Bayiz rastî çekdarêن tevgera azadixwazê welêt tê. Ew ji wan dibihîse ku hemû gund kavil bûne û jiyanâ gundayeti nemaye. Gundî hatine kuştin, herweha jin û zarokê wî jî (û ji mêm ve)... Di cîhaneye weha de, tu rê êdi li ber Camêr Bayiz namîne; ew vedigere bajêr, hin karên xwe bi rê dixîne û disan vedigere nav refêن hêzên çekdar ên azadixwaz. Ev naveroka ku min li vir, pir bi kurtî behs kir, di romanê de sax didin. Lê bi giştî, roman li ser welatekî ye ku kavil bûye û di nav ser de ye. Roman li ser jiyaneye perçiqî û li ser civateke nexwes û nesax e. 1. Ehmed bi devê qehremanê romanê, dermanê nexweşiyê jî dibê; "Zarok jana jinê ye... şoreş jana gel e" Herweha, navê romanê jî bi vî awayê tê pê. Nivîskar, bi şeweyekî realist, bergeheke realist, bi zimanekî sade, berpêşî xwendevanan dike. Zimanê romanê sade ye, lê bi gotinêن weha xwe û edebî jî dagirtî ye: "tenûra xeberdanê vêxistin û asê xeyalê xistin..."

Bê guman, mîna her romana yekemîn û destpêkê, di romana Jana Gel de jî kêmanî û qelsiyên edebî hene. Lihevanîn û raxistina edebî ya romanê ne ewçend bi quwet e, realizma bûyeran û salixdana eş û derdan carina ji sinorêñ edebî dibihurin. Lê belê, digel vê yekê, Jana Gel di pêşvexistina pexşan û romana kurdî de gaveke tarîxi ye. Gava meriv behsa tarîxa edebiyata kurdî ya nûjen bike, meriv divê behsa Jana Gel jî bike.

Herweki ku tê zanîn, Jana Gel pêşî bi tipêñ erebî û bi zaravayê soranî hatiye nivisîn û navê wê hingê Janî Gel e. Bi dû re ew transkrîbeyî tipêñ latînî bûye. Zimanê wê jî bi zaravayêñ kurmancî û soranî têkel bûye. Bi baweriya min, ev têkelî di warê nêzikkirina zaravan de

baş e. Ji bo yekitiya ziman û edebiyata kurdî, em divê eser û berhemên xwe yên ku bi zaravayêن me yên curbecur û bi elfabayêن curbecur hatine nivisîn, veguhezînin hevûdu. Ji bo yekitiya bîr û hîsêن neteweyî jî ev yeka pêwist e. Edebiyata kurdî baş dewlemend e, lê ew jihevketî ye û yekitiya wê nîn e. Herkes di warê xwe de eser û berheman diafirine, lê haya me ji piraniya wan nabe. Li ku dibe bila bibe, gava esereke, berhemeke kurdî tê afirin, ew dewlemendiya me ye. Em divê lê xwedî derkevin û wê rabigîhinin aliyêن xwe. Heta em nikaribin berhem û eserên hev binasin û bixwînin, em nikarin behsa bîr, his û zimanê yekgirtî û neteweyî jî bikin. Ji ber vê yekê jî tecrube û pêşkeşkirina Jana Gel pir ezîz e.

Û ez hêvi dikim ku ew bibe destpêka xebata veguhezandina eser û berhemên kurdî di navbera zaravayêن kurdî û elfabayêن cuda de ...

## **Niviskarên gelên tenêmayî: G. G. MARQUEZ**

Gelo kî heta ku Gabriel Garcia Marquez nivisand, di derheqê Macondo û çiroka wî de tiştekî dizanibû? Lê iro bi milyonan meriv Macondo û çiroka wî dizanin. Íro bi milyonan meriv trajedi, dram û tenêbûna Macondo dizanin. Marcondo iro, êdi ne tenê gundekî piçûk li Amerika Latînî ya bextreş e. Macondo iro quncikek li Afrika reş an stariyek li Hind û Çinê an jî kozikekî pêşmerga yê li Kurdistanê ye. Anglo li seranserê cihanê derek e ku meriv li wir trajedyekê û tenêbûyinekê dijin. Derek e ku çavêن zarokan bi hêvî, lê zikê wan birçi ye. Derek e ku rûyê jinan bi ken, lê dilê wan bi şîn e. Derek e ku lê simbêlên mîran merd e, lê eniya wan qermiçî ye. Derek e ku pîr û kal di binê barên tenêmayînê de westiyane. Ha Macondo ew der bi xwe ye.

Macondo iro ev e. Yadigara Marquez ev e ji merivan re. Marquez bi romana xwe ya "Sedsal Ji Tenêbûnê" ve ji cihanê re Macondoyekî wusan yadigar kiriye.

"Sedsal Ji Tenêbûnê" çiroka gundekî piçûk û merivên wî ye. Çirok, ya malbata Buendia ye. Çiroka mîrxasê gel general Aurelia ku ketiye şeran, lê di hemûya de jî winda kiriye.

Íro bi alikariya Marquez, meriv jî hemû derên cihanê di "Sedsal Ji Tenêbûnê" de çiroka xwe jî, trajediya xwe jî dixwînin, sûretekî ji xwe di romanê de dibînin. Ev ne tiştekî hindik e.

Pêkvanê vê romana giranbaha Gabriel Garcia Marquez isal (1982), xelata Nobelê ya edebî stend.

### **XELATA NOBELÊ**

Akademîya Swêdê, isal ji bo xelata Nobelê ya edebî

G.G. Marquez helbijart. Xelata Nobelê her sal di besên ekonomî, tibi, zanyarî, aştî û edebî de tê dayîn. Kesên ku di warêن van beşan de xebateke xuyayî ya hêja kirine, têne hilbijartin. Enstituyêن ku van xelatan didin, gelek kevn in. Xelat ji 1901-ê û bi vir ve têne dayîn.

Ji bo xelata îsal, gelek nivîskarêن bi navûdeng hatibûne pêşniyar kirin. Ji Amerîka Latînî jî gelek nivîskarêن hêja di lista Akedemiya Swêdê de hebûn. Wek mîsal kalê hosta Jorge Luris, Mario Vargas, Julio Cortazar, Carlos Drummond, Juan Carlos Onetti jî, di listê de bûn. Marquez di nava van hemû nivîskarêن jîr de, bû yekemin û xelatê stand.

Akademiya Swêdê di helbijartina Marquez de, wek pîvana xwe van tiştên jêrîn ji cîhanê re diyar kir:

"Edebiyata (wêjeya) Amerîka Latînî ji kevn de ye, jîndariyeke hêja nîşan dide û roleke pir hêja di jîyana kulturi ya îro de dileyize. Gelek bawerî û tore bi hev re ne. Kultura gelî, stiran û destanên devki, sûretên kevn ji kultura bilind ya Sorikan (Indian), tesîrên barokiya Spanî, tesîrên sarrealizma Ewrûpî û modernîzm... Ev hemû bi hev re avayıyeke jîndar pêk tînin, ku Garcia Marquez û hozanên Amerîka, yên Spanî şewqa xwe jê werdigrin..."

Lê ev pîvan, bese bi serê xwe, hêjayî û dewlemendiya kultura Amerîka Latînî nîşan nade. Ji ber ku Amerîka Latînî ji sedsalan ve ye ku bindest e.

## BINDESTIYA AMERİKA LATINI Û KULTUR

Di 1492-an de Kristof Kolomb bêzanîn cîhaneyeke nû dît û keşf kir. Lê belê gelên cîhana nû jî, bi hatina Kristof Kolomb û hevalbendêن wî, cara pêşî bû ku bindestiyê dîtin.

Piştî K. Kolomb, kesên ku li dû zêr, baharad û li pey keda belaş digeriyan hatin. Hatin, lê bi tang, top, şûr û dekêن xwe ve hatin. Piştî demeke kurt, ew têgihiştin ku cihê ew hatine ne bihişa baharada Hindistanê ye. Lê ew

êdî carek hatibûn û her wisan jî li wir man...

Wê demê, zimanê ku di nava Kastilyan de dihate peyvandin, spanyoli bû. Helbest, destan, çîrok, dîrok û perwerdeyî her bi wî zimanî dihate nivîsandin. Spanyoli di wê demê de gelekî populer bû.

Merivên cihana nû jî, cara pêşî bi hatina Kristof Kolomb û hevalbendêñ wî, ew zimanê ecêb nasîn. Bi demekê piştre êdî merivên navxweyî yên cihana nû dest bi axaftina wî zimanê "ecêb" kirine. Gava hevalbendêñ Kolomb, Alvor Munez xwe di 1541-ê de gihande Paraguayê. Navxweyiyêñ Guarani ew bi spanyoli piroz kîrin. Êdî spanyoli di sedsala VI-an de li piraniya Amerika Latîni dihate axaftin.

Bi vî awayî biyaniyan digel tank, top û derewên xwe, ziman, tore û kultura xwe jî anîn. Navxwetiyêñ Amerika Latîni bideest ketin, naçar û bê hêz bûn. Digel dewlemendiyêñ wan; ziman, kultur, edetêñ wan jî ji destêñ wan çûn. Xweşî û heyinêñ Tlaxcalteca, Aztek, Inka wek berfa ber rojê diheliya.

Piştî Spanyolan, ji derêñ din yên Ewrûpayê ji "biyanî" hatin. Ewan jî yên xwe anîn.

Dawiya dawîn navxweyiyêñ Amerika Latîni yên reben, ketin rewşike wisan êdî ne kifş bû ku ew kî ne, ci kes in. Vê rewşa han Kalê baweriya "Amerika Latîni ya aza" Simon Bolivar wusan xuya dida: "Gelo em kî ne? Rewşa me gelek taybetî ye. Em ne Ewrûpayî ne, ne jî êdî navxweyî ne... Dayika me hemûyan yek e. Lê bavêñ me cihê ne. Xwin û cihatînêñ wan cihê he. Ev yek di hêjahiya kultura me de giraniyeke mezin e..."

Latîn Amerîkayiyêñ reben êdî di binê mêtzana Ewrûpayê de mabûn. Li hêlekê Spanya, li hêla din Ewrûpa. Pozitîvîzma Fransî, ultiîteratîzma Îngilizî û pragmatîzma Amerîka Başûr jî, ji şikeft û deştêñ Inka û Aztekêñ reben re derbaz bûn.

Lê weke her derî -li Amerika Latîni jî ronakbirêñ wê hewirda (qita) reben dixwestin xweser bin. Gelek tişt ji serperwerdeyêñ xwe fêr bûbûn. Lê êdî -weke her carê-

wan dixwest ku bi xwe jî hebin, bi xwe jî pêk binin, ava bikin, bêjin, binivisînin û -ya herî girîng- fêr kin, nişan bidin ku tiştên ew bêjin jî hene.

Herweha rûpelek teze di diroka Amerika Latînî de vebû. Ku bai Jose Marti bi avayiyêن xwe nişan da ku tiştên ew bêjin jî hene. Armanc di nav bawerî û kulturên curbecur de xweyibûn bû. Bahozâ kultûri ya Amerika Latînî wusa ges bû, wisan kultureke giranbiha, hêja ava bû. Ji xwîn, kozmopoliti û bindestiyê quesreke zêrin ava bû. Wusa Roman Lepoz Velarde (Meksika), Cesare Vallejo (Perûyi) û hozanê mezin, merivê mezin Pablo Naruda (Şiliyi) derket.

### **MARQUEZ... MARQUEZ...**

Îro jî Gabriel Garcia Marquez di şopa pêsiyêن xwe dde dimeşe. Îro alaya bahozê ya Qesra Zêrin di destê Marquez, Octavio Paz, Jorge Luis Borges û yên din de ye.

Ango, Marquez kurê Qesra Zêrin bahozâ tenêmâyîyan e. Ew jî ji kahniya ked, xwîdan û hêrsê ye, dijminê kedxwaran, hevalê belengazan e. Ew, rebenan bi zimanê wan dinivise, xwuya dide, nişan dide. Wî, di 4-7'ê Ilona 1982'an de li Kubayê di civîna ronakbirêن Amerika Latînî de bi navêن ronakbirêن wê heverdayê wusan digot: "Îro di vê demê de ku Amerika Yekgirtî (USA) careke din dixwaze Amerika me bi dest xine, weke xwe bike. Divê em ronakbîr jî berpirsyariya xwe bi cih bînin û li ba gelê xwe bin, li dijî bindestiyê şer bikin."

Belê, Nobela Îsal, îro di destêن şervanê kahniya xwîdanê de ye. Marquezê Kolombiyayî weke nivîskar, weke xuyadar di stîla xwe de jî pir aza ye. Ew dizane, bo nivîsîna azadiyê bes bi azabûnê dikare bibe. Ew jî bo azadiyê nivîsin e, lê bêyî ku bi dûr û dirêj jî behsa azadiyê bike. Di cihê azadiyê de ev behsa merivêن tenêmayı, merivêن ku ji kahniya xwîdanê ne dike. Ew cihêbûna politîka û ya edebiyatê rind dizane, di nivîsarêن xwe de tiştan tevlihev nake, xuyayıyek hêsan

nade ber xwendevanên xwe, xwendevanên xwe fêri zexeliyê nake, bernade ku xwendevan bes xwendevan bimîne. Ew, xwendevanan jî digre, dixe nava drama merivên xwe. Xwendevan jî, êdî dibe yek ji çirûskên rika neheqiyê.

Marquez ne bi tenê behsa bindestan dike. Her weha serdest jî cihêن xwe li ba wî digirin. Ew serdestan digre, bi wan ve kûrayiya dîrokê, yan jî wan digre û dibe mazata Newyorkê ya iro. Wan digerîne. Ji bo ku ew xwendevanan bîghîne qurma neheqiyê. Marquez serdestêن navxweyîyan jî jibîr nake; Ewan jî digre û dibe seyranê. Bi wan re jî dileyize. Di "Payîza Patrik" de xwendevanan, cihê tucarekî fetbaz (weke di "Sedsal Ji Tûnebûnê" de) îcar diktatorekî kevnar ê mejîihevketî dibîne.

Marquez bo merivan dinivisîne. Ji bo wî, meriv esas in. Ji ber vê jî bingeha nivîsarêن wî meriv in. Ji merivan mozayikeke hezarreng (weke kultura wan) derdixe û dîsan yadîgarê merivan dike.

Ji vê yekê, iro meriv li seranserê cihanê, bi taybeti yên ku ji kahniya xwîdanê ne, qedrê Marquez digrin.

**Berbang**, 12/1982

## Xwendin

Goethe di despêka niviskariya xwe de weha digote; "fîrbêna xwendinê senheta herî dijwar e." Xwendin û senhet... û li ser jî senheta herî dijwar. Gelo wisan e, ev yeka rast e?

Gotina Goethe di esasê xwe de ne tenê ya wî ye. Gelek kesên din jî di wê baweriyê de ne, ku herçî xwendin e, senhet e, û daxwazî, zanîn, jîrî û hosteyî jê re dive.

Xwendin û nivisandin di tarîxa merivan de cihekî girîng radigire. Meriv bi xwendin û nivisandinê xwe radigihînin hev. Bir û baweriyên xwe, daxwazî û pêşniyarên xwe, rexne û şiretên xwe ji hev re dibêjin. Tecrube û nêrînê hevûdu bi kar tînin. Bi alikariya xwendin û nivisandinê cihana me ya stûr biçüktir dibe. Gel nêzikê hevûdu dîbin, kulturên curbecur dikevin nava hevdu. Meriv ji cihanê, ji gelen din, kultur, ziman, nêrîn û tecrubê din hayidar dibe. Bi alikariya hayidarî û agahdariyê jî, meriv xwe bi pêşve dixe.

Eger merivan nivisandin û pergelên wê peyda nekiribiwa, ji bo xwendinê xwe neêşandine, herçî nêrîn, tecrube û zanîn e, dê di warekî pir teng de bîma. Tu kesî dê nikirabiwa çarçewa xwe ya civakî, bivê-nevê pir teng e, firehtir bikira. Her tişt, her nêrîn û tecrube, her zanîn dê di cihê xwe de bîma.

Bi xêra xwendin û nivisandinê, em ji vê xezeba hanê xelas bûne. Meriv her gav hewcedarê dan û standinê civakî ye, her dixwaze bide û bistîne. Tu kesê normal û hayjixwe bêî vê yekî nabe. Dialog bingehê civatê ye.

Îcar xwendin jî şîweyekî dialog e, heypeyvin e. Bi xwendinê xwendevan û niviskar digîhêن hevûdu, bi hev re dipeyvin. Xwendevan niviskar û tiştên niviskar nivisîne dinase. Niviskar piştî dema tenêbûn û bêdengiya nivisandinê, derdikeve holê û bi tiştê xwe yê

nivisandi xwe digihîne xwendevanê xwe. Ícar divê xwendevan tenê be da ku bi niviskar ve dialogê pêk bîne.

U bi alikariya ev dialoga bêdeng, xwendewan xêni tecrube, nérin, his, zanînên xwe, bi yên hinekên din ve ji tê rû, û tiştê jê re pêvist e, werdigire, wan li bêjinga hîs û zanînên xwe dixe, tiştên li ser bêjingê mane werdigire dixe nav terzada zanînên xwe. Bi vî awayî ew zanîna xwe pêşve dixe, terzada zanîna xwe hîn dewlementir dike, wê bi tiştên nû didewisine.

Çeyiya dialogek wisan - bê guman- li ber çavan e. Digel vî yekî, alikariya xwendinê di warekî din de ji pir e. Xwendin difikirine, dide fikirandin. Fikirandin xwendin e. Di dema xwendinê de meriv tenê ye. Ji dan û standinê dora xwe dûr e. Li gora xwe, daxwaziya dilê xwe dixwîne. Xwendevan bi xwe bîryara xwe dide, ka ew dê çawan bixwîne. Herçend -li gora tecrube û lêkolinan-xwendevan dixwaze pir zû weşanê destê xwe bixwîne û jê rizgar bibe û di xwendinê de dema bîhna wî teng dibe, beî ku bixwîne, çend rûpelan dipeline jî, disan xwendevan bi niviskarê destê xwe ve bi serê xwe ye, û her rêz, her rûpela niviskar di mîjîyê xwendevan de çerx dibe. Xwendevan -bivê, neve- difikire. Dewlementkirina fikirandinê yek ji stûnên bingehîn yên pêşveketinê ye, .têkûztir û bi rêk û pêktirbûn e.

Ji ber vê yekê xwendin, zanêbûn, fikirandin û peşveketin bi hev ve girêdayî ne, hevûdû temam dikin. Hemû gel û welat li ser xwendinê radiwestin û dixwazin gelên wan fêri xwendinê bibin. Xwendin jî bibe wekî xwarina nêñ û vexwarina avê. Ev yeka bê sedem nîne. Peşketin û serfirazî bi zanînê ve gengaz e. Zanînek bi rêk û pêk û rêxistinî daxwazîyan bi cih tîne, wan dike rast. û loma jî li Fransê salê 26 hezar pirtûkên cuda çap dîbin. Di dereki pir piçûk wekî Swêd de, ku nifûsa 8.5 milyon e rojê 4,5 milyon rojname belav dibe.

Xwendin yekgirtina merivan e. Bi hêzbûna wan e. Bi hev re yekbûn e. Xwe û merivaîyê naskirin e. Mejî û

fikiran têkûztirkirin e.

## II

Li vir divê em hinekî li ser dan û standina xwe û xwendinê jî rawestin. Navbera me û xwendinê çawan e?

Tu kes nikare ji vê yekê re bersiveke pozitîv bide. Ji aliyê xwendinê (nivisandin jî tê de) neçaiîya me li ber çavan e. Di vî warî de kurd nikarin rewşa xwe û gelên din bidin ber hev. Rewşa ku em tê de ne, ji ya gelên din gelek cuda ye. Bê guman neçariya me ya xwendinê ne bê sedem e, û sedemên neçariya me jî pir in. Em nikarin an sedaman hemûyan, yek û yek, di çerçeva vê nivisari de diyar bikin. Lê belê, li ser hinek sedeman bi kurtî rawestîn pêwîst e.

Ez bawer im di vî warî de 3 sedem esasî ne.

**1-** Gele kurd ne xwedî dewlet û muessesên netewî ne ku dewlet û muessênetewî bikaribin li seran serê Kurdistanê xwendinê bi rê xînin. Bi xebatê pêvist bikaribin problemên zimanê kurdî hal bikin, çap kirin û weşandina kovar, rojname û pirtûkan organîze bikin.

**2-** Yek ji sedemên esasî jî şer e. Kurdistan ji 153 salan zêdetir e, her di nava şerekî dijwar de ye. Dijminan wî perçe kirine û hemû mal û heyînên wî jî destan girtine. U Kurdistan jî li ber xwe dide. Ji bo maf û heyînên xwe şer dike. Ev şerê ijiwar û zordestiya nedîti ya dewletên zorker rê nade ku kurd nefesê bigirin, ji bo tiştên din jî bi firehî û dirêjî bixebitin.

**3-** Koçerbûna gelê kurd jî disan di warê neçariya xwendinê de sedemeke esasî ye. Em wekî gel bi sed salan di nava iîyanek koçerî û eşîri de ne. Bajarêne me yêne mezin ku navenda dan û standinê aborî, ticarî, kulturi, siyasi û hwd. ne, çênebûne. Di du sed salên dawîn de, xwendegeh û kitapxanên me yêne mezin, balkêş û xwedî pelek bilind, tune bûne.

Ez bawer im, şêweyê jiyana koçerî, di warê neçariya xwendin û nivisandinê de cîhekî girîng werdigre. Ji ber

ku kurd civateke koçer û xwedî qerekterê koçerî bûne, li ba kurdan edetê gotinê ji edetê nivisandinê hîn bi hêztir e. Gel û civatênerûniştî ji nivisandinê zêdetir dibêjin. Tarîx, kultur, edebiyat û muzîka xwe bi gotinê radigihînin hev, nifşen nûhatî û gelên din. Îcar edetê kultur û edebiyata nivisandî li ba gel, hêz û kesên bicîhbûyi,ango li ba bajariyan pêşketitir e. Li ba me ji edetê devkî pêste ye. Em Memê Alan, Xecê û Siyabend, Zembilfiroş, Derwêşê Evdi, Fermana İbram Paşê, Dimdim, Bavê Fexriya û yên din ji dev fêr dîbin, bi dev dibêjin û bi dev fêr dikin. Em tarîx, kultur, edebiyat û musîka xwe ji dev fêr dîbin.

### III

Îcar di roja me de, ew sazûmana me ya civakî êdî ji hev dikeve. Edî ne eşîrên me û ne jî jiyana koçertiyê li pê dimîne. Sazûman û dan û standinêne kevn dihelin. Teví vê, edet, tore, norm û nêrînêne wê sazûman û dan û standinêne civakî jî nikarin xwe nû bikin û winda dîbin. Edî tu kes ji nifşa ku nuha 20-30 salî ye, ji zarokêne xwe re behsa Kêz Xatûnê an tiştêne din ên zargotinê nake. Edî ji beroşen eşîran dû ranabe. Edî zozanêne welatê me sêwî dimînin, koçer têne li bajar û gundan bi cih dîbin.

Di heyameke wisan de zelalbüna girîngiya xwendin û nivisandinê, ji bo roj û demêne pêşiyê, pêwist e. Em divê fêrî xwendin û nivisandinê bibin, bixwînin, awa û atmosfera xwendinê ava bikin. Ev yek dê di xebat û tekoşîna gelê kurd de ji kurdan re bibe alîkareke mezin. Kurd divê -ger li welêt, ger li dervayê welêt- ji bo fêrbûn û fêrkirina xwendinê bi xurtî bixebeitin. Rast e, xwendin senhetekê dijwar e, lê tiştê nefêrbûnê nîn e. Xwendin dê pêşîya me roni bike, dê me nêzikê hevûdu bike, dê hejmara kesen bîrewer, rêber û pisporan zêde bike.

Nemaze rêexistinêne me yên sîyasî, civakî û kulturi divê, ji bo pêşxistina xwendinê di nava gel de, sêweyên

nû yên xebatê bibînin, kampanyan vekin, heftan durist bikin, semîner û konferansan çêkin, xelatan bidin... Li Ewrûpayê tê de ku zêdeyi nîv milyonî kurd dijin, meriv dikare xebatên wisan, bi hêsanî, bike.

Di vir de du tiştên gelek girîng hene ku divê meriv ji bîr neke.

**1-** Hebûna cih û warênu ku meriv bikaribe li wir tiştan biweşîne û ragîhîne xwendewan û girseyên kurd.

**2-** Tiştên weşiyaye dive bikaribe bala xelkê bikişîne û bersîva daxwazîyan bide. Ji bo van her du tiştan jî, kalite û ciddiyet esas e. Di her varê weşan û xwendinê de, em di nava birçibûneke pir mezin de ne. Ji zarokan ta pîrêne me, her kes di war û rewşa xwe de hewcedarê weşanan e. Divê êdî cih û warênu ku vê xebata giran (lê evçend jî hêja) bidin ser milên xwe derkevin û bi alîkariya welatparêzan bimeşin. U kesên ku dinivisînin, zêde bibin, kalîta afirandinê wan berzir bibe da ku tesîr li xelkê bike.

#### IV

Benjamin Franklin di nivîsareke xwe de digot, "heta di welatekî de ji bo xwendinê daxwazî zêde nebe, çewtî û xezebênu ku ji çewtiyan dizên, kêm nabin..."

Sedemên xezeba çend sedsalan ku li ser welatê kurdan xwe dihêjine, ne bi tenê kîmaniya xwendinê ye. Sedemên xezebê pir in.

Lê belê, eger hejmara xwendayênu kurdan zêde bibin, xwendin di nav kurdan de bibe civakî, girseyî, hingê kurd dê -qet nebe- li ser sedemên xezebê baştir rawestin, hevûdu baştir têbigihîyên...

**Berbang, 1982**

## **Ci şixulê me hebû di tarîxa merivan de**

Rêza jorîn ne ya min e, ya hozanê mezin Aragon e. Ew di helbesteke xwe de ku ji bo Pablo Neruda nivisiye, weha dibêje...

Di destpêka sersala 1983-an d, hozan û merivê mezin Aragon mir, bi gotina bapîrên me, çû rehma Xwedê. Weşanên hemû cîhanê di teleksên xwe de, li ser mirina wî, xebereke weha derbas kirin; jiyanek 85 salî şopeke bêmirin li pey xwe berda û çû...

Belê rast e, jiyanek 85 salî, bi zêdeyê 70 kitabêن hêja, bi hezaran helbestêن giranbiha, bi kovara *Les Lettres Françaises*, bi endametiya *Akademîya Goncourt* û bi hunermendî û merivahi,bihurî û çû. Lê vê jiyanê şopeke bêmirin berda û çû. Aragon çû, lê dewlemendiyêن ku wî afirîne, berhemêن wî, iro, li ber me ne. Fermo, em helbestêن wî yêñ ku yek ji yekê xweştir û hêjatir e, werbigirin û bixwînin. Yan em *Les Cloches de Basel* (*Zingilêñ Baselê*) bixwînin, yan jî inêñ din... û hingê em bibînin ka meriv çawan diare zimanekî evçend xweş bineqîşine, çawan dikare dilêñ bi an hilkişîne ser esmanan û ji wir bide qîrandin; merivno, meriv bin!.. Em kitabêñ wî bixwînin û bibînin ka meriv çawan dikare rêzeke biçûk bike kozeke agir û bi milyonan dilan pê bişewitîne.

Wî, ji roja destpêka nivisînê heta roja mirinê, ne bi kesekî din re, lê bi xwe re, qewleki biribû; diviya dilê wî ji bo merivan û serfiraziya merivan lê bida, diviya mîjiyê wî ji bo merivan û rizgariya wan bixebeitîya. Wi her weha digot.

Ew heta mirinê jî li ser qewlê xwe ma. Wî bi hezaran tişt ditin, di hezaran heyaman re bihurî. Di umrê wî yê

dirêj de, pîr tişt guherîn, pîr tişt têk çûn, pîr tişt ava bûn. Lê qewlê wî her qewl bû.

Wî ji jiyanê hez dikir û digot, "her tişt ji bo jiyanê ye." Wî jiyanekî hin wekhevtir, hin azatir dixwest û ji bo vê şer dikir. Wî ji şînbûna darekê, avisya kewroşkekê, şîveke xweş, helbesteke hêja û ji şerê bindestan hez dikir. Wî digot, "jiyan ev e..." Em rahijinê û helbestên ku wî ji bo jina xwe Elsa nivisîne, bixwînin. Eger me ew xwendibin, em careke din wan bixwînin û bibînin ka meriv çawan ji jiyanê hez dike.

Wî pesna xwe nedida, fortan nedavêt, çawan difikirî, wisan jî digot û dinivisi. Wî ji kêmâniyên xwe re digot, "kêm in." (Herwekî ku ew di romana xwe ya yekemîn "Anicet ou Panorama" de dinivisîne) Wî ji rastî û hêjahiyên xwe re jî digot, "ev rast û hêja ne..."

Hozanekî, merivekî weha mir. Ew meriv bû, ew Aragon bû...

## II

Gava heval û hogirê wî Pablo Neruda mir, wî weha nivisi;

*Ci şixulê me hebû di tarîxa merivan de  
Axx, em çima vê janê dikişînin  
Ci heye ku em lê digerin di dînîtiyên wan de  
Çima em ketin nav wan, wekî miyeke ber kîrê  
Axx, me ci guneh kirin, ger bi fîkir ger bi gotin  
Ku em ketin av wan, axx...*

Pablo Neruda heval û hogirê Aragon bû. Wî jî, mîna Aragon, ji bo çeyî û serfirazîya merivan xwe diêşand, ji bo merivan dinivisi. Ew jî hozanekî pîr mezîn bû, wekî hevalê xwe. Di welatê Neruda e, ji bo serfiraziya merivan, pêşketineke hêja hebû. Merivên wî welatê ji bo şîrê zarokan, nanê pîran, azadiya jinan û keda karkeran dixebeitin. Serokê wan jî yek ji wan bû. Wan ekî ji xwe kiribûn serokêwelatê xwe.

Lê rojeke reş ya îlonê, hin merivên din ku dijminê merivahiyê bûn, bi çek, tanq û balafirêñ xwe hatin û gotin; meriv çi dizane meriv be!

Yêñ ku nû hatibûn, general bûn. Wan her tiştî têk dan, hilweşandin, bi hezaran meriv kuştin, şîrê zarokan, pariya nanê pîran ji destê zarok û pîran girtin, keda karkeran, careke din, bi darê zorê şelandin û serokê wî welatê jî kuştin.

Wan merivahî, di seranserê welêt de, qedexe kirin û weha gotin; divê em ji bîr nekin ku bapîrêñ me lawir in, ev merivahî û pêşxistina wê çi ye, ev ji ku derketin?

Ü dilê merivê hêja, hozanê jêhatî hingê hew xwe ragirt, ew dilê mezin teqîya.

Pablo Neruda jî meriv bû, lê ew Pablo Neruda bû...

### III

Yêñ ku nû hatibûn ser hukim jî meriv bûn, lê ew li pey şopa bapîrêñ xwe, lawiran bûn.

Gelo, li nik me jî, serê kahnîyan her û her di destê şopvanêñ bapîran de nebûye?

Mîna iro tê bîra min, ji rojan rojekê, serokê dewleta ku kurdan diperçiqand, dê bihata bajarê me. Bajarê me, bajarekî biçûk bû, bi qasî sih hezar kes li wir dijiyan. Serokê "dewleta azîm" dê bihata... Ji berî pêncî salan û vir ve, em ketibûn bin destêñ wan. Wan her tiştêñ kyrdan qedexe kiribûn. Gava kurdan, li ba wan, dixwest bi zimanê xwe bipeyivin, ew diqîriya ser kurdan û digotin, "vatandaş Türkçe konuş!.." Yanê, hemwelatiyo, bi tirkî bipeyive!.. Serokê vê celeb dewletê dê bihata bajarê me yê biçûk û wî dê di meydana bajêr de hîtabî xelkê jî bikira.

Min û yek ji dostêñ bavê min, Xalê Evdo, li çayxanê, me bi lez çayêñ xwe vedixwarin da ku em bigîhana ser xeberdana "serokê ezîm." Ew serokê dewleteke ezîm bû, em diviya biçûna. Xalê Evdo xwe xweş dabû hev, şelwerê xwe yê qabardin li xwe kiribû, kur bûbû û simbêlê xwe xweş boyax kiribû. Wî dê cara yekemîn serokekî bidîta.

Wî dixwest bidita ka ew çi kesên evçend hunermend bûn ku dikaribûn 10 milyon kurdan bindest bikirana.

Em çûn. Wan meydan bi ala xwe neqîsandibûn, kursiyeke bilind danîbûn koşeyekî meydanê da ku serokê serokan li wir bipeyiviya. Piştî bi hezaran qîrin û teqînan, serok hat, giran giran hilkişıya kursiyê. Ew generalekî kevn bû, qelefetê wî li cih bû. Xalê Evdo bi hêdîka got, "peh... maşallah, ev çi serî ye!" Ew şas mabû, serê serok jî, wekî qelefetê wî, pir gir bû. Tu kêmâniyên serî nîn bûn. Serî li gora serokan bû.

Serokê me, dîsan, giran giran, careke weha ji jor ve, li xelkê nihêrt û disan hêdî hêdî kaxiza xwe ya xeberdanê ji bêrika xwe derxist û rawesta (serok bê kaxiz nikaribû bipeyiviya.) Ji me kesî tu deng dergediket. Ew deqa ku em li pey bûn, hatibû; serok dê bipeyiviya.

Serok carekê-du caran, bi sivikahî, kuxuya, kaxiza destê xwe danî ser kursiyê, pêşıya xwe û dil kir, bê kaxiz, çend gotinênen pêşin yên xeberdanê, bibêje. Wî bi dengekî ku wekî ji binê bîrê dihat, gotin bi gotin, dest bi xeberdanê kir: "Sevgili Silvanlı hemşehrilerim..."

Bi vê gotina serok re, Xalê Evdo ji nişka ve qîriya û got; "dêêê mîrattt... camêr hê navê bajarê me nizane!.." Xalê Evdo rast digot, navê bajarê me ne Silvan bû. Serok navê bajarê me nizanibû, serokê dewletekê navê bajarê ku tê de bû, nizanibû, fêr jî nebûbû. Û ez bawer im, wî hewceyê fîrbûnê jî nedîtibû. Loma jî Xalê Evdo jê re digot, "dêêê mîrattt..." Ji bo Xalê Evdo, serok êdî bûbû gayeki reş... Welê dixuye ku derdên Xalê Evdo yên me û yên welatê Pablo Neruda yek in: mîratênu ku serê kahniyan vegirtine û nahêlin kahnî ji bo merivan biherikin...

Serok jî meriv bû, lê merivekî mîrat...

#### IV

David Herbert Lawrence weha dest bi esera xwe ya herî mezin "*Evîndarê Lady Chatterley*" dike;

"Ji ber ku sedsala me bi qahr û jan e, em jê direvin û

mezin "Evîndarê Lady Chatterley" dike;

"Ji ber ku sedsala me bi qahr û jan e, em jê direvin û naxwazin wê xemgir bibinîn."

D.H. Lwrence romana xwe ya giranbiha piştî şerê cihanê yê yekemin nivisi. Di navbera 1925-28-an de, li Italyayê, bi guherinên sê caran, wî ew nivisi. Di hemû jiyanâ wî de, tiştê ku wî herî zêde dixwest bike, nivisîna vê romanê bû. Wî her dixwest romana xwe binivisiya.

Wî dixwest rewşa piştî şer di nav jiyan û danûstandinên malbatekê de nîşan bida, hîs û dijîtiyên merivan nîşan bida. Wî dil dikir, bi alikariya tîpa Sir Cifford nîşan bida ku bawerî û ramanên merivan li gora rewşa wan ya civakî û şêweyê jiyanâ wan e. Bi alikariya tîpa Lady Chatterley jî wî dixwest nîşan bida ku jiyan li ser her tiştî ye û meriv divê jê hez bike. Meriv qirnên ku jiyan li serê bilind dibe, bibîne û xwe bi wan bigihîne. Bi tîpa rezvan Mellors jî, wî dixwest nîşan bida ku meriv tevî kêmanî û hêjahiyên xwe meriv e. Meriv ji çewti û rastiyan, rindî û xirabiyan ava bûye, tu kes bê kêmanî, bê çewti nabe û tune ye. Lê ya herî gîring, digel kêmanî û çewtiyan, meriv bikaribe ji bo xwe û yên din jiyanekê hîn çêtir bixwaze, ava bike û ji bo vê bixebite.

Di derekî romanê de. D.H. Lawrence, Sir Clifford û jina wî, Lady Chatterley weha dide peyivandin;

"Çaxa ew gîhîst malê, Clifford jê pîrsî:

- Tu li ku bûyi?

- Li daristanê! Binihêre, ev nêrgizên çiqas xweş in. Ne wisan e? Meriv bawer nake ku ew ji binî axê derketine.

- Lê belê, meriv divê hawe û tava royê ji bîr neke!

- Lê, ew di av axê de hatine pê, ava bûne, Lady Chatterley got."

Rast e, nêrgiz hewcedarê av, hawe û avê ne jî. Lê eer ax tune be, nêrgiz tu carî nikarin hêşin werin.

Rast e, em hemû, li seranserê cihanê, meriv in û

hewcedarê merivan in. Lê merivbûn û merivahi? Lê,  
xwediye merivahiyek paqij, germ û nerm bûyin?..  
Ez bawer im, pirsa herî girîng ev e...

**Berbang**, hej. 7, 01.1983

## Xewnen Oblomov û Ronakbîrêñ Kurd

Antonio Gramsci ronakbirekî italî û sekreterê Partiya Komunistê italî bû. Di sala 1926-an de, ew hate girtin û piştî yanzdeh salên zîndanê, wî li zîndanêñ Mussolini wefat kir. Gava ew mir, salê wî 46 bû. Wi yanzdeh salên xwe yê herî girîng di zîndanêñ faşistan de bihurand. Di wan yanzdeh salên xwe yên zîndanê de, wî bi hezaran rûpel tişt nivisîn. Îro, bi hezaran namêñ wî yên hêja û ji sîhi zêdetir defterêñ wî li ber me ne.

Piraniya nivisarêñ wî li ser rêxistin, xebata rêxistinî, kultur, ronakbîrî û şêweyêñ pêşengiya civatê ne. Antonio Gramsci di derekî defterêñ xwe de, di derheqê avakirina ronakbîrêñ nû de weha dibêje:

*"Eger meriv bixwaze ji girûbeke sosyal ku di toreyêñ wî de avakirina ronakbîran nîn e, tîpekî nû, ronakbirekî nû ava bike, divê meriv ji bîr neke ku serketin pir û pir dijwar e."*

Îcar, ji bo xelasî û pêşketina girûba sosyal ku neçar û bindest e. A. Gramsci şertekî esasî datîne; avakirin û zêdekirina ronakbîran. Ü ew dibêje, eger ronakbîrêñ girûba bindest, ango girûb bi xwe, hegemonyayeke siyasi, kulturi û civakî pêk neyine, xelasbûn ne mumkin e.

Li gora A. Gramsci, tiştêñ ku girûba bindest divê bike pir ekiriye; ji bo xeasî û bi serketinê bi hûtan (ango bi dijwariyêñ pir û pir mezin) re şer kirin. Yan jî bindestî...

**11**

Niha jî hinekî fantazî...

Fantazî stariyeke germ û nerm e, tu zirarên wê nîn in. Dema meriv nikare dijwariyan ji holê rake, xwe davê bin baskên fantaziyê û tiştên xweşik, tiştên rindik difikire û çêdike. Ji jiyana rojane, ji dijwarî û problemên jiyanê bi dûr dikeve. Rast e, meriv tiştekî naguherine, lê tiştekî têk jî nadî. Meriv her di stariya xwe ya germ ya fantaziyê de tiştên xweş û rind ava dike... Fantaziya tiştên xweş û rind, herçend fantazî bin jî, xweş û rind in.

Min jî xwest di vê nivisara xwe de fanaziyeke biçük û xweşik çêkim û berpêşî xwendevanan bikim. em welê bihesibinin ku problemên zimanê kurdî nemanin, (problema kumê ser tîpan jî i holê rabûye), çend kovarêن me yên kulturi têن weşandin, bi sedan nivîskar, rojnamevan û ronakbirêن kurdan di van kovaran de eserên xwe diweşînin û herweha alîkarî li hev û li pêşketina kultur û edebiyata kurdî dikin, rexnen nivîskar û ronakbiran ji bo alîkariya hevûdu û pêşketinê ye, rexnegir û xwendevanêن kurd jî li kovarêن xwe xwedî derdi Kevin, bi rexne û şîretên xwe alîkariya wan dikin. Awayekî, atmosfereke biratiyê, yekityê heye, salê bi sedan kitabêن nivîskarêن kurdan dertêن, kovar û rojnameyêن jin, zarok, gundi, şagirt û ciwanan danûstandineke xurt di navbera xwe û xwendevanêن xwe de pêk anîne. Ji bo zarok, jin, şagirt, gundi, karker û kal û pîran bi sedan kitab bi zimanê kurdî derdi Kevin. Kitabêن Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyra û hwd. ku rêberiya kultur û edebiyata kurdî kirine, bi çapêن pir modern û xweş derdi Kevin. Êdi hemû kurd dizanin ku zordestî û siyasetên dijminan gelê kurd neçar berdaye, paştemayî û bindest hiştiye. Ji ber vê yekê jî ronakbir, nivîskar, rojnamevan, xwendevan, karker, gundi, şagirt, jin û kategoriyê din yên civaki bi hev re dixebeitin, tiştên cûrbicûr aa dikin ku ji neçarı û bindestiyê xelas bibin.

Û herweha bi sedan kitabêن biyanî û klasîkên cîhanê jî têن wergerandin, xwendevanêن kurdan kitabên

Dostoyevski, Tolstoy, Zola, Goethe, Lorca, Bacon, Çehov, Gogol, Faulkner, Hemingway, awrence, Mann, Rousseau, Strindberg, Sartre, Neruda û hwd. bi kurdî dixwînin...

Fermo, ji we re fantaziyeke biçûk. Gelo ev antaziya jorîn çawan e?

Ma ew ê xirab büya ku me ev fantazî i fantazîbûnê derxista û bikira tişteki rastîn?

### III

Gava ku ev fantaziya jorîn ji fanazîbûnê derkeve û bibe tişteki rastîn, divê em kitaba bi navê *Oblomov* ji bir ve nekin û wê jî wergerînin kurdî. *Oblomov* romanekê rûsi ye, sala 1859-an de hatiye nivisîn. Roman weha dest pê dike:

*"Îlya Oblomov di vê sibêya hanê de li mala xwe ya ku dikaribû tê de xelkekî bajarekî biçûk bihewanda û yek ji xaniyên herî mezin yê kolana Gorochovaya li Petersburgê bû, li ser cîhê xwe nîviyabû."*

Roman li ser jiyana camereki, Îlya oblomov ava büye. Niviskarê romanê İvan Alexandraviç Gontçarov (1812-1891) e. Jiyana niviskar pir bêdeng bû, ew ji malbateke tucar dihat, li bajarê Simbirsk ku nêzîkê Volayê bû, mezin bû, sala 1831-an de, ji bo xwendinê, hate bajarê Moskovayê. Piştî xwendina xwe ya unîwersitê, wî dest pê kir û wekî memûr xebitî. Piştî demekê jî, ew bû redaktorê kovara *Le Courrier du nord*. Lê, sala 1867-an, wî dev ji memûretiya dewletê û redaktoriyê berda. Gontçarov jî wekî Tolstoy, Dostoyevski û Turgenyev di dema despotiya Nikolayê 1. de jiya. Lê wî wekî niviskarê din li ser problemên sosyal û siyasî nenivisi.

*Oblomov* romana wî ya herî avdar e. Ji deh salan zêdetir, ew li ser nivisîna romanê xebitî û dema *Oblomov* çap bû, wê alaqeyeke mezin kêşand. *Oblomov* ala hemû ronakbir û niviskarê Rusyayê kêşand. Roman bû sebebê lêkolîn û polemikên mezin û germ. Û

bi taybetî, piştî nivîsara rexnegirê edebî Nikolay Dobrolyubov, Oblomov hîn bêtir bala ronakbîran û xelk kêşand.

Nikolay Dobrolyukov ku li ser Oblomov nivisibû, ronakbirekî navdar û radîkalekî li pêş bû. Navê nivîsara wî "Oblomovtî ci ye?" bû. N. Dobrolyukov di nivîsara xwe de li ser du tiştan radiwesta; 1- Oblomov qerekterekî milî yê rûsan nîşan dide, 2- Di qerekterê rûsan de oblomovtî heye, ji ber ku ew berhemeke civata otorîter û girtî ya Rûsyayê ye.

Em vegeerin ser Oblomov, baş e, gelo qehremanê romanê Oblomov bi xwe merivekî çawan e. Herwekî ku me li jorê ji got, roman li malê û li ser cîhê razanê yê Oblomov dest pê dike. Oblomov di mala xwe ya pir mezin de, li ser cihan dirêjbûyî ye. Ew merivekî dewlemend e, hebûn û mîratê bav û kalên xwe dixwe û dijî, ji civatê, jiyanê ditirse, bê hêz û quwet e, xwe bêhêz û tırsok dibîne û hîs dike, tu tişt bala wî nakişîne, wisan pasîv û bêlebat li ser cihan dirêjbûyî dijî, di hemû jiyana xwe de tu cari li derekî nexebitiye, nizane xebat ci ye, tu tiştekî ava nekiriye, nizane avakirin, pêkanîn ci ye, ji wextê, ji saetan hez nake, tênağıhê ka çîma merivêni li dervayî wî hewqas bi lez in û ewçend dixebeitin. Ew tênağıhê ka çîma hevalê wî Stolz ewçend xwe diêşîne û dixebite. Li gora Oblomov, hevalê wî yê aleman Stolz kariyerîstekî ye.

Lê belê, di romana Gontçarov de, tiştê herî girîng xewnenê Oblomov in. Ew her radîzê û xewnan dibîne, ji xewnan pir hez dike, her di cîhê xwe de dirêj dibe û ji xwe re xewnan çêdiike. Xewnçen xweşik, xewnen rîndik... Xewn û fantaziyên Oblomov pir fireh in. Ew di xewn û fantaziyên xwe de, ji xwe re, welatek, Oblomovistanek çêdiike. Welatê Oblomov pir xweş e, bihuşt e. Di welatê wî de dar û ber her hêşîn in, ji dengê çivikan musikeke delal dertê, her der di nav şîr û hungiv de ye, xirabî, zordestî, nexweşî, gemarî li wir tune. Meriv wekhev in, ji hevûdu hez dikin. Li wir kar û xebat ne pêwist e, gava

hewce be, xebat çêdibe, her tişt ji bo çeyî û başiya  
merivan ê. Xewnêن Oblomov weha dewam dikin.

Xewnêن Oblomov çiqas xewnêن xweş, çiqas xewnêن  
rind in!..

Lê mixabin, hezar mixabin ku ew xewn in, fantazî ne.  
Loma jî xewnêن Oblomov alîkarî li Oblomov nakin.  
Oblomov bê heval, dost, yar, berhemeke hêja, bêdeng,  
xewnêن xwe werdigire û ji cîhana me ya kevnare koç  
dike, dere...

#### IV

Nivîsara Nikoloy Dobrolcukov "*Oblomovtî ci ye?*" li  
ser tîsekî weha ye. Dobrolcukov ji tîpa Oblomov  
qerekterekî neteweyî derdixe. Wladimir İliç Lenîn jî di  
nivsareke xwe de behsa oblomovtiyê dike. Ronakbirêن  
Rûsyayê romana Oblomov ne bi tenê mîna esereke  
edebî, lê mîna sûreteke sosyolojîk ya civata Rûsyayê jî  
ditine û xwendine û weha li romanê nihêrtine. Û wan,  
bi kurtebirî, di lêkolinêن xwe de, van tiştên jêrin  
gotine;

**1-** Bêdaxwazî, bêhêz û tirsokbûyin, yek ji aliyêن herî  
pêste yên civata paştemayî ye. Civata Rûsyayê civateke  
koledar û girtî ye, edet û torêن wê nahêlin ku di ciatê de  
girûbêن nû ava bibin. Ew ji tiştên nû re girtî ye. Di  
civateke weha girtî de guhertin, xwe guhertin û  
nûkirin, der û dora xwe guhertin tiştên pir xerîb, ecêb û  
dijwar in.

**2-** Di civatekê de ku li wir zordariyeke pir mezin heye,  
westîn û revîn tiştên karekteristik in. zordarı dikare ji  
dewletê yan ji girûbêن sosyal yan ji edet û toreyan yan ji  
ji şexsan bê. Lê her ji ku were jî, di her şêweyê zordariyê  
de, meriv bi geleki hêsanî dikare ji realiteyên jiyanê, ji  
realiteyçn civatê bireve û xwe veşêre. Ji ber ku zordarı,  
zordestî pir mezin e, îmkan kêm in. Di rewşeke weha de  
xeatêن pir mezin divêن, şêwe û etodêن nû divêن,  
zanebûn û bihêzbûn divê, hevkarî û xebateke kollektîv  
divê.

**3- Di civateke patrarkal de heta otorîteyên nû ava nebin, tiştên tradisyonî guherti pir dijwar e. Ji bo pêşketin û guherînê pîvan û xebatê nû pêwist in.**

## V

Belê, rewşa Oblomov û tiştên ku li ser oblomov dihatin gotin, bi kurtebirî, weha ne. Baş e, rewşa kurdan û bi taybetî jî rewşa ronakbîrê kurdan çawan e? Ronakbîrê kurdan ci dikin, bi ci mijûl in, ci ava dikin, li ser ci radiwestin, bi kîjan şewe û etoda dixebeitin, ji bo pêşketina kultur û edebiyata kurdî kîjan gavan davêjin?

Pirs pir in. Lê bersîv? Kî dê çawan bersîva van pirsan bide? ka bersîvîn van pirsan li ku ne?

Bi tevayî rûyê me ronakbîrê kurdan reş e. Sala ku em tê de dijin, sala 1983-an e. Di vê dema modern de, bi milyonan rojname, kovar û kitab têñ weşandin. Ka rojname, kovar û kitabêñ kurdî li ku ne? Hejmara rojname û kovarêñ kurdî bi qasî tiliyêñ destan jî nabin. Herweha hejmara rojnamevan û nivîskarêñ me jî hewqas in. Kovar an rojnameyêñ ku bi kurdî têñ weşandin, nîn in. (Ez bawer im, bêñ Berbangê tu kovar an rojname tune). Mehê-salê carekê, ew jî bi hezaran zehmetî, kitabeke kurdî çap dibe. Tu kes bi şêweyekî îlmî, pêşxiste û alîkar li ser problemêñ kultur û edebiyata kurdî ranaweste. Rexne, şiret, alikarî, pêşxistin, avakirin û wekî van bi dehan ramanêñ bingehîn û pêwist di jiyana kurdan ya kulturi de nîn in. Ev raman, bi awayekî modern, di jiyana sosyal de jî nîn in. Gava bi xîretêñ kesekî yan çend kesan kitabekê çap bibe jî, eger em xira ekin, alaçe jî nişan nadin, lê xwedî dernakevin. Îmkan û keysa me kurdan nîn e ku em berheman biafirînin û ava bikin, em tiştan biguherînin û ji û ve bi rê xînin.

Herwekî ku xweliya heft goristanan li serê me bariye...

Gelo ev yeka çîma weha ye? Çîma ronakbîrê kurd

nikarin ên ser xwe û atmoserekî hin jîndar ji bo kultur û edebiyata xwe pêk binin?

Yek ji edetêne me yên herî xirab, pir axaftina me ye. Em pir dipeyivin, her dipeyivin, li ser xwe, li ser der û dora xwe û problemên xwe dipeyivin. Di her axaftinê de, bi dehan gotinê "bindestî, neçarı, çarereşî, belenazi" derbas dibin. Ev hemû rast in. Kurd bindest in, neçar in, çarereş in, belengaz in...

Lê belê, ka romanên, destanên, çîrokên, helestên, musîkên, wêneyên bindestiya kurdan? Em ima tênağıhênu ku heta roman, destan, helbestên bindestiya kurdan ava nebin û pêk neyên, rizgarî pir dijwar e. Em çîma tênağıhênu ku roman, çîrok, helbest, destan... ev emû tişt, bî kurtî kultur û edebiyata kurdi, li ser riya rizgariyê, bingehêke sosyal e.

## VI

Sala 1979-an, li Turkiyê, bi navê Kovara Çandî û Pişeyî Tîrêj, kovareke edebî derhat. Ez bawer im, Tîrêj dikaribû bi tenê çar hejmarañ derbihata. Piştî hejmara çaran, me hew Tîrêjê dit. Ew bi zaravayêñ kurmancî û dîmili (zazayı) dihate weşandin. Tê de çîrok helbest, serbûri, stran û werger hebûn. Ez welê bawer im ku piştî pêkhatina Cumhuriya Turkiyê cara yekemîn bû ku kovarek bese kulturi û bi zimanê kurdi dihate weşandin. Kovara Tîrêj'ê ala me çend kesan kişand? Ji me çend kesan nivîsar, rexne, pêşniyar û şîretên xwe jê re şandin? Ev koar ji -mîna piraniya tiştên me- di nav dijîtî, berberî û teqûreqên me yên rojane de, ji bîr bû.

Di hejmara dudiyâñ ya kovarê de, bi navê "De were binivîse", serbûriyeke Fît Totanî heye. Totanî di serbûriya xwe de, li ser problemên zimanê kurdi radiweste. Ew çirokeke geleki "xwes û manîdar" dinivîse. Paşê, ew çiroka xwe nişanî çend hevalêñ xwe dide. Hevalêñ Totanî her yek ji aliyekî Kurdistanê ye. Hewalêñ nivîskar li ser peyva "axaftinê" radiwestin û

dest bi munaqaşeyên germ dikan. Her hevalekî Totanî, li gora devoka xwe, tiştekî dibêje û di dawiyê de, ev gotinên hanê têن meydaa munaqaşê; peyivîn, xeberdan, qise kirin, qezi kirin, galegal kirin, şor kirin, şitexlin... Û Totanî'yê reben nizane çi bike, çawan binivise. Ew serbûriya xwe weha diqedîne; "Mîvanê min rabû, çû. Ez iwrîm hundir, min piyanok û ferqên ser masê da hev, masê malîst. Kaxizên çiroka min i navdar bi stûxwarî li min dînihêrîn. Min rahişt kaxizan li hev tewand, kir ber çavika sobayê û da ber pêta kibrîtê..."

Totanî çiroka xwe da ber pêta kibrîtê. Lê wî serbûriya çiroka xwe jî nivisi. Ronakbirêن Rûsyayê li ser trajediya Oblomov rawestiyan, lê belê, cihana Oblomov û xewnêن wî jî nivisîn. Ew di bin zordestiya qeysarêن Rûsyayê de dijîyan, lê roman, çirok, destan, serbûriyêن zordestî û bindestiyê jî nivisîn. Wan bi hezaran kitabêن giranbiha ava kirin, kesen wekî Tolstoy, Gogol, Dostoyevski, Çehov derxistin û paşê jî bi raperîneke mezin şoreşa xwe bi ser xistin. Bindestî, neçarı û belengaziya kurdan rast e. Problem û dijwariyêن li ber kurdan pir mezin in. Em kurd di nav asîmilasyoneke nedîti de ne, mîjiyê me bi zimanêni biyanî (tirkî, erebî, farisi...) dewisiye. Emnikarin zimanê xwe baş bi kar bînin... Probem dikarin, herweha, zêde bin. Û herwekî ku A. Gramsci digot, avakirina ronakbirêن nû pir û pir dijwar e.

Lê ma wekî din riyekê ji bo kurdan heye? Riya xelasî û serbestiya her cûreyê ji avakirina ronakbiran, şewe û etodêن nû û eser û berheman derbas dibe. Yan na, kurd dê her wekî Oblomov xewnan bibînin. Ji xwe re, wekî ku min di rûpelên borî de çêkirin, fantaziyêن xweş û rind çêkin.

Bapîrêن me gotine; gîsinê xebatkar diçirûse. Yan na, ew ko dibe, zingarî dibe û bêkêr û bêrûmet wisan li cihê xwe dimîne...

**Berbang** Gulân, 1983

## Magna servitus est magna fortuna

Qisa jorîn, di nivisareke MONTAIGNE de derbas dibe. Ew bi zimanê latini hatîye nivisin. Meriv dikare vê qisê wisa wergerine; cîhekî (mewkiyekî) bilind, nîrekî mezin e ji. An ji wekî ku di gotinên pêşyan de tê gotin; "Serê çiyayê bilind her bi mij e."

Wisan e, dawîya zanibûnê û pêşketinê tune. İbni Ruşd di dema serketina İslamîyetê de weha digot; "merivahî bê mirin, zanîn bê dawîn e." Bi hezaran salêن cihana me ya pîr, di şerê navbera zanîn û kospêن li ber zanînê de derbaz bûye. Meriv ji hebûna xwe heta iro qet ji zanibûnê têr nebûye. Lê disan ew meriv, ji hebûna xwe heta iro li dijî zanibûnê ji rawestaye.

Di dema antik de, Heraklitiyê yewnani weha digot; "Meriv nikare du caran bikeve çemekî Hemû tişt di nav herikandinekê de ye ku ji diyütiyan avabûye." Herikandina tarîxê heta iro hat: Bi mîlyonan mirî, bi sedan bajarê tar û mar, bi qasî çend behran hêstêrên çavan û bi qasî çend sed salan hêviyên şikestî li dù xwe berda û hat. Wê xwe gîhand iro. Bê guman ji iro pê ve ji ew dê dom bike. Û em ji, hebûnen biçûk, ango meriv ji, -herwekî Aragon digot- bi qasî eser û kîrinên xwe dê di nav herikandina tarîxê de bin. Bi daxwaz, hêvî, qahr, çeyî û xirabiyên xwe ve...

Di behra zanibûnê de, her gaveke teze bi xwe re dijwariyên xwe ji tîne. Destpêka zanibûnê, fîrbûnê xweş e. Her tist wekî berbanga sibê zelal e. Daxwazî heye, xîret heye. Lê piştî demekê ew daxwaza destpê kê tune ye êdi. Ji lewre meriv ferî fîrbûnê bûye êdi. Û di behra zanibûnê de tiştê herî dijwar ji ev e; ferî fîrbûnê bûyin... Ji ber ku meriv divê her bidomîne, her fîr be.

Ew yên ku di bin barê domandina fêrbûnê de dimînin û her û her janên wê dikişînin, ronakbîr in. Ew dîlên (koleyêن) zanîbûnê ne. Heta ku ew bijîn, her wisan dil in. Jean Paul Sartre di kurtenivîsara xwe ya “Nîvîsandin, bo çi nîvîsandin” de behsa niviskariya xwe dike û dibêje; “... piştî windakirina xewnan jî dîsan meriv didomîne û dînîvîsîne...” Ji lewre meriv êdî fêri fêrbûnê bûye.

Gelo fêri fêrbûnê bûyîn tiştekî xirab e? Na xêr. Meriv her di nav herikandina tarîxê de ye. Wê gavê meriv çîma bi daxwaz, xîret û avayî û berhemêن xwe ve yek ji dilopêن behra zanîbûnê nebe? Fêrbûn û pêşketin maratoneke bêdawîn e. Loma jî ew dijwar e, bi jan e. Lê digel vê, ew xweş e jî. Wekî jiyana meriv û merivahiyê rind e, wekî neh mehêن di zikê dayikê de bûyînê ye, pêkhatinek û avabûneke hêja ye.

## II

Rast e, serê çiyayê bilind her bi mij e. Baş e, serê çiyayê nîzm çawan e? Seriyekî bi mij an seriyekî rût hîn hêjatir e? Di nav behra zanîbûnê de dilopek bûyîn an di hemberî herikandina tarîxê de kospek bûyîn baş e?

Ez bawer im, ev pirs, bi taybetî ji bo gelekî wekî me bindest û neçar, gelek girîng in.

Avahiyêن hêja ji ber xwe ve ava nabin. Xîret divê, zanîbûn divê, daxwaz divê. Hilberyekê hêja, piştî hezar xebat û lebatî dertê. Dîsan Jean Poul Sartre digot; “*Meriv divê her tiştî bixwaze ku bikaribe tişteki ava bike.*”

Ji bo me û gelê me jî wisan e. Em jî divê her tiştî bixwazin ku hin tiştan ava bikin. Em, gelê me, hewcedarî her tiştî ne. Kêmaniyêن me bi hezaran, îmkanêن me bi hejmarêن yekan in. Di her warî de em di nav tengasîyeke mezin de ne. Di warê edebîyat û kultur de jî wisan e.

Tarîx diherike û li benda tu kesî nasekine. Ew li hêviya me jî nasekine, nabêje, “*kurdên belengaz*

*paştamayı ne, ez divê li hêviya wan bim.*" Tu carî tarîx weha diltenik nebûye. Ew her diherike. Em di- vê xwe bigîhînin wê. Em divê di maratona jîrbûn û pêşketinê de bi lez bin. Bi xîret û xwedî daxwazî bin. Ji ber vê yekê ji armanç divê -her çiqas nîrekî mezin be jî- cîhekî bilind be. Anglo çiyayekî serîmij be...

Herweha berpirsiyarê sedsala xwe bûyin û li gora herikandina tarîxê gav avêtin jî, yek ji girîngiyên armancê hêja ye. Kêmaniyên me yêñ herî mezin, di vî warî de ne. Weki gel û ronakbirêñ wî, em qîma xwe bi tiştêñ rojê û sivik tînin. Bindestî û dijwariyên bindestiyê me bi hevsarêñ xwe girêdane û bernadin em tu gavî bavêjin, bernadin em xwe ragihînin sedsala xwe û bibin dilopeke behra zanînê...

Di qisa jorîn ya latînî de fortuna navê xwedayek e jî. Di dema antîk de, Roman ji xwe re -bo serfirazî û pêşketinê - xwedayek xweşik dîtibûn û navê wê ji Fortuna danibûn. Wan dixwestin di şerê pêşketin û serfiraziyê de Fortuna alîkari li wan bike. Alîkariya Fortuna'yê çiqas bûye? Kes bi vê yekê nizane.

Lê tişte tku ê zanîn, êdî Fortuna û xwedanêñ din di rûpelên kevnar yêñ tarîxê de mane. İro bi tenê meriv û xîret û zanîbûna wî heye. Pêşketin, serfirazî bese bi zanîbûn, daxwaz û xîreta merivan mimkin e iro.

Me jî ev yeka hanê divê iro.

### 111

Li Swêdê ev bû çendekê ku kovara BERBANG'ê tê weşandin. Piraniya nivîskar û ronakbirêñ kurdan, ku li dervayî welat û Swêdê ne, eserêñ xwe di wê de diweşînin. Li Fransê *Enstituya Kurdi* ava dibe. Li hinek cîhêñ din -periyodik nebe jî- kovar û kitabêñ zarokan xwe şanî didin. Dengbêj, hozan, çîrokvan êdî li der û doran xuya dibin. Carina jî kitabêñ bi zimanê kurdi derdikevin.

Gelo ev yeka di warê kulturi de nişana pêşketinekê ye? Em dê bibînin...

## IV

Di hejmara bûrî ya BERBANG'ê de bi navê "Çi şıculê me hebû di tarixa merivan de" nivisareke min derhat. Hevalên berpirsiyar dixwestin, ez ji bo her hejmarê tiştekî lêkim. Tu sedem nebû ku ez bibêjim na. Û di nivisara bûrî de li ser bingehê meriv kombînasyonek ji Aragon, Pablo Neruda, D.H. Lawrence û Xalê Evdo çêbû. Gelo ew ci bû?

Di zimanê kurdî de ji vê forma edebî re ci tê gotin? Bi rastî, ez bi xwe jî bi vê yekê nizanim. Min li wan ferhengokên ku li ba min bûn, nihêrtin. Lê, min nikaribû bersiv bidita. Min ji çend hevalên ku têkiliya wan bi zimanê kurdî heye jî pirsî. Min ji wan hevalan jî nikaribû bersiveke xweş werbigirta. Wisan, bêî ku em jê re navekî bibînin, min dest bi nivisinê kir.

Di zimanên ewrûpeyi de ji vê forma edebî re "essay" tê gotin. Di tirkî de "deneme" dibêjin. Ez bawer im, tirkân ev gotin raste-rast ji zimanên ewrûpeyi wergerandine. Bi kurtebirî, meriv dikare ji vê forma edebî re weha bibêje; li ser warekî jiyanê yan tiştekî, bi şêwekî aza nivisin e. Nivîsar bi xwe zêde dirêj nîn in. Û ew ne çîrok in, ne jî nivîsarên akademîk in. Lê ev herdu jî dikarin di nav de bin. Cudabûna wê ya herî girîng jî formên din, jixwe, ev e; ew bi alikariya bikaranîna formên din, formeke taybetî ava dike. Ev form, bi alikariya formên din (wekî roman, çîrok, helbest, destan û hwd.) xwe digihîne armancêxwe.

Ev form di navbera xwe û xwendevanan de pireke jîndar ava dike. Wekî ku nivîskar bi xwe û bi xwendevanan re dipeyive. Bi vî awayî, nivîskar xwe radigîhîne xwendevanan û şîret û rexnên wan werdigire. Bûyer, serbûrî û jîyana rojê, ji bo vê formê girîng in. Herweha tarîx û weşan jî.

Gelek tiştên cûrbecûr dikarin di nav bendeke weha de cih bigirin. Mana vê yekê tevihevbûn nîn e. Tiştên cûrbecûr tê de li gora pergalekî (duzenekî) rêkûpêk

(1553-92). Montaigne ji Fransa'yê ye. Ew filosof û nivîskar bû. Di dema xwe de wî giraniyeke pir mezin li ser jiyana çandî û ramanî ya Fransê çêkiribû. Di damezrandin û pêşvexistina edebiyata Fransî de cîhê Montaigne girîng e.

Montaigne di nivîsareke xwe de di derheqê xwe de weha dibêje; "her nivîskar xwe bi şexsiyet û bi hin aliyên xwe yên ecêb dide nasîn. Belam ez, xwe, ne weki zimanzan an jî hozan an jî parêzer (avûkad) didim nasîn. Ez dixwazim, berî her tiştî, bi şêweyê xwe û weki Michel De Montaigne xwe bidim nasîn."

Bila xwendevan min bibexşînin ku ez li ser agahî û enformasyonên vê formê rawestam. Kêfa min ji agahiyên weha bingehin re nayê. Lê mixabin di zimanê kurdî de hê jî izeh û agahiyên weha pêwist in. Wekî ku di gotina latinî de dihate gotin, heta em negîhîjin cîhekî bilind an nebin çiyakî sermij, em dê her hewcedarî izeh û agahiyên destpêkî bin.

Xwezi em di cîhekî bilind de bûna û bila nîrê sitûyê me jî hebûya. Xwezi em çiyakî bilind bûna û bila serê me jî di nav mij de bûya...

Xwezi dewsa dîlêن dagîrkeran em dîlêن (koleyêن) zanîbûnê bûna...

**Berbang**, hej. 8, 1983

## **Enstituya Kurdi û pêwistiya enstitusyonan**

Îsal, di dawiya meha adarê de, li Fransê, bi alikariya Wezareta Kulturî, enstituyeke kurdî hate damezrandin. Enstituyê, bi çend zimanan belavokeke damezrandinê nivisî û armancêن xwe tê de diyar kir. Belavoka Enstituyê di Berbangê de jî çap bû. Enstitû di belavoka xwe de dibêje; "dara ku ji qirnên xwe hatiye birîn, hişk dibe, dimire. Qirnên xelkekî zimanê wî, stranên û çîrok, edebiyat û dîroka wî ne, musîkî û pîse, awayê jiyan, lixwekirin û hezkirina wî ne, bi kurtî çand û kultura wî ye."

Wekî armancêن Enstituyê jî, rêzên jêrîn di belavoka Enstituyê de hatine nivisîn;

*"-Danîna meztirîn kitabxane û wênexane ya cîhanê li ser gelê kurd*

*-Berhevkirina arşîvên neteweyî (mili) yêن Kurdistanê*

*-Nasîn û nêzîkkirina zaravayêن kurdi (kurmancî, soranî, zazakî)*

*-Çapkirina kitêbên xwendin, edebiyat, erdnasî û dîroka Kurdistanê ji bo zarokêن kurd*

*-Berhevkirin û weşandina (kasêt, sêlik) musîkiya kurdi*

*-Çapkirina ferhengên kurdi û kurdi-zimanên biyanî*

*-Çapkirina afirandinêن helbestvan û nivîskarêن kurdêñ hemdem û yêن berê*

*-Çapkirina wergerandinêن klasîkêن edebiyata cîhanê*

*-Wergerandin û çapkirina pirtûkêن ku bi zimanêن Ewrûpayê li ser kurdan derketine*

*-Danasîna pişekar, hunermend, dengbêj û sazbendêن kurd."*

Damezrandina Enstituya kurd di warê kulturî de

*kurd."*

Damezrandina Enstituya kurd di warê kulturi de bûyereke girîng e. Ji ber vê yekê jî, piraniya kurdan bi damezrandina Enstituya kurd kêfxwes bûn. Em jî pîrozbahiyêن xwe ji Enstituya kurd re rê bikin û hêvîdar bin ku Enstitu bikaribe bi rê keve û xebatêن hêja bike.

## 11

Îcar, giringiya avabûna Enstituyê ci ye? Min xwest, ez di vê nivisara xwe de -li gora bir û baweriyêن xwe- li ser vê yekê rawestim. Enstituya kurd li Fransê hê nû ava bûye. Wê li gora xwe programek çêkîriye û ew dê bixebite. Enstitu dê çiqas bi ser keve? Em hê pê nizanin. Em hemû divê alikariya Enstituyê bikin û ci bikeve ser milên me, bi cih bînin.

Lê tiştê herî girîng û berbiçav, damezrandina enstituyeke kurdi ye, hebûn û xebata enstituyeke neteweyî ye.

Ger li Kurdistanê, ger li dervayî welêt hê tu organizasyonê me yên neteweyî nin in. Herwekî pir warêñ din, di vî warî de jî, tevî gelek tiştêñ din, lêkolîneke sosyolojîk hewce ye. Em zêde li serê ranawestin yan zêde bala me nakışîne, lê rastiyek û realiteyeke pir tahl û pir bi xof li ber me ye; Kurd ji rêkxistin û mueeseyêneteweyî mehrûm in, bêpar in. Li kurdistanê hemû danûstandin û rêkxistinê civakî û çandî bi destê neyaran ava bûne. Dewleta ku li Kurdistanê ye, ne ya kurdan e. Rêkxistinê meheli ne yên kurdan in, xwendegeh û cihêñ perwerdebûnê ne yên wan in, jiyana siyasî bi destê wan nameşe, sinema, tiyatro û rêkxistinê kulturi ne yên wan in. Axatî û şêxitî bi destêne yeyaran, mîna xençerekî jahrîn, li ser singa kurdan atiye daçikandin... û hwd.

Û kurd jî bese, bi tenê xwediye rêkxistinê xwe yên siyasî ne. Bi hezaran keft û leftan, ew dixwazin bixebitin û xwe bigîhînin xelkê û xelkê bi rê xînin.

Ez nizanim, gelo li serê cihanê tu xelkekî din heye ku hejmara wî li ser bihîst milyonan be û tu organizasyonên wî yên neteweyî nin bin?

Rewşa kurdan weha ye. Eger em otonomiya Kurdistana Îraqê, 1970-74, nehesibînin, ji destpêka 1900'i heta iro, rewşa kurdan weha bûye.

Herçend rewşa kurdan weha be jî, dîsan ji destpêka 1900'i ve heta iro, kurdan li ber xwe dane. Herwekî ku pirî caran tê gotin, dîroka kurdan û Kurdistanê, dîroka raperîn û berxwedanê ye. Lî belê, ev raperîn û berxwedan hemû têk çûne. Hê jî, heta iro tu bi serketinekê pêk nehatiye. Çima?

### III

Bê guman, cîhê bersîva "çima"yê ne ev der e. Û ez bawer im, bersîva sedemên têkçûna (carina jî aşbetali) raperînên kurdan ne yek e jî. Bersîv pir in, divê pir bin. Ji lewre her herekeyek an raperîneke neteweyî bi qasî naveroka xwe ya siyasî, xwedî naverokeke civakî ye jî. Û herweha naverokeke kulturi jî tê de heye.

Eger hin rêkxistin, muesese û organizasyonên civakî, kulturi yên neteweyî hebûna, dê dîsan her weha bûya? Dawiya raperînan dê dîsan têkçûn û stûxwarî bûya?

Kovara Nîştimanê di hejmara xwe ya duwemin de, nîsan 1983, nivîsareke Îhsan Nûrî Paşa weşandiye. Nivîsar cara pêşîn di kovara Ronahî de, di hejmara 28 adar 1945-an de tê weşandin. Û Nîştiman jî iro careke din wê nivîsarê çap dike. Ew baş dike. Pireke jîndar di navbera do û iro de her pêwist e. Em divê gertim rûpelên dîroka xwe bipelinin. Dîroka kurdan û welatê wan ji iro dest pê nake. Kes nikare rûpelên dîrokê bigire û dîrokeke nû jî xwe destpêkirin bide. Ev yeka şâsi ye, nezanî ye. Kurd jî, bi rûpelên xwe yên rind û xirab, bi bûyerên çê û neçê, xwedî dîrokekê ne. Herwekî ku di belavoka Enstîtuya kurd li Fransê de tê gotin; "dara ku ji qîrnêن xwe hatiye birîn, hişk dibe, dimire." Ji ber vê yekê ye ku em divê bala xwe û der û dora xwe, ber bi aliyê

dîrokê û do bikişînin. Ev balkêşandin hem ji bo îro hem jî ji bo avakirina rojên dahatû pêwist e.

Nivîsara Îhsan Nûrî Paşa geleki kurt e, bi xortê kurd re hasbihalekê ye. Ew weha dest bi nivîsara xwe dike;

*"Lawo! Tu dizanî çîra em hev nabînin; çîra axa me reş, esmanê me tarî ye? Efritan pêşıya ronahiyê girtiye. Lawo, tu dizanî çîra em nikarin hîlmeke rehet bikêşin? Em difetisin, dengê me dernakeve, dest û pê me nalipe. Dêw li ser sînga me rûniştine...!"* Û ew nivîsara xwe weha diqedîne; "Lawo, te seh kir, ji min dibihure, hêvî ji te ye."

Îhsan Nûrî yek ji wan ronakbîrêñ hêja yêñ kurdan bû. Wî di dema xwe de, destpêka salêñ 30-an, serektiya raperîna Agiriyê jî kir. Ew bi ser neket. Ew di kurte-nivîsara xwe de li ser sedemêñ bi serneketina raperînê hin tiştan dibêje. Ew pêñç sedemêñ bingehin nişan dide. Ji wan sebeba duwemîn weha ye;

*"2- Zanayî û zor serkaniya xweşiyê ye. Danzanîna esasê ezahiya mîlet e. Yek jê bi xwendinê, ê din bi yekbûnê çêdibe."*

Xwendin... yanê zanîn û yekiti. Ji ber kêmaniya van herdu tiştan, kurdan pir kişandine. Kêmaniya van tiştan pişta kurdan şikandiye. Li ba kurdan ne zanîn heye ne jî yekiti. Li welatê kurdan tu carî yekitiyeke civakî peyda nebûye. Di dîroka kurdan de tu mînakêñ perwerdebûn û perwerdekirina xelkî, gelêrî nin in. Bi dehan dijîti û berberiyêñ axa, şêx, eşîr, bajar, mintiqe, perçe, devok, zarava, tore û şexsan, ji bo kur'an, bûne nan û ava rojê. Kurd di nav van dijîtiyan de mezin bûne û hê jî mezin dibin. Kurd fêrî dijî û berberiyân bûne. Û tiştê herî xirab, kurd nîzanîn, ew ê çawan ji dijîtiyan xelas bin. Em ê van dijîti û berberiyân çawan ji holê rakin?..

Belê, em nikarin dijîtiyêñ xwe ji holê rakin û em nikarin wan kêm jî bikin. Ji ber ku dijîtiyan ji meydanê rakirin yan jî wan kêmkirin zanîn û perwerdeyî dixwaze. Bi tenê civateke zane û

perwerdekirî dikare dijîtiyên xwe kêmtir bike, civat û welatê xwe bi pêş ve bixe.

Nivîsara Îhsan Nûrî ya ji lawê kurd re gaziye e. Çaxa wî gazî dikir, 1945, law bi tiliyên destan dihatin hejmartin. Lê iro? Îro hejmara lawan gihiştiye milyonan. Îro bi milyonan lawên kurd hene. Çiyayên Kurdistanê, deşt û gundên welêt, girtixanên biyaniyan, fabrikên xerîban û kolanên bajarên Ewrûpayê bi lawên kurdan tijî ne... Lawên nezan, lawên neperwerdekirî, lawên birçî û bêpar. Lawên bê xwendeghênen kurdî, lawên bê mamotoe û unîwersîteyên kurdî, bê radto û telewîzyona kurdî. Lawên bê rêkxistin û enstitusyonen civakî û kulturi yên neteweyî.

Lê digel vê, hêvî jî di lawan de ye. Ew ê çawan bibe? Li mileki şerekî dijwar li dijî dijmin, li mileki jî nezanî û dijîti û berberiyên kurdan yên nav xwe. Û li mileki jî bi milyonan lawên kurd û welatekî ku hewcedarê perwerdeiyî ye. Ew ê çawan bibe?

#### IV

Xwedîyê enstitusyona bûyin riyek e, riyekte bingehîn û girîng. Eger hin enstitusyonen kulturi ku bi rastî neteweyî ne, bi rastî xweser û niwênerên gelê kurd in, hebin, dê pir problem bikaribin hal bin. Xebat û xireta şexsan pêwist e. Lê ew têr nake. ≈exis çiqas zane û hunermend dibin bila bibin, tu carî nikarin bi serê xwe ji derheqê probleman bêñ û gavêñ pir mezin bavêjin. Ev yeka hanê ne mumkin e. Herweha tu şansên komikên biçük jî nîn in ku bikaribin karêñ enstitû û akademiyan bi cih bînin. ≈exs û komikên biçük dikarin dest pê bikin, gavêñ yekemîn û pêwist bavêjin. Lê domandin, meşandin û pêşxistin bi imkanêñ hîn mezintir, bi ekitiyêñ hîn firehtir mumkin e. Ev yeka sistem, pisporî û xebata ilmî, rûniştî dixwaze.

Xebatêñ organîzasyon û enstitusyonan dikarin, ji hemû xebatêñ din bêtir, alîkarî li pêşveçûna gelê kurd bike. Fekiyêñ enstitusyonan ji hemû fekiyêñ din çêtir

Em hemû pê dizanin ka dijmin çawan êrîşî gelê kurd dikan. Ew ne bi tenê bi ordî û eskerên xwe, lê digel eskerên xwe, bi siyaset û îdeolojiyên xwe, bi kulturên xwe, bi edebiyat, tore û edetên xwe, bi ziman-xwendegeh-radyo-telewizyonên xwe, bi muzîk-kinc-xwarin û vexwarin û şêweyên jiyanên xwe jî êrîşî gelê kurd dikan.

Baş e, em ê çima eniyeke weha fireh ku pir tiştên bingehin tê de hene, ava nekin? Eniyeke bi kitab, rojname, kovar, ziman, kultur, edebiyat, muzîk, îdeoloji, siyaset û hwd... Li ser bingeha zanîn û yekitiyeke nûjen, eniyeke weha gelêrî, civakî û kulturi pêwist e. Bersîva êrîşen dijmin, çi li welêt, çi li derveyî welêt, afirîn, avakirin û organîzebûna alternativî ye.

Bê guman, kevirên koşeyên afirîn û organîzebûnê jî; organizasyon, enstitusyon û akademî ne. Bi alikariya wan, hem hebûnên welêt dê ji windabûnê xelas bibin û hem jî eser, berhem û afirînên nû dê pêk werin.

Di rewşa iro de, li welatê kurdan tu şertên avakirina organizasyon û enstitusyonên kulturi û civakî nîn in. Îcar, qet nebe, li dervayî welêt meriv bikaribe, bi hevkarî û yekitiyê hin cihêن weha ava bike...

Em hêvî bikin ku Enstituya kurd li Fransê bibe gaveke hêja li ser riya welat û xelkekî bi enstitusyon û rêexistinên modern .

**Berbang, 1983**

## Kultur û ronakbîrêñ kurd

*"Dî welatêñ paştamayı de, nîşêñ (generasyonêñ) kevnar li dij hêzêñ kolonyalîstan rawestine û ji bo şerêñ iro ji rê vekirine. Em, yên ku di nav şerê iro de ne, divê dev ji piçûk dîtina xebat û kirdeyên bapûrêñ xwe berdin û bêdengî û pasîwîteta wan tê bigiyêñ. Ewana, bi çekêñ xwe yên wê rojê û bi qasi imkan û zarîna xwe şer kirin. Û eger şer û xebatêñ wan deng nedaye, xwe ranegîhandiye cîhanê, sedemê wî kemaniya rêkûpeki nebû. Rewşa cîhanê wê demê gelek cihê bû. Em iro bawer in û dizanin. ku em dê bi ser kevin. Lê ji bo ku em bigihêñ iro, diviya çend serîhildanêñ eşiri çebûna, çend raperînêñ gundiyan têk biçûya, çend meş û li berxwedan bi destêñ kolonyalîstan biperçîqiya."*

Frantz FANON di gotara xwe ya di Kongra duwemîn a Nivîskar û Hunermendêñ Reşik de qîseyêñ jorîn digotin. Kongre di sala 1959-an de li Romayê pêk hatibû. Û Frantz Fanon gotara xwe weha didomand;

*"Em, yên ku iro, wekî karê herî bimgehîn û tarîxi, barê têkdana kolonyalîsmê dane ser milê xwe, divê van raperîn û serhildanan bimeşînin..."*

Kî ye Frantz Fanon?

Ew ronakbîrekî Cezayîrî bû. Dengê welatê xwe û xofa dijminêñ xwe bû. Wî di şerê rizgariya gelê Cezayîr de rolek pir mezin leyist, bir û bawerî û ideolojiya şerê rizgariya gelê Cezayîr asfirand, li Fransê xwend, bû doxtor, tiştêñ ku li Fransê fer bû, li dijî kolonyaalîsma Fransê bi kar anî. Wî prensîbêñ WEKHEVÎ, AZADÎ, BIRATÎ li dijî dayika van prensîban bi kar anî, li hemberî ideolojiya dewleta Fransê, ideolojiya neteweyî ya Cezayîre; li hemberî kultura Fransê,

kultura ereb u Cezayir; li hemberî sexsiyeta Fransi, sexsiyeta ereb u Cezayîri derxist û got:

*"Di welatê paştemayî de kultura neteweyî divê navenda şerê rizgariya wan welatan be".*

Piştî şerê rizgariya Cezayîrê F. Fanon bû wezîr, xeberdan û nivîsarên xwe bi navê "Nahletiyêن Cihanê" di kitabekê de berhev kirin. Hin beşen vê kitaba pir hêja bi turkî jî derketiye. Ev kitaba heja bi hemû zimanen ewrupayî heye. Kurd u bi taybetî ronakbîren kurdan divê vê kitabê bixwinin û F. Fanon û baweriyêن wî binasin. Jean Paul Sartre jî ji kitabê re peşgotinek pir xweş û manîdar nivîsiye. Sartre di peşgotina xwe de, dewlet û ronakbîrên welatê xwe, ango yêن Fransê mehkeme dike.

KULTUR - ZANEBUR - RONAKBÎRÎ Û LIBERXWEDAN di bîr û bawweriya F. Fanon de gelek cihêن girîng werdigirin. Ew, hemû teoriya xwe ya welatperwerîyê li ser van hîman ava dike. Jî bo Fanon kultur û pêşvexistina kulturê gelek girîng e.

## 11

Rast, Kultur çî ye? Meriv jê çî fahm dike? Hem em Kurd û hem gelên din yêن cihanê li ser kulturê pir tiştan dibêjin. Ev çend sedsal in ku merivahî behsa kulturê dike. Lê kultur çî ye ? Bêî mana wê ya latînî, ku çand e, li ser vê yekê tu daxuyaniyên wekhev nîn in. Le iro riya lêkolin û daxuyaniyan ber bi wekheviyê diçe.

Wekî ku hatiye gotin, kultur yek ji du - sê peyvêh herî dijwar yêن ziman in. Di gelek cih û gehînekên curbecur de, ew bi gelek manêن cihê hatiye bikaranîn. Di destpêka kapitalîzm û kolonyalîsmê de kultur, bese hêjayiyeke serdestan bû. Kultur, neteweyêن xwedî kultur, gelên xwedî kultur u miratêن kulturî bese li ba serdestan hebû. Bmdest "bêkultur" bûn. Neteweyêن bmdest "keriyêن wehşî" bûn, nizanîbûn kultur çî ye. Çêyiya serdestan ev yeka bû, ku pariyek ji kultura xwe -her çiqas bi zordarî be jî- didan bmdestan. Li ser

kulture, nêrîn û daxuyaniyêñ welat û çinêñ serdest weha bûn.

Piştî muzîk, edebiyat, huner uwđ jî wekî kultur hatin ditin. Her kî ku xwediyê edebiyat, muzîk û pişê bûya, ew xwedî kultur bû jî.

Piştî vê dîtinê li ser mana û naveroka kulturê lekolîn û hûrnêrin zêde bûn. Pirsiyar çebûn. Çarçewa naveroka kulturê firehtir bû. Kultura çîn û kategoriyêñ civakî derketin peş. Mîna kultura burjuvazî, kultura karker, gundi, jin, zarokan uwđ... Piştî hûrnérinan hate dîtin ku çîn û kategoriyêñ civatî ji hev cihê dijin. Gelek tiştên wan ji hev cihê ne. Û bi normêñ cihê cihê li tişt û buyeran dinihêrin. Ji ber vê yekê jî, merîv têgihiştin ku di nav tevahî û yekîtiya kultur de, kategorî, berberî û curbecurî jî hene.

Û van salêñ dawîn, bi alikariya lêkolîn û hûrnérinan, pispor -bi taybetî antropolog u etnolog-gîhiştin havilekî weha; bi tevayî û kategoriyêñ xwe ve, şêweyêñ jiyîn û fikirîna gel kultur e. Anglo forma jiyanê bi xwe kultur e.

Forma jiyanê... Bêguman, ev yeka pir tiştan dibêje. Meriv dil dike ku ji bo her warê forma jiyanê peyv û daxuyaniyen xas hebûna. Wê demê mana u naveroka kulturê dê çêtir fahm bibûya. Lê mixabin, zanîna iro bersîva vê daxwaziyê nadî. Loma jî peyva kultur hîmêñ bingehîn yên civatek û gelekî di- hundirine. Şîûra şîrîkî û bîhevrebûnê, pîvek u normêñ civakî, tecrûbin civatê, şêweyêñ fikirîna gel, edet u tore, dan û standinêñ civakî, hemû di nav naveroka peyva kultur de cihêñ xwe werdigirin. Û bê şik, ev hemû warêñ forma jiyanê, bi ziman rolêñ xwe yên civakî dilizîn. Meriv bi ziman dikare hevûdû têbigiyê, bi ziman dikare tecrûbêñ xwe ragîhîne hev, zanebûn û tevgerêñ civakî pêk bîne...

Li gora vê daxuyaniya li ser kulturê, hemû gelên cîhanê xwedî kultureke neteweyî ne. Ji gelen herî paştemayî ta gelên herî peşketî hemû gel, xwedî kultureke xas û xweyî ne.

Her weha gelê kurd jî xwedi kultureke neteweyî, xas û xweyî ye. Kurd bi dan û standinên civakî, bi edet û torêñ xwe, bi eşîr û malbatêñ xwe, bi xwarin û cil û bergêñ xwe, bi ziman, zarav û devokêñ xwe, bi şerê xwe yê sedsalan xwedî formeke taybeti ya jiyanê ne. Ev forma kurdan ya jiyanê bi gelek aliyêñ xwe, ji formêñ jiyana gelên cîran û der û dora kurdan cihe ye. (gelek aliyêñ wekhev jî hene).

Ji stran û govendêñ kurdan ta rabûn û rûniştina wan; ji şal-şepikêñ wan ta şihîrêñ Ehmedê Xanê, Feqiyê Teyra, Meleyê Cizîrî; ji dawet û şahiyêñ wan ta benîsta kengerê; ji keleh û bircêñ wan ta şêweyêñ peyivîn û silavdana wan; ji leyistokêñ wan yêñ zarokan ta bêriya pezan... hemû ev tişt perçêñ kultura kurd in.

### III

Bi sedsalan e, di navbera serdest û bindestan de şerekî dijwar dom dike. Digel vê, ji destpêka tarîxa kolonyalîsmê heta roja me, şerekî din yê dijwar jî di navbera biyanî û gelên navxweyiyan de, heye. Ji sedsalan vir ve, di şerê gelên bindest u navxweyiyan de xebat û tekoşîna kulturî cihekî gelekî girîng ragirtiye.

#### Çima?

Ji ber ku ji bo serketina şerê rizgarî û azadîyê pêşketin û li ser riya pêşketinê jî hîmêñ bingehîn divê. Tu xelk nikarin di armancêñ xwe de bi ser kevîn, -heta ew, li ser riya pêşketinê, bi şêwe û xebatêñ curbecur yêñ hîmêñ bingehîn yêñ civakî ava nekin û ji bo ve yekê gav navêjin. Tarîx şahîdê vê yekê ye. Hêzên biyanî û dacîrker bi darê zorê, bi kotekî, dixwazin forma jiyana gelên bindest têk bidin, û navxweyî jî, ji bo derkirin û qewitandina hêzên biyaniyan, forma jiyana xwe diparêzin û wê, digel pêşketina tarîx û civakê, peşve dixin û modernîze dikan. Ji destpêka tarîxa zordariyê heta roja me, dijitiya herî bmgehîn ya di navbera hêzen biyanî û dacîrkeran û gelên bindest ev bû ye.

Afrîkayıyêñ reşik li hemberê *Societe Europeenne de*

*Cultur, Societe Africaine de Cultur* ava kirin. Ronakbirêñ ereban ji bo armanca Dar-El-Salam rêxistinêñ kulturi çekirin. Serekên Latin Amerikayî ji bo "Amerika Latîni ya azad" di pêşengiya Simon Bolivar de civyan ser hev. Wietnamîyan di pêşengiya Ho Chi Minh, Ngo Tat To û To Huu de, di sala 1948'an de kongra xwe ya kultura neteweyî civandin. Li cihane tu ronakbirêñ gelên bindest (ger sosyalist, ger welatperwer û demokrat) sînoran dananîne navbera şêwê û warêñ têkoşinê. Ronakbirêñ gelên bindest her xwestine li ser riya pêşketina civatêñ xwe himêñ bingehîn ava bikin. Rêberiya şerê rizgariya gelê Vietnam di destê sosyalist û welatperweran de bû. Rêberêñ gelê Vietnam di navbera sala 1945 û 48'an de ji bo kultur-edebiyat û pîseya Vietnamê ev tişt bi cih anîn: Seferberiya xwendin û nivisîne, di dewsa zimanê Fransızî de, bikaranîna zimanê zîkmakî, xebata nûjenkirina kultur û mîratiyêñ kulturê, lêvebûn û bidervevebûna kulturê, avakirin û xurtkirina kultureke zaniyar û neteweyî, afirîna musîka welatperwer û şoresger, çekirina kongra kultura neteweyî.

Min mînaka wietnamîyan ji bo vê yekê weha dirêj kir; ger sosyalist, ger welatperwer, rêber û ronakbirêñ gelên bindest divê ji bo parastin û pêşvexistina himêñ bingehîn yên forma jiyana gelên xwe bixebitin. Hebûna welêt, parastin û pêşvexistina kultur, ziman û forma jiyana neteweyî esas e, bingeh e. Ev yeka hanê destpêk e, destpêka her tiştî ye.

Esas e, lewre têkoşin, xebat, şer, lebat bese dikare li ser hebûna welat, gel, kultur, ziman û forma jîyanê xurt û jîndar be.

Bingeh e, lewre pêşketin, pêşvexistin, serketin bi tenê dikare li ser bingehêke tekûz bê holê.

Destpêk e, lewre tarîx û dem her diherike, pêşdikeve. Tişt têñ guhertin, modernîze dibin. Ji bo modernîzekirin, pêşvexistinê divê himêñ bingehîn

hebin û ev hîmên bingehin divê bibin destpêk.

Mixabin îmkanêñ me hê dest nadin ku em kovar û rojnamên kulturi, edebî û pişeyî biweşinin. BERBANG, di vî warî de kovara herî ber bi çav e.(Ev çendêñ dawîn li Swedê bi navê ROJA NÛ kovareke kultûrî dest bi weşinê kir. Û li Engistanê jî, bi tîpêñ erebi û bi zaravayê soranî kovarek bi navê ÇIRîKA KURDISTAN dêt weşandin.)

BERBANG gîhaye hejmara xwe ya 11'an. Em binihêrin ka di rûpelên BERBANG'ê de çi hene? Piraniya nivîsaran li ser ziman û problemên zimanê kurdî ne. Li ser dîroka zimanê kurdî yê nivisandî, têkiliya zaravayêñ zimanê kurdî, bikaranîna elsaba kurdî, nivîsar hene. Çend çîrokên gelêri û nivîsar û helbestên welatperwerî ku li ser tarîx, edet û tore û şere gelê kurd in jî di nav rûpelan de hene. Li ser folklor, zargotin û weşannêñ kurdî jî çend nivîsar hene.

Ango piraniya nivîsar, wêne u helbestên BE;RBANG'ê li ser hîm û refîn civat û jiyana kurdî û pêşvexistina wan e. Berî niha bi çendekê, ez li Parîs'e bûm. Wekî ku tê zanîn, li wir bi alikariya dewleta Fransê enstituyeke kurd vebû. Ji niha ve piraniya orijinalêñ kovarêñ kurdî li Enstituyê civiyane. Gava ez li wir bûm, min hinekî li wan kovaran jî nihêrt. Piraniya nivîsar û têdehiyêñ wan kovaran jî wekî yên BERBANG'ê ne. Çima ew weha ne?

Bersîva vê yeke li ber çavan e; wekî ronakbirêñ gelêñ din yên bindest, ronakbirêñ kurd jî li dû kok û rehêñ xwe ne, dixwazin xwe bigîhînin kokêñ xwe, heyînêñ xwe bibînin, binasin, derxînin meydanê, biparêzin û hêdî hêdî pêşvebixin. Li ku zordarî û asîmîlasyona hêzîn biyanî û dacîrkeran hebûye, li wê derê parastin, lê xwedî derketin, lêkolin û pêşvexistina dewlemendî û heyînêñ wê derê jî her hebûye. Yek ji wezîfêñ herî girîng yên rîber, serek û ronakbirêñ wê derê, parastin û pêşvexistina dewlemendî û heyînêñ neteweyî bûye.

Ji bo kesêñ ku ji asîmîlasyon û nîrêñ neteweyî dûr in,

dibe, parastin û lê xwedî derketma heyinê neteweyî eceb bê. Lewre ew jana şexsiyeteke neteweyî ya perçiqî nakişinin. Problemên wan yên wisan nînin. Wan pişa xwe daye ser ziman, kultur û şexsiyeteke azad. Gelên bindest û ronakbîrêن wan jana perçiqandina ziman, kultur û şexsiyeta xwe dijîn. Mejiyêن wan bi vê jana reş ve tijî ye.

Ji bo kurdan û ronakbîrêن wan jî wisa ye. Kurd jî, ji zû ve ye, jana perçiqîna ziman, kultur û şexsiyeta xwe ya neteweyî dikeşînin. Barê vê janê li Kurdistanâ Irakê kemtir e. Ji ber ku li wir tu carî ziman, kultur û edebiyata kurdi qedexe nebûye. Îcar barê jana reş li Kurdistanâ Turkiyê hîn bêtir e. Ji ber ku li Turkiyê dewleta Turk ya zorker ji damezrandina xwe û vir ve, her tiştî ku bi navê Kurd û Kurdayetî ye, qedexe kiriye. Hebûna gelê kurd nenase. Û pir bi xurtî diçe ser gelê kurd û Kurdistanê. Ji bo ku ew bikaribe gelê kurd asîmîle bike, bi darê zorê, her tiştî dike. Tu tiştekî ne xema dewleta Turk e, li Kurdistanê her tiştî têk dide. Parastina dewlemendiyêن antîk û tarîxa kevn jî ne xema dewleta Turk e. Du bûyerên rojèn dawîn, ji bo peyitandina vê yekê, mînakêن herî ber bi çav in.

Bûyera yekem li der û dora Herran û Ruha (Urfâ)’yê ye. Ev bûye çendekê ku dewleta Turk dixwaze li ser Firatê bendeke avê ava bike. Mintiqeyekî heft sed mîlyon mîlî dî bin avê de bimîne. Di nav vê mintiqê de ji hefteyî (70) zêdetir gund û bajarên biçûk hene. Ev gund jî dî bin avê de biminin û winda bin. Lê ya herî girîng, mintiqe kahniya dewlemendiyêن tarîxi û arkeolojîk e. Medeniyeta hezar salan li wê derê ye. Ji Kalkolilitika ta Urartuya, gelên kevn, di wextê xwe de, li mintiqê bi cih bûne. Mintiqe di navbera Mezopotamiya-Anatolî û Suriyê de pir e. Hinek beşen destana **Giigamêş** jî di mintiqê de hatibûn dîtin. Di navbera Samsat-Bozova-Karkamîş û Herranê de bi kêmanî berî niha bi 5000 salan merv bi cih bûne. Li gora dîroknasê Edessaî (Ruha-Urfâ) Mateos, bajarê Samsatê ji Bîzans

Commagenera payitextî kiriye. Lê sibe roj ev medenîyet û tarîxa hezar salan dê winda bibin û biçin. Her mîna mintiqâ Harpêt û bedenava Kebanê...

Bûyera duwemîn, xeberdaneke serekcumhûrê dewleta Turk general Kenan Evren e. Berî nuha bi çendekê. K. Evren û serbarêن cunta leşkerî bi hev re çûn Çolamergê. K. Evren li wir xeber da. Xeberdana general, ji serî heta binî li ser Kurdan bû. Bi kurtebirî tiştên ku wî digot in, ev bûn; kurd ne kurd in, ew tirk in. Kurd û Kurdistan nîn e, turk, Turkiye heye. K. Evren li Çolamergê wekî xortekî 18 salî diqîriya, xwe dihêjand û li ber çavêن hemû cîhanê derew dikirin. Îdeolojî û siyaseta dewleta turk weha ye. Merivahî, zaniyarî li ba dewleta turk nîn e. Sosyolog û nivîskarê hêja İsmail Bêşikçi di kitaba xwe ya dawîn de, ku weşanxana "Dengê Komalê" bi nave "Ji Unesco'yê re name" çap kiriye, zordarî û hovîtiya dewleta Turk baş dide xuyadan.

Ji ber zordarî û hovîtiya nedîtî ya dewleta turk, dile Küdistana Turkiyê bi jana perçiqandina ziman, kultur û şexsiyeta neteweyî hîn zêdetir tijî ye. Ev yeka di rûpelên HAWAR û ROHANÎ'ye de baş xuyaye. Kovarêن HAWAR û RONAHÎ kovarêن herî bedew û hêja yên kurdêن Turkiyê û Suriyê bûn, ku piştî tekçûna raperîna SEX SEÎD derdihatin. Di her hejmara van kovaran de ji bo gelê Kurd qîrîn û gazîn hene. Di hejmara 5'an ya RONAHÎ de (1- Tebax- 1942) li ser kovareke kurdî (GELAWÊJ) nivîsareke kurt heye. Nivîsar bê nav e. Lê, xuyaye bergerêن RONAHÎ'ye ew nivîsine. Di dawiya nivîsarê de wisa tê gotin;

"Herwekî bergerê Gulavejê gotiye, kurd nemaze iro, ji her wextî bêtir hewcedarî kovar û kiteban in. Ji ber ko sibê, gava milletên dinyayê dewh û doza heyîna xwe bikin, yên ko heqe milletan lêk vekin, li kovar, kitêp û rojnameyên wan jî dê bipirsin.

Ji lewre em jî digel bergerê Gulawêjê dibêjine kurdan, nemaze kurdêن Iraqê: Kurdino! ne bi tenê bi çar, le bi

*çardeh destan b Gulawêje bigirin û qedrê wê bizanin".*

Qırın, qırına parastin u lê xwedî derketina heyin û dewlemendiyên neteweyî ye.

#### IV

OİRİN û jana perçiqandina şexsiyeta neteweyî li ba bîrewer û ronakbîran bêtir e. Ji ber ku ew ji xelkê betir ji derva re vekirîne. Dan û standinên wan bi derva re heye, ji xelkê zûtir xwe nêzî tişt, bawerî, raman û normên nuh dikin. Û piraniya wan di cih û refen biyaniyan de xwe perwerde kirine. Nêrin û nêzbûna wan i tiştan cuda ye. Bîrewerî û zanebûna wan, alikariya wan dike ku bûyer û tiştan hîn firehtir û kûrtir bipivin. Loma jî pîvekên wan hişk û girtî nîn in.

Ev tişt hemû pir pozitîv û rind in. Bi alikariya van tiştan meriv dikare guhertinan bibine li bûyeran hûr binihere, ji keda kar, xebat û lebatan havilan derxîne, rêberiya guhertinan bike, bibe nûnerê tiştên nû. Fonksiyon û rola ronakbîran jî, jixwe, ev e.

Lê ev yeka hanê bi xwe re tehlikeyeke mezin jî tîne; ji hebûnên xwe, ji welatê xwe û gelê xwe bi dûrkentin. Trajediya ronakbîrên welat û gelên bindest ev e. Anglo di nav ziman, kultur, pîvek, norm û dan û standinên nû de fetisîn, asîmîle bûyin, şexsiyeta xwe ya neteweyî winda kirin. Ji ber vê yekê jî ronakbîrên gelên bîdest ji her kesî zêdetir jana perçiqandina şexsiyeta neteweyî dikêşînin, ji her kesî zêdetir digirin û xwe diêşînn. Ev normal e. Li ba hemû gelên bindest yêñ cihanê wisa bûye û dê li ba kurdan jî wisa be.

Bawerîyên ronakbîran çi dibe bila bibe, ew divê xwe bigîhînin kokêñ xwe, li kultur, heyin û dewlemendiyên neteweyî yêñ welatêñ xwe xwedî derkevin, wan biparêzin û hêdi hêdi peşvebixînin. Parastin û lê xwedî derketina do û iro ji bo leyлан, xewn û fantazîyan ne, lê ji bo baştîrbûna sibê pêwist e. Baştîrbûna sibê û rojêñ peş, bi rêxistin û tekoşîna gel mumkin e. Gel jî bi tiştên jê dûr û hiç û pûç ve rînakeve. Gel divê xwe û daxwaziyêñ

xwe di nav tekoşînê de bibîne, ku bi rê keve.

Ronakbirêñ gelên bindest ku şerê nzgariyê dane û iro serbest in, vê yekê baş bi cih anîne. Berî her tiştî xwe û der û dora xwe ji krîza şexsiyeta neteweyî filitandine, xwe gîhandine kok û rehêñ xwe, yekîtiyek jîndar di navbera xwe û welat, gel û kultura xwe de avakirine. Û ew di demeke dirêj de bi ser ketine, welat û gelên xwe rizgar kirine.

Em binêrin; di qirna me ya 20'an de, rîber u pêşengêñ hemû şerêñ rizgarîxwaz ronakbir in. Bir û bawerî û metodêñ xebata wan ji hev gelek cuda be jî hemûyan, yekîtiyek bi welat, gel û kultura xwe ve damezrandina. Dan û standin û yekîtiyeke hêja, jîndar di navbera bawerî, raman, norm û metodêñ xwe yêñ nû û welat, gel û kultura xwe ya kevnar de çekirine.

## V

Problemê herî mezin û bingehin yê ronakbirêñ kurdan, bi baweriya min, ev e. Nemaze ji bo ronakbirêñ kurdêñ Turkiyê weha ye. Ronakbirêñ kurdêñ Turkiyê nikarin dan û standin û yekîtiyeke heja û jîndar di navbera bawerî, raman, norm û metodêñ nû û welat, gel û kultura xwe de ava bikin. Yan ew jî welat, gel û kultura xwe pir dûrketî ne, yan jî ji tişt, bawerî, raman û normêñ nû re pir girtî ne. Helbet ji herdu awiran jî tu havilekî dernayê. Ji ber vê yekê jî, berhem, afirandin û hilberiyêñ ku bimîne û bibe rîçeyeke koka welat û gelê kurd, zû bi zû, dernakevin. Kurdistanâ Turkiye bûye wekî çolekî. Ji 10-12 milyon kurdêñ Kurdistanâ Turkiye, 10-12 nivîskar yan rojnamevanêñ kurd derneketine. Herweha 10-12 kesên pispor, zanyar, dîrokñas, zimanزان, müsîknas jî derneketine. 10-12 roman, çîrok, helbest, destan yan pirtukêñ zarokan jî derneketine.

Lê çi derketiye? Bi hezaran, sed hezaran xort u keçen nîvzane, mêtî tevíhev derketine.

Ev xebitîn, bûn serek û rîberen gelê kurd, ji bo ber

doza gelê xwe ked, xwîdan û xwîna xwe rijandin. Gelek ji wan bûn gorbehîst. Lê inixabin, hezar mixabin, wan li ser riya pêşketinê hîmên bingehîn yên forma jîyana gelê Kurd avan nekirin, nikaribûn ava bikin, dan û standinek, yekîtiyeke xurt, jîndar di navbera xwe û welat, gel û kultura xwe de ava nekirin.

Sedemê wêranbûna Kurdistana Turkiyê, tunebûna ronakbîrên modern e. Xwendayê me pir in, bi hezaran in. Di vê manê de ronakbîrên me jî pir in. Lê ew kêm û paştemayî ne. Wekî kultur, mana ronakbîrî jî gelek fireh e. Nemaze di welatê bindest û paştemayî de peyva ronakbîrî jî pir tiştan ifade dike. Ji lewre di welatê bindest de kadir û merivên pispor yên warêne curbecur kêm in. Kêmaniya pispor u kadiran barê ronakbîrên welatê bindest girantir dike. Di welatê pêşketî de pisporî di pêşîya ronakbîrîye de ye. Li wir ne hewce ye ku meriv hem siyaset û tarîx û hem jî edebîyat û sosyolojî bizanibe. Pispor û kadirêne pêşketî pir in. Organizasyon û muessesên wan hene.

Ronakbîrê welatê bindest divê berpirsiyarê tarîxa xwe û qirnê xwe yê îroyî be. Mejîyê wî nûjen be, lê dûri welat, gel û kultura xwe nebe, di mîjîyê xwe de welat, gel û kultura xwe bijî, li heyîn û dewlemendiyêne hûr binêre, û tiştê herî girîng, pêşvebixîne. Ronakbîr kesê pêştexiste ye, ango pêşverû ye. Parastin û pêşvexistin du riyen rastî ne û sedemê hebûna ronakbîr e.

Pêşverûti behsa teorî û baweriyêne şoreşger kirin nîn e. Pêşverûti, di her warî de tiştan pêşvexistin e. Em dê pêşverû bin, behsa teorî û baweriyêne pêşverû bikin, lê tiştan, hêl û warêne jîyanê bi pêşve nexin... Pêşverûtiya wisan ne pêşverûti ye. Û pêşverûtiyeke weha tu havılı nade. Meriv divê xwe ji pêşverûtiyeke weha şaş û çewt biparêze.

Rewşa ronakbîrên Kurdistana Turkiyê ne baş e. (Di perçen din yên Kurdistanê de rewş gelek cuda ye. Ji ber vê, ez naxwazim di vê nivîsara xwe de behsa perçen din bikim.) Ronakbîrên Kurdistana Turkiyê, yan bêî

ziinan, kultur û şexsiyeteke neteweyî, bêî parastina van dixwæe tiştan pêşve bixinê, yan jî ziman, kultur û şexsiyeta neteweyî ewçend hişk diparêze ku nahêle ev bi pêş kevin.

## VI

Bi qasî ku xuyaye, di Kurdistana Turkiyê de du kategorî ronakbîrên kurd hene. Bê şik ew kesen ku xwenda ne, lê xwe li kurdîyê danayinin û tu tekiliya xwe bi kurdayeti û besen xebata kurdayetiye danayinin, li dervayî van kategoriyanan in. Hejmarê van kesan pir e. Nivê xwendayên Kurdistana Turkiyê ji van in. Ji asimilasyon û tîrsa dewleta turk, ji kurdayetiye bi dûr ketine. Eger ronakbîrên me kîmaniyen xwe ji holê rakin û bi xebatek cûrbecûr û gelêri (bi metodêni modern) rabin, ev kes jî -bi kemanî piraniya wan- dê li xwe vegeerin.

Îcar xwendevan divê ji bir neke ku ev dabeşkirina ronakbîrên Kurdistana Turkiye bi xetêni giştî ne. Ez hêvidar im ku em dê di rojêni pêş de bikaribin hin bêtir ji nêzîk ve li ronakbîrên xwe binêrin, hin çêtir lê hûr bin û lêkolin.

Kategoriya yekem ya ronakbîrên Kurdistana Turkiyê, melle û seydayên welatperwer in. Kahniya welatperwerî û ronakbiriye ev in. Tarixa seydayan pir kevn e, xwe digihîne Mellayê Cizîri, Ehmedê Xanî, Eliyê Herîri. Bapîrên edeta welatperweriya şêx, melle û seydayan, M. Cizîri, E. Xanî, E. Herîri ye. Seydayêni me yên iro ji wir, ji kûrahiya tarixa me têni. Ji sedsalan û vir ve ye ku ev ekol rêberiya welatperweriya kurdî dike, welat, gel, kultur û tarixa kurdan diparêze. Ew di nav gel de ne, edet, tore û normêni jîyana gelê kurd baş dizanin, ji bûyerên der û dorêni Kurdistanê baş agehdar in. Mêjîyêni wan bi çirok, stran, zargotin, destan u serpehatiyêni kurdan ve tijî ye.

Lê mixabîn ew ji derva re girtî ne. Bi şik li derva dinêrin. Zordariya hezêni biyanî ew kirine dijminê

tiştên biyanî. Wan her xwestine heyin û dewlemendiyên Kurdistanê biparêzin, ziman, kultur û şexsiyeta kurd li ser lingan pêgirin. Hêla wan ya parastinê gelekî li peş e. Lê hêla wan ya pêşvexistinê gelekî qels e. Ji lewre piraniya wan, ji dîtin, bawerî, norm, pîvek û metodêن nû re girtî ne, ji xebatêن akademik, pisporî û modern dûr in. Edebîyat, kultur û zaniyariya navneteweyî bala wan nekêşîne.

Bi kurtebirî, ekola seydayêن welatperwer forma jiyanâ kurdî diparêzin, lê nikarin wê bi pêş bixinin.

Kategoriya duwem ya ronakbîrêن Kurdistanâ Turkiyê, xwendayêن nû yên welatperwer û sosyalist in. Ji destpêka 1960' i ta iro nîşêkî weh j Kurdistanâ Turkiyê derket. Ev nîş jî di nav xwe de yek nîn e. Nêrinêن wan ji hev cuda ne. Le hêlêن wan yên bingehîn nêzê hev in. (Ez bi xwe jî, ji vê kategorîyê me.)

Piraniya vî nîşê nû di xwendegehêن bilindan de xwendine, avukat, doxtor, mamoste û hwd ne. Bi kêmanî, wan xwendegeha navîn qedandine, ji dîtin, bawerî, norm û jiyanâ modern agahdar in, li ser teoriyêن nû munaqaşeyêن germ û kûr dikin, xwedî idiyayêن gelekî mezîn in, dixwînin û dinivisinin, tiştên nû, bûyerêن cihanê bala wan dikêşîne, ji derva re, tiştên nû re pir vekîri ne, bi lez û aktiv in, ji welatê xwe, gelê xwe hez dikin, bi xurtî ji bo welatê xwe dixebeitin, têن girtin, têن kuştin, dixwazin rewşa welatê xwe biguhêrinin, welatê xwe bi pêşve bixin.

Lê mixabin xwendegeh, perwerî û sîstema dewleta turk, heyin û hebûna wan ya kurdî çelqandiye. Ji % 95' ên wan bi zimanê turkî difikirin, nêzê temamiya xebata wan ya siyasi, civakî û kulturî bi turkî ye. Piraniya wan di nav xwe de bi turkî dipeyivin. Nemaze xeberdan û tevgerêن wan yên siyasi hemû bi turkî ne. Ji% 20 - 30'yê wan dikarin bi kurdî bipeyivin. Eger em bi optimizmeke boş bibêjin, ji sedî yekê wan dikarin bi kurdî binivîsin û bixwînin. Forma jiyanâ kurdî û ya turkî di serê wan de tevîhev e. Piraniya wan ji kultur û

tarixa kurd bi dûr in, krîza şexsiyeta neteweyî dijîn, xwe nadin ber xebata ake- demîk, nêzî lêkolin û hûrnêrinêñ kûr û fireh nabin, pisporiyê nadin ber xwe. Keysa wan nîn e ku bibin nivîskar, hozan, rojnamevan, sosyolog, etnolog, dîroknas, zimanzan, muzîknas, diplomad ûwd...

Bi kurtebirî ev kategorî jî dixwaze biguhîrîne, pêşve bixe, lê belê, bêî ku xwe bigîhîne kokêñ xwe, bêî ku hîmêñ bingehîn ava bike.

## VII

Bi kurtî rewşa me weha ye. Welatê kurdan di nav nezaniyeke mezin de ye. Ronakbîrêñ welabê kurdan jî hem kêm û hem belengaz in. Kêmanî û çewtiyêñ wan pir in. Lê li milekî din jî welatê kurdan bi lez diguhere. Eşirêñ welêt ji hev dikevin. Jiyana koçeriyê mina berfa ber royê dihele. Dan û standinêñ kevn winda dibin. Û asîmîlasyona dewleta turk roj bi roj bêtir dibe.

Di gehîneka iro de, vatiniya herî mezin û bingehîn; derxistin, avakirin û berpêş kirina ronakbîrêñ modern e. Kurd wekî welat, wekî gel iro hewoedarı ronakbîrêñ modern û pêşverû ne, di çarçeweke pêşverû de hewoedarı yekîtiya nûjenî û kevnariyê ne. Anglo kurd iro hewoedarı ronakbîrêñ ku gelên din yên bindest j zû ve ye ku derxistine, ne.

Li vir divê em tiştekî ber bi çav bikin ku daxuyaniyêñ me yên li ser ronakbîrêñ Kurdistanâ Turkiyê, bi xetêñ giştî ne. Ji wan re lêhurnêrin divê. Em divê van agahî û daxuyaniyan vekin û sedemên wan bidin ber çavan. U bê şik, ronakbîrêñ modern ku daxwaza me hemuyan e, disan dê ji yên hene, derkevin. Armanç, kêmanîyan ji holê rakirin e.

Wekî ku me di rûpelên bûrî de berpêş kir, ronakbîrêñ kurdan jî êdi divê dan û standineke, yekîtiyeke jîndar di navbera nû û kevn, nûjen u kevnar, kok û pi, kahnî û rêçan de pêk bîne.

Di destpêka nivisarê de, Frantz Fanon digot; kare me

yê herî bingehîn û tarîxî, domandina raperîn û serîhildanêñ kevn e. Domandina li berxwedanêñ kevn? Belê, rast e. Wekî din rê nîn e. Lê li gora dan û standinêñ îro û bi rêberiya ronakbirêñ ku berpirsiyarê sedsala xwe ne û welatê xwe, gelê xwe, kultura xwe di mêtîyê xwe de dijin...

**Berbang**, hej. 14, 1983

## Kultur, zanîn û ronakbîrêñ Kurd

Berî niha bi çendekê, min ji kovara Federasyona Komelêñ Kurdistanê li Swêdê BERBANG re, bi navê "Kultur û Ronakbîrêñ Kurd", nivisarek nivisi. Di beşekî wê nivîsarê de, ez li ser man'a û naveroka kulturê piçekî rawestiyabûm. U bi kurtebirî, ji bo kulturê, min weha gotibû; kultur forma jiyana gelekî ye.

Li ser kultur û man'a wê, ev çend sed sal in ku lêkolîn, lêhûrnêrîn û munaqaşe hene. Gelên din ên cihanê û ronakbîrêñ wan li ser kulturê, parastin û pêşvexistina wê, bi hezaran tişt nivisîne. Herweha li welatê me jî, nemaze li Kurdistanâ Iraqê, di vî warî de, gelek tişt hatine nivisin. Di kovar û rojnameyan de guft û goh û munaqaşen kûr, balkêş û mezin çêbûne.

Lê bi taybetî li Kurdistanâ bakur, piştî raperîna şêx Seid û heta iro, di warê kultur û lêkolîna kulturê de, tu tişt nehatine nivisîn. Jixwe ji 1923 an heta 1960 an, tu imkanêñ weşandin û çapkirina kitab, kovar û rojnamên kurdî tune bûn. Piştî 1960'ı li Turkiyê rewşa civakî û siyasi hinekî çêtir bû. Her mîna hêz û tevgerên çep ên Tirk, kurdan jî rewşa nü ya nerm bi kar anîn û hêdî hêdî dest bi weşin û çapkirina kitab, rojname û kovaran kirin, - digel ku umrê weşanêñ wan ne ewçend dirêj bû. Piştî 1974 an, Kurd di warê weşanê de, pir bi pêş ketin. Dema cunta leşkerî ya Tirk, 12. Ilon. 1980, hat ser hukim, hingî Kurd xwediyê çend kovar, rojname û weşanxanan bûn. Wê gavê weşanêñ kurdî, bêyi kovara TÎRÊJ'ê, hemû siyasi bûn. Gerçi hin rûpelên van kovar û rojnameyan ji edebiyad, çand û hunerê re veqetî bûn, lê ew li ser hîmînî siyasi ava bûbûn û armanca wan a herî bingehîn bicîhanîna bernama siyasi ya wê

kovar/rojnamê bû. Û tê de li ser -em bibêjin- dan û standina siyaset û kultur yan kultur û netewe yan kultur û serên rizgarîxwaz û babetên mîna van, nivîsar û lêkolin, hema ci bigire, tune bûn.

Herçi TÎRÊJ bû, mixabin ku wê hê reh û tovên xwe negîhandibû nava gel. Cunta leşkerî hê di destpêka weşinê wê de hat û ew jî hate girtin. Piştî cunta leşkerî -her ci Kurd, Tirk- hemû hêz û kesên demokrat, pêşverû û sosyalist her celeb imkanên xwe winda kirin. Û her tişt ku bi navê demokrat, pêşverû û sosyalistî li meydanê bû, hate qedexkirin.

Hêz, tevger û kesên Kurdistana bakûr niha jî xebatên xwe yên çapemeniyê li derveyê welêt didomînin. Ev hewldan û xebat dê, di rojên bê de, çiqas bi kar bê? Havil û berhemên wê dê ci bibe?.. Ji niha ve, zehmet e ku meriv bikaribe bersîva vê yekê bide. Bersîv di hembêza pêşerojê de ye.

Eger em vejerin ser qisa xwe ya sêrî, em dibînin ku ji 50 salan zêdetir e ku Kurdistana bakûr, tu carî, keys û imkan bi dest nexistine ku li ser kultur, şax û warêن kulturê, kultura me û problem û gelşen wê raweste, lê bikoline û lê hûr bibe.

Li ser riya pêşketinê, ji bo hemû gelên cîhanê û ronakbîrên wan sê esas û meshûmên bingehîn hene, tarîx, kultur û îdeolojî... (Bi îdeolojiyê mebesta min, îdeolojiya her texlît tevgerên neteweyî û çinî ye). Ev hersê esas, tarîx, kultur û îdeolojî, bernama kar û barêن curbecur ên iro û dahatûyê berpêş dikin. Loma li ser van esasan serwextî û zelalî divê. Bêguman, serwextî û serzelalî ne şixulê rojek-du rojan yan demên kurt e. Jê re wext û demên dûr û dirêj, xebat i karêن kûr û fireh divên. Bi vî awayî (bi xebat, lêkolin û berhem), di warêن tarîx, kultur û îdeolojî de, serê merivan zelal dibe û meriv dikare hem xwe û hem jî welat, gel û kultura gel^û welatê xwe bi pêş ve xîne.

İro, roj roja dagirtina valahî û kêmaniyêن me ye...

## II

Min dil heye ku ez di vê nivîsara xwe de ïzeh û zanîna kulturê, bi awayê forma jiyana geleki, hinekî vekim. Bêşik, herweki ku hatiye gotin, gotina forma jiyana gel tê mana pir tiştan. Armanca min ne ew e ku bikaribim, bi her awayî, li ser vê meselê hûr bim...

Di her welatê de dan û standineke pir xurt di navbera kultur û civatê de heye. Ji ber vê yekê jî, lêgerên civaknas (nemaze sosyolog, antropolog, etnolog, tarîxnas, arkelog û feylesof) têkiliya kultur û civatê, ji bo gavavêtin û lêkolinêن xwe, mîna hîmê esasî û destpêkê dibînin. Herwqeha kesen siyasi jî di xebata xwe de pir girani û ehimiyet didin vê tekiliyê. Çima?

Ji lewre, kultur ne beşekî bingehîn ê abotiyê û ne jî yê organ û mueseseyên civatê ye. U ew ne beşekî ideolojiyê ye jî. Çarçewa wê hîn firehtir e. Kulturê mîna beşekî û perçeyeki ji bingeha aborî yan sergehê yan jî ideolojiyê ditin, şâsiyeke pir mezin e. Ji ber ku meriv bi kulturê dijî, jiyana rojane bi pergalên kulturê bi rê dixe û dan û standinêن hawirdora xwe li gora normêن kultura civata xwe dimeşîne. Loma, mefûm, hebûn, binyat, giranî û tesîra kulturê firehtir û kûrtir e. Kultur şêweyên bi rêxistin, têgihiştin, izehkîrin û bi pêşvebirina dan û standinêن civakî ye. Ew di civatê de diafire, form digire û li gora herikîn û pêşveketina civatê û çîn û tebeqeyên civatê xwe diguherîne û tesîr li hîmêن bingehîn ên civatê dike.

Di lêkolinêن kulturî de dixuye ku du aliyêن kulturê hene; aliyê pasîv û aliyê aktiv. Aliyê pasîv xwe di têkilî, nêrîn, nêzbûn, rabûn û rûniştin û hızır û fikirîna merivî de xwe nîşan dide. Yanê di wan norm û pîvekan de ku meriv ji malbat, perwerî, rêkxistin û dan û standinêن civakî werdigire. Bêyî ku meriv xwe biêşîne, van norm û pîvekan werdigire û li gora wan dilebite, li xwe dike, dixwe, vedixwe, dinihêre, nêzîkî li tişt û bûyeran dike. Digel vê aliyê pasîv, içar aliyeke aktiv jî

heye ku meriv bi zanîn, bi plan, bername û armanc kulturê bi pêş ve dixe, diguherîne û ji bo feniomenen kulturî yên nû hîm û bingeh ava dike. Herkes di nav kultur û dan û ştandinên kulturî de tê dinê, mezin dibe û bi alikariya xebat, rêxistin û dan û standinên civakî, kulturî û siyasi wê bi pêş ve dixe û diguherîne.

Bêşik e ku ji bo pêşvexistin û guhertina kulturê, zanîn/zanebûn divê. Ji bo ku meriv di nav kulturekê de were dinê û bijî, zanebûn ne pêwist e. Bêyî zanînê ji ev yeka dibe. Jixwe meriv di nav civatê de dijî û di nav têkilyên civakî de ye. Lê pêşvexistin û guhertina kulturê (yanê forma jiyana civatê) bê zanîn û zanebûnê nabe.

Ji bo zanîneke vekirî û zelal jî, meriv divê bizanibe ka hîmên bingehîn yên kulturî çi ne, jiyana civatê û ev hîmên bingehîn di bir û mîjiyê çawan cih û form digirin... Ez dixwazim, li vê derê, bi kurtî behsa van hîmên bingehîn yên kulturî ku bingeha fikirin û nêrînê meriv in, bikim. Bi qasî ku ez dizanim, meriv bi van esas û pîvekên jêrîn disikire, dilebite, dixebeite, dijî û dimire;

**1- Fikir, pîvek û normên wext, dem, dewr û dewranê:** nêrîna demên kevnare û tarîx, nêrîna iro û dahatû (Pêşerojê), herikîna wext û jiyanê, domandina jiyanê, zayin û mirin...

**2- Yêñ kar û xebatê:** nêrîna ked û hêjahiya kedê, afirîn, vekêşan û fekiyêñ ked û şixul, parvekirina kar û berhem û fekiyêñ wî...

**3- Yêñ cih û cîgehan:** nêrîna vejandin, avakirin, domandin û nûkirina cih, war, ax û welêt, prensîbêñ bi rêxistin û pêşvexistina wan, mefhûmên nêzbûn û dûrbûnê...

**4- Yêñ meriv, merivahî û qerekterên wan:** bir û bawerioyêñ li ser meriv û merivahiyê, ferqêñ merivahî û nemerivahiyê, li meriv, beden, giyan, xweşî û nexweşiyê nêrîn...

**5- Yêñ ez û ezitîyê:** nêrînêñ li ser daxwaz, mebes û

mezinbûnê, xwezî û hêvî, xirab û xirabî, heval û hevaltî, qerekter, huwyet, şexslyet û h.w.d...

**6- Yêñ hevkarî û tevkariyê:** nêrînêñ li ser têkiliyên civakî û tê de cihê şexsan, şêwe û celebêñ hevkarî û tevkariyê...

**7- Yêñ civakî û fenomenêñ civakî:** nêrînêñ di derheqa zanîn i izehkirina civatê, jiyin, zîndekirin û vejîna civatê, sînor û çarçeweyêñ "em" û "ewana", norm, pîvek û kategoriyên civakî...

**8- Yêñ ehlaq û ehlaqiyê:** nêrînêñ li ser çeyî û xirabî, rîndî û nerindi, xweşî û kirêti, rastî û nerastiyê...

**9- Yêñ zor, hukim û idarê:** nêrîn û kar û şixulêñ di warê bicihanîn û bikaranîna hukim, idare û pergalêñ wê, helwesta li hember iktidar û fermanan...

**10- Yêñ ol, din, cîhan û tebietê:** nêrînêñ li ser avabûn û heyina cîhanê, -bi aliyêñ xwe yêñ berbiçav û neberbicav, hîs û pejnêñ li hember nexeşî û afatêñ tebii, dan û standinêñ dîni, berberî û wekheviyêñ fikri...

**11- Yêñ li ser nêr û mî, jîn û mîr:** nêrînêñ li ser cihê jîn û mîran di civatê de, dan û standinêñ wan...

Meriv dikare van esas û pîvekêñ bingehîn yêñ kulturi ku di hizir, fikirîn û nêrînêñ meriv de hene, hîn zêdetir bike. Lî armanca min nîşandana hin esasan bû... Îcar eger em bixwazin li gora van esasêñ kulturi, bi alikariya hin gotinan, mîsalek ji bo civat û kultura kurdî bidin û bergeheke diyar û zelal berbêş bikin, ez bawer im, bergeheke weha dê were pê; Med, Keldan, rizgarî, seyda, seyid, şêx, axa, beg, eşir, koçer, bajarı berdêli, pişk avêtin, newroz, mîrî, cot, pez, gisin, traktor, comerdî, çikosî, kerge, bêri, mîzgevt, nimêj, zordariya derve, bindestî, nezanî, pêşmerge, çayxane, qiyamet, bermalî, hesp, kirîv, sawar û h.w.d...

Belê, ji gotinêñ curbecur bergeheke weha... Em ji xwe bipirsin, gelo bergeheke weha bi van gotinan ji bo japoniyan, fransizan, îngilizan, afrikayıyan yan jî ji bo amerîkalatîniyan ci ifade dike? Qet, tu tiştî. Ji bo wan bergeheke weha xerîb e. Gelo ev ji bo me kurdan ci

îfade dike? Her tiştî. Ji lewre, em xwe di nav bergeheke weha de dibînin, em percekî wê ne. Ev bergeh form û şeweyê jiyana kurdan ber bi pêş dike. Ya fikri û ya rojane û civakî.

### III

Bi ya min, kovara herî jîndar û bikêr ku piştî damezrandina Komara Turkiyê, ji aliyê ronakbirêñ kurdan derketiye. HAWAR e. Hê tu kovar û rojnama kurdêñ Turkiyê û Sûriyê, ji aliyê xurtî û jîndariyê, negîhiştiye Hawar'ê. HAWAR ji 1932-an ta 1943-an 57 hejmarêñ Kovarê weşandine. Ew bi kurdî û bi frensizî weşiyaye. Weki ku min got, HAWAR bi rêberiya ronakbirêñ Kurdistana bakur dest bi jiyana xwe ya weşanê kiriye. Lê ne li Kurdistana bakur, li Sûriyê, şamê. Zordariya dewleta tîrk rê nedaye ku kurd bikaribin kovar, rojname û kitabêñ xwe li Kurdistana Bakur biweşinin. Kurd jî, bêçare, di derêñ din de xebatêñ xwe domandine. Di warê weşanan de HAWAR eser û berhemâ wan a herî giranbiha û hêja ye. Ew iro yek ji afirîn û avahiyên me yên bedew û dewlemend e. anayê gorbehîş Celadet Ali Bedirxan tevî bira û hevalêñ xwe (Kamuran Bedirxan, Osman Sebrî, Qedrî Can, Qedrî û Ekrem Cemilpaşa, Hesenê Hişyar, Nureddin Usif-Zaza, Rewşen Bedirxan û h.w.d.) Kovar diweşand.

Hemreş Reşo jî, bi alîkarî û şîretêñ Apê Osman Sebrî û rîdana Kamuran Bedirxan û kurê Celadet Bedirxan, Cemşîd Bedirxan, karekî hêja kiriye û **Hawar** careke din çap kiriye. Û bi vê xebata baş HAWAR gihiştiye roja me. Lê mixabin ji hejmata yekemin ta hejmara 23-an iro naxuyin. HAWAR heta hejmara 24-an bi elsaba erebî û carina jî bi latînî weşiyaye. Di çapa nû ya HAWAR'ê de ku H. Reşo derxistiye, bi tenê hejmarêñ 24-57 hene. Hejmarêñ 1-23 tê nîn in. Kesekî bikaribûya van hejmaran jî derxista ronahiyê û orijinalêñ wan tevî wergerên wan ên latînî çap bikira, wê dê karekî

hêja bikira.

Her tê gotin; dan û standineke xurt di navbera me û tarîxa me de pêwist e. Me zanîn û hînbûna tarîxa xwe divê. Tu kes bêreh, bêtarîx nabe. Tu kes bêreh, bêtarîx bi pêş ve nare. Di navbera do-îro-sibê de, her gav, benêñ xurt hene.

Yek ji kêmaniyên nifşen nû yêñ kurd ew e ku ew ji tarîxa xwe bi dûr in yan jî hatine bidûrxistin. Li ba nifşen nû, zanîna tarîxê pir kêm e. Zordariya dewletê rê lê girtiye ku ew bikarîbin xwe bi tarîxa xwe bigihînin. Dewletê, mîna her tiştî, tarîxa kurd jî qedexe kiriye. Piştî damezrandina Komara Turkiyê, 1923, turkan dev ji bikaranina tîpêñ erebî berdan û dest bi elfabeya latînî kirin, 1927. Wan nifşen xwe yêñ nû di dibistan û xwendegehan de bi elfabeya latînî perwerde kirin. Kurd jî, bivê nevê, di nav vê heyama nû de bûn. Ji ber vê yekê jî, nifşen kurd yêñ nû ku di xwendegehêñ tirkan de perwerde bûne, elfabeya erebî nas nakin, jê re biyani ne. Bê guman, ev yeka hanê ji bo kurdan bû darbeyeke mezin. Ji lewre benêñ tarîxi ku di navbera rabirdû û nifşen nû de hebûn, qetiyân. Nifşen nû hêdî bi hêdî ji tarîxa xwe bi dûr ketin.

Li milê din, dewleta tirk, ji bo nifşen xwe yêñ nû, ci ku pêwist bû, kir. Hemû kitab, kovar, rojname û weşanên xwe yêñ ku bi tîpêñ erebî bûn, wergerandin tîpêñ latînî; ji bo vê yekê enstitusiyon damezrandin, bi hezaran tişt derxistin û piraniya eserên xwe yêñ kevn parastin. Kitabxanêñ tirk yêñ mezin bi kitab, kovar û rojnameyên kevn tijî ne.

Lê belê, kurd ji vê tekê bêpar man. Ne ku bi tenê ew bêpar man, eser û berhemên ku di destê wan de hebûn jî, bi êrîşen dewletê, ji destê wan derketin û winda bûn. Kurdan ne dikarîbûn eserên xwe biparêzin û ne jî eserên xwe, ji bo nifşen nû, wergerînin tîpêñ latînî. Loma ehemiyeta HAWAR'ê girîng e. Bi alîkariya wê û berpirsiyarê wê Celadet Bedirxan, kurdêñ ku bi zaravayê kurmancî dipeyivin derbazî tîpêñ latînî bûn.

Ev yeka li hemberî siyaset û assîmilasyona dewleta tîrk gaveke mezin bû ú ji bo nifşen nû alikariyeke hêja bû. Iro em, nifşen nû, ku ji tipên erebî bi dûr in, bi xêra rêvekirina HAWAR'ê dikarin bi kurdî bixwînin û binivisînin.

HAWAR'ê rê li siyaseta dewleta tîrk girt û ji nifşen nû yên Kurdistana Turkiyê re alikariyeke mezin kir. Lê digel vê yekê jî, heyinê kevnare, her wisan, li cîhêne xwe man. Eser û berhemên kevn ku bi tipên erebî ne, ranegîhiştin nifşen nû. Bi hezaran kitab û bi dehan rojname û kovarêne kurdî ku bi tipên erebî derketine, hene. Piraniya wan li Kurdistana Iraqê weşiyane. Lê ew jî bi tipên erebî ne. Kurdistana Turkiyê û nifşen nû ji van kitab, kovar û rojnaman bêpar in.

Di roja me de, yek ji berpirsiyariyên me yên herî bingehîn ew e ku em hewl bidin û eser û berhemên xwe ji elfaba erebî wergerînin elfaba latîni. Bi vî awayî benêni di navbera tarixê û nifşen nû de, ji nû ve, têne pê û hingê nifşen nû dikarin xwe li tarixa xwe bigihînin, hîn xurttir lê hûr bin û bêtir serwext bin. Ji bo ku gotinêni min çewt neyên fahmkirin, ez divê, li vê derê, paragrafek vekim;

Nasîn û zanîna tarîxê, ne nasîn û zanîna reqemên hin tarixan e ku hingê hin hedise qewimîne. Tarîx, bûyer, raperîn, serîhildan, şikestin, lebat û herikîna civatê ye. Yanê yekgirêdana wan e, mozayikek ji wan e. Ew ne bi tenê ji rastî û rindîyan û ne jî bi tenê ji xirabî û çewtiyan hatiye pê. Ev hemû di nav tarîxê de hene. Ji bûyereke tarîxi dikare pir encam û havilêne cihêderkevinMeriv li gora zanîn, metod û nêrînen xwe, ders û havilan ji tarîxê derdixe. Loma jî, gava ez dibêjîm ku em tarîxê bizanibin û lê vegezin, ev gotina min nayê wê manê ku em divê tarîxê, bi her awayî bipesînin. Mîna tarixêni hemû gelan, di tarixa me de jî rastî-çewti, rindî-xirabî di gel hev de ne. Ji bo me, ya girîngitîn, zanebûna wan hemûyan e, zanîna tarîxê û yekseriya wê ye. Gelo em ê xwe bi kijan havil, encam û dersan

bigihînin, ci jê derxin? Ev yeka êdî bi nêrin û pîvekên me ve girêdayî ye. Lê belê, zanîn û zanebûn hewce ye. Berî her tiştî zanîn pêwist e.

Derdê zanînê ne bi tenê derdê me yê iroyin e. Do jî her wisan bûye. Celadet Bedirxan Beg di nivîsara xwe ya bi navê *Sê Tarîxên HAWAR'ê*, 15 Gulan 1932-18 Tebax 1935-15 Nisan 1941 de (hejmar 27, 15 Nisan 1941) weha dînivîse;

*"Ev bend ji alîkî dîrokiya HAWAR'ê, ji aliyê din proniwîsa xebata me ye. Beriya ku ez vê biqedinim, herwekî di destpêkê de min gili û gazindên xwe ji kurdên zana û nezana kir, di xelasê de jî, ez ê wezîfên wan jî nû ve pêş wan bikim. Tiştê ko min divê ez ji we re bibêjim, bi kurtî ev e:*

*Hîn bin. Hîn bin. Hîn bin.  
Hîn bin. Hîn bin. Hîn bin"*

Dîsan dî eynî hejmarê de, bermaliya Celadet Bedirxan Beg, Rewşen Bedirxan jî, ji jin û keçen kurdan re weha dînivîse:

*"Xwehîn min ên delal, herwekî hon jî dizanîn derdê miletê me yê mezîn û xedar nezanî ye. Nezanî nexweşiyek e, dermanê wê zanîn e. Nik miletên xwudan hikumet û teşkilat vê nexweşiyê di xestexaneyine xisûsi de derman dikin û ji wan xestexanan re dibistan dibêjin. Mamoste, bijîskên wê xestexaneyê ne.*

*Miletê me ne xwedîyê van xestexanan e. Miletê me, miletekî bê teşkilat, bê xwedî û serî, miletekî bela vala ye. Lê dijminê me yê mezîn, ê meztir nezanî ye."*

Nezanî... welê dixuye, mîna îro, do jî nezanî dijmineke mezîn bûye. Zanîn, zanebûn... yek ji dermanêne me yêngîn e. Û ez bawer im, hê demeke dirêj jî, em ê ji derdê nezaniyê (kêmâniya zanînê) binalin.

#### IV

Li vê derê, me şerhek li ser zanîn û zanebûnê divê;

dema meriv li ser zanîn û zanebûnê dipeyive, dinivîse, divê nekeve nav şâşîyeke mezin. Sînor û çarçewêن zanînê ne berbiçav in. Ew li gora kes, hêz, kategori, cîh, dewr û wextan têñ guhertin.

Zanîn û zanebûn... Lê li gora kê û çî?

Her meriv li gora xwe, xebat û têkiliyên xwe zane ye. Ew hin tiştan dizane, hin tiştan diafirîne û hin tiştan bi rê dixîne. Herkes di warê xwe bîrewer e... şivan di şivaniya xwe de, nivîskar di nivîskariya xwe de, necar di necariya xwe de, ramangir di ramanêñ xwe de, pêşmerge di pêşmergetiya xwe de û mamoste di mamostetiya xwe de zana ye. Ne şivan ji nivîskar biçüktir e û ne jî ramangir û serok ji necar mezintir e. Şivanekî ji nivîskarekî hezar car çêtir çere, avdan û beriya pêz dizane, hezar car çêtir bi stranêñ kurdî dizane û li bilûrê dixe. Lê herweha şivan jî ji nivîskar ne hêjatir yan mezintir e. Hemû kes di civatê de xwedî rolek e, herkes fonksiyonek bi cîh tîne.

Ronakbîr û sosyalistê italî Antonio Gramsci di vî warê de weha dinivîse; "her meriv karekî ronakbîri bi cîh tîne. Anglo meriv bi xwe feylesof, hunermend û xwedî daxwaz û miraz e..."

Ji ber vê yekê, meriv divê xwe ji pozbilindî û fortêñ ne di cîh de biparêze. Meriv divê xwe mezin nebîne û bi nizmahî li kesî nenihêre. Li gora pêşmerge, ramangirekî di warê şer, êris û xwe parastina çekdari de nezan e. Li gora ramangir jî, pêşmerge di warê fikir, ideolojî û ramanan de nezan e. Lê di esasê xwe de, herdu jî zana ne. Û bi hevkariya herdulan, hêz û quwetek tê pê.

Û tiştekî din; ew kesê ku di warê xwe herî zana ye jî, heta radeyekê, nezan e. Ji ber ku pîvan û sînorêñ zanînê nîn in.

Lê belê, eger em vejerin ser meselê, merama min a li ser zanîn û zanebûnê, zanebûneke civakî ye. Yanê tiştêñ ku dikarin civatek bi pêş ve bixin û pêla zanebûna civatê berztir bikin. Herweha, gotinêñ min,

ji bo kesên ku xwedî rol û fonksiyoneke civakî ne.  
Dîsan A. Gramci li ser vê yekê weha dinivîse,

*"Hemû kes zana ye... lê herkes bi qasî ronakbîran ne xwedî roleke civakî ye."*

Baş e, zanîn û zanebûn bi xwe çi ne? Ew cawan tênafirandin, derdikevin holê, çawan di kom, ref û kategoriyên civatê de bi cih dibin û bi şax û ber dibin?.. Bi qasî ku ez dizanim, civat yekgirtina hal, hewal û rewsên têvel û têkel e. Rewş, merc û şettên cuda civatê pêk tîne. Di van rewş û hoyêncurbecur de meriv bi rolên cuda, ji bo armancêna cuda besdarî li tevgera civakî dikan, tecrubenin bi dest dixînin. Di her civatê de, rewş, hal û şertên ji hev pir cihê hene û piraniya merivan, kêm yan zêde, bivê nevê, di nav van rewş û şertan de ne. Di civateke mîna ya me paştemayî û bindest de, rewş, hal, hoy ne ewçend ji hev cihê û rengareng in. Ew pir bi sînor in û bi hev dimîni. Yanê rewş, hal û hoyêncurbecur de merivan ya civatê Kêm û bi sînor e. Bê guman, besdariya civakî li gora çarçewa rewş, hal û hoyan e.

Binyat, jêder û kahniya zanîn û zanebûnê besdariya merivan ya civakî ye. Meriv bi hin şêwe û awayan li civatê besdarî dike û hin tecruban tîne pê, bi vî awayî zanîn û zanebûnê diafîrîne û civatê dewlementir dike.

Meriv dikare bibêje ku pêkanîn û afîrîna tecruban ku bingeha zanînê ye, bi du şêweyan tê pê; yek, meriv bi xwe di civatê de besdar e û bi besdariya xwe hin tecruben şexsi tîne pê û bi vî awayî zanîneke şexsi û xweser diafîrîne. Bê şik, nêrîn, nêzbûn, fantazî û daxwazên meriv bi xwe jî pergalenafrîna zanîna şexsi ne. Zanîneke weha şexsi "dewlemendîyeke nêrînê û perspektiveke bîrbirînê" dide merivan. Meriv bi vê dewlemendi û perspektivê li bûyeran û hawirdora xwe dinihêre. Hin kesên ku rol û besdariya wan a civakî cuda ne, dikarin bi awayekî pir cihê li bûyerekê binihêrin û li hember wê bûyera taybetî xwedî awir û

fikrên ji hev pir cihê bin. Loma jî, meriv dikare bibêje ku riyêñ bi destxistina zanînê ji hev cihê ne.

Şêwê din ê pêkanîna tecruban û afirîna zanînê jî, der û dor e. Meriv bi dan û standinën xwe yên civakî jî dibe xwedî zanînekê. Herwekî ku tê zanîn, meriv di civatê de ne bi tana serê xwe ye. Civat kollektîv e, tê de endamên din jî hene. Meriv bi van endamên din ên civatê re dijî, bi wan re ye; bi wan re dipeyive, radibe, rûdine, dan û standinën curbecur tîne pê, dixebite û bi wan re diafirîne. Meriv ji bîr û bawerî, fikir û dîtinên wan tiştên nû werdigire û yên xwe jî dide wan. bi vî awayî, zanîn her û her diafire, vedikêşe û vedije. Yanê bi alîkariya mesaj, sembol û pergalên civakî, meriv zanînê werdigire û dide.

Perspektîv û mesajên civakî du aliyên zanîn û zanebûnê ne. Bi perspektîv û mesajan, meriv tişt, bûyer û rewşen cihê qebûl dike yan jî red dike, lê beşdarî dike yan nake, dibe xwedî pêşniyar, bi pêş ve dixîne, diguherîne û her gav sentezên nû diafirîne. Li vê derê, em dikarin bibêjin ku kultur yekitiya perspektiv û mesajên civakî ye jî. Yanê ew, zanîn û zanebûna yekgirtî ye. Di kulturekê de, hin alî û warêñ kultûri ne bi tenê ji aliyê keseki, lê belê herweha ji aliyê hin kes û hêzên din ên civatê jî têñ zanîn. Ev yeka, bi baweriya min, ji bo ragihandina mesaj û daxwazan gelek girîng e. Ji ber ku mesaj û daxwazên ku meriv bi rê dike, divê bi cihê xwe bigihêñ. Wekheviya kultûri di eynî wextê de tê mana wekheviya meraq, daxwaz û pîvekan jî. Kultur û tevgera kultûri di nav dan û standinën weha xurt de ne ku tê de meriv, bivê nevê, tecrube û zanînên xwe radigihîne hinekan, tecrube û zanînên hinekan werdigire û bi alîkariya ders û tecrûbêñ dervayî xwe, form û şekil dide tecrube û zanîna xwe.

Lê em divê ji bîr nekin ku, di welat û civatên mîna me bindest û paştemayî de, ji ber kîmaniya zanîn, tecrube û perspektivên ji hev cuda, meriv mesajan hîn hêasantir werdigire. Iknakirin û bi rêkxistina merivan hîn

hêasantir e.

## V

Belê, em niha careke din li serê rawestin; di welatên wekî yê me paştemayî û bindest de, beşdariya merivan ya civatê pir kêm û pir bi sînor e. ji ber ku civat ne aktiv e û ne piralî ye û hal, rewş û hoyêن cuda tê de kêm in. Encam û havilên vê yekê, bê guman, kêmanî û bi sînorbûna perspektiv û mesajan e. Yanê di welatê me de şert, merc, hoy û rewşen curbecur kêm in, loma jî tecrube, zanîn/zanebûn, perspektiv û mejasên curbecur kêm in. Pêla zanebûnê nizm e. Em mesajên hevûdu bi hêsanî werdigirin. Em bi çend gotinên sivik, hîç û pûç dikarin hevûdu ikna bikin û ji bo tiştên herî nexweş hevûdu bi rê xînin. Di vê pêla nizm de, em, kêm zêde mîna hev in. Zanîn û zanebûna me ya yekgirtî û muşterek li ser hîm û beşdariyên bi sînor yêن civakî ava bûye. Û loma jî hem çarçewa wê û hem jî naveroka wê pir teng e.

Rola ronakbîrên kurd jî di vê noktê de pir girîng e. Pêla zanebûna welatê me nizm e. Ji ber sebebêñ jorîn, çarçewa wê teng e. Ronakbîr jî di vê niqtê de divê li dijî van kêmanî û nizmahiyan rawestin. Wezîfa wan avakirina xebat û tevgerêñ ronakbîrî ye da ku pêla zanînê berz be. qehîm be, kûr û xurt be. Wezîfa wan, zêdekirina şert, merc, hoy, hal û rewşen civakî; bêtirkirina beşdariya merivan ya civakî; bi destxistina tecrubêñ nû û curbecur û zêdekirina perspektiv û mesajên curbecur e.

Erk û wezîfa ronakbîrên kurd ew e ku ew bikaribin çarçewa zanîn û zanebûna kurdî firehtir bikin, pêla zanîn û zanebûnê bilindtir bikin... Heta ku hal, hoy û rewşen cihê di civatê de zêde nebin, meriv bêtir beşdarî li tevger, merc, şert û rewşen civakî kenin û heta tecrube, perspektiv û mesajên nû û curbecur zêde nebin, civat tu carî nikare hevsarê nezanî, neçarî û bindestiyê biqetîne. Civatêb paştemayî û bindest, civatêñ girtî,

nexweş û cemidî ne. Ne bi tenê ji aliyê aborî, herweha ji aliyê bîr, fikir, raman, bawerî ji, ew paşteemayî ne. Ew mîna ava ron in, naherikin. Ji ber vê yekê ye ku meriv bi hêsanî mesajên basid ên hevûdu werdigirin û tiştên ne işe aqilan dikan.

Meriv bi hêsanî mesajên basid, sivik û ji aliyê zanînê ve pir qels werdigirin. Le ev nayÂê wê manê ku civat bi pêş ve dere. Naxêr, pêşveketin bi tenê, bi sentezênu ku dikarin biguherînin û bi harmoniya hal, rewş û şertênu cuda mumkin e.

Belê, gotina min ev e; me sentezênu curbecur û nû ku maqûl in, demokratik in, li pey avakirina civateke rengareng in, divê... Ev celeb bîr, fikir û sentez ku dikarin me, gelê me, welatê me bi pêş ve bibe, hewce ne. Di vî warî de, ronakbîrênu kurd divê bi rol û wezîfa xwe rabin û wan bi cih binin. Heta iro, li her derî, ronakbîr xwediyê sê esasan bûye;

**1-** Ronakbîr dan û standineke xurt, kûr û fireh bi civat, gel û kultura xwe re aniye pê. Ewî bi his û mîjî, bi daxwaz û xebata xwe civat, gel û kultura xwe jiwaye.

**2-** Ronakbîr rêberiya bîr, fikir, raman û dan û standinênu kirine. Ger pratiki, ger fikri. Dan û standina ronakbîrê nûjen, her gav, bi ifşen kevn ên ronakbîran re hebûye. Lî ew mîna wan nebûye, li ser riya wan, lê ji wan cihê bûye. Wî hem nifşen kevn parastiye (ji ber kirin, eser û berhemên wan ên baş û qenc) û hem jî rexnegir bûye (ji ber kîmanî û çewtiyên wan).

**3-** Ronakbîr her gav, bi ronakbîrênu din re, dan û standineke xurt û pozitîv aniye pê, ji wan dîtin û mesaj wergirtine û mesajên bîr û bawerîya xwe ragihandiye wan. Bi alikariya sentez, organ, muesese û rêkxistinan, hemû bi hev re, wan "zanebûna yekgirtî" bi pêş ve birine.

Bi van yekan û yen din ên mîna van, ronakbîran, li her aliyê dinê, rola xwe ya bîrewerî û civakî bi cih anîne... Bi bawerîya min, ji ronakbîrênu kurdan re jî ev

yenek divêne.

Li jorê min gor ku di civata me de bîr, dîtin, mesaj û perspektiv bi sînor in. Ev yeka ji bo ronakbîrên Kurdistana bakur jî rast e. Ew jî tê de ne. Sedemên kêmeanî û bi sînorbûnê ber bi çav in; zordariya dewletê. Zordariya dewletê rê li herikîna civata me girtiye. Ji pir û pir mêt ve ye ku herikîna civata kurdî giran û hêdiye. Ronakbîrên me jî fekiyên herikînên civakî yên welatê me ne.

Bê guman, heta ew bendênu ku rê li herikînên civakî yên welatê me girtine, neyên têkdan, herikînên xurt, serbest û azad bi cih nabin. Ji ber vê yekê, rê, rêkxistin û bernamên siyasî pir pêwist in. Le, herwekî tê zanîn, heta tevger, rêkxistin û bernamên siyasî ji aliyê xebat û besdariyên din ên civakî neyên tahmdan û têkûzkirin, tu havil bi dest nakeve, ked vala dere. Jixwe giringiya besdariya civakî, ronakbîrî û çandî di vir de ye.

Ji bo her tiştî bername, plan û program divê... Ji ziman, tarix, edebiyat, çand, huner, musik, xebat û lêkolînên civakî, tevgerên jin, xort, kal û pîr û meslekî û h.w.d. re bername û xebat divê. Li gora her aliyê civatê, xebatêna pîralî divê. Ev, destpêka pîralibûnê ye. Bi tenê, bi vî awayî, besdarî, tecrube, perspektiv, mesaj û zanînên curbecur derdikevin holê. û bi tenê hingê "zanebûna yekgirtî" dikare bibe pîralî û xurt. Hingê pêla wê bilind dibe û çarçewa wê fireh dibe. Bi kurtebirî; berî hewr tiştî bername, plan û programên civakî, çandî, edebî, siyasî. Piştre, li gora wan, xebat û besdariyên curbecur û bi dû re jî, encam, netice û havilên curbecur ku "zanebûna me ya yekgirtî" bilind dike...

Mebesa min bi van rêzan ev e; diyalog û pêwistiya diyalogan...

#### IV

Yek ji aliyêna baş ên zimanê kurdî, rakêşana peyv û gotinan e. Peyv û gotin hevûdu radikêşînin û bi

alikariya lêker, girêk, daçek û qertavan, di cihêن cuda de, bi manayên cuda, têن bikaranîn. Mesela gotina kar. Kar bi alikariya "alî" dibe alikar, bi alikariya "hev" dibe hevkar, bi alikariya "bi" û "anîn"ê dibe bikaranîn, bi alikariya "cot"ê dibe cotkar... Kemal Badili'yê rehmetî di kitaba xwe ya bi navê "Kürtçe Grameri", 1965, de baş nîşan dide.

Hevpeyvîn jî yek ji wan peyvîn rakêşandî ye. Hevpeyvîn bi gelempêri di cihê interwiu'ya awrûpayî de tê bikaranîn. Helbet, ew di dewsa interwiu'yê de jî dikare were bikaranîn. Lê, gelo meriv vê gotinê di dewsa diyalogê de jî nikare bi kar bîne?..

Belê, me diyalog divê. Ji kes, hêz, tevger, çin û kategoriyên Kurdistanê re diyalog divê. Û bi taybeti jî ji ronakbîrên kurdan re diyalog divê. Welatê me ji bo her tiştî hewcedarê diyalogan e. Û ji ber rolêن xwe yêن civakî, ji her kesî bêtir, ronakbîrên kurd hewcedarê diyalogan in.

Ronakbîr ew aliyê xwe yê siyemîn ku min li jorê qal kiribû, bi alikariya diyalogan bi cih tîne. Me got, ji me re bername, besdarî, tecrube, perspektîv û mesajên curbecur hewce ne. Lê bi qasî van, diyalogjî hewce ye, pêwist e. Eger di navbera van tişt û tevgerên curbecur de diyalog tune be, hingê disan "zanebûna yekgirtî" bi pêş ve nare. Ji lewre, sentezêن nû û konstruktiv dernakevin. Di welatêن paştemayî û bindest de, meriv mesajên hevûdu bi hêsanî ji hev werdigire, lê bêyî sentez, netice, encam û havilêن nû...

Di navbera tiştêن curbecur de, dan û standinêن xurt pêwist in. Erk û wezîfa vê yekê jî li ser milê ronakbîran e. Ronakbîr, bi rolêن xwe yêن civakî, rêberêن civatê ne. Berî herkesî, ronakbîr divê di navbera xwe de diyalogeke xurt û jîndar pêk bînin. Heta ronakbîr di navbera xwe de diyalogan ava nekin, ew nikarin di navbera kes û hêzên din de jî diyalogan bînin pê. Ji ber ku, digel berberî û dijîtiyêن xwe, disan ew di civatê de katagoriyeke pir girîng in.

Ronakbir, bêyi diyalogên jîndar, nikare bibe ronakbir. Hingê aliyekî wî/wê kêm e. Rast e, gava ronakbir eser û berhemên xwe diafirîne, ew bi tena serê xwe ye. Ew bi tenê diafirîne. Lê li milê din jî ew bi dinya derve re di nav dan û standineke xurt de ye. Bi tenê diyalogên jîndar û xurt dikarin rê li afirîna eser û berhemên hêja veke. Yanê ronakbir divê, bi baweriya min, li milekî ronakbirekî xweser be û li milekî ji ronakbirekî yekgirtî û kollektîv be. Bala wî/wê li derve be, ew mesajên der û dora xwe û yên dervayî xwe werbigire, wan bikole, lê hûr be û bi kar bîne.

Bê guman, dan û standin û diyalog bi têkiliyên şexsî ava nabin. Meriv çiqas jîr dibe bila bibe, ew nikare her kesî bibîne, xwe bi her derî bilezîne û her erk û wezifê bi cih bîne. Naxêr, li serê cîhanê, hê tu kes evcendbihêz û zîrek nebûye. Rê û şêweyên diyalogê cihê ne; weşan, organ, enstitusyon, konferans, tevger, rêkxistin... Bi riya van, ronakbir dikarin bi hev re û bi derveyî xwe re diyalogan bînin pê.

Di heyama me ya nûjen de, meriv diyalogên fikirî, siyasî, çandî, edebî û civakî bi alîkariya organ û rêkxistinan ava dike û bi rê dixe. Ev organ û muesese ew cih û war in ku tê de diyalogên ku "zanebûna yekgirtî" bi pêş ve dixîne, têن pê.

Di dawiya nivîsara xwe de, ez divê, ji bo diyalogên weha, li gora baweriya xwe, şertên pêwist jî binivîsim; demokrasi û tolerans. Yanê ji bo ku diyalogên bikêr û hêja li dar bikevin, em divê demokrat bin û xwedî toleransê bin.

Îlon, 1983

## **Guherînên cîhanê û kurd**

Berî niha bi çendekê şâirê ereb Adonis hatibû Swêdê. Kitêba wî «Aghani Mihyar ad-Dimashqi» bi swêdî derketibû û Adonis ku ji Sûriyê ye, li Lubnanê demeke dirêj jiyaye û niha li sîrgûnê, li Parîsê dijî, bi hincêta weşîna kitaba xwe hatibû Swêdê. Şevekê ez, Adonis, nivîskarê tîrk Demir Özlü û şâirê kurd Şêrko Bêkes li restoranekê li hev civiyan û li ser hal û hewalê cîhanê û Rojhelata Navîn hinekî peyivîn. Tiştên ku ji wê sohbeta xweş û germ derdiketin, ev bûn;

- Cîhan ji binî ve diguhere. Rûpeleke tarîxê tê girtin, rûpeleke nû vedibe. Ew blok û sîstemên ku heta niha cîhanê di navbera xwe de parve kiribûn, hêdî hêdî têk derin. Hîmîn peyman û lihevhatinên mîna Sykes-Picot, Lozane, Molotov-Ribbentrop, Yalta, Tehran, Potsdame hildiweşin û rê li peymanên nû vedibin.

- Di vê guherîna mezin de mêtî, bîr û bawerî, nêrîn û pîvan jî diguherin. Nêrîn û pîvanên ku me heta niha pê tevgerên xwe bi rê dixistin, diguherin. Termên wekî pêşverûtî, paşverûtî, merivahî, demokrasî, hevaltî û biratî, enternasyonalism û h.w.d. şekil û naverok diguherînin.

- Ev guherîna gerdûnî dê -bivê, nevê- tesîr li navçeyê ku em, kurd, ereb, tîrk, faris, cihû tê de dijîn, bike û navçe û rewşa iroyin ya navçê dê hêdî hêdî biguhere. Lî belê, ev guherînên ku dê li Rojhelata Navîn biqewimin, mîna guherînên Rojhelata Ewrûpayê nebin. Herwekî ku tê zanîn, di guherînên Rojhelata Ewrûpayê de, ji Romanyayê pê ve, li tu derî xwîn nerîjiya û ev guherîn bi şêweyekî demokratîk hatin pê. Lî, li Rojheleta Navîn

ku warê neçarı, paştemayin, anti-demokratizm, bêgavî û zordar û diktatorên biçûk e, dê xwîn birije. Ji ber sedemên tarixî, dîni, siyasi û civakî, guherînên Rojhelata Navîn dê bi xwîn be û mîna hêlekanekê hemû navçe bihejîne.

- Meriv divê ji bo van guherînan hazır be da ku çaxa pêla guherînan rabû, meriv di binî de nefetise û li ber pêlê nere. Berî herkesî jî kurdên bêdewlet, bêquwet û jihevketî divê hazır bin.

«Kurd divê hazır bin...» Lê çawan? Bi ci awayî? Ci divê? Meriv divê ci bike?..

\*\*\*

Du roj bi dû wê şeva xweş re, serê min bi wê sohbata bisûd û bi pirsên jorîn tijî, ez çûm konferanseke navneteweyî [21-23.09.90] ku PEN-kluba Swêdê amade kiribû. Gelek nivîskar û ronakbir, swêdî, danmarkî, finî, amerîka-latînî, afrikayî, rus, çînî, poloni, letoni, ermen, ereb, faris û kurd, li wê derê gîhiştibûn hev. Yek ji babetên konferansê «Guherînên cihanê û rewşa zimanên bindest û biçûk» bû.

Gava li ser vê babetê hat peyivîn, bê guman, li ser zimanê kurdî û rewşa zimanê kurdî jî gelek tişt hatin gotin. Zimanê kurdî ne zimanekî biçûk e, ew zimanekî kevn e û ji aliyê 20 milyon merivî tê peyivîn. Ji bo pêşxistin û nûkîrina zimanê kurdî gelek tişt jî çêbûne. Herwekî dr. Kemal Fuat di nivîsara xwe «The origins, development and state of the Kurdish language» [Yearbook of The Kurdish Academy 1990, hejmar 1] de behs dike, ronakbirê kurdan hewl dane ku zimanê xwe yê zîkmakî bi pêş xînin. Bi taybetî Tewfik Wehbî [1891-1984] û Celadet Bedirxan[1892-1951] di warê zimanzanistiya kurdî de, Abdullah Goran[1904-1962] di warê zimanê şîr de û İbrahim Ehmed[1914-] di warê zimanê pexşan de xebatên hêja kirine û berhemên baş derxistine. Lê digel vê çendê, zimanê kurdî zimanekî perçiqî, bindest, jihevketî û paştemayî ye. Ji ber rewşa siyasi ya welatê Kurdistanê, zimanê kurdî rê nabîne ku

xwe bi heyama nû bigihine, xwe nû bike û nîrê jihevketitî û paştemayinê ji ser xwe bavêje. Lê ev rewş dê heta kengê dewam bike? Di vê guherînên mezin de cihê zimanê kurdî li kû ye? Çi rê û şans li ber zimanê kurdî hene? Ji bo avêtina nîrê kambax yê jihevketin û paştemayinê çi divê? Zimanzan, ronakbîr, nivîskar û rojnamevanên kurd divê çi bikin? Cihan û ronakbîr û nivîskarên cîhanê ji bo zimanê kurdî divê çi bikin?.. Ev jî, dîsan, çend pîrsiyar bûn ku li konferansê hatin pêş. Û ev pîrsiyar îroj çendin ji wan pîrsiyarêñ herî girîng in ku li ber me ne û jê re bersîv û xebat divê.

\*\*\*

Bi kurtebirî, cîhan bi lez û bez diguhere û her tişt ser û binê hev dibe. Cîhana kevnar û pîr kirasekî nû li xwe dike. U herkes li her aliyê cîhanê serê xwe bi van guherînan diêşîne û hazırlı pêşerojê dike. Bi qasî ku ez dibînim, di vî xebatê fikirî û kirdeyî yê haziriyan de li tarîxa xwe vegeŕin cîheki esası werdigire. Herkes li xwe û tarîxa xwe vedigere. Herkes li xwe, hebûn, huwyet, ziman û çanda xwe vedigere. Gelên Baltikî bi doza welat, ziman û çandêñ xwe radibin. Baskî, katalanî û galisî dixwazîn masfîn xwe yêñ neteweyî firehtir û kûrtir bikin. Fransizên Kanadayê û flamanên Beljîkî ji bo parastîn û pêşvexistina ziman û çanda xwe qanûnên nû tînin pê. Meksîkayî li hember nîrê zimanê amerîkayî/îngilizî tedbîrîn nû distînin. Gelên biçûk yêñ Yekitiya Sowyetê, macarêñ Romanyayê, korsîkayiyêñ Fransayê, tîrkîn Bulgaristanê, arnawutêñ Yugoslavyayê, ermenêñ Qafqasyayê, tîbetiyêñ Çinê, erîtreyiyêñ Hebeşistanê, berberiyêñ welatêñ Mixribê û gel û neteweyêñ din yêñ bindest bi doza masfîn xwe radibin û ji bo avakirina pêşerojeke çêtir û ewletir li tarîxa xwe vedigerin.

Li xwe û tarîxa xwe vegeŕin ji ber gelek sedeman pêwist e. Sistem û blokêñ ku îro hene û cîhanê di nav xwe de parve kirine, li ser neheqîyan, li ser xwîna gelek netewe û gelî, li ser perçekirina gelek welatan ava bûne.

Dengê gelek gelî hatiye birin, bi darê zorê perda nizmahî, tirs, bêdengî û bêxîretiyê li ser gelek neteweyî hatiye rakişandin. Tarixa gelek gelî hatiye guhertin, gelek gel û netewe ji tarixa cihanê hatine derxistin û avêtin. Ew peyman û lihevhatinên ku di navbera serdestan de hatine pê, şekil û düzaneke nû dabû cihanê. Lê li ser neheqiyên pir û pir mezin. Tarix bi neqeziyan tijî ye. Neheqiyên tarîxi têñ pê û diqewimin. Lê ev neheqî tu carî ji bîr nabin û heta ev neheqî rast nebin, birin necebîrin merivahî, tarix û wext her û her bi birîn e, bi kul e.

Guherînên roja me rê dide ku neheqiyên tarîxi ji meydanê rabin û kul û birînên merivahî û tarîxê bicebirin. Saîr û nivîskarê meksîkî Octavio Paz di berhemâ xwe «*Le Labyrinthe de la solitude*» [Xaçeriya Tenêtiyê] de dibêje ku ziman, gel û neteweyên bindest her gav di kêleka tarîxê de jiyane. Welat û dewletên mezin û serdest rê nedane ku ev ziman, gel û neteweyên bindest roleke navendî di avakirina tarîxê de bilizin. Rola navendî ya welat û dewletên mezin û serdest bûye.

Lê îroj, guherînên cihanê rê dide ku ev ziman, gel û neteweyên bindest roleke navendî di avakirina tarixa pêşerojê de bilizin. Di tarixa merivahiyê de, heye ku ev cara yekemin e ku ev gel evçend nêzîkahî li fersend û imkanên guherîna qedera xwe dîkin. Ji ber vê yekê herkes li tarîxa xwe vedigere da ku bikaribe doza huwiyyeta xwe bike û bikaribe roleke navendî di tarixa pêşerojê de bilize.

Li gora gelek pispor û zaneyan, dinya îroj ber bi desentralizasyoneke bingehîn diçe. Desentralizasyonek ku neheqiyên tarixi ji holê radike û ewlehiyekî metîn ji bo mafêñ gelên bindest û biçûk tîne pê û rê dide ku ev gel û netewe bikaribe, bi rastî, «*Danezana Gerdûnî ya Mafêñ Merivan*» di jiyana xwe ya civakî û siyasi de bi cih bîne. Nemaze bendên 2. û 21. ku li ser mafêñ serbestiya kesan û neteweyan in.

Lê li vê derê tişteki heye; ji bo ku gel û neteweyên biçûk

û bindest bigihêن van mafan, ew divê bi yek bin. Her netewe divê yekitiyeke metîn û bi quwet bîne pê, daxwazêن xwe yên neteweyî zelal bike û bi her awayî yekitî û hêza xwe nîşan bide. Ji ber ku zimanê navneteweyî yê çareserkirina mesele, kosp û astengan hê jî zimanê yekitî û hêz û quwetê ye.

Gelo kurd di vî warî de li kû ne? Ew di kîjan konaxî de ne û çi dîkin?

\*\*\*

Rewşa kurdan li ber çavan e, jê re gotinêن dirêj navê. Ji bervajiyê pêşveçûn û guherînêن cîhanê, rewşa kurdan ne tu rewş e. Ji bervajiyê yekitî, hêz û quwetekî yekgirtî, kurd di her warî de ji hev ketine û nikarin xebat, gotin û daxwazin xwe yên curbecur bikin yek. Ez ne bawer im ku ji vê rastiya tahl re misal hewce ne. Di rewşeke weha de, tirsa min[û tirsa gelek kesên din] ew e ku kurd dîsan ji pêşketin û guherînêن gerdûnî bêpar bimînin û gava pêla guherinan li navçeyê rabe, ew li ber lingan biçin. Eynî mîna heyema şerê yekemîn yê cîhanê. Hingê jî cîhan bi lez guherî. Lê ji ber perçebûna piralî, kurd nikarîbûn bigihîştina masêن xwe. Dewsâ ku em bigihijin masêن xwe, welatê Kurdistanê bû goristan, bi qasî nîv milyonî kurd hatin kuştin û pişta welêt şikest, ew bû çar perçe.

Bi hêviya ku tarîx dubare nebe, min dil heye vê nivîsarê bi du rêzêن Adonis biqedinim;

*«Ji şevêن avis re*

*ez iwellatekî diafirînim ji xweliya tarîxê»*

**Armanç, hej. 109**

## Huwiyeta Neteweyî

Li ser pirsa huwyeta neteweyî peyivîn hem pir hêsan, hem pir zehmet e. Pir hêsan e, ji ber ku em hemû dizanin ku her netewe xwediyê ziman, çand, tarîx û wenatekî xweser e. Ev mefhûm jî bingehênu huwyeta neteweyî ye. Pir zehmet e, ji ber ku meriv nikare, bi çend gotinan yan jî bi çend "şerhên" sathî bersîva pirsên Em kî ne? Em ci ne? Em ji kû tênu ber kû derin? bide.

Yek ji wan niviskar û filizofênu ku serê xwe bi pirsên weha û bi mesela huwyeta neteweyî diêşîne, niviskarê meksîkî Octavio Paz e. Herweki ku tê zanîn, vî niviskar û şairê giranbiha îsal xelata Nobelê ji wergirt. Ji ber ku bi hênceta xelata Nobelê, li ser Octavio Paz pir hatiye nivisîn, min dil tune ku ez li ser jiyan, berhem û şâriya wî binivîsim. Lê belê, gava meriv li ser huwyet û şexsiyeta neteweyekî dipeyive, bivê nevê, heşê merivan diçe ser ger û lêgerîna Octavio Paz. Ji ber ku niviskarı û şâriya Octavio Paz li ser gera huwyetekî neteweyî û daxwaza şexsiyet, ziman, tarîx û çandeke xweser ava bûye. Jiyana wî bi vê ger û lêgerinê pêçayî ye. Di her nivisar, şîr û berhema wî de şopênu vê ger û lêgerinê hene. Ev şêşt sal in ku wî daye ser riya xwenasîn, li xwe xwedi derketin û xwe nûkirinê.

Octavio Paz meksîkî ye, yanê mensûbê neteweyekî bindest û wenatekî perçiqî ye. Bi hatina spanyoliyan trajediya tarixa Meksîkayê dest pê kir. Eynî mîna tiştên ku bi serê kurdan de hatine, spanyoliyan bi serê Meksîkayê de anîn; bi darê zorê welatê Aztek û Inkan ku bav û kalênu Octavio Paz bûn, vegirtin û ji ziman heta adet û ûsilênu xwe, her tiştên xwe li ser serê xelkê

Meksikayê ferz kirin. Zimanê gelê Meksikayê winda bû, medeniyeta wan a bedew û dewlemend ji hev ket, rûpelên tarîxa wan a kevnare hatin girtin û bi destê spanyoliyan rûpelên nû ku reş û kirêt bûn, hatin nivisîn, şexsiyet û huwiyyeta meksîkî bi dengê tifing û topêñ spanyoli hate perçiqandin û merivê meksîkî bû stûxwar, bêçare û bindest.

Ü bi dû keft û lesta sedsalan û tarîxeke dirêj ji xwîn, xwîdan û hêşirên çavan re, iro jî, Meksîka û ziman, çand û huwiyyeta neteweyî ya meksîkî di bin nîrê cîranê xwe yê mezin Yekitiya Amerikayê de ye... Ma nivîskar û şâîrê vî welatê perçiqî û lawê vê tarîxa trajîk Octavio Paz nekeve pey hebûn û xweseriya welat, tarîx û gelê xwe, gelo hingê kî dê bikeve pey? Ne bi tenê Octavio Paz, lê herweha Carlos Fountes û gelek nivîskar û ronakbîrên meksîkî jî bi eynî wezifê rabûne û bi heyecan û daxwazeke bêwest û bêrawest ketine pey pîrsiyarên mîna Em kî ne, Em çi ne, Em ji kû têñ û ber bi kû derin?..

\*\*\*

Yek ji wesif û xusûsiyetên herî mezin ên ronakbîran ew e ku ew bi kar û berhemên xwe bibin dengê mîjî û dilê welatê xwe, zimanê hîs û bîrên gelê xwe, çavê hal û hewalê tarîxa xwe û niwênerê yekemîn û metîn ê huwiyyeta neteweyê xwe. Gava ronakbîr dikare bi vê rolê rabe û van karan bi cih bîne, hingê ew ronakbîr e. Ferqeke mezin di navbera ronakbîr û berdevkêñ xwenda de heye. Ronakbîr dipirse, diafirîne, li tarîxa xwe xwedî derdikeve, seyde û dahatûya welat û neteweyê xwe li ser her tiştî re digire, xwe perçeyekî tevgera gerdûnî ya merivahiyê dibîne. Herçî berdevk e, ew neafirîne, lê vediguhezîne, napirse, lê diparêze û dixwaze tarîx, çand û huwiyyeta neteweyê xwe têxe nav kirâsê teng ê xwediye bîr û baweriyêñ ku berdevk jê re berdevkî dike. Octavio Paz ji bo xwe û welatê xwe dibêje ku "aqilmendêñ navdar her tiştî û herweha ferqiyet û newekheviya me û Amerîka Başûr, bi tenê, bi termêñ

*ekonomîk izeh dikin û dibêjin; ew dewlemend û pêşketî, hûn neçar û paşketî ne... sebebê her tiştî jî ev e, ferqiyet jî ji vîr tê... na, ev yeka ne rast e, eger ev bîr rast be, hingê rol û giringiya tarîx, adet, tore û huwiyeta neteweyî li kû dimîne?"*

Tarîx, adet, tore û huwiyeta neteweyî hem ji bo do û iro, hem ji bo pêşerojê pêwist e. Ferqên ekonomîk li her aliyêñ dinê hene û encamên ferqên ekonomîk jî, bêguman, pir in. Lê ronakbirekî ku ketiye pey pîrsiyarêñ li dora huwiyet û şexsiyeta neteweyî, nikare rû ji tarîx, adet, tore, ziman û çanda welatê xwe bade. Ji ber ku tarîx reh û rêç e; adet û tore bîr û hîzr e; ziman û çand mîjî û ruh e. Gava wenatekî yan neteweyekî yan merivekî xwedîyê tarîx, adet, tore, ziman û çandeke xurt be, hingê tevgera wî jî xurt e. Ew bi xurtî pê li axê dike, bi xurtî dimeşe, bi xurtî difikire, bi xurtî diafîrisine. Ew bi xwe bawer e, zû tiştan ji hev derdixîne, pihêt bi stuyê neheqîyan digire, bi leza birûskê bîr bi tiştan dibe, ji xwe fedî nake, dikare yekitiya xwe ava bike, nabe berdevkê kesi û hebûn û xwesiriya xwe her tim diparêze.

\*\*\*

Gelo rewşa me kurdan, di vî warî de çawan e? Gelo ronakbîrêñ kurd di warê huwiyet û şexsiyeta neteweyî de ci dikin û li kîjan qonaxî ne?.. Berî niha bi çendekê, ez bi balafirê diçûm Parîsê. Min çend kitêb jî, ji bo rîwîtiyê, bi xwe re dibirin. Yek ji wan kitêban a Şahînê Bekirê Soreklî *Mehkemekirina Selahaddînê Eyûbî* bû. Gava balafir bi firê ket, min bîrayeke sar danî ber xwe û kitêba dostê xwe vekir û dest bi xwendinê kir. Kitaba biçûk şanoyeke [piyeseke] biçûk ku li ser hukimdarê îslamî Selahiddînê Eyûbî bû. Selahaddînê Eyûbî kurd bû, lê li kurdiya xwe xwedî derneketibû û bûbû şervanê dîn û ola îslamê û li hember xaçperestên Awrûpayê ola îslamê parastibû. Ew hukimdarékî jîr, têkoşerekî yeman ê îslamê bû. Wî ola îslamê parastibû, lê welatê xwe Kurdistanê û gelê xwe yê Kurd ji bîr kiribû. Ola

îslamê bi ser ketibû, lê welat û gelê wî ji hev ketibûn. J.B. Soreklî jî di piyesa xwe de Selahaddinê Eyûbî ji dewrên kevn wergirtibû û anîbû roja me, 1993, da ku wî mehkeme bike û jê bipirse, "Selahiddinê Eyûbî, we ji bo çi sûda gelê kurd nehanî ber çavan?"

Piyes bi zimanekî xweşik kêmaniya hîs û bîrên huwiyyeta neteweyî diyarı xwendevan dikir... ðcar sernavê kitêbê bala rîwiyê ku li kêleka min rûniştibû, kişand. Ew jî porreş bû û ji Stockholmê diçû Parisê. Em hinekî, bi zimanê swêdî, bi hev re, li ser Selahiddinê Eyûbî peyivîn. Haya wî ji meselan hebû û ew merivekî serwext bû. Bi dû xeberdana bîskekê re, min jê pirsî ka ew ji kîjan welati bû. Wî pêşî got İran, paşê jî got Urmiye. Min jê pirsî û got, "ma Urmiye ne bajarekî kurdan e?" Wî got, "belê, ez kurd im jî. " Ew "jî" ya ku wî anî dawiya cimla xwe, ez êşandim. Herçend min bi bersîva wî dizanîbû, min dîsan jê pirsî, "çima jî?" Bersîva wî mîna min dipa bû; ew merivekî enternasyonal bû, mesela çînayetiyê ji mesela neteweyî gîringtir bû... Ev rewşa ku ne xerîbî min bû, agir bi dilê min xist. Rewş ne xerîbî min bû, ji ber ku min jî bi qîre qîra xwe ya li ser "sosyalizm û enternasyonalizmê" nefes li gelek kesan çikandibû. Bi dû re, piştî ku ez rastî ziman, çand, edebiyat û neteweyê din hatibûm, ez li xwe û ziman, çand, edebiyat û huwiyyeta xwe ya neteweyî vege riyabûm. Niha jî zilamê kurd ê İranê di eynî rewşa kambax de bû... Em her sê, ez, zilamê kurdê İranê û Selahiddinê Eyûbî, li ser esmanan, dibûn şirikê tiştekî nexweş; kîmbûna zanîna huwiyyetekî neteweyî. Ev rastiya me bû. Rastiyeke tahl ku me ji sedsalan û vir ve jê kişandibû. Zanîna huwiyyeteke neteweyî li ba me kêm bû. Kesên ku haya wan ji vê zanînê hebû, li ba me kêm bûn. Kesên ku bi doza huwiyyeteke neteweyî rabûbûn, li ba me kêm bûn. Bir û bawerî û îdeolojiyênu ku zanîn û şîura huwiyet û şexsiyyeteke neteweyî ji me bi dûr dixistin, em dil girtibûn, em bûbûn berdevkên xelkê,

-bêyî ku haya me jê hebe;

- Eger em ê bibin misilman yan komunist, em divê bibin misilman yan komunistên welat û neteweyê xwe.

- Eger zanîn û şîûra huwyeteke neteweyî li ba me xurt be, em ê bikaribin ji her celeb bîr, bawerî û îdeolojiyan destkewti bibin û wê bîr, bawerî û îdeolojiya ku bi dilê me ye, ji bo pêşvebirin û yekîtiya welat û neteweyê xwe bi kar bînin...

Loma pirsiyarênu ku Octavio Paz li pey in, Em kî ne, çî ne, ji kû hatine û ber bi kû derine, pirsiyarênu bingehin in û bala merivan divê her tim li serê be.

**Armanç, hej. 110**

## **ji NECMETTİN BÜYÜKKAYA re**

Birayê NECO, kekê delal.

Sala 1990'i ji me xatir dixwaze û diqulipe ser sala 1991'i. Meha çilê û 23'ê meha çilê disan tê. Ji wê roja 23'ê çila 1984-an û vir ve, 6 sal derbaz bûn. Ji wê roja ku tu li girtigeha eskerî ya Diyarbekirê şehîd ketî û vir ve 6 sal bihurin. Sala 6-an diqulipe û dikeve 7-an. 7 salên bêyi te...

Niha, gava ez van rêzan dinivîsim, şevê dest pê kiriye. Şeva welatê bakûrê niha ber bi rojeke nû dere. Lê ecêb e, şeva reş xwe bi rengeki spî radipêce. Berf dibare. Kuliyên spî yên berfê li ber pencera min dilizin. Berf, kuliyên berfê, rengê berfê zora reşa şevê dixin. Ronahî di şeva reş de diçirûse û kuli hêdi hêdi xwe berdidin jêr... Kuliyên berfê ku ji der ve dest li min dikin, heşê min ji oda min a biçük a xebatê hildigirin û dixin dereki din. Heşê min ji welatê xerîbiyê bi firê dikeve û dere bajarê Siwerekê, welatê Kurdistanê... warê bav û kalan...

Sal 1961, roj çile bû, haya min ji bayê felekê û gerîna dewranê nîn bû; ez zarokekî 8 salî bûm. Kalikê min wefat kiribû. Kahniya ruh û can serê xwe danibû axa rehmetê. Em, malbata me, bav û apêñ min, heval û dostêñ malbatê li goristana bajarê Siwerekê bûn. Siwerga xopan hê nû bûbû xwedî goristanekê. Deriyê goristanê bi sitûnan û kevirêñ mezin ava bûbû. Li dora goristanê dar hatibûn çandin. Goristanê haziriya umrekî dirêj dikir... Di destpêka goristanê de, gorek hatibû vedan. Kalikê min, bextiyarî û këfxweşîya min di wê gorê de hatibû veşartin. Dinya ecêb bû... kalikê min, bêyi ku ji me xatir bixwaze, çûbû û hew vedigeriya... Berf dibarî, kuliyên berfê, bêyi ku haya wan ji tiştekî hebe, dilîstin û bi nazdarî xwe berdidan

jêr û li jêr, kirasekî spî dikişandin ser axa teze ya gora kalikê min. Dinya sar bû, lê ronî û pak bû. Goristan spî dikir. Berfê ronahî reşandibû ser goristanê. Wê gavê goristan û mirinê mohra xwe li min xist. Heşê min ê zarok bi veqetîna kalikê min û ronahiya wê roja çilê hat risandin. Ew roj, ew goristan, ew ronahî bûn siya min û ketin pey min. Ez li kû, ew li wir... Gava, sala 1979, ez û te li Şamê, li goristana Taxa Kurdan, li ber qebra Mîr Bedîr-Xan bûn û me li miriyêñ welatê Kurdistanê dinihêri, min ji te re got; aramîya goristanan bala min dikişîne û ew roja zaroktiya min û goristana Siweregê ji heşê min dernakeve...

Goristana Siweregê roj bi roj firehtir û dirêjtir bû. Bi dû kalikê min re, gelek nasên din jî, li wê derê, ketin xewa ebedî; pismamê min û dostê te Ferit Uzun, bavê min, ap û birarziyêñ min... û niha jî tu... Wê goristanê tu jî, lawê xwe yê yekta [bi her wesfê xwe yekta] Necmettin Büyükkaya jî hembêz kir. Gelo wê tu bi rêz û rêzdari, bi qedr û qîmet hembêz kir? Gelo wê bi girîn û axîn, bi dilovanî û delalî bedena te ya xort rapêça? Gelo wê doraliyê gora te bi rihanêñ mîna bejna te û bi gulêñ mîna rûyê te neqlîsand? Û iro, gelo ew goristana bav û kalan ji bo te dilorine û strana te, xewna te, daxwaz û armanca te bi hemû welêt digihîne?

Bira, birakan NECO,

Mixabin ku ez heta iro jî nikarîbûm bihatama ser gora te û gulek daniya ser axa te. Min ne gora bavê xwe, ne ya Ferit û ne jî ya te ziyaret kiriye. Ev hesreta dilê min e... Lê gava min serê xwe danî diyarê rehmetê, hingê ez dixwazim vejerim goristana zaroktiya xwe û li kêleka te û Ferit bikevim xewa ebedî. Hingê kuliyyêñ berfê dê, mîna ڕoja zaroktiya min, li ser gorêñ me govendê bigirin. Ev jî xewna min e...

Herçend min nikaribûye gulek jî dayinim ser gora te, lê ez dizanim ku keça te, delaliya ber dilê te Serdil her tim gulêñ sor tîne û dide bavê xwe. Te hay jê heye; Serdil mezin bûye. Ev bûn 13 sal ku min jî ew nedîtiye. Lê li

gora gotinan, ew bûye keçekte bi dilê te...

Heye ku niha ne şûna gotinê be, lê piştî ku eskerên bêbext te li zîndana tarî ya Diyarbekirê kuşt, min xwest ji Serdilê re nameyeke dirêj binivîsim û jê re behsa te bikim. Mîna destanekê. Destana jiyana te ya pak, daxwaza te ya pîroz, dilê te yê xurt, heşê te yê serwext, baweriya te ya pole û wîcdanê te yê nerm... Lê min heta niha jî hê ew xelas nekiriye. Peyvîn min ên xaf têr nakin ku ez bikaribim wê biqedînim û bi Serdilê bigihînim... Bi rîdana te, ez dixwazim li vê derê rêzên pêşin ên wê destanê binivîsim...

\*\*\*

### "JI SERDILA MERXASEKÎ GORBEHIŞT RE ÇEND GOTIN

Serdilê, gulizerê... Keça delal,  
Roj giran, dil tenik, çav bi hêşir in.  
Sersilê,  
Ez çawan bibêjim, ji te re çawan bidim fahmkirinê...  
Serdilê, ji iro pê ve,  
Ji wê şeva reş a 23.01.84-an pê ve  
Edî ji devê te dê gotina BAVO dernekeve...

Axx Serdil, ax çivîka Bavo,  
Wan kuştin... hêviyên te jî kuştin,  
Dijiminan, dijminen hêviyên te,  
Di şeva tarî de  
Li pey cax û deriyên hesin  
Bi bêbextî hêviyên te vetisandin,

Axx Serdil... di rojêñ weha tu giraniya gotinan namîne. Reh diguvişin ser hev, dil ditengize, mêtî naxwaze bedenê bi rê xîne... Li min bibihure ku ez nikarim bi zimanekî xweşik û nermik bi te re bipeyivim...

Dijwar e, Gulizerê dijwar e.  
Li welatê me jiyan dijwar e.

*Li ser şehîdbûna hevalekî peyîvin, yan nîvisîn, yan fikirîn*

*Dîjwar e.*

*Zarotiya te,*

*Evîn, heval û hogirê diya te, şêrê pîrika te*

*U hêviyên me... û hêviyên me ji me digirin Gulizerê.*

*Serdilê,*

*Xwişka xwe, pîrika xwe, kalikê xwe yê kokim bihewîne,*

*Ji wan re bibêje ku*

*Diyarbekir, Silêmaniye, Mehabad û Cizîre*

*Di şînê de ne.*

*Ji wan re bibêje ku*

*Ew mîrxas, ew jîr, ew bîrewer bû.*

*Ji wan re bibêje ku*

*Wîji we hez dikir,*

*Ji te û xwişka te, ji diya te, ji kalik û pîrika te,*

*Ji merîv, heval û hogirên xwe,*

*Ji gel û welatê xwe hez dikir...*

*Serdilê,*

*Ez niha li pirtûkeke bavê te dînihêrim; Doza Kurdistan. Di çapkirina vê pirtûka hêja û tarîxi de alîkariya bavê te jî pir bû. Di pirtûkê de, şehîdên me yêneteweyî li pey hev, di nav rûpelan de, rêzbûyî ne. Şêx Seîd, Seyid Ebdulqadir, Xalidê Cibirî, Yada Axa, Dr. Fuad Beg, Bavê Tûjo, Seyid Riza, Qadî Mihemed û gelekên din tê de ne... Ma tu dizanî, bavê te di bin sûretê Bavê Tûjo de ci nivisiye?.. "Gehremanê mezîn" ... Wî weha nivisiye... Gehremanê mezîn...*

*Serdilê, kezîzerê,*

*Bavê te hevalê gehremanên mezîn bû...*

[Sîbat-1984]  
**Armanc**, hej. 111

## Zimanê Kurdi

Seydayê Ehmedê Xanî, berî niha bi sê sed salan, di "Mem û Zin"ê de, gotiye;

*Da xelk nebêjin ku Ekrad  
Bê meeriset in, bê esil û binyad  
Enwai melet xudan kitêb in  
Kurmanç lenê di bê hesêb in  
Hem ehlê nezere nebêñ ku kurmanç  
Işqek ne kîrin bo xwe amanc*

Eşqa ku Seyda behs dike kitêbên kurdi ye, nivisîna zimanê kurdi ye, bi zimanê kurdi kitab asirandin e... Nemiriya Seydayê Ehmedê Xanî ji vir tê: wi bi kurdi, bi zimanê zikmakî, bi gotinêñ bav û kalan nivisi. Wi peyv û gotinêñ kurdi mîna gewher, lûlû û yaqûd li ser kaxizêñ spî reşandin, şewq û ronahiya peyv û gotinêñ kurdi bi her aliyê welêt gîhandin. Wi, mîna zîrkerekî, peyv û gotinêñ kurdi hûnandin, neqîsandin, peyv û gotinêñ kurdi li hev anîn û pê eserên abadin asirandin. Wi ji peyv û gotinêñ kurdi lehiyeke nemir ava kir... û ya herî girîng, rê li ber nîfşen nû rast kir.

\*\*\*

Herweki tê zanîn, berî niha bi çend heftan, li Tirkîyê, serokkomarê Tirkîyê Turgut Ozal û gelek gernasên dewleta Tirkîyê li ser zimanê kurdi peyivîn û behsa serbestkirina zimanê kurdi kîrin. Gelo ew dixwazin çi bikin? Ew çi difikirin, bi çi awayî dixwazin rê bidin zimanê kurdi û nivisîna wi?.. Em hê baş bi vê yekê nîzanin. Lî ev munaqaşe û gotûbêjên dawîn disan, careke din, yek ji wezîfîn herî girîng ên kurdan(nemaze ên ronakbîrîn kurdan) pêşberî me kir: kurd divê li zimanê kurdi xwedi derkevin, pê bixwînin û binivisin,

wî pêşve bibin. Bêguman, gelek girîng e ku meriv bizanibe ka dewleta Tirk ci û çawan difikire. Pir û pir girîng e ku serbestî û azadiyek ji bo zimanê kurdî were pê. Lê girîngtirîn tişt ew e ku kurd bi xwe li zimanê xwe xwedî derkevin, zimanê xwe mîna nan û ava xwe biparêzin, pê bijin.

Em hemû pê dizanin ku gelek tevgerên kurdî û ronakbîrên kurd, bi xurtî, li zimanê xwe xwedî dernakevin, pê napeyivin, pê nanivisînin. Ew rizgarî û serbestiya zimanê kurdî dihêlin pey "şoreşa mezin". Ecêba mezin ev e; ew ji bo "Kurdistanekê yekbûyî û xweser" şer dikan, dixebeitin, lê kar, xebat û tevgerên xwe ne bi zimanê xwe, bi zimanekî biyanî, bi rê dibin... Ma li vê derê kêmâniyekê, şaşiyekê tune? Çawan ev daxwaz, armanc û xebatêن pîroz ê bi zimanekî biyanî û bêyî zimanê kurdî bi ser keve? Ma zimanê kurdî ne yek ji himêñ esasî yêñ netewayê kurd e? Ma şexsiyeta kurdî û huwiyyeta gelê kurd bi zimanê kurdî nehatiye risandin?

Zimanê kurdî divê di her celeb tevgerên kurdî de bibe zimanê esası. Ev yeka hem prensîbekî ehleqî ye û hem jî ji bo biserketina daxwaz, armanc û xebatêن pîroz pêwistiyekê ye. Kurd dikarin di tevger û xebatêن xwe yêñ curbecur de zimanêñ din, tırkı, farisi, erebî, îngilizi, fransizî, alemanî, rûsî û h.w.d. bi kar bînin. Bikaranîna zimanêñ din, ji bo me û tevgerên me yêñ piralî dewlemendî ye. Lê zimanê esası, himê bingehîn divê zimanê kurdî be. Ji ber ku zimanê kurdî heyina herî muqeddes ya civat û tarîxa kurdî ye, ew nişana edet û üsilêñ tarîxa kurdî û nişana baweriya pêşerojên tevger û civata kurdî ye. Zimanê kurdî ruh û giyanê netewayê kurd, alaya serîhildanêñ kurdî û rêberê tarîxa hezar salan a kurdan e. Zimanê kurdî hem kilita deriyê dilê merîvîn kurd hem jî kilita têgihiştina çand û edebiyata kurdî ye. Meriv bi tenê dikare, bi alikarîya zimanê kurdî, bi musîka bedew û dewlemend a kurdî sermest be.

Çawan tevger û ronakbîrêñ kurd dikarin bê zimanê kurdi bixebitin, bilebitin, bifikirin? Zimanê kurdi, li serê vê cîhana kambax, mal û warê kurdan e, stariya wan e, parêzgeha wan e, ji bo wan hembêza dê ye, germahiya dapîr û bapîran e... Serokkomar û gernasên dewleta Tirkîyê çi dibêjin bila bibêjin, lê ew tiştekî tînin bîra me; merivên têgihiştî, tevgerên siyasî û ronakbîr, gel û neteweyekî serwext divê, berî her tiştî, rêz û rêzdariyeke bêhempa nişanî zimanê xwe yê zikmakî bide. Kesê ku nikaribe rêz û rêzdariyeke maqûl nişanî zimanê xwe bide, ew nikare rêz û rêzdariyê nişanî tu tiştê din jî bide. Kesê ku li zimanê xwe xwedî dernekeve û jê hez neke, ew nikare li tu tiştekî din jî, bi başî, xwedî derkeve û jê hez bike.

\*\*\*

Ziman nişandeka haletî ruhiyê civatan e. Bi xêra zimanê civatê û qayide û normên wî zimanî, meriv dikare civatan fahm bike. Civata kurdi û insanê kurd jî bi zimanê kurdi tê fahmkirin. Ji ber ku insanê kurd hê jî bi zimanê kurdi dipeyive, bi zimanê kurdi difikire, bi qayide û normên zimanê kurdi tevgerên xwe bi rê dixe. Ma li ber destê tevgerên civakî, siyasî û ronakbîri yêñ kurdan, ji zimanê kurdi pê ve, dikare çi tiştê hêjatir hebe?

Nemaze ji bo me kurdêñ Tirkîyê, Suriyê, Lubnan û Yekitiya Sowyetê, bi kurdi peyivîn, nivisîn û fikirîn pêwistiya herî mezin e. Ji ber ku, ji her kesî bêtir, em li ber xetera asîmilasyon û windabûnê ne, em di bin bandûr û tesîra zimanêñ biyanî de ne. Gava em li zimanê xwe vegerin, hingê em ê li xwe û şexsiyeta xwe jî vegerin. Em ê di ruh û şexsiyeta xwe de guherinêñ mezin û pîroz bînin pê. Ma ji destê kesê bêşexsiyet çi tê? Ew dikare çi bike, çi biafirîne?.. Ma kesê ku bi şexsiyeta xwe, bi huwiyeta xwe ya neteweyî, bi ziman û çanda xwe bawer nebe, baş bi wan nizanibe, dikare mîna Seydayê Ehmedê Xanî berhem û eserên abadîn biafirîne?

Bi kurdi fikirîn, nivisîn û afîrîn tevgereke pîroz,

kurdî nivisin, fikirin û afirin li hember qirêjî û gemariya serdest û zordaran rawestin e, li hember bêdengî û bêrûmetiyê serihildan e, li hember tirs û şermezariyê qîrina baweriye ye, li hember derew û sextekariyê alaya rastiyê hildan e; xweşî, germahî û paqîjî ye; rûmet e.

Serokên dewleta Tirkiyê, pir caran, dibêjin ku zimanê kurdî nîn e. Ew iddia dikan ku zimanê kurdî devokeke tirkî ye. Çima ew van gotinan dikan? Ji ber ku ew dizanin; em kurd li zimanê xwe xwedi dernakevin, pê naxwînin û pê nanivisinin. Ew dizanin ku kesen ku bi zimanê kurdî nivisine û dinivisînin, bi tiliyê destan têñ hejmartin, rojname, kovar û kitabêñ kurdî pir hindik in. Eger bi sedan nivîskarêñ kurd hebûna, kitabxanêñ me hebûna û ew bi kitêbêñ kurdî tiji bûna, rojnamêñ me pir bûna û ew bihatina xwendin, zimanê tevgerêñ me yên civakî, siyasi û ronakbîri kurdî bûya, gelo wan ê disan van gotinan bigotina û van iddiayan bikirina?.. Ew dizanin ku piraniya me ji eşqa ku Seydayê Xanî behs dike, dûr in. Ew dizanin ku "enwayî millet xudan kitêb in, Kurmanç tenê di bê hesêb in." Ji ber vê yekê ye ku ew herçend behsa kurdan û zimanê kurdî jî bikin, bi hêsanî, zimanê kurdî dixin qalib û kiraseki pênc peran.

Rûmet û bêrûmetî, rûgeşî û rûreşî, serfirazî û bindestî û h.w.d. bi hev re ne. Ew du aliyeñ tiştan in û pir caran sînor jî di navbera wan de ne zelal û ne diyar e. Bi baweriya min zimanê kurdî vê sînorê diyar û zelal dike. Çima Seydayê Xanî bû nemir? Ew bû nemir, ji ber ku ew li aliye rûmet, rûgeşî û serfirazî yê sînorê bû. Ew bû nemir, berhem û eserêñ wî bûn nemir. Lê mixabin ku xewna wî jî hê nemir e. Xewna wî rûmet, rûgeşî û serfiraziya zimanê kurdî bû.

Em divê ji bir nekin; xewna Seydayê Xanî hê jî xewn e û iroj jî derbas dibe.

**Armanç**, hej. 112

## Eger me ji hebûna hin nemir...

Mamosteyê edebiyata kurdî Mam Hejar Mukriyanî şeva 21'ê sibatê wefat kir. Hingê ez li Parîsê bûm. Li ser mirina Mamosteyê mezin, Enstitiya Kurdî li Parîsê şevek amade kir û deftereke bîranînê vekir. Min ji li defterê, bi vê şêweyê, rêzine kurt nivisîn;

*"Mamostayê Hêja... Te dabû ser riya Seydayê Ehmedê Xanî yê nemir. Niha tu ji, mîna Seyda, bûyî nemir... Tu her bijî..."*

Hevalekî ku hingê li kîleka min bû, li rêzên min nihêrî û bi ken got,

- Malava, Mamoste wefat kiriye, tu dibêjî "her bijî..."

Her bijî...

Meriv ji kî re û kengê dibêje her bijî? Li ser mirina kî?

\*\*

Bi baweriya min, meriv li ser mirina şair û nivîskareki mîna Mam Hejar, bêşik û bêguman, dibêje "her bijî." Ji ber ku ew ê bi eser, berhem, avahî û xebatêن xwe her bijî. Di dil û mîjiyê me de. Li ser rûpelên rojname, kovar û kitêbên me. Li cîh û war û avahiyêن me.

Tiştê ku Mam Hejar dike nemir; jiyana wî ya dirêj [70 sal], xebatêن wî yêن siyasi, edebî û ronakbirî û bir û baweriyêن wî yêن pêşverû, welathezî û merivheziyê ye. Hê di xortiya xwe de, wî beşdarî li tevgera Komara Mehabadê kiriye, gelek rojname û kovar derxistîne, di gelek rojname û kovaran de nivisiye, 22 kitab weşandîne, şîrîn Omer Xeyyam wergerandîne kurdî, hin kitêbên tarixî ji farisi wergerandîne kurdî, "Dîwana" Seydayê nemir Melayê Cizîrî, digel şerh û ferhengekê, weşandiye, "Mem û Zîn'a Seydayê nemir Ehmedê Xanî wergerandiye zaravayê mukrî û soranî û

Ehmedê Xanî wergerandiye zaravayê mukrî û soranî û digel şerh û ferhengekê, weşandiye û şîrên xweş, giranbiha û abadin afirandine û bi nivîskarî û şâiriya xwe ziman û edebiyata kurdî dewlemendtir kiriye...

Merivekî weha dê, bêguman, her bijî. Mirin şexs û bedena wî ji me bi dûr dixîne, lê belê ruh û giyanê wî, bîr û baweriyêñ wî, eser û berhemêñ wî her li ba me ne. Ew nemir in.

Nemirî ev e. Kesê nemir bi vî awayî dibe nemir...

\*\*\*

Milan Kundera, nivîskarê navdar ê çekoslawakî, di romana xwe ya dawîn "Inmortalité" [Nemirî] de behsa du celeb nemiriyê dike; nemiriya biçûk û nemiriya mezin. Nemiriya biçûk ew e ku meriv, piştî mirinê jî, di heşê nas, dost û cîranêñ xwe de dimîne, di bîr û heşen wan de diji. Heta ku ew jî dimirin. îcar nemiriya mezin ew e ku meriv, piştî mirinê, di heşê nenas û xelkê de dimîne, di bîr û heşê netewe, gel û navçeyekî de dijî.

Herkes nemir e. Mezinê malekê, giregirê malbatekê ji bo mal û malbata xwe nemir e. Keyayekî gundekî ji bo gundê xwe, heta demekê, nemir e. Piştî mirina wî, nifşekî-du nifş, bavekî-du bav wî bi bîr tîne. Meriv û nasêñ wî, xelkê Gund behsa wî dikin. Lê paşê, ew ji bîr dibe. Nemiriya kesên weha bi sînor e; hem ji aliyê wext, hem ji aliyê cîh û war.

Lê, nemiriya nemirîn mezin bêhed û bêhidûd e. Jê re ne cîh û ne jî war qîm dike. Ji ber ku wan bi eser, berhem, avahî, xebat û fikrîn xwe ruh û can dane neteweyeki û herweha insaniyetê. Nemirîn mezin ne keyayê gundê xwe, mezinê malbata xwe û serekê koma xwe ya biçûk in. Ew ne li pey keyatî, mezinahî û serekîyê ne. Nemirîn mezin wîjdanê neteweyê xwe, pîvanê merîvevîniyê û sembolê xebat û lebatêñ rast û dirust in. Ew li pey afirandin û avakirina eserên nû, ronesans û şoreşen fikri û nûjenkirin û dewlemendkirina medeniyet û neteweyan in. Ew li pey dewlemendî û rengîniya jîyana siyasî, çandî, edebî û

civakî ya civatan in. Ew li pey eser, afîrîn û avahîyan in. Eser û avahîyen wisan ku gel û neteweyen wan û însaniyet pê serbilind bibe. Ew ne merivên idare û idarekirinê ne, ew merivên afîrîn û avahîye ne.

Jiyana rojane, xire-cir û teşqelên rojane, şer û dijîtî û kar û xebatên nedûrbîn inîna berfa li ber tavê ne. Ew dihelin û winda dîbin. Ew iroj hene, sibê tune ne. Lê eser û berhem tav in. Ew iroj jî hene, sibê jî hene, dusibê jî hene... Ew şewq didin me, ronahî direşînin ser me. Ew jiyana me ya basit û dinya me ya ku bi şer û teşqelan tijî ye, ronî dikan.

Loma xwedîyên van eser û berheman nemir in. Loma ew her û her hene, ew her û her dijîn. Kî dikare bibêje ku Goethe naji? Kî dikare iddia bike ku Shakespeare iroj ne li mal û bîraxonên îngilizan e? Kî dikare bibêje ku dengê senfoniyên Beethoven, Mozart, Schubert û h.w.d. iroj aheng û aramiyeke xweş nadî dil û ruhê merivan? Kî dikare bibêje ku eser û avahîyen Gaudî ne serbilindiya gelê Katalan û Spanyayê ne? Kî dikare bibêje ku rêzên nivîskar û şîrên nûjen ên farisi bi bîr û fîkrêni Fîrdewsî nehatine neqşandin?..

\*\*

Gava em çavê xwe li ser tarîxa gel û neteweyen pêşketî digerînin, em dibînin ku nemirên van gel û neteweyan pir in. U ew her dixwazin, dil dikan û hewl didin ku nemirên wan pirtir bin. Ji ber ku piraniya nemiran nişana pêşketina wan, garantiya pêşeroja wan û sembola jiyana ronakbîriya wan e. Lê li ba gel û neteweyen paştemayî û bindest rewş bervajiyê vê yekê ye. Li van welatan hejmara nemiran pir kêm e û bîr û şîûra pirkirina hejmara nemiran tune. Bêguman nemir bi eser û avahîyen xwe dibe nemir. Kes bi qise û gotinan nabe nemir. Lê belê, ji bo avakirin û afîrîna eser û berheman jî rê, gav û imkan divên. Gel û neteweyen ku dikarin van riyan vekin, gavan bavêjin û imkanan peyda bikin, dikarin bibin xwedîyê nemiran.

Mîna her gel û neteweyen paştemayî, hejmara nemirên

kurd bi pêçiyên tiliyan dikare were hejmartin. Nemirên kurd mîna stêrikên serê sibê ne; kêm in, hindik in. Mixabin ku ev yeka rastiya me ya tahl e. Ma em dikarin navê çend nemirên kurdan di warê huner, çand, edeb, avahî, felsefe, ilim û siyasetê de bihejmêrin? Di warê çand û edebiyatê de, Mîr Celadet Bedirxan, sala 1941, weha dibêje: "... ji eserên beriya islamiyetê hesêb tiştek nemaye. Piştî islamiyetê ji nav kurdan gelek şâhîr, edîb û peyayêن zana rabûne, lê eserên xwe bi piranî bi erebî, bi farisi an bi tirkî nivîsandine û ji wan milet û edebiyata wan re xizmeteke mezin kirine... Yêن ku bi kurdmancî nivîsandine gelek hindin in û wan jî bala xwe nedaye zînên û çêtir këfa xwe ji pîrsen erebî û farisi re anîne..." [Hawar, hej. 33]

Nemir tav û stêrik in. Meriv li gora wan rê li ber xwe rast dike. Seydayê Ehmedê Xanî bi xêra nemirên beriya xwe rê li ber xwe rast kir û bi xwe jî bû nemir. Mam Hejar bi xêra Seydayê Ehmedê Xanî rê li ber xwe rast kir û bi xwe jî niha bû nemir. Seydayê E. Xanî di şîreke xwe de nemirên beriya xwe bi nav dike û weha dibêje;

"Min da ilama kelamî mewzûn Alî bikira li banê  
gerdîn  
Bi nav e riha Melê Cizîrî Pê hey bikira Elî Herînî  
Keysek we bida Feqiyê Teyran Heta bi edeb bimaye  
heyan  
Çi bikim ko qewî kesed e bazar Nîn in jî qimaş re  
xerîdar"

Bi hêviya ku ji qimaşê kurdi re jî hebin xerîdar û bazara kurdi nemîne kesed û me jî hebin bêtir nemir...

Amanç, hej 113-114

## **Bigî Welatê min ê delal, bigî...**

Gava Ovidius, şahîrê hukimdariya Romayê, nivîskarê bajarê Romê, bi neheqiyekî mezin sîrgûnî Zerya Reş, wî aliyê dinê, bû, hingê wî xemgir, bîhnteng, keserkûr, hîsên xwe weha bi lêv kirin; meriv gurê hev in...

Ez, mîna kurdeki, di van rojêñ reş de, bi keder û keser, pir caran li gotina Ovidius a basid û balkêş difikirim. Ji ber ku ez dizanim; kurd, gelê jibîrbûyî yê dinê, qurbanê herî mezin ê Rojhelata Navîn, niha, li ser riya sîrgûnê û mirinê, xemgir, bîhnteng, birçî û keserkûr, di bêdengiya hêşirêñ çavan de, hîsên xwe weha bi lêv dîkin; meriv gurê kurdan in...

Ew gotina kurdî ku di esasê xwe de trajediyeke mezin e, iro, careke din, bi qetliamên rejîma Saddam û bi bêdengiya cihanê li hember van qetliaman, rast derdikeve; bi tenê çiyayêñ kurdan dostêñ wan in. Heval û dostêñ kurdan nîn in. Her gav îxanet li wan dibe. Ew dibin qurbanê îxanetê, îxanetê û dîsan îxanetê... Hemû gelêñ ku diperçiqin û li ber xeterêñ mezin in, digel her tiştî, dîsan bi awayekî, xwedîyê alîkariyêñ ekonomîk, siyasî, eskerî û ehleqî ne. Lê ne kurd. Li Rojhelata Navîn ku warê zordarî û dîktatoriyê ye, mesela USA û hevalbendêñ din ên bi quwet li pişta cihûyan, hemû şêx, emir û dîktatorêñ ereb li pişta filistîniyan, Iran û Sûriye li pişta şîhiyêñ Iraqê, Siûdi Erebistan li pişta sûniyêñ Iranê, Turkiye li pişta turkmenêñ Iraqê û ezeriyêñ Iranê ne. Lê kes, tu kes ne li pişta kurdan e, bêyî dijmin. Ne dinya Rojava, ne dinya Rojhelat, ne welatêñ cîran û ne jî hin welatêñ din dostêñ kurdan in. Rojava, bi serekiya Englîstan û Fransê, di destpêka 1920-an de, pişta kurdan şikand û welatê kurdan di nav dewletêñ ku bi temamî dijminê kurdan in û bi temamî ji adet û ûsilêñ însaniyet û demokrasiyê bi dûr in, parve

ji adet û úsilêñ însaniyet û demokrasîyê bi dûr in, parve kir. Bloka komunist, bi serekiya Yekitiya Sovyetê, bi durûtî û bêehleqiyekî mezin, tu carî alîkariya kurdan nekiriye û her gav alîkarî li Turkiye, Iran û Iraqê kiriye ku ew serihildanêñ kurdan, 1925, 30, 45, 75..., bîşkinin. Welatêñ cîranêñ bêbext ku di nav tixûbêñ wan bi xwe de beşekî ji gel û welatê kurdan heye, tu carî alîkarî li kurdan nekirine û bi tenê xwestine kurdan li dijî cîranêñ din bi kar binin. Wan kurd bi tenê, mîna qurbanê listikekî dîtine û ne tiştekî din...

Çima dinya jiyanekê bextewar û hêja ji gelê kurd re pir dibîne? Çima ji vî gelî evçend tê tirsin, tê nefretkirin? Çima ev gel evçend tê perçiqandin? Çima ev gel dê, ji 1844-an û vir ve, di her deh salî de carekê, qetliamekî mezin bijî? Gunehê vî gelî çi ye, vî gelî çi guneh kirine ku evçend biperçiqe, bê vetisandin û ji bûr bibe?.. Iro, di van rojêñ şînê de, ez û 25 milyon kurd van pîrsan ji xwe dikin...

Heta berî niha bi sê heftan jî, her tişt xweş, baş û bi hêvî dixuya. Li Konferansa navneteweyî ya li ser kurdan, li Hasseludden, Swêd, 15-17 adar, 1991, çirûskên hêviyê ji çavêñ beşdarêñ kurd difiriyan. Serek û niwênerên Cepha Kurdan ku iro serekiya şerê li hember diktatorê Baxdayê dike, bi hêvî, fîkr û baweriyêñ ronî tîjî bûn. Wan pêşerojeke çêtir û însanî û bextiyar xeyal dikirin... Kurdan bawer dikirin ku êdi dawiya tunela tarî û reş dixuya. Ronahiyê nêzikî li wan dikir. Ew çembera şeytanê Beko Ewan ku kurd mecbûr mabûn û tê de dijîyan, dest pê kiribû ku bîşkiyê... Kurdan navê Hêvî li zarokêñ xwe yên nûbûyi dikirin.....

Kurdan baweriya xwe bi Irakekî yekgirtî, demokrat, plural û layik dianîn. Wan, car bi car, ji hemû dinê re digotin ku Irakekî yekgirtî, demokrat, plural û layik garantiya mafêñ kurdan e. Gotinêñ wan ne ji bo xapandina cîhanê bûn, wan bi dil û can bawerî bi gotinêñ xwe dianîn. Ji ber ku li cîhanê tu neteweyeki

tune ku mîna kurdan ji nebûna demokrasiyê evçend kişandibe û tu netewe tune ku mîna kurdan evçend li pey aramî û ewlehiyekî demokratik be.

Kurdan bawer dikirin ku ew dê, îcar, nebin berdevk û qurbanê lîstîkên dewletan, îcar, bêtir xweser bin û alikariyeke navneteweyî werbigirin û îcar bi ser kevin...

Wan bawer nedikirin ku dinya û Yekitiya Koma Neteweyan ê fersend bide Saddam ê şikeştxwari û birîndar da ku ew li kurdan xwe... Lê "dijminê" diktator û xwînrêjê Baxdayê bi xwe ew fersend danê. Yekitiya Koma Neteweyan, USA û şexsê George Bush Saddam vewandin ku ew, Hitlerê nû (George Bush Saddam weha bi nav dikir) gelê kurd ser jê bike. George Bush ew tiştên ku ji bo rizgarkirina Kuveyta hûrik û ji nû ve avakirina jiyanekê bextewar ji bo milyonekî kuveytiyan kir, ji bo bi milyonan kurdan nekir û ew fersend neda kurdan. Wi kurd ji alikarı û parastinê bêpar hiştin. Wi bi şiretê Siûdiyan Saddam û rejîma wi ya xwînrêj û quesab tercîh kir û kurd avêtin ber pencen cinawirekî xof, xwînrêj û birîndar...

Tişteki pir aşkere û diyar e; eger rejîma Saddam nikaribûya çekên modern û giran, helikopter û balafirên şer bi kar baniya û ev imkanên rejîmê nebûna, kurd ê neşikayana û rejîm ê bi ser neketa. Kurdan dijîtiyên xwe dan aliyekî û yekitiya xwe ava kirin, wan hemû gel (ji zarokê heft salî ta kalê heftê salî) bi rêk xistin, programek pir mutewazi ji bo Irakekî demokratik û Kurdistanekî otonom pejirandin û şer kirin û li ber xwe dan... Gelekî bêpiş, perçiqli û tenê çi dikare ji vi bêtir bike?

Berî çend rojan, li rûpela yekemin a rojnama ingilizi *The Independent* wêneyek li ser qetliama kurdan hebû. Li wir, li milekî, George Bush masîvanî dike û masiyeke mezin nû ji avê derdixe û li milê din jî Saddam Husêن masîvaniya kurdan dike û bi çenqalekî masîvanan gelê kurd ji Kurdistanê derdixe. Herdu jî kêfxwêş

dixwiyin. Herdu jî kêfa xwe tînin û îstirihet dîkin. Herdu jî baş dizanin ka ew çi dîkin... Ev wêna basîd hemû rastiyê dibêje; George Bush jî, bi qasî Saddam, berpirsiyarê qetlima kurdan e. Gotar û xeberdanêن George Bush li ser dûzana nû ya demokratik li cîhanê û li Rojhelata Navîn, bi tenê, sextekarî û durûtî ye. Gotar û xeberdanêن Yekitiya Koma Neteweyan, USA û George Bush li ser da ku ew tekiliya xwe bi karên hundîrî yêن Iraqê nayinin, bi tenê, cynism e. Cynismeke nedîti ye.

Gotar û xeberdanêن George Bush ên bêhejmar li ser demokrasi, xweseriya neteweyî, mafê çareniwisîn, edalet û ehlaq, nemaze yêن li ser ehlaq, derew in. Bi tenê derew. Wêneya The Independent' ê hemû rastiyê diyar dike; George Bush bi qasî Saddam Husêن xwedi ehlaq e. Ew kesên ku petrolê ji xwîna geleki hêjatir dibînin, nikarin behsa ehlaq û duristiyê bikin.

Lê hed û hudûdê durûtîyê nîn e. Niha, piştî ku rejîma Saddam tevgera kurdî şikandiye û gelê kurd qetl kiriye, dor hatiye ser gotar û gotinêن alikariya insanî. Ew wîjdanê ku bi xwîna gelê kurd hatiye şuştin, niha divê were paqirkirin. Niha, piştî ku xwîna gelê kurd rişiyaye, geleki ji warê xwe bûye û ew hêviya paqij a kurdan bi çekêن Saddam bûye perçe perçe, wexta alikariyêن insanî hatiye. Pêşî kesê xwe nede ber avakirin û parastina jiyanekê bextewar a kurdî û kesê rê li cinawirê ku cîhana Rojava û Rojhelat ava kiriye, negire ku ew kurdan qetl bike û paşê, piştî ku cinawir bi ser ketiye, cihan ê alikari li "kurdêñ mazlûm û bêçare" bike. Niha wext hatiye ku laş û meyîtê kurd ê qetlkiri, bi awayeki insanî bi gor be... Alikariya insanî pêwist e. Pir û pir û hema, bi carekê. Her roj, bi sedan zarokêñ kurd li Kurdistanê dimirin. Alikariya insanî bi her awayî pêwist e. Lê ev trajediya ku kurd tê de dijin, heta ku ew mafêñ xwe yêñ neteweyî û insanî wernegirin û Koma Neteweyan û cîhana Rojava nebe garantiya van mafan û wan neparêze, dê berdewam be...

Berî niha bi çendekê, gava min kitêba Walter

Benjamin *Illuminationen*, kurte-nivîsarên wî yên balkêş, xwendin, demeke dirêj, min li sûretê wî yê ku li ser bergê kitabê bû, nihêrî. Wê çaxê min keser û kederek li ser çavêن wî yêن xweşik dît. Paşê, min eynî keser û kedera di çavêن wî de, li hemû sûretên wî dît. Hingê min fahm kir ku ev eynî keder e ku ez pir caran di çavêن hevalêن xwe yêن cihû û ermenan de dibînim; keser û kedera ku mensûb û endambûna gel û neteweyekî ku ji bo qetlîmanêن mezin hatiye helbijartin. Keser û kedera ku meriv xwe bêpişt, bêhêz, çewtfahmbûyî û ixanetlêbûyî hîs bike. Keser û kedera ku meriv baş fahm neke çîma evçend kuştin, zulim û zordariya dujehî li dijî netewe û gelekî bêpişt û bêçare... Lê, ez niha, di van rojêن reş de, hîn çêtir fahm dikim ka çîma Walter Benjamin û gelek cihû û ermenêن din xwe di dema qetlîam û piştî qetlîaman kuştin. Ji ber ku ew bûn mehkûmêن destana mirineke nehêja, ew bûn mehkûmêن keser û kedereke bêeman û bêdawîn.

Heye ku kurd, ev 25 milyon merivêن bextres dîvê, ji bêyî liberxwedaneke qehreman, vê yekê bikin; hemû bi hev re, bi awayekî kollektiv, xwe bikujin. Hingê ew ne dibin meseleyekî hundirî û ne jî meseleyekî derwayî ji bo civata dinê û hingê, êdî, ne hewce ye ku kes xwe ji bo van kurdêن "nerehet" eciz bike.

Ovidius, şahîrê nemir ê insaniyetê, di nameyeke xwe de, xemgir, bîhteng, keserkûr, ji warê xwe yê sirgûniyê, ji wî aliyê dinê, weha dinivisi; "ez hatim vê derê... û ez ê li vir bimîrim... Jixwe, ji bo pîr kesan, gava stérka min vemîrî, ez jî mirîm..." U berî ku ew xatir ji dinê bixwaze û winda bibe, here, wî her tiştî bi gotineke din a basîd xelas kir; "dinya bêbext e..."

Kurd, gelê jibîrbûyî yê insaniyetê, ku niha li ser rîya mirin û revê ne, heq didin Ovidius û di bêdengiya hêşirêن çavan de, weha dibêjin;

Bigrî welatê min ê delal, bigrî... dinya bêbext e, hê jî...

## Tolerans

Gelo kurdîya toleransê ci ye? Ez bixwe pê nizanim. Heye ku peyv û gotineke kurdî di dewsâ toleransê de hebe. Meriv dikare, bi erebî, jê re bibêje, "tehamul, musameha..." Yanê tiştekî ku ne bi dilê merivan be jî, meriv bikaribe qebûl bike, rê bîdiyê, xwêş bibîne. Meriv bizanibe ku ji daxwaz û ditinên merivan pê ve jî dîtin, tevger, lebat û daxwaz hene û ew jî xwedî maf in. Di civatên pêşketî û demokratik de, peyva toleransê mefhûmeke (concept) esasî û bingehîn e ku endamên civatê pê perwerde dibin û her haya wan jê heye. Peyva toleransê yek ji hîmên wan civatan e. Kes wê naleqîne, pê nalîze û li dijî wê dernakeve. Ji ber ku herkes dizane, gava ew hîm bileqe, aheng û düzana civatê û konsesusa di navbera çîn û komên civatê dê têk here. Civat ê ji hêz û quweta xwe winda bike, dijîtî, hemberi û navkokiyêñ hundurî ku ji bo civatan birînên kûr in, dê pir zêde bibin. Sergêji û perçebûn ê dewsâ zîrekiya civakî û entelektueli û yekitiyê bigire. Yekdengiyekî tarî dê dewsâ pirdengiyekî rengîn bigire... û gelek bûyerên din ên nexwêş...

Ji ber vê yekê ye ku merivêñ welat û civatên pêşketî toleransa şexsî û civakî mîna îmkanîke baş dibînin. Ne mîna xeterekê ku rê li pêşketinê digire.

\*\*\*

Çima ez qala toleransê dikim? Du hevalêñ min ên hêja hene. Gava ez wan dibînim, bi wan re dipeyivim an jî li wan difikirim, her, ev gotina toleransê tê bîra min. Ev herdu hevalêñ min jî, li welatê xerîbiyê, penaber in, ji Kurdistanâ Turkiyê ne, xwenda û ronakbîr in, ji bo welat û gelê xwe gelek tişt kirine û her di xizmeta welatê xwe de ne. Ji ber kar û xebatêñ xwe û daxwaz û

armancêن xwe, ew nikarin vegerin welêt. Ew di nav hesreteke zîz de, jiyanekê penaber, di salên xwe yên 40-an de, dijin. Bi gotineke din, hema çi bigire, qedera wan mîna hev e. Lê belê, wekheviyêن wan jî heta vê derê ye. Ji vê derê û pê ve, ew ji hevûdu pir cihê ne.

Yek ji wan pir cîddî ye, bala xwe pir dide ser rabûn û rûniştinê, pir bi dîqet dipeyive, her gotina xwe bi caran dipîve û paşê dibêje, di dan û standinêن xwe de pir bi iñtiyat e, ji lêkolîn û lêgerînan hez dike, analiz û nêrînêن tarixî, fikrî, felsefî jê re pir girîng in, ji siyaset û tevgerêن siyasi hez dike, bi disiplîn û terbiya siyasi bawer e, tekiliyêن wî bi tevgerêن siyasi re xurt e, hemû belavok, kovar. û weşanêن wan dixwine, li Ewrûpê, lê hema çi bigire, li dervayî jiyana ewrûpê, di taxeke dervayî bajarekî mezin, di nav kurdan de dijî, her gav dere civinêن kurdêن penaber, lê tu carî nare civîneke ewrûpî.

Yê din xweşohbet e, ji henek û qirfan hez dike, zêde guh nade rabûn û rûniştinê û paşgotinan, pir spontant dipeyive, hazircewab e, li gora her rewşê gotinêن wî hene, pir bi hêsanî dikare bi her celeb merivî re bipeyive û dan û standin dayine, bala wî li ser tiştên rojane ye, ji lêkolîn û lêgerînan hez nake, ji analiz û nêrînêن kûr direve û henekêن xwe pê dike, ew û siyaset û tevgerêن siyasi pir ji hevûdu dûr in, belavok û kovarêن tevgerêن siyasi naxwîne û wan pir biçûk û nîzm dibîne, eger pir ne pêwist be, nare civênen kurdan, bi azadî û serbestiya şexsi û kabiliyeta şexsi bawer e, meriveki nerm e, pîvanêن demokrasiyê û demokratbûnê jê re pir girîng in, di kar û xebatêن xwe de jîr e û li gora xwe pir tişt dike û diafirîne, li Ewrûpê, di navenda Ewrûpê de dijî, ziman hîn bûne, bi hêsanî dikare bi ewrûpayiyan re bixebite, tiştên ku li Ewrûpê û cihanê dibin, pir bala wî dikişîne, tekiliyêن wî bi dezgeh û sazgehêن ewrûpî re xurt in, berpirsiyariyêن wî hene...

Yanê du merivêن ku ji hevûdu pir cihê ne û wesfêن wan cuda ne. Qisûr û kêmanî di vê yekê de nîn in. Meriv ji

hev cihê ne. Lê kambaxî ew e ku ev herdu hevalên min qet ji hev ne razî ne û bi hev ne qayil in. Herweha ew ji hevûdu hez ji nakin û nikarin tu carî bi hev re bixebeitin jî. Yek ji yê din re dibêje "qeşmer û sivik", yê din jî jê re dibêje "paştemayî û hov". Herdu jî ew wesfên hev ên ku ew jê hez nakin, derdixin pêş û rexne li hev digirin. Bi vî awayî, dijîtiyek, berberiyek di navbera wan de tê pê ku tesîra wî qet ne baş e.

Ma ev herdu heval, eger em wan gotinên vala mîna "qeşmer, hov..." li qliyekî bihêlin, hevûdu temam nakin? Ma wesfên cihê yên van hevalan bigihêن hev, hingê hêz û quweteke çêtir û berfireh ê neyê pê? Ma dewsa dijîti û berberiyê, germahî û tolerans di navbera van hevalan de hebe, hingê feyda wan ê ne zêde be? Ez, pir caran, bi awayekî basîd, weha difikirim.

\* \* \*

Heye ku ez çewt im, lê ez bawer dikim, ev bêtehamulî û nerazibûna ku ez bi mîsaleke şexsî tînim zimên, di her aliye me û civata me de heye. Bêtehamulî û ji toleransê dûrbûn, ez bawer im, yek ji wesfên me yên esasi ye. Dewsa ku em hevûdu bi alî û wesfên xwe yên taybetî qebûl bikin û dan û standinek li ser wê ava bikin, em dixwazin yên din jî mîna me bin, mîna me bifikirin, bipeyivin û tevgerên xwe bi rê xînin. Ci şexsî û civakî, ci siyasi û entelektueli. Gava ew ne mîna me bin, hingê ew ne dost û hevkarên me ne jî... Ma ev ne yek ji wan sebebên paştemayin û jihevketibûna kurdan e?

Ji lewre, eger gotina toleransê yan jî hemberiya wê ya kurdî, bikeve nav zimanê me yê rojane û bibe kevirekî esasi yê stûna tevger û fîkrêن me yên şexsî û civakî, hingê dijîti û berberiyê me kurdan jî dê kêm bin.

## Rexne û Rexnegirî

Sê xwedyîyen kitêbeke edebî hene; nivîskar, xwendevan û rexnegir. Nivîskar kitêba xwe diafirîne û diweşine. Piştî ku kitap weşiya, ew xwedî diguherîne û xwendavan dibe xwedyê kîtebê û bi xwendin û ditinên xwe li kitêbê xwedî derdikeve û wê dike nemir. Herçî rexnegir e, ew di navbera nivîskar û xwendevan de pireke xurt e. Ew pireke welê ye ku herdu aliyan digihîne hev û alîkarî li herdu aliyan dike da ku nivîskar hîn çêtir binivîse û xwendevan hîn çêtir bixwine. Bi vî awayî rexnegir alîkarî li jiyana edebî dike da ku ew hîn geştir, xweştir, pêşketitir û kûrtir be.

Rexnegir bi karekî weha pîroz radibe. Bi alîkariya rojname, kovar, radiyo û kitêban, rexnegir dibe ziman, guh û çavên jiyana edebî. Ew kitêba edebî, form û naveroka wê û nivîskarê wê dide nasîn, çavê xwe li kîmanîyan û dîtin û pêşniyarênen xwe (ji bo herdu aliyan) dinivîse.

Ji lewrê pêşvexistina edebiyatekê, avakirina jiyaneke edebî û perwerdekirina xwendevanan pir bi rexne û rexnegiriye girêdayî ye. Li cihê ku rexne û rexnegirî hebe û xurt be, li wê derê, hêdî hêdî, edebiyateke xurt jî tê pê. Lê li cihê ku rexne û rexnegirî tune be yan jî qels be li wê derê edebiyateke xurt hêşin nayê û edebiyat û jiyana edebî di nav komeke teng de dimîne.

Gelo revşa rexne û rexnegiriya kurdî çawan e? Ez baver nakim ku kes bikaribe bibêje ku rewş baş e. Ji bervajiyê, rewş kambax e. Sebebên vê pir in. Berî her tiştî, zordariya dewletên dijmin, perçebûna welatê Kurdistanê, paştemayina civatê û bikaranîna sê elfabeyên cihê (latînî, erebî, kirilî) di warê rexne û

rexnegiriyê de jî girêk û bêgaviyên mezin anine pê. Digel wê yekê, perçebûna civakî û sîyasî jî problem zêde kîrinê. Mîna her tiştê kurdî, di warê rexne û rexnegiriya kurdî de jî mesele û zahmetî pir in û kesên kû serê xwe bi wan mesele û zahmetîyan diêşînîn, kêm in. Li hemû Kurdistanê û li derveyî welêt, bi tenê çend kes îlmê rexne û edebiyatê xwendine û serê xwe bi meseleyên rexne û rexnegiriya kurdî diêşînin û gava rê li wan vedibe, dîtinêن xwe dinivisînin.

Li her derî, rexnegir danasîn, rexne û dîtinêن xwe li ser sê pirsan ava dike; kî, çima, çawan? Û rexnegir, dîsan li her cihê bi erînî (konstriktîv) dikeve pey bersîva van pirsan û bi erînî li esera edebî dinihêre...

Heye ku ez şaş im, lê bi qasî ku ez dibînim, li ba me kurdan ne weha ye. Ji ber sebebêن ku min qalê kîrin, em kurd ne bi erînî, lê bi neyinî (destruktîv) dikevin pey bersîva pirsan û bi neyinî li esera edebî dinihêrin. Loma, pir caran, li ba me kurdan, rexne dibe çêr, qisêن bêedeb û dijminahi. Û dewsa dilopêن zêrin yêن danasîn, edeb, perwerî û dostiyê, pêñûs dilopêن jahrîn yêن bedbînî, hesûdî û berberiyê direşînê.

Kî ji vê yekê destkevtî dibe? Heye ku hin kes û hêz jê destkevtî bibin, lê ne kurd û edebiyata kurdî. Di vê rewşa kambax de, para nezaniyê pir e. Gava dewsa pisporan, militan û dewsa niviskaran xwendevanekî ku çend kitêb xwendine, rahêjin pêñûsê, rewş weha dibe. Ji lewre pir girîng e ku nivîskar, hunermend û ronakbîrêن kurd hewl bidin rexne û rexnegirî û pêla vî karê pîroz bilind bikin. Ziman, edebiyat û hunera kurdî hewcedarê rexna bedew û rexnegirêن pispor e.

Edebîyata kurdî hewcedarê rexnegirî welê ye ku  
1-Bi ilim, qayide û prensîbêن rexne, rexnegirî û edebiyatê perwerde bûye.

2-Pêşvexistina edebîyata kurdî ji bo wî/wê esas e û ji bo xwendevanan dinivîse.

3-Ji bo kesekî û hêzekê nanivîse û pîvanêن bi tenê kesekî û hêzekê ji xwe re esas nagire.

4-Rû ji ehlaq û pîvanên rexnegiriyê ba nadî, di nav komên idolojî, siyaset, hêz û rêxistininan de xweserîbûna rexnegiriyê ji bîr nake.

5-Bi zimanekî sivik, zelal û xweş li ser kitêba edebî û niviskarê wê agahdariyêن esasî dide xwendevanan û aliyêن baş û kêmaniyêن niviskar nişan dide.

6-Bi zanîn rexnegirî dike û rexna xwe li ser lêkolîn, lêhûrbûn, agahi, rexne, şerh û giranbihayiyê avadike.

7-Tu carî rewşa zimanê kurdî û hejahiya nivisîna bi zimanê kurdî û kitêba kurdî ji bîr nake.

Wekî, destpêk, di vê hejmara Kurdistan Pressê de em dest bi rexne û danasînên kurtêçirok û romanên kurdî dîkin û hêvî dîkin ku ev gav di xizmeta pêşvexistina rexne û rexnegiriya kurdî de be

**Kurdistan Press, 26.Gulan.1990**

## **Li ser romana TU**

Berî her tiştî, ez spas dikim ku hevalên mamestêez nivîskar hesibandime û vexwandime vê derê da ku ez bikaribim li ser romana xwe bipeyivim. Spas... Ez ê ji "romana kurdî" bêtir li ser romana xwe bipeyivim. Bi min xweş nayê ku ez mîna nivîskarê romanekê rabim û li ser romanên kurdî bipeyivim. Lê belê, bi dû xeberdana min re, em bi hev re dikarin li ser vê yekê ji sohbet bikin.

Bêguman, gava ez dibêjim "*ez ê li ser romana xwe bipeyivim*", ev nayê wê manê ku ez ê li ser başî yan ji xirabiya romanê bipeyivim. Xwendekar dikarin wê bipîvin û li ser hêjahiya berhemê bipeyivin. Lê ne nivîskar bi xwe. Min romana "TU" nivisiye, ew êdî ji destê min derketiye. Ew niha ya xwendevanan e, ya gelê kurd e, ya tarîxê ye. Xwendevan û pêşeroj ê wê bipîve û li ser hêjahiya wê bipeyive. Ne ez... Ez dixwazim, bêtir, li ser sedemên nivisina vê romanê bipeyivim û bersîva pîrsên çima, ci, çawan bidim û zehmetiyêñ nivîsinê, nivisina kurdî pêşkeşî we xwendekar û guhdarêñ hêja bikim. Di her nivisina berhemek edebî de hin kesp û kospêñ teknikî hene, problemen lihevaninê hene. Zanîna van, ji bo pêşerojê, dibe tecrube. Nivisina bêproblem nîn e. Nivisîn ji celebek matematik e. Eger ev nivisîn bi kurdî be, problem hîn zêdetir in. Û di ser de, herwekî tê zanîn roman û nivisina romanê li ba me kurdan fenomenek nû ye. Ji lewre, kêmanî û çewtî pir in. Bêşik kêmanî û çewtiyêñ min ji hene.

### **Çima?**

Gelo min çima ev roman nivisi?.. Sedem pir in, lê bi kurtahî, ez dikarim vê yekê bibêjim: Di destpêka

1970-an de, 3.adar.1971, ez û çend hevalên din, em bi hev re hatin girtin. Bi qasî du (2) salan, ez li girtîxanê eskerî yên Diyarbekir û Anqerê mam. Girtîxana Diyarbekrê ji bo min bû tecrubeyek gelek mezin, bû dibistanek. Ji aliyê civakî, çandî, siyasi û zimanê min ê zikmakî û li wê derê, ez cara yekemîn, bi xurtî, rastî edebiyatê hatim... Bi dû derketina girtigehê re, min her dil dikir ku serpêhatî û tecrubêñ xwe yên wê demê binivîsim. Lê qet min wext çênebû. Piştî 1974-an, me dest bi xebatêñ siyasi kirin û heta ku ez hatim Swêdê, xebata siyasi û weşandina kovara Rizgarî ku min berpirsiyariyê dikir, dewam kir. Gava ez hatim Swêdê, min bir û fîkrêñ xwe yên di derheqê dema girtigehan de, mîna not, rijandin ser kaxiz. Derketina derveyî welêt û ziman û çandeke nû nasîn jî hin bêtir alikarî li min kir ku ez ber bi aliyê edebiyatê bêm rakêşandin. Lê destpêkirin û nivisîna romanê piştî 1980'yî ye. Di navenda 1981-an de, min dest bi nivisîna romanê kir... Cunta eskerî ya Turkiyê, 1980, ji bo min bû dersek baş. Heye ku ez çewt im, lê min, mîna şexis, jê derxist ku mesele, zehmetî û problemêñ kurdêñ Turkiyê ne bi tenê qelsiya xebatêñ siyasi û rêkxistinî ne, herweha civakî, çandî, ronakkîrî, edebî, felsefî, nefsi û h.w.d. in. Ji ber vê yekê, bala min bêtir, rakêşa ser ziman, edebiyat, çand û hunerê. Em dikarin bibêjin ku "TU" encam û berhema vê balkêşanê ye.

Lê belê, gava min dest bi nivisinê kir û bi qasî 50 rûpelan nivisi, min dît ku ez nikarim binivîsim. Ji ber ku kurdiya min têri nivisîna romanekê kurdî nedikir. Ez nikaribûm ji binî derkevim. Min berê jî bi kurdî dinivisi û nivisarêñ min di kovar û rojnamêñ kurdî de diweşîyan. Lê nivisîna romanekê karekî kûrtir, firehtir û dirêjtir bû. Hingê min dev ji nivisîna romanê berda û dest bi xwendin û temrînêñ nivisîna kurdî ya edebî kir. Demeke dirêj, min berhem, eser û weşanêñ kurdî ku diketin destê min, xwendin. Min ji wan not derdixistin, lista peyv, cimle, gotin, edet û üsilêñ

nivisîn û fikirîna kurdî çêdikirin. Min, ji bo xwe, name, gotar bi kurdî dinivîsîn, bi rûpelan taswîrên edebî çêdikirin... Bi dû vê xebatê re, ez dîsan li romanê vege riyeke dirêj e, dilopeke nû ya kahniyeke kevn e. Ev kitêb li kitêbên ku hene, zêde bûye. Wan ev anîne dinê. Hin ji gotin û qiseyên windabûyî yên wan kovar û kitêban, niha, di nav rûpelên TU de, dîsan, derdikevin ronahiyê.

### Çawan?

Di nivisînê de, jiyana min a girtîgehan bû esas. Ew dewr, wext, cih û dewran bûn hîmîn bingehîn. Min dest bi salixdana wê dem û jiyanê kir. Lê dîsan, gava xebat bi pêş ve çû û ez ketim nav romanê, ez têgihiştîm ku ez ne romanek, lê riportajek, serpêhatiyek, bîranînekê dinivîsim. Qayide û prensîbên nivisîna romanê hene. Meriv behsa xewn û xeyalan jî bike, behsa rastiyên jiyan û civatê jî bike, ev weha ye. Gelek roman ji seri heta bini xewn û xeyal in, tu pêwendîya wan bi rastiyê nîn e. Lê belê, ew xewn û xeyal jî, dîsan, li gora pîvan û úsilîn nivisîna romanê hatine hûnandin. Roman divê bête hûnandin, bedewiya edebiyatê divê tê de hebe, stil, naverok, raxistin û ziman divê lihevhatî be û tâhm bide xwendevan. Ew beşen sohbata bi kêzê re, bi van bîr, hîzr û fikiran hatin pê. Eger ev beş nebûna, bi baweriya min, roman ê nebûya roman. Ew ê pir kêm bûya. Armanca min nivisîna romanek bû. Ji bo vê yekê jî, ji dema girtixanan pê ve, tişt, bûyer, wext, dewr, dewran û cih û warêñ din jî diviya hebûna. Min ew ceribandin û beşen kêzê peyda bûn. Bi vî awayê, raxistina romanê hate pê.

Herwekî we dîtiye, roman bi du forman hatiye nivisîn. Forma yekem girtîgeh, bûyerên girtîgehê û wê wextê dihundirîne. Jixwe roman jî li ser wan şax dide. Bi kurtî, em dikarin ji vê formê re bibêjin forma tu. Li wir nivîskar bi kesê yekeminê romanê(qehremanê

romanê) re dipeyive, jê re behsa wî û jiyana wî dike. Forma duwem jî, em dikarin bibêjin, forma ez e. Li wir jî, ne niviskar, lê qehremanê romanê bi xwe dipeyive. Ew bi kêzek re dipeyive. Ji qehreman re yek diviya ku pê re bipeyiviya. Min kêzek jê re peyda kir!.. Û tiştên ku qehreman ji kêzê re behs dike, piraniya wan çêkirî ne. Mesela wî hin tiştên ku xwendine, mina ku wî ew jiyane, behs dike. Ev yeka pêwist bû da ku min bikaribûya hin bûyer, wext, cih û dewrên din ên rast û nerast jî bixista nav romanê û roman, bi rastî, bikira roman. Peydakırına kêzek, bêşik, xeyali ye, fantazî ye, ne rast e. Bi alikariya xeberdana qehreman bi kêzê re, roman şax dide û vedibe, ber bi hin aliyêñ din dere. Girtîgeh, jiyan û wexta girtîgehê, bi vî awayê, perçê dibe, tê şkestin û hin wext, cih û bûyerên din dikevin navê.

Herweha roman ji deh beşan hate pê; pênc beş girtîgeh û jiyana wê derê û pênc beş ji bi kêzê re xeberdan û hin cih û dewrên din. Beşen ku bi kêzê re ne, herikîna bûyerên girtîgehê û taswîra wê demê dibirin, car bi car. Û li wir mesele û bûyer carina ber bi paş, carina ber bi pêş derin. Bi vî awayî, roman disan dizivire û tê cihê ku dest pê kiribû û li wir diqede. Di destpêkê de, qehremanê romanê li hucrekî ye, işkence dîtiye,bihnteng e, tenê ye, esebî ye û bi tesadîfi kêzek dibîne û dest pê dike û bi kêzê re dipeyive. Gotinêñ wi tev li hev in, piranî ne li hev in û di nav wan de dûzan nin e. Tişt û bûyerên rast û nerast di nav hev de ne. Roman weha dest bi herikînê dike. Di dawiyê de, herikîna romanê disan xwe digihîne hucrê û diqede. Di romanê de raxistineke edebî ya weha heye.

Çima min ev roman weha bi du forman nivisi? Ma ew bi tenê bi formek vebihata nivisîn ne hêsanter bû? Ma hê ji bo pexşan û edebiyata kurdi ne zû ye ku meriv bi formen weha binivise? Hin xwendevanêñ eziz vê yekê ji min dipirsin... Di forma tu de bûyererek heye ku ez jî tê de bûme, pê re jiyame; hepîsxane. Girtin, lêdan, hepîsxane û h.w.d. tiştên nexweş in, bîhntengî ne. Ez bawer dikim

ku taswîrkirina wan û salixdana rewşa psikolojîk ya wan ne hêsan e. Nemaze ji bo kesekî ku bi xwe jî tê de bûye û dixwaze wan tecruban bi zimanê kurdî û bi şêweyek edebî binivîse... Di vir de, min wisan çêtir dît ku bûyer û mesele hinekî ji min bi dûr kevin ku ez bikaribim wê demê binivîsim. Bi forma ez, ev yeka dê zehmet bûya. Loma min wê demê, mîna ku hatibe serê kesekî din, bi forma tu nivisî. Wekî ku hatibe serê kurdeki. Mixabin ku jiyana hepışxanê li welatê me ne tiştekî pir orijinal e. Gelek kes ketine hepışxanê. Loma min xwest di vî warî de xetên hevbeş bibînim da ku ji tecrubê hemû girtiyêñ welêt tiştine tê de hebin. Ew tecrube nebin tecrübê şexseki, lê di şexsê kesekî de bibe neynika hemû tecruba.

Bêguman di helbijartina van forman de, eserên edebî ku min xwendibûn, tesîr li min kirin û piştî ku min li ser forma **tu** bîryar da, min ji nû ve ew eserên ku bi vê formê hatine nivisîn, xwendin. Hin nivîskaran bi vê formê nivisîne. Form ne hêsan e, lê xwes û pir edebî ye, eger meriv bikaribe li hev bîne. Meselan ji xwe bi dûr xistin û bi vî awayê taswîrkirin, bi qasî ku ez dizanim, ne hêsan e. Meriv divê hakîmê formê be da ku tê de winda nebe û mîzîna herikîna gotinê têk nere. Ji bo agahiyê, min dil heye navê hin nivîskarêñ ku bi vê formê nivisîne, li vir bibêjim; Carlos Fuentes, Oriana Fallaci, Julio Cortazar... û Ihsan Nûrî Paşa. Belê ew jî. Gerçî Ihsan Nûrî Paşa tu roman yan jî berhemên edebî nenivisîne, lê nameyek kuwî ji "xortê kurd" re şandiye, di HAWAR'ê de weşiyaye. Ew name bi forma hitabê hatiye lêkirin û gelek xwes e. Û di romana TU de jî, hin hevokên wê namê, ji devê yek ji qehremanên romanê Apo, hatiye veguheztin. Nivîskarê navdar ê meksîkî Carlos Fuentes ku gelek roman û kurte-çirok nivisîne, bi vê forma ku ez qal dikimê kurte-romanek nivisiye: *Aura*. Ev kurte-romana ku bi forma tu hatiye nivisîn, gelek balkêş e, tê de şopêñ sembolizma dawiya sedsala bihûrî heye, xewn, xeyal û fantazî di nav hev de ne. Di

romanê de, nivîskar ji qehremanê romanê re ku ronakkirekî ye, qala jiyana ronakkîr dike. Bi hêdika, sivik û tenik. Ew di nivîsara xwe "Çawan min Aura nivisi" de behsa riya nivisina vê kurte-romanê dike. Romana C. Fuentes û bûyerên tê de ji romana TU pir cihê ne. Lê ez dikarim bibêjim ku hawa û atmosfera vegotina Aura'yê gelekî alikariya min kir.

Herçî forma **ez** e, bi baweriya min, hêsanter e. Di vê formê de, kes û qehremanê roman û bûyerê behsa xwe dike. Berhemên edebî ku bi vê formê hatine nivisin, pir û pir in. Li ser vê formê jî, disan, ez divê behsa romanek C. Fuentes bikim; *Mirina Artemio Cruz*. Nivîskar di vê romana xwe de gelek form, şêwe û awayên gotinê bi kar anîne. Qehremanê romanê Artemio Cruz li ber mirinê ye û ew jiyana xwe yabihurî bi bir tîne. Haletê ruhiya mirinê, mîna xeta esasî, di hemû romanê de rakêşayî ye. Ew bîhtengî, bêçaretî û esebiyeta li ber mirinê her xuyaye. Ji bo taswîirkirina qehremanê romana TU jî, di forma ez de, ev haletê ruhiye û ev şêweyê edebî diviya. Ji ber ku qehremanê me di romanê de girtî ye, işkence ditiye, eşiyaye, perçiqiye, ditirse, bi tenê ye û nizane ka ci dê bi serê wî de were.

Hawayên ev her du formên romana TU ji hev pir cihê ne. Forma tu nerm, tenik, hêdî û giran e. Mîna şerîda filmekê. Taswîr, salixdan û vegotina psîkolojiya merivan di besên ku bi vê formê hatine nivisin de, ji besên din bêtir in. Forma ez bi lez û bez e, metafor, fantazi, xewn û xeyal tê de pir in, gelek aliyê wê çewt û şaş in, gotin bi hev namînin, carina ber bi jor, carina ber bi jêr in, taswîr ne li ser xetek rast in, ne heş lê daxwaz, ne mantik lê tesaduf esas in. Icar di besên ku bi forma ez hatine nivisin de, haletê ruhiya insanekî ku li ber dînbûnê ye, heye. Raxistina romana TU, bi kurtahî, bi van şêweyan e. Hem ji aliyê bûyer û salixdana wan û hem jî ji aliyê awa û şêweyên wan, ev her du form ji hev pir cihê ne. Û ew bi zanîn di romanê de hatine bikaranîn.

Ev celebeke nivisîna romanê ye. Ji vê pê ve jî, gelek celebên nivisîna romanê hene. Lê min ji xwe re ev celeb helbijart.

### **Beden û kirasê edebî**

Niha jî ez dixwazim çend gotinan li ser diyalog û stilên romanê bibêjim. Her form û stil xwediya awayekî taybetî yê gotin û taswîrkirinê ye. Ji bo her formê her celeb ne rast e. Meriv divê li gora formê bikaribe awa û şêweyên gotina ku li wê formê tê bibîne, peyda bike. Gava weha nebe, form, bûyer, hawa li hev nayêñ û ew nabin yek. Ji bo helbijartina şêweyê gotinê, meriv divê pêşî biryar bide ka kîjan formê bi kar tîne. Min li gora her du formên ku min di romanê de bi kar anîne, du awa ûşêweyên gotinê hilçandin; 1- *awayekî dîn, bi lez û bez, heyecan, tîrs...* 2- *awayekî hêdî, tenik, sivik...* Li vê derê meseleyek din jî heye; kesên ku dipeyivin kî ne, ci ne, ji ku têñ, bi kîjan devokan dipeyivin, ji kîjan kategorî û aliyêñ civatê têñ? Di edebiyatê de, hostetî ew e ku meriv bikaribe kesan bi awayekî jîndar, balkêş û lihevhatî bîne pê. Gundiyekî divê di romanê de jî gundi be, profesorekî jî herweha. Ev her du celeb meriv divê nekevin dewsa hev. Bi fikirin, rabûn û rûniştin û dan û standinêñ xwe, ew ji hev cihê ne. Ev di edebiyat û romannivisînê de esas e. Esasekî din jî heye; lihevhatina stil û bûyerê. Stila ku meriv di romanê de bi kar tîne divê li bûyerên romanê were. Hin nivîskarêñ navdar, mîna Umberto Eco, Roland Barthes, Knut Ahlund, Italo Calvino, li ser vê meselê berhemên hêja nivisiye... Ev nivîskar nîşan didin ka min romana TU li gora kîjan qayide, edet û üsilên romannivisînê nivisiye. (Hejmartina navan hinekî jî loma ye). Di romannivisînê de gelek edet û traditionêñ cuda hene. Meriv nikare romanekê amerîka-latîni bide ber romanekê bulgarî, yan jî yeka norweçî bide ber yeka itâli. Romanekê romantik ji ya realist, yeka "nouveaux romane" ji ya sosyalrealist pir

cihê ye. Ji ber îdeolojiyên siyasi û hinek qayide û prensibên nivisînê, ew ji hev cihê ne.

Helbet berî ku roman tê nivisîn, nivîskar divê li gora war, dewr û bûyerên romanê, ji xwe re cihanekê "ava bike." Ev jî, dîsan, ez bawer im, bi xwendin, lêgerîn û lêpirsinê dibe. Di romana TU de jî hin cîhan hene; cîhana zaroktiyê, cîhana xortiyê, cîhana îşkence û lêdanê, cîhana jiyanekê hevkar li girtîgehê û h.w.d. Min ev jî, li gora xwe, bi xwendin, lêgerîn, lêpirsin û sohbetan ava kirin... Herçî cîhana girtîxanê ye, gelek tişt li serê hatine nivisîn. Li dunyayê herkesî li ser girtîxanê nivisiye. Eger min jî, bi tenê jiyanâ girtîxanê taswîr bikira, hingê romana min ê nebûya romanekê kurdî. Ji bo romanekê millî diviya edet, ûsil, jiyan, civat, fikirîn û rabûn û rûniştina kurdî jî tê de hebûna. Min hem cîhaneke girtîxanê ya millî diviya hem jî hin cîhanen din diviya lê zêde bûna... Beşen bi kêzê re sohbet li ser vê hewcedariyê hatin pê.

## Çî?

### (War û wext û kes)

Eger ez li ser warênu ku di romanê de lêbûne jî hin tiştan bibêjim, divê berî her tiştî ez behsa girtîgeha eskerî ya Diyarbekirê bikim. Girtîgeha ku di romanê de ye, ya Diyarbekirê ye. Lê ne ya piştî 1980-an. Ya destpêka 1970-an. Ev herdu girtîgeh ji hev pir cihê ne. Min ya 1970-an taswîr kiriye. Em hemû dizanîn ku ya 1980-an cehenemek bû. Lê ji ber ku min ew girtîxane nedîtiye, ez li wir nemame, min nikaribû girtîgeha 1980-an ya Diyarbekirê salix bida. Lê ez bawer im û hêvi dikim ku ew girtîxane jî dê rojekê bê nivisîn. Hucra ku di romanê de ye, çêkirî ye. Ez neketime hucreyeke welê û min mîna qehremanê romanê ewçend îşkence jî nedîtiye. Ji lewre, ez dikarim bibêjim ku di avakirina qehremanê romanê de perçeyek ji min û tecrubê min jî heye, lê ew ne ez im. Roman ne otobiyografîk e. Tê de ez jî heme, lê qehremanê romanê

em hemû ne. Cîh û warêñ din ên ku di romanê de hene, piraniya wan, çêbûyî ne. Di avakirina wan de, realite û xeyal ketine nav hev. Ma jixwe edebiyat jî ne ev yeka ye? Armanc; lihevanîn û ahenga stil, form, bûyer û taswîran bûye.

Em werin ser mesela wextê... Gelo kîjan wext di romanê de hatine bikaranîn û çawan? Wexta hemû romanê di esasê xwe de kurt e, bi tenê çend roj in. Hemû roman li ser bûyereke çend rojan ava dibe. Lê ji bo ku roman bibûya roman, diviya min ev wexta teng û kurt bi hin aliyên din firehtir, dirêjtir bikira û hemû bûyer gav bi gav venegota. Bi tenê vegotin û salixdana bûyerek ne roman e. Jê re estetikeke edebî, zimanekî xurt û kûr, bûyerên dewlemend û balkêş, qehreman û kesen jîndar û h.w.d. divê. Yek ji sedemên forma ez û besen bi kêzê re sohbetê, dîsan, ev e. Wê formê û wan besan alikariya min kir. Bûyara bingehîn ya romanê bi van besan hatin vegetandin. Û bi alikariya wan, hem nivîskar û hem jî qehreman carina bi metoda flashback li rabirduya xwe vege riya û carina jî ber bi pêşerojê çû. Wext ketin nava hev. Do, iro û dahatû bûn yek. Ez bawer im, bi vî awayî, roman ji aliyê ziman, stil, form, bûyer û gotinan kemili.

Mîna her romanê, di romana TU de jî çend kes hene. Ez dixwazim, bi kurtî, çend gotinan jî li ser qehremanen romanê bibêjim û gotara xwe bi dawî binim. Digel hin kesen din, di esasê xwe de, çar kes xwediyê rolên sereke ne. *Xort*; qehremanê romanê ye. Kurdeki xort e. Di pêkanîna vî qehremanê de ji min bi xwe jî hin alî û tecrube hene, lê ew ne bi giştî ez (nivîskar) im. Min xwest bila ew bibe kurdeki giştî ku hemû xwendevan bikaribin xwe tê de bibînin. *Apo*; ev kaleki kurd e. Qehremanê romanê li hepisxanê rastî wi tê. *Pismam*; kurê mamê qehreman e, li hepisxanê ye, xebatkar û aktivistê kurd e. Û *mamoste*., şexsên esasî di romanê de ev in.

Tecruben min ên wê demê kakila taswîra xortê kurd

tîne pê. Lê ew ne ez im, bi tenê hin aliyên min pê re ne. Ji ber ku min dixwest, bi alikariya vî qehremanî, hin tiştan bibêjim û vebiguhezinim xwendevanan. Rola xort di esasê xwe de ne zêde ye. Belê, ew qehremanê romanê ye, di navenda romanê de ye, lê ew ne insanekî aktiv e. Gelo wî ci kiriye, ci dike, ji bo ci hatiye girtin? Ev ne diyar in. Ew mîna lampayekê ye. Min xwestiye, bi alikariya wî, bi bikaranîna wî, ronahî bireşinim ser bûyerên romanê. Xortê romanê ne besdarvan, lê nêrevan e... Icar Apo merivekî rasteqîn e. Ew li girtigeha eskerî ya Diyarbekirê bû, ji kurdayetiyê, dawa Partiya Demokrata Kurdistanê hatibû girtin. Navê wî yê rastî Halil Çiftçi û ji Botanê bû. Jê re "Xalê Xelîl" digotin. Ew hê hingê pir kal bû. Tevî ku ew kal bû, jê re 16 sal ceza dan. Xalê Xelîl ji bo Apo bû esas. Lê gelek wesif û aliyên din ên hin ronakbirê kurd mîna Osman Sebri, Celadet Bedirxan, Qedri Cemilpaşa, İhsan Nûri Paşa lê zêde bûne. Jixwe gelek gotin û vegotinên Apo (çirokênu ku ew behs dike jî tê de) ji gotin û vegotinên van şexsiyetên kurd ku piranî di nav rûpelên Hawar, Ronahî û Roja Nû de ne, hatine veguheztin. Bi alikariya Apo, ew ji nû ve hatine vejandin. Bi vê metoda hanê ku jê re bi zimanê ilmê edebiyatê "intertekstualité" tê gotin, diyaloga tekst û nivîsarên do û iro çêbûye. Pismam di esasê xwe de pismamê min bi xwe ye; rehmeti Ferid Uzun. Hingê ew jî li girtigehê bû, ji dawa DDKO'yê (Dewrimci Dogu Kültür Ocakları). Ew merivekî xebatkar û piralî bû, dilê wî bi doza welatê Kurdistanê hildavêt, gelek germ bû. Lê kesê Pismam di eyñî wext de hemû endam û serokên DDKO'yê ne. Wê çaxê ev rêkxistin fenomaneke gelek baş bû. Serok û endamên wê ku hemû xwenda û ronakbir bûn, tevgera kurdî nû û modernize dikirin. Pismam kurdê ronakbir ê wê demê ye. Herçi Mamoste ye, şexsêlsmail Beşikçi, ronakbir û lêgerekî tirk, lê kurdperwer û kurdparast, esas hatiye girtin... Lê kesê ku min xwest di romanê de, bi alikariya van her çar şexsan, nişan bidim, merivekî

bû. Ev her çar şexis di esasê xwe de merivekî ne. Di taswîrkirina her şexsî de, min xwest hin aliyên wî merivî bidim. Ew meriv jî qerekter û şexsiyeta kurdî ye. Qerekter û şexsiyeta ku ez dil dikim û hêvî dikim ku di rojêñ bê de pir bin û gelê kurd temsîl bikin. Merivekî bi vê qerekter û şexsiyetê ku ez dil dikim hebe, ne dûrî gel û welatê xwe ye, ew tarîx û tecrubêñ rabirdû dizane, bir bi pêşerojê dibe, bi xwe bawer e, haya wî ji edebiyat, çand, ilim û hunerê heye, jiyana civakî dewlemend dike, qedr û qîmetê dide tiştan, dijminahî nake... Di taswîrkirina kesêñ romana TU de, bi veşartî, daxwaz û hêviya qerekter û şexsiyeteke weha heye. Bi qasi dilopekê be jî, min xwestiye, bi qayidêñ edebî, vê daxwazê berpêş bikim.

Nemaze di taswîr û salixdana Apo de kovarêñ giranbiha *Hawar*, *Ronahî* û *Roja Nû* gelek alikarı li min kirin. Apo di romanê de tarîx û çand e, ziman, edet û úsilêñ civata kurdî ye. Kêmaniyêñ min di van waran de gelek bûn û hê jî gelek in. Her kes û qehremanê romanekê divê li gora cihana ku ew tê de dijin, bêñ salixdan. Cihan, jihan, peyv û fikirîna Apo, bi her awayî, di nav rûpelên van kovaran de hebû. Ez alikariya van kovarêñ hêja û nivîskarêñ wan ên hêja tu carî ji bîr nakim. Ez ji wan gelek tişt hîn bûm... Di taswîrkirina Mamoste de, rês û rûpelên kitabêñ İsmail Beşikçi, ya Pismam de, yên bultenêñ DDKO û kitabêñ ku li ser DDKO weşiyane, gihîştin alikariya min.

Eger em werin ser navê romanê, min navekî ecêb tercîh kir; TU. Eger nav hinekî ecêb be jî, min di romanê de dixwest şexsekî, bi tenê merivekî taswîr bikim û behs lê bikim. Û bi alikariya wî şexsî, ez tiştin bibêjim û tabloyêñ jiyana civakî ya Kurdistanê bidim. Herwekî ku em dizanîn, civata me, civateke kollektiv e, şexis tê de bi hin dan û standinan girêdayî ye. şexs (individ) bi serê xwe hem di civata me de hem jî di civatêñ din ên paştemayî de ne esas in. Girêdanêñ din wekî malbat, eşîr, bajar, dever esas in. Min dil kir ku

Şexsekî derxim pêş û gotin, daxwaz û mirazên xwe bi alikariya wî û piraniya caran, bi çav û nêrinêñ wî bibêjim.

### Û ziman...

Ez bawer dikim, eger ez bi kurtî behsa zimanê romanê jî bikim, ji bo munakaşan, dê baş be. Min di nivisinê de, ji xwe re, çend prensîb derxistin û ew li ser diwarê oda xebatê daleqandin.

1- Elfabe û gramera Hawarê esas bû. Min hewl da ku ez bi wê binivîsim. Iro di warê nivisîna kurmanciya jorê de, em divê qebûl bikin, tevliheviyek heye. Ji bo çareserkirina tevliheviyan û standardizekirina zimanê kurdi, em divê li ser elfabe û gramerekê biryar bidin. Bi ya min, di vî warî de, iro alternatifâ herî baş û herî bi rêk û pêk elfabe û gramera Hawarê ye.

2- Min ji ber xwe peyv, gotin û qise çênekirin. Ez bi dûrê vê yekê mam. Dewsa ku ez wan çêbikim, min ew ji der û dorêñ din wergirtin. Eger peyvek, gotinek didevoka min de yan jî di zaravayê kurmanciya jorê de tune bû, min ew ji zaravayêñ din, eger di wir de tune bû, ji erebi, farisi yan ji zimanêñ ewrûpî wergirtin.

3- Ji tarîxê û vir ve, di zimanê kurdi de, devoka edebî ya Botanê ye. Min xwest, ez li gora vê devokê, qet nebe, nêzî vê devokê, romana TU binivîsim.

4- Min hewl da ku ziman bi awayekî sivik lêbe. Ew bikaribe biherike. Ez bawer im, ew mesele, iro, ji bo me, problemeke mezin e. Ji ber ku kurdiya ku em pê dipeyivin, ne edebî ye, ne zimanê nivisînê ye. Ew bi tenê zimanê xeberdanê ye. Mixabin ku ev rastiya me ye. Du sed sal in ku ev ziman di warê nivisîn de bi pêş neketiye, baş Nehatiye bikaranîn. Zimanê ku em pê dipeyivin, ji hêjahi û spehitiya xwe gelek tişt winda kiriye. Ji zimanê kurdi re reformek, şoreşek divê. Û ji bo ku ev reform bikaribe bi ser keve, ziman divê bi awayekî pir zelal, rehet, sivik bête nivisîn û bikaranîn.

5- Herçî mesela devokan e, bi baweriya min, em divê

zimanê kurdî ne kêmanî, lê dewlemendî ye. Zimanê yekgirtî yê kurdî dê bi bikaranîn û dewlemendkirina devok û zaravayan were pê. Jixwe dewlemendiya zimanê kurdî di kûrahiyên devok û zaravayan de veşartiye. Niviskar û zimanzanên kurdan divê xwe bi wan kûrahiyan bigihînin û wê dewlemendiyê derxînin. Lê li vê derê, meriv divê bala xwe bide ser tiştekî; devok divê li gora qayide û prensibên zimanê kurdî werin nivisîn. Hin devokên kurdî, iro, ji qayideyên zimanê kurdî bi dûr ketine û zimanên biyanî gelek tesîr li wan kirîye. Ji lewre, di vir de jî qayide girîng in. Dijwarî û zehmetî hem li ber min, şexsî, hem li ber me, kesen ku bi kurdî dinivisînin, pir in. Herweha kêmanî û çewtî jî pir in. Lê ez bawer dikim ku her ku kurdî bê nivisîn, kêmanî û çewtî dê kêm bin.

Wext diherike. Mîna ku seylesofê yewnanî gotiye; meriv nikare xwe du caran di eynî ava çemê herikî dê bişo. Romana TU di destpêka salên 1980-an de hate nivisîn û di 1984-an de ji destê min derket û weşiya. Niha, ew ne ya min e, ew ya we xwendevanên hêja ye. Eger ez iro rahiştima pênûsê, heye ku min ê ew bi awayekî din binivisiya. Gava min ew nivisî, ez pir pê qayil bûm. Lê çaxa ez iro lê vedigerim, dibînim ku kêmaniyên wê pir in. Û ez bi dîtina wan kêmanîyan jî këfxwêş dibim. Yan na, ez ê ew kesê berî 5-6 salan bûma. Ez hêvî dikim ku romana TU di xizmeta afîrîn û teşwikkirina nivisîna romanên hîn hêjatir de be...

Ji we hemûyan re gelek spas ku we xwe êşand û romana TU xwend.

**Not:** *Bihara sala 1987-an, mamostayên Xwendegeha Mamostayan, Beşê Kurdi, li Stockholmê, ji bo konferansekê li ser romana min a yekemîn TU, ez vexwandim Xwendegehê. Ev nîvîsar ji wan notên konferansê amade bûye.*

## Memduh Selim Beg û Em

**Pirs:** Çima Memduh Selim Begê ewqas bala te kişande ser xwe û bû merxasekî romana "Siya Evinê"?

**M. Uzun;** Sala 1977 bû. Ez ji Kurdistana Tirkiyê derketibûm û hatibûm Sûriyê. Kurdistana Suriyê. Kurdistana Tirkiyê li pey mabû, rojên nû bo min dest pê kiribû ez li Qamişliyê bûm. Rojekê mirovê bîrewer, dostê hêja Necmettin Büyükkaya yê gorbehişt ez birim mala Mele Hesen Hişyar ku niha xwe gîhandiye diyarê gorê, cem heval û hogirên xwe yên serihildana şêx Seîdê nemir. Mele Hesen ji Lîcê bû, kalêmerekî dewr û dewranditi bû, bi kurdi û tirkî xweş dipeyivî.

Di vê ziyareta me de, Mele Hesen behsa serihildana şêx Seîd û serpêhatiyên xwe yên tê de kir. Ew tarîxa kurdan ku me li Tirkiyê bi awayekî dizi û veşartî, bi tirs û xof dixwend, bi carekê li mala Mele Hesenê Hişyar vejiyabû. Ronahiya nêrîn û baweriyên kurdi li ser dîwarêni mala Mele Hesenê Hişyar alan dida.

Li wê derê min ferqa di navbera gotina devkî ya tecrubeyan û gotina niviskî ya idolojîyan hîn baştir dît.

Di ziyareta me ya duwemîn de, Mele Hesen ji me re behsa Partiya Xoybûnê kir. Gotin û agahdariyên wî, ji bo min pir giranbiha bûn. Di vê sohbata me ya 5-6 saetan de, navek car bi car ji devê Mele Hesen derdiket; Memduh Selim Beg... Naveki ku ji bo min xerîb bû, min tu cara ew nebihistibû. Mele Hesen bi rêz û rêzdarî di eynî wextê de, bi axîn û keser behsa Memduh Selim Begê dikir. Memduh Selim Beg jî, li Sûriyê, li =amê jîyabû û berî salekê, di sala 1976-an, di nav neçarî û belengazîke mezin de wefat kiribû.

Dostanîya min û Memduh Selim Begê wusan dest pê

kir. Ez ji Qamişliyê hatim Şamê û qasî meh nîvekê li wir mam. Min li wir Apê Osman Sebrî û hin kesên mayîn ku ji dema Xoybûnê bûn, ditin. Li Şamê ez hin çêtir hîn bûm ku Memduh Selim Beg yek ji baştîrîn ronakbîrêñ kurd e ku di navbera 1900-1970-an de jiyaye û wî hemû jiyana xwe bi xebata doza kurd û Kurdistanê derbas kirîye.

Li Şamê, ez ji tiştekî pir û pir êşiyam; Memduh Selim Beg bi rastî jî, di nav rebenî, bêkesî û belengaziyeke ecêb mezin de serê xwe danibû axa rehmetê. Pere û îmkanêñ wî tune bûne ku wî bikaribûya mesrefen nexweşxanê bida û li nexweşxanê bima. Digel ku bi hezaran, deh hezaran, mîlyonan kurd li Şamê û Kurdistanê dijîn, kesî alîkarî li Memduh Selim Begê kal û bêkes nekiriye (ji çend kesan pê ve...)

Kitabxaneke dewlemend ya Memduh Selim Begê hebûye. Tê de ji rojname Kurdistanê bigire (ya ku sala 1898-an li Kahîrê weşiyabû) heta sala 1960-an her tiştê ku li ser kurd û Kurdistanê, ci ji aliyê kurdan, ci ji aliyê biyaniyan de weşiyaye, hebûye. Memduh Selim Beg ev kitabxana dewlemend jî, ji bo mesrefê, bi deh hezar lîrayê Surîyê yêñ wê wextê derdixe firotinê. Lî tu kesî deh hezar lîra nedîne û ew kitabxane ji windabûnê xelas nekiriye. Ma ci bi serê kitabxanê tê? Ew winda dibe. Akademiya Kurdi Ya Bexdayê hin ansiklopedî û kitabêñ ilmî dibin Iraqê, çend kes jî hin tiştan werdigirin, dibin. Ji van pê ve, hemû tiştên mayî ku li gora gotinan giranbihayiya wan bi malê dinê bûye, bi kilo, di dikanan de hatine firotin û bi vî awayi kurdan kitabxaneke din jî winda kirine...

Min ev bûyer di romana xwe ya **Siya Evinê** de nenivisi. Min nikaribû binivisa. Pênusa bêruh, bêhiş, bêpejn neliviya ku vê bûyera kirêt li ser kaxiz salix bide.

Gava ez diçûm Şamê, min berê xwe dida taxa mihaciran ku Memduh Selim Beg lê jiyabû, ez kuçe û kolanêñ wê gav bi gav digeriyam, min kaşa ku mala wî lê bû, ziyaret dikir û ez diçûm wan aşxane, çayxane û

cîhêن ku Memduh Selim Beg diçûyê.

Sala 1984 an, gava ku ez li Sûriyê bûm, çûme mala jina Celadet Bedir-Xanê gorbihişt, xanima hêja Rûşen Bedir-Xanê. Wê ji min re behsa evîna Memduh Selim Beg û Ferihayê kir. Hingî çirûska nivisîna Romanê li wir veda û min kakila romanê, rengê nexşa wê û teşîya rêsandina wê peyda kir. Eger alikariyên Rûşen Xanimê nebûna, ez bawer nakim ku min ê bikaribûya romana Siya Evînê bi wî awayî binivisa. Di nivisîna vê romanê de ez ez minetdarê wê û kesên weki Necmettin Büyükkaya, Seyda Cigerxwîn, Mele Hesen Hişyar, Osman Sebnî, Gurgin Hişyar û kesên mayîn im.

**Pirs:** Mirov dikare romana "Siya Evînê" wek romanekê nîw-dîrokî bihesibîne?

**M. Uzun:** Di vî warî de, romannivîskar û endamê Akedemiya Fransızî Marguerite Yourcenar ku berî çand salan çû rehmetê, weha dibêje; "*Her roman, di esasê xwe de romanekê dîrokî ye.*" Ev gotin rast e. Romanek li ser daxwaz, xewn, bûyer, dan û standin, bîr û baweriyên duh yan jî iro ava dibe. Wext, dewr û dewran diherike. Di demeke kin de, iro dibe "duh". Li vê derê, tiştê esasî yekitiya iro û duh e. Iro berçavka duh e. Duh neynika iro ye û ev herdû bi hev re ne, rêberên pêşerojê ne. Mirov tovîn pêşerojê, ji iro ve bi tecrube û zanînêñ duh, diçine. Netewe û welatêñ ku dan û standinêñ ahengdar di navbera duh-iro-pêşerojê de de ava kirine, bi pêş dikevin û serfiraz dibin.

Bi baweriya min, neteweyê kurd û welatê Kurdistanê dan û standineke ahengdar ava nekiriye. Bi qasî ku ez dibînim iro baweriya neteweyî, zanîn û nasîna huwiyyeta neteweyî li ba me kurdan kêm e. Eger weha nebûya, me dê rê bida ku Memduh Selim ji bîr bûya û kitêbxana wî winda bibûya.?

Sebeba vê yekê ci ye? Sebebêñ vê yekê di duh û dîroka duh de veşartî ne. Eger ez li duh vedigerim û li dora Memduh Selim Begê û evîna wî romanekê dirêsinim, daxwaza min fahmkirina rewşa kambax ya iro ye. Ez

dixwazim xwe binasim, bizanim bi rastî ez çi dikim.

Ez ji kategoriyên (dabeşkirin) "romana dîrokî, romana civakî, romana pîskolojîk û hwd." hez nakim. Di romanekê de divê ev hemû tişt hebin û lihevhatî bin. Bi romana Siya Evînê, min xwest ku ez romaneke nûjen binivisim ku duh û dîroka duh wekî dekorasyona wê be. Min jiyan û evîna Memduh Selim Begê salix daye û taswîr kiriye. Lê Memduh Selîm Beg, di eynî wextê de, ez im, tu yî, em in. Memduh Selim daxwaz, tekoşîn û tradejiya 300 salan ya ronakbîrêñ kurd e.

Neteweyekî, welatekî ku li dîroka xwe xwedî derneketiye, dernakeve kor e û pêşıya wî tarî ye, di nav koma netewe û welatan de rûmeta wî tune ye. Dîrok ji bo şexsiyet û huwiyyeta netewî û ji bo iro û pêşerojê pêwîst e. Dîroka kurdan jî, herwekî welatê wan Kurdistanê, hatiye vegertin. Ez wusan bawer im ku piraniya çewtî, qelsî û şikestinan bi vê yekê ve girêdayî ne.

**Pîrs:** *Berî nivîsîna romanê, çi xebat û lêgerînên te li ser jîyana Memduh Selim Begê pêk hatin.*

**M. Uzun:** Bi qasî ku ez dizanim, di nivisîna berhemeye edebî de sê esas hene. Yek, zanîneke fireh û kûr li ser mesele û babetê romanê, berhevkirina belge û dokumentan. Dudu, hiş û mejiyê xwe bi qehreman û bûyerên berhemê re parvekirin, xwe bi wan ragêhandin û bi hîs û pejn bi wan re jîyîn. Sisê, dan û standinên xurt û ahengdar di navbera wexta nuh (iro) û wexta berhemê de avakirin. Mirov divê, herdu wextan, rewş û mercen wan wextan baş bizanibe.

Lê belê ji bo kurdeki û niviskareki kurd di praktikê de bi cih anîna van esasan pir zehmet e. Ji milekî de zordariya dewletên dijmin û ji mileki jî belengazî û peregendeyîa kurdan wûsan kiriye ku her tiştê me dikeve ber ba û bahozê û winda dibe, ji nû ve van peyda kîrin êdî pir zehmet dibe... Eger em vejerin ser pirsa xwe, bêguman min hewl da ku ez her tiştê ku li ser

Memduh Selim Begê ne, bibinim, bixwinim, peyda bikim û bijîm da ku Memduh Selîm Beg bikaribe jî nû ve, wekî insan, weki min û te, wejiyî. Ew ronakbirekî nûjen yê sedsala 20-an bû û di navbera salên 1910-1934-an de di warê xebata ronakbîrî û siyâsi de pir aktif bûye. Tarixa welatê kurdan di van salan de reng diguherîne û bêbextiyekê pir mezin li kurdan dibe. Ev sal ji bo kurdan pir û pir girîng in. Lê digel ve yekê, em kurd, bi başî, bi vê demê nizanîn. Ev dem veşartiye, ji kurdan hatîye dizin. Mesela partiya Xoybûnê ku Memduh Selim Beg yek ji serokên wê bû û bi şev û roj, bi xebatêن wê radibû... Kî ji me tiştine bi rêk û pêk li ser Xoybûnê dizane? Li ba kîjan kurdi çi bêlge li ser Xoybûnê hene? Bi baweriya min kurdan hê rêxisteneke mina Xoybûnê modern, xurt û lihevhatî ava nekirine. Lê digel vê yekê, ji çend bîranîn û serpêhatiyêن biçük pê ve, tu bêlge li ba me kurdan tune. Bêlgeyên Xoybûnê di arşîwên fransız, ingiliz, tirk, ecem û ereban de ne. Di wexta xwe de, ev bêlge li ba kurdan jî hebûne, lê ew winda bûne û çûne.

Ji aliyê din, di warê berhev kirin û bi dest xistina bêlge û dokumendêن li ser Memduh Selim Begê, min alikariyeke mezin ji Rewşen Bedir-Xan, Mele Hesenê Hişyar, Gurgîn Hişyar, Xanîma hêja jina çerkez Saadet Abla ku hevala dergistiya Memduh Selim Begê bû, wergirtin. Bi alikariya wan, min gelek sûret, name, destnivîs bi dest xistin, cih û war nas kirin, li gelek kesan guhdarî kirin û notderxistin... Mesela ev hersê sûretên ku tevî vê hevpeyvînê diweşin... Ji wan du heb li ba Rewşen Xanîmê bûn û ya sêwemîn (Memduh Selim Beg, Qedri û Bedri Cemîl Paşa) li ba dostekî Mele Hesenê Hişyar bû. Nama ku disan bi vê hevpeyvînê ve tê weşandin, Rewşen Xanîmê ew teslimê min kir. Ez spasdarî wan kesan im ku alikarî kirin û ez fedakariya wan ji bîr nakim.

**Pîrs:** *Dîjîyana Memduh Selim Begê de bi baweriya te*

## *hüsüsîyêtên herê mezin ci ne?*

**M. Uzun:** Li ser rûyê dinê, gava behsa kurd û Kurdistanê dibe, hîn tişt, hîn sûret têñ bîra meriv; pêşmergeyekî bi tising, jineke şermoke û rûpêçayî, gundiyeckî simbêlboq û rûtîrş, gundekî weran, zarokekî belengaz ku meş li ser çav û rûyê wî weniştine... Ev hemû, sûret û tabloyêñ civat û neteweyekî belengaz, reben, girtî, bindest û paştemayî ne. Bi rastî jî, ma civata kurdî bi tenê ji van pêk tê? Ka ziman, edebiyat, huner, felsefe, têgîhiştin, bîrewerî, berhem û eseren ronakbîrî yêñ vê civat û neteweyî? Ka nivîskar, feylesof, hunermend û ronakbîrêñ vî gel û welatî? Ka ew li ku ne?

Ziman, edebiyat, huner, felsefe, berhem û eserên ronakbîrî serbilindahiyêñ cîvat û neteweyekî ne. Jiyan bi van geş û xweş dibe, hevsarêñ bindestî û paştemayînê bi alîkariya van têñ qetandin. Ronakbîrêñ welitekî rûmeta wî welatî ne.

Em li tarixa xwe û kirinêñ dijmin binehêrin. Dijmin tu carî nexwestiye ku tecrubêñ kevn yêñ kurdî rabigîhêñ nîşêñ nû yêñ kurd. Dijmin tu carî nexwestiye ku ronakbîrêñ kurd li welatê xwe, di nav derya gelê xwe de bijîn û dijmin tu carî nexwestiye ku nîşêñ nû yêñ kurd, ronakbîrêñ xwe yêñ mirî, şehîtbûyi bi bir binin û wan vejînin.

Nîşêñ nû yêñ kurd rêwindayî ne. Ez ji tecrubêñ xwe dizanim, ji her tiştî bêtir, ez hewcedarê tecrube, xebat û dersêñ ronakbîrêñ kurd yêñ ku di nav rûpelêñ rizyayı yêñ dîrokê de mane, me, -da ku ez bikaribim pêşıya xwe bibînim.

Gava min Memduh Selîm Beg, Celadet Ali Bedir-Xan Beg, İhsan Nûrî Paşa, Hecî Qadîrê Koyî, Nali, Ahmedî Xani û h.w.d hîn çêtir nasîn, min dît ku tu kêmanîya van ronakbîrêñ kurd ji ronakbîrêñ din yêñ cîhanê tune, min fahm kir ku heta ez nikaribim xwe bi wan bigihînim, ez nikarim xwe bigihînim zanîneke zelal, bir û hişeki kûr.

*"Çawa wîcdana me dest dide ku em mirovekî mîna Memduh Selîm Begê ku ewçend tişt kirine, jiyana xwe ji bo netewê xwe, welatê xwe daye, ji bîr bikin?"* Min ev pirs, car bi car, ji xwe pirsî û ev pirs bû gava yekemîn ya nivîsîna "Siya Evînê." Di xebata nivisînê de, her ku ez lê hûr bûm, ez bi jiyan, meziyet û hususiyetên wî serbilind bûm û bi siûda wî ku bi gelempêrî, siûda ronakbîrên kurd e, êşiyam. Hususiyetên Memduh Selîm Begê di romanê de hatine teswîr kirin, ez li vir careke din li ser nasekinim. Lê belê, kurd divê ronakbîrên xwe û hususiyetên wan derxin ronahiyê û berpêşen nifşen nû yên kurd û cîhanê bikin. Digel jina rûpêçayî, kalêmêrê simbêlboq, zarokên birîndar û mês li rû veniştî, gundê kavil, zanîn, bîrêwerî, edeb, terbiye, bawerî, cesareta medeni, hez û humanîzma Memduh Selîm Begê ji perçeyên diroka civat û welatê kurdan e.

Min di romana xwe de Memduh Selîm Beg wekî mirovekî û şexsekî ku ji hususiyetên curbecur pêkhatîye, teswîr kiriye. Ne ku wekî qehremenekî, mîna Rustemê Zal yan Kawayê hesinker. Roman ne berdevka idolojiyên hişk û xizmetkara mesajên qehremaniyê ye. Leheng û qehramanên romanê jî, wek min û te carina baş, carna nebaş, carna rind, carna nerind, carna jîr, carina nejîr, carina qels in. Ew jî, herwekî me, dikarin bigrin, hêrs bikevn, li ber tiştan bikevin, bi bûyeran biêşin, bitirsin, biwestin û bimirin.

Em divê ji bîr nekin ku ew jî insan bûne û dîrok bi destê însanên weha ava bûye.

Gelek spas.

Kovara BERGEH'ê, hej. 4. 1990

## **Tarîx, huwyeta neteweyî, nivîsîn û xwebûn**

*Mehmed Uzun yek jî nîvîskarêñ xurt yêñ kurd e. Di van salêñ dawiyê da, wî kariye cihê xwe di edebiyata kurdi da bike û çendin romanêñ serketî biafirîne, romana kurdi ber bi pêş da bibe.*

*Lewra min bi fer zanî, xwe berdime di nav cihana nivîskariya wî da. Min nevêt bahsî jiyanâ wî bikim, çînku ew çend jî xwendevanan ra xuyaye, lê belê ez dê bi tenê çend pirsiyaran jê bikim û ez bawer im bersivêñ wî, wê çend layên tarî rohn bikin.*

### **Xelîl Dihokî**

**Xelîl Dihokî:** Te divê ci bibêjî? Mebesa te bî vê romana "Siya Evînê" û nîvîskariya te ci ye? Mesajên te ci ne?

**Mehmed Uzun:** Gava ez hê 7 salî bûm, bi his û hîzrêñ zaroktî, min bala xwe dayê ku hin tişt ne normal in. Hîngê min dest bi dibistanê kir. Heta hîngê, ji çend wêşeyan pê ve, ez rastî zimanê tirkî nehatibûm. Zimanê me kurdi bû û jiyanâ me ya civakî bi kurdi dilebitî. Lê roja ku min dest bi xwendinê kir, ez rastî cihaneke nû hatim; cihana zimanê tirkî. Kurdi, zimanê bav û kalan, li dibistanê qedexe bû û pewist bû ku em zarok hemû bi tirkî bipeyiviyana, bilebitiyana û bifikiriyana... Bi darê zorê, em mecbûri cihaneke nû dibûn... Lê gava ez mezin bûm û min bir bi tiştan, gerina gerdûnê û çerxa felekê kir, hîngê min sahm kir ka ci nîrekî kambax û dijwar li ser milê civat u jiyanâ kurdi ye. Jiyanâ me, ziman, çand, muzik û edebiyata me li me hatibû qedexe kirin. Kurd û kurdayetî, huwyet û wesfîn me yêñ neteweyî ketibûn bin qeyd û zincîran. Kesê ku doz li nav û huwyeta xwe dikir, dihate girtin,

îakence didît, li girtîgehan diriziya û mala wî wêran dibû.

Ma li cihanê, ji vê yekê xirabtir tiştekî din heye? Tiştê heri xirab û trajîk ku dikare li merivekî biqewime, qedexekirina ziman û huwyeta wî ye. Bi vê qeyd, bend û qedexeyê, ew meriv dibe lal, kerr û gêj.

Gava ez cara yekemin ketim girtixanê, 1971-73, hingê min wext pir bû ku ez bixwînim. Ez pêşî li girtîxana eskeri ya Diyarbekrê, paşê li girtîxana eskefi ya Anquerê mam. Li girtîxana Anquerê îmkanên kitab peydakirin û xwendinê hin bêtir bûn. Li wê derê, hema, çi diket ber destê min, min dixwend. Ji wan kiteban geleki wan roman bûn. Romanen ku ji aliyê niviskarên tirk hatibun nivisin. Hin ji wan romanen jî li ser kurdan bûn. Li ser serihildanen kurdan, li ser jiyana civakî, çandi, tarixî û siyasi ya kurdan... Gava min ew kitab xwendin, min hingê, 19 sali, sahm kir ku ji zordarî û totalîtarizmê re bir û bawerî, îdeolojî û nêrin jî divêndâku ew bikaribe xwe biparêze û xwe bi heq derxe. Ji ber ku di wan romanen de kurd, tarixa kurdî, jiyana kurdî, zimanê kurdî, çand û edebiyata kurdî bi awayekî din, bi çavê zordaran hatibû salixdan. Di nav wan rûpelan de, kurd hov bûn. Zimanê wan qels û "çiyayı" bû, serekên kurdan diz, keleş û sextekar bûn, kurdêne nezan mîna keriyekî pez didan pev wan "serokên dilxirab û dijminê dewletê." Dewletê, dewleta xweşperest, adîl û qedîm dixwest ronahi bireşîne ser welatê kurdan û kurdêne çiyayı kedî bike... Di nav wan rûpelan de her tişt sero-bino bûbû. Qurban bûbû cellat u cellat bûbû bav. Cinawir û ruhistîn reng guherîbin û bûbûn melayike...

Hîngê ez têgihiştîm, edebiyat û nivisîna ku divê di xizmeta merivahî û biratiya merîv, welat, çand û netewyan de be, dikare bibe şirikê zordar, çavşor û diktatoran. Hîngê ez têgihiştîm ku şerê di navbera heqî û neheqiyê, rindî û xirabiyê, serdestî û bindestiyê, totalîtarizm û demokrasiyê de li her warî dewam dike.

Ser ne bi tenê bi çek û çekdarî ye. çek û çekdarî bi tenê yek ji waren ser e. Û hingê min ji xwe pirsî "ka roman, şihîr, destan, kurte-çirok, şano û berhemên din yên kurdi ku her tiştî [civat, jiyan, bir û bawerî, ziman, çand, edet û tore û h.w.d.] bi çavê bindest û neçarmayıyan salix dide?" Hingê her çiqas ku min çavê xwe lê gerand, min nikaribû ew berhem biditina. Ew tune bûn û yên ku hebûn, hejmara wan bi tiliyên destekê dihate hijmartin, qedexe bûn.

Malwéraniyeke weha bi serê kê de hatiye?

Tarîx, bêbext e. Eger meriv ne xurt be û bi xurtî nexebite û eserên hêja neafirîne. bûyer, kirde û tiştên qewimî, bi demê, ji bir dibin û şekil û şewe diguherinin. Hingê ji bo serdestan pir hêsan dibe ku ew bikaribin bi van tiştan bilizin, biguherinin û şekil û şeweyên nû bidinê. Loma di her warî de xebat, bi bîranîn, nivîsin, belge û îspatkîrin divê. Ev tişt pêwistîyeke bingehîn e.

Ji aliyekei din ve, min bi tecrubêñ xwe fahm kir ku meriv nikare jiyanâ civat, gel û welatekî têxe nav qalibêñ teng yen rêkxistîneke siyasî. Ev fikir û raman bi xwe fikreke kambax e. jiyanê û aliyêñ jiyanê mehkûmî tengahî, nizmahî, bêgavî, neçafi û sivikiyê dike. Jiyanekê civakî herçend berfireh û piralî be, ew jiyan hewqas dewlemend û pêşketítir dibe. Civateke bêkitab, bênívîskar, bêilm û felsefe û nexwende, civateke tarî û girtî ye. Û civateke weha tu carî nikare qeyd û zincirên bindestî û paştemayînê bişkîne û bi peş ve here. Ma heta zîmanekî xurt û dewlemend, çand û hunereke berfireh tune be. şexsiyet û huwyeteke xurt û zane ya neteweyî dikare were pê? Ma heta şexsiyet û huwyeteke xurt û zane neyê pê, welatekî dikare nîrê bindestî û nizmahiyê ji ser xwe bavêje?.. Lewra tişt bi hevûdu ve girêdayî ne û hev temam dikin.

Digel gelek sebebêñ din ev his, ev bir û tecrubêñ min, rê li nivîskariya min vekirin û ji min re bûn rêber.

Em vejerin ser mebesta min ya "**Siya Evînê**"... Min heta niha 3 roman nivisîne: **Tu** (1985), **Mirina Kaleki**

**Rind** (1987) û **Siya Evinê** (1989). Niha jî romanekê nû li ber destê min heye. Eger meriv bi dîqet çave xwe li van romanen bigerîne, hingê meriv dibîne ku ew li ser yek babetê hatine hûnandin: ronakbire kurd û rewşa wî.

Her nivîskar bi xurtî bi reh û rêça xwe ve girêdayî ye. Dan û standinên malbatî û civakî, salên zaroktiyê, mala ku nivîskar lê mezin dibe û tecrubê salan pir tesir li nivîskariya nivîskar dikan. Nivîskar tu carî nikare ji van bi dûr keve. Û beguman her nivîskar dikare der û dora xwe ji herkesî bêtir û çêtir salix bide. Gelek heval ji min dipirsin ka çîma ez romanekê li ser jiyan û civata gundî û gunditiya kurdî nanivisînim. Bersîva min ji bo vê yekê pir basit e: ez nikarim, ev yeka ji min nayê. Ez jiyana gundiyan û gundîtivê nizanim, ez bî hîs, fikirin, hîzr, edet û toreyêwan nizanim. Eger ji minbihata, min dê bi kêfxweş, li ser gundiyan xwe jî binivîsa.

Ronakbir û jiyan û tevgerên ronakbiri, ji mîj ve ye, bala min dikişnin. Hem ya neteweyî hem ya navneteweyî. Herweki tê zanîn, ronakbir li her welatî roleke esasi di jiyana civakî, siyasi û çandî ya wî welatî de dilize. Pêşketina ronakbîran û tevgera ronakbiri peşketina welat e. Paştemayina ronakbir û tevgera ronakbiri paştemayina welat e. Mesele ewçend zelal e. Heta niha barê kurdayetiye li ser milê ronakbîren kurdan buye. Wan doza welite Kurdistanê kiriye, xebitîne, xwe êşandine û xwe dane kuştin. Ew bûne deng û wîjdanê gelê kurd. Ew li hember ideolojî, bîr û baweriyêne dewletên zorker rawestiyane... Bêguman, di nav wan de gelek celeb ronakbir hebûne. Hinan dest bi dozê û xebatê kirine lê paşê westiyane û dev jê berdane. Hinêwan li ser riya têkoşin û xebatê li girtigehan, li serê çiyan û bi sêdaran ve hatine kuştin. Hinan ixanet kirine û li doz û huwyet û şexsiyeta xwe bêbextî kirine û bûne berdevkê dijminên Kurdistanê. Hinan jî heta mirinê, bi gelek texlitan, doza kurdî domandine...

Jiyana ronakbîren kurd pir balkêş e. Tê de ders û

tecrubêن pir mezin hene. Hem ji bo kurdan û hem ji bo cîhanê. Ez bi hoş û heyecaneke mezin dikevim pey van ders û tecruban û dixwazim jiyana wan binasim û xwe bi dengê wan yê jibîrbûyî û windabûyi bigihinim. Ji levre, meriv dikare romanêن min mîna besen kitêbeke fireh û mezin, mîna dengin ji jiyana ronakbîrêن kurd û rûpelin ji ders û tecrubêن wan bibîne.

Bi şertê ku meriv ji bîr neke: berî her tiştî ew roman in. Nivisîna romanê ji celebêن din yên nivisînê pir cihê ye. Qayide û usilên wê yên xweser hene. Min di romanêن xwe de tarixa ronakbîrêن kurd nenivisiye. Lê ew ji tê de heye. Min kronolojî, biyografya û bibliyografya wan ji nenivisiye. Ew ji carina tê de hene. Min roman nivisîne. Herweha min hewl daye ku romanêن baş biafirinim. Ez çiqas bi ser ketime. pê nizanim. Heye ku hê pir zû be, meriv behsa biserketin û neketinê bike. Lê belê, armanc û hedefa min her ew bûye ku ez bikarîbim romanêن kurdî bi qayide û ûsilen navneteweyi biafirinim.

Ji bo min, navneteweyîti bi qasî kurdbûnê girîng e. Bêguman ez niviskarekî kurd im û her dixwazim welê bimînim. Ji levre, digel ku min dikarîbû romanêن xwe bi zimanen dîn ji binivîsanda, lê min ew bi kurdî, bi zimanê bav û kalan ku hatiye qedexekirin û hewcedarê alîkariya ronakbîrêن kurd e, nivisîne. Mîna ronakbîrekî kurd, berpirsiyariyêن min li hember zimanê min yê zikmakî pir in. Ez nikarim jê rû badîm û xwe bidim alî. Lê digel vê yekê, ez dixwazim bibim ronakbîrekî navneteweyî ku tekiliya wî bi ziman, çand û edebiyatêن din re heye. Çima ez ê xwe ji hêjayî û avahiyêن merivahiyê bêpar bihelim? Ders û tecrubêن merivahiyê, bi her awayî, merivan dewlementir dikin. Ev yek şexsiyet û huwiyyeta neteweyî ji xurttir dikin... Ez bawerî bi "enternasyonalîzma çînekê" nayinim. Baweriya min bi navneteweyi yekê ku li ser hemû ders û tecrubêن merivahiyê ava bûye, heye.

Pir caran kurd bi şik li der û dora xwe û li "xerîban"

diniherin. Meriv vî awirî fahm dike: kesên ku mala kurdan wêran û welatê wan kavil kir, "xerib" bûn. Lê ji "van xeribên çavşor u lehîzvanan" pê ve jî, xerib hene. Xeribên ku bi qasî kurdan bi rewşa wan diêşin û tiştê ku li kurdan qewimiye, neheqiyekê pir mezin dibînin. Xeribên ku qayide û hîmên demokrasî û merivahiyê di tevgera cihanê de esas dibînin. Ders u tecrubê merivahiyê divê ne "xeribê" kurdan bin. Ji lewre ez dil dikim, Ehmedê Xani hem bavê ziman û edebiyata kurdî hem jî hevalbendê Dante, Cervantes, Firdewsi, Shekespaer bibînim. Herweha Mîr Bedir-Xan jî hem rîberê tevgera kurd û hem jî hevalbendê Garibaldi, Bolîviyar, Bismarc bibînim... Ez bawer im ku yekitiyekê weha dê jiyana civakî, felsefî, edebî ya kurdî dewlementir bike.

Gava ez romanê xwe dinivisînim, bala xwe didim pîvanêن navneteweyî [universell] jî. Min romana "Siya Evînê" jî bi vê bir û baweriyê nivisiye. Rast e, berî her kesî, ez ji xwendevanê kurd re dinivisim, lê herweha xwendevanê cihanê jî divê bibin pardarêن berhemên kurdî. Da ku ew jî jê fahm bikin û jîyan, ders û tecrubê jiyana xwe di eserên kurdî de jî bibînin.

Ji ber vê yekê, meriv dikare bibêje ku mesajên min di romanê min de hem neteweyî hem jî navneteweyî ne Û ez dixwazim mesajên xwe bi tarîxa ders û tecrubê merivahiyê ve girêbidim û bikim beşekî jê. Ez romanê xwe, her gav, li ser hin meshûman(conception) ava dikim. Mîna evîn, hezkirin, siûd, bext, tarix, dijîti, ronakbîr/ronakbîri, kes, netewe, xeribî, zor û zulim, biratî, nivisîn, afirîn û h.w.d. Ji bo min gelek girîng e ku gava ev meshûm di romanê de, bi alikariya cîh, war, bûyer, dan û standin û lehengên romanê têن raxistin, ew bibin hem neteweyî û hem jî navneteweyî.

**X.D.: Tesîren edebî li ser te ci ne?**

**M.U.:** Ji jiyana şexsî ya meriv pê ve, tu tişt bi merivan dest pê nake. Meriv berdewamê tiştin e. Herikîna wextê bêser û bêdawî ye. Her tişt li hin tiştan zêde dibe. Tesîr û

tecrube jî weha ne. Eger bav û diya min tune bûna, ez jî iro çênedibûm. Eger tecrubê wan nebûna. iro ez ne kurd bûm.

Meriv mehlûqekî civakî ye û di nav civate de ye. Ew bi tena sere xwe nahewe, ew her û her divê di nav hin têkiliyan de be, hin tiştan bigire û hin tiştan bide. Tesîr bi lebata civakî tê pê û tiştekî pir baş û pir gîring e. Ji ber ku bi xêra tesîrê, civat bi pêş ve diçe û eser û berhemên nû têñ pê. Tesîr dewlemendiya merivahiyê ye, bizav û geşbûn e, nişana serwextbûnê ye û hînbûn û hînkirin e.

Mîna her kurdê Turkiyê, ez jî çûm dibistanêñ tirkî û li wan deran perwerde bûm. Loma zimane min yê ronakbîri bû zimane tirkî. Jiyana min bi du zimanân hat rapêçandin: kurdî û tirkî. Kurdî bû zimanê rojane û xeberdanê, tirkî jî bû zimanê xwendin, nîvisin û xebatêñ ronakbîri. Ji aliyê ronakbîri, ez ji zimanê xwe pir bi dûr ketim. Heta ku ez neketim girtîgehê, 1972, min xwendin û nîvisandina bi kurdî nizanibû. Li girtîgeha eskerî ya Diyarbekirê, ez rastî hin kesan hatim ku bi kurdî dinivisîn. Yek ji wan jî pismamê min yê gorbihişt Ferit Uzun bû. (Ew di 1978 an de, bi destê dijminan, hate kuştin). Hingê hin nîviskarêñ kurd jî li girtîgehê bûn. Bi tesîra girtiyêñ yekta yêñ girtîgeha Diyarbekirê, min dest bi fîrbûna xwendin û nîvisîna kurdî kir.

Çawan ku min li jorê jî qal kir, di wan salan de min pir xwend. Jixwe li girtîgehê ji xwendin û nîvisandinê pê ve, tiştekî ku me bikira, tune bû. Hingê, min gelek klasikêñ rûsî xwendin. Wan nîviskarêñ rûs li ber min cihaneke nû vekirin; cihaneke xurt, kûr, fireh û rewşen. Ew cihan ewçend xurt bû ku ez bi mehan di bin tîna lehengêñ wê cihanê de dimam. Ez jî di xewn û xeyalêñ xwe de dibûm pardarê siûda wan. Bi xêra wan, min xwe ji bîhntengiya girtî û dîlbûnê bi dûr dixist.

Bi klasikêñ rûsî re, min klasikêñ cihanê jî xwendin. Tirk pir qedr û qîmet didin wergerandina kitêban. Di destpêka salêñ 1940-an de, Wezareta Perwerdeyi ya

Tirkiyê bi navê "Tercüme Bürosu" rêkxistineke çandî ava kiribû da ku klasikên cihanê wergerîne tirkî. Wê rêkxistinê gelek klasikên giranbiha wergerandibûn tirkî û hin ji wan klasikan digihîstîn destê girtiyêن Diyarbekirê û Anquerê. Min jî ew ji wan girtiyêن hêja werdigirtin û dixwedin. Ew bêtir klasikên yewnanî, fransizî û îngilizî bûn. Wan klasikan jî cihaneke din li ber min vekir; cihana medeniyet, ilim, felsefe û merivahiyê. Her çiqasî min ew baş fahm nedikirin, lê wan gelek tesîr li min dikir.

Herweha kitêbên din jî ku diketin destê min, min dixwedin. Bi vî awayî, ez hînî xwendinê bûm. Min terbiya xwendinê wergirt.

Piştî ku ez ji girtîgehê hatim berdan, min hîn bêtir bala xwe da ser kurdî û hin kitêbên kurdî bi dest xistin. Yek ji wan "Memê Alan" ya berevoka rehmetî dr. Nurettin Zaza bû. Yeka din dîwana Seydayê nemir Cîgerxwîn "Sewra Azadi" bû. Yê din niha nayêن bîra min. Van kitêban jî gelek tesîr li min û li ruhiyeta min ya kurdî kirin. Destana Memê Alan mîna lehiyekê diherikî û dilê min şâ dikir. Ez jî pê re diherikim. Jixwe şîhîrên Seyda Cîgerxwîn coş û keleke nedîti dixist hundirê min...

Ez û çend ronakbîrên kurd di 1975-an de, li Anquerê, me bi hev re biryar da ku em kovareke kurdî-tirkî biweşînin. Ji bo vê yekê, me dest bi xebatê kir û me komekê ji bo zimanê kurdî anî pê. Serokê wê komê ap û dostê min yê hêja Feqe Husêن bû. Bi qasî 8 mehan, her roj, em çar saet li ser zimanê kurdî (bi gelek şêweyan) dixebeitin. Bi xêra wê xebatê, min hîn bêtir nêzîkahî li zimanê xwe kir û bi wê tesîrê cara yekemîn, min dest bi nivîsandina kurdî kir.

Li derveyî welêt jî daxwaza min ji bo nivîsandina kurdî hîn xurttir bû. Min herçend xwest ku ziman, edebiyat û çandêن din yên cihanê jî binasim, ewçend daxwaza nivîsîna kurdî, li ba min, zêdetir bû. Min herçend ziman, edebiyat û çandêن din nasîn, ewçend

min ziman, edebiyat û çanda xwe hin çêtir nasîn. Dan û standin bi ziman, edebiyat û çandêñ din re tesireke welê li min kir ku ez bi coş, evîn û eşqeke boş li xwe û li zimanê xwe vege riyam û roj bi roj hin çêtir lê vebûm.

Herçî nivîskarêñ ku tesîr li min kirine, gelek in. Ez hewl didim ku haya min ji edebiyata cîhanê çêbe û nivîskarêñ gelên din binasim. Nivîskarêñ ku ez heri zêde dixwînim, yen fransiz, italî, amerîka-latîni, spanyolî, cihû, afrika-bâşûri ne. Edebiyata cihû, afrika û amerîka-latîni li ber dilê min pir eziz in. Ji ber ku mebes, armanc û hedefen wan, kêm-zêde, mîna yêñ kurdan in. Ew ji bi doza ziman, edebiyat, çand û huwiyetekê xweser rabûne û li hember ziman û edebiyatêñ pir mezin, mîna fransizi, îngilizî û spanyolî kayış dikişînin û pir caran bi ser dikevin. Ew bi eserêñ xwe yêñ pir balkêş û hêja hem ziman û edebiyata xwe hem jî hêjahî û avahiyê merivahiyê dewlemendtir dikan. Her gav kitêben hin ji van nivîskaran li ber destê min in. Ez wan bi kêfxweşî dixwînim û ji wan pir sûd werdigirim. Di nivîskariya min de jî ew gelek dibin alîkar.

Li vê derê, ez dixwazim tiştekî din li gotinêñ xwe zede bikim: Tesîr tiştelî pir tebiî ye. Heta ku merivahî hebe tesîr, hevkarî u tevkarî dê hebin. Lê meriv divê ku tesîrê û kopyacitî û texlitê teví hev neke. Herçend tesîr tiştekî erînî ye, ewçend kopya tiştekî nerînî ye.

Tesîr merivan dewlemend dike û rê li merivan vedike ku meriv bi xwe bikaribe berhemên taybeti û xweser biafirine. Berhemên merivan divê ne kopye bin, ew divê xweser û orijinal bin. Jixwe eser û berhemên ku dimînin û dibin malêñ merivahiyê, eser û berhemên orijinal û xweser in. Meriv divê ku bi ked, xîret, zanîn û xebata xwe tiştina li zîncîra dewlemendiyêñ merivahiyê zêde bike Hedef û armanc divê ev be. Her hunermend û nivîskar di bin tesîra hin dîtin, kes, kom û tevgeran de dimîne. Lê her hunermend û nivîskarê ciddî bi eserêñ xwe yêñ taybeti û xweser e. Ez ê li vê derê

mîsalekê bidim; Umberto Eco û romana wî "Navê Gulê". Ji ber ku gelek gotin li ser vî nivîskarî û romana wî hatine kirin, ez dixwazim mîsaleke weha nas bidim. Romana Umberto Eco romanekê yekta ye. Ew kûr, piralî, dewlemend û rengîn e û bi awayekî pir balkêş û xweş hatiye nivisîn. Ji bo ku nivîskar vê romanê binivise, ew bi salan xebitiye û lêkolîn kiriye. Wî bi hezaran kitab, kovar, rojname, nivîsar xwendine. Di romanê de dixuye ku nivîskar ji gelek nivîskar û hunermendên din destkewti bûye, ji wan sûd wergirtiye û di bin tesîra wan de maye. Lê esera ku Umberto Eco aniye pê, esereke xweser ya wî bi xwe ye.

Huner û edebiyat zincirek e. Her heyam hem xweser e, hem berdewama heyamên rabirdû ye. Eger Melayê Cizîri ne bûya, Ehmedê Xani dernediket. Eger Ehmedê Xani ne bûya, Hecî Qadirê Koyî dernediket. Eger Hecî Qadirê Koyî ne bûya, Celadet Alî Bedir-Xan dernediket. Eger Celadet Alî Bedir-Xan ne bûya, nivîskarê heyama me dernediketin. Ew hemû hem xweser in, hem jî berdewamên hevûdu ne.

**X. D.:** *Di nivîskariya te de, cihê tarîxê ci ye, tesîra tarîxê li ser te ci ye?*

**M. U.:** Her kes û her netewe xwediyyê tarîxekê ye. Ji her kesî û her gelî re tarîxek divê. Lê ji her gel û neteweyî bêtir, ji gelê kurd re tarîxek divê. Ji ber ku tarîxa gelê kurd û welatê Kurdistanê, bi darê zorê, hatiye guhertin. Kurd ji tarîxa xwe bi dûr ketine, bi gotineke din, ew hatine bi dûrxistin. Çaxa ku welateki di nav çar dewletên nedemokratik de bê dabeşkirin û di nav axa wî de tixûbên zexm û hesinî bêne rakêşandin, hingê tarîxa wî welatê jî di nav mij û dûmanê de dimîne. Mîna her tiştê wî, tarîxa wî welatî jî reng diguherîne û bi destê serdest û zordaran ew tarix ji nû ve, bi awayekî sexte û derew, tê nivisîn.

Gel û neteweyên bêtarîx mîna merivên kor in. Loma ew nikarin pêşıya xwe bibînin û nikarin gavêñ nû bavêjin. Tarîx ne bi tenê rabirdû ye, herweha ew pêşeroj

e. Hebûna tarixeke dewlemend, selameta pêşerojê û xurtbûna merivan e. Tarîx avahî ye, şîûr û zanîna xweseriyê ye, bîr û baweriya welat û netewe ye. Loma ronakbir, nivîskar û hunermendên kurd divê pir bala xwe bidin ser tarîxê û bi destêن xwe kevirêن avahiya tarîxa xwe lêkin û wê dewlemend bikin.

Çawan ku min li cihekî din jî gotibû; min lehengê romana xwe ya sêyemîn, Memduh Selîm Beg heta sala 19'76-an nedinasî. Min romana xwe li dora vî şexsiyetê kurd hûnandiye. Vî camêrî di tarîxa me de gelek tiş kirine. Lê hem ew bi xwe, wekî şexsiyet û hem jî kirdeyen wî ji me re biyanî bûn. Me ew nedinasî. Ne bi tenê ew, em gelek şexsiyetên din yên kurd û gelek aliyên din yên tarîxa xwe nas nakin. Di rewşeke weha kambax de, meriv ji xwe dipirse; ev doz dê çawan bi ser keve?

Ji ber v ê yekê, doza welêt û mafêن neteweyi divê ji doza tarîx û xwenasînê neyê veqetandin. Doz û xebata tarîx û xwenasînê dê doza welat û mafêن merivahî û neteweyî pir xurt bike. Pêşketina doz û xebata tarîx û xwenasînê dê bîr û zanîna huwiyyeta neteweyî pir xurt bike. Meriv dê hîn bêtir serbest û azad bin, daxwaz û xireta xebat û avakirinê dê pir bi peş ve bikeve, dijiti u berberiyêن ku di civatê de hene dê kêmtilibin, meriv dê bikaribin hîn çêtir ji hevûdu fahm bikin û qeyd û zincirêن kevnare dê bêن şikandin.

Ji bo ders û tecruban jî tarîx pêwist e. Ji ber ku tarîxa welatê Kurdistanê ya misûbet û trajediyan e. Eger meriv bi van bûyeran nizanibe. jê ders û tecruban wernegire, kurd dê her gav bi eynî misûbet û trajediyan bijîn.

Bêguman edebiyat ne tarîx e. û ez jî ne tarîxnas im. Lê edebiyat dikare pir alîkarî li tarîxê bike û ders û tecrubêن tarîxi, bi zimanekî edebî û bi şêweyeki bedew, bi xwendevanan bigihîne. Avakirina bîr û şîûra tarixeke xweser ne şixulê kesekî/çend kesan yan kitêbekê/çend kitêban e. Jê re xebateke pirali, hevkariyeke têkûz û têkiliyeke civakî ku dikare xwe bi

her derî bigihîne, divê. Di vî warî de, edebiyat û roman dikarin roleke girîng bilizin.

Bi baweriya min, divê dan û standineke xurt di navbera tarîx-huwiyeta neteweyî-şûra xwebûnê de hebe.

**X. D.:** *Romana te “Siya Evînê” bi awayekî dilsojî û bedbîhnî xelas dibe. Meriv li ber xwe û li ber lehengên romanê dikeve. Çima te bi vî awahî xelas kirive?*

**M.U.:** Berî niha bi çendekê, ez li bajarekî, li mala dostekî xwe bûm. Wi jî “Siya Evînê” xwendibû, ew jî bi siûda Memduh Selîm Begê pir êşiyabû. Wi weha got; “*bi hefteyan, ez di bin tesîra siûda Memduh Selîm Begê de mam û pê êşiyam.*” Min jê re got; “*jixwe bi v ê romanê, yek ji armancê min jî ev yek bû... ku xwendevan xemgir bibe û li ser siûda qehremanên romanê bifikire...*”

Min li jorê got; bala min li ser ronakbîrênd kurdan û tarixa wan e. Herweha romanêñ min li dora tevgera ronakbîriya welêt ava bûne. Lê belê, em hê bi xurtî li ser vê tevgerê ranewestiyane, lê ev tevger pir balkêş e û bi ders û tecruban tijî ye. Bi qasî ku ez dibînim, yek ji aliyen wê yên balkêş ev e ku tu ronakbîrê kurd, digel her xebatî, negîhiştiye mirazê xwe. Piraniya wan, hemû umrê xwe, ji bo welat xebitîne û tiştîn hêja kirine, berhem û eserên hêja anîne pê, lê belê mîna şexis, ew mesûd nebûne, xwe bextiyar û biserketî his nekirine. Çima?

Sebebêñ vê yekê jî pir in. Lê çend sebebêñ esasî, bi baweriya min ev in:

- Zor û zordariya dewletêñ serdest. Ev zordarî ewçend zêde û mezin e ku mîna her tiştî, jiyana ronakbîriyê difetisîne. Zordar tu carî rê nadîn ku ronakbîrênd kurd li ser axa xwe, bi xebatêñ ronakbîrî bilebitin. Cihê ronakbîr yan işkencexane û zîndan yan siya sêdarê û hilma ruhistîn yan bêdengiyeke bêşexsiyet û nokeriyeke riswa yan jî diyarê xefibiyê ye. Rebenê ronakbîrê kurd dê jî van riyan kîjaneê hilbijêre? Yek ji

yekî xirabtir, yek ji yekî dijwartir...

- Ferq di navbera gel û ronakbîr de pir zêde ye. Ronakbîr li milekî, gel li milekî ye. Paştemayin û girtibûna civata kurd welê kiriye ku welatê Kurdistanê bûye warê nezanî û belengaziyê. Gelê kurd ji pêşketina merivahiyê û dewlemendiyên medeniyetê bêpar maye. Ji lewre, ronakbire kurd û gelê kurd, bi hêsamî ji hev fahm nakin. Ew bi zimanên cîhe dipeyivin. Bala wan li ser tiştên pir cihê ye. Gelê kurd nikare li ronakbîrên xwe xwedî derkeve û wan biparêze, qedr û qimet bidê, berhem û eserên wan bigihîne civate. Loma ronakbîr bi serê xwe ye, ew tenê ye. Ew nikare xwe, xebat û mebesa xwe bi civatê bigihîne. Izolasyoneke weha barekî pir giran e. Hem ji aliyê nefsi û şexsi hem ji aliye ronakbîrî û çandî ve.

- Li welatê Kurdistanê timî şer heye. Şer dijminê xebata ronakbîriyê ye. Li cîhê ku şer heye, ronakbîr nikarin dengê xwe bilind bikin. Ew dengê xwe bilind bikin jî, ji dengê tifing û tanq û topan, dengê wan nayê bihîstin. Şer îmkan û fersendên xebata ronakbîriyê dimiçiqîne. Hingê li ber ronakbîrên kurd riyên xebatê namînin, ew mecbûr dibin yan bibin şerbaz û şerker ku pir caran nikarin di vî warî de bi ser kevin, yan ji bibin guhdar û temaseger. Bêguman, guhdarî û temasegerî ji ne şixulê ronakbîran e.

- Berberî û dijitiyen civakî, siyasî, dînî, herêmî yên civata kurdi, bi her awayî, rê li xebata ronakbîran digire, wan mehkûmî tengahiyeyeke mezin dike. Gava ronakbîr bikevin nav tengahiyeyeke mezin, hingê ew nikarin rol û fonksiyona xwe ya ronakbîri bi cîh binin.

Rewş weha ye û ronakbîrên kurd, ev du sed sal in ku di nav merc û şertên weha de dixwazin ronakbîri bikin. Ez ne bawer im ku bêgaviyêni li ber ronakbîrên kurdan hene, li ber ronakbîrên neteweyekî din hebin. Îcar di rewşeke weha de, çawan ronakbîrên kurd bikaribin xwe mesûd û bextiyar his bikin, çawan ew bikaribin bi

ser kevin?

Heta niha rewş weya bûye. Eger ronakbîrêñ kurd yêñ heyama nû nikaribin ji ders û tecrubêñ ronakbîrêñ rabirdu destketî bin, ew jiyan û ew tarîx dê dubare bibe. Wekî din rê tune.

Min xwest, ez bi serencama Memduh Selîm Begê xwendevanêñ kurd bihejinim da ku ew li ser serencama xwe bifikirin. Memduh Selîm Beg ne tenê ew bi xwe ye. Ew ez im, tu yî, em in. Qedera ronakbîrêñ kurd wekhev e. Ev qeder divê bê guhertin. Em divê li serê bifikirin, wê salix bidin, wê bi gelek şêweyan berpêşî xwendevan û civata kurd bikin û di mîjiyê xwe de bikin meshûmeke jîndar da ku trajedyên bûrî dubare nebin, ronakbîrêñ serdema nû jî mîna Memduh Selîm Begê ji bîr nebin û li welatê xeribiyê di nav tenêtî, rebenî û neçariyeke mezin de neçin diyarê rehmetê...

17. 10.90. Stockholm,  
Kovara ~~WAN~~ hej. 1. 1992

## Xebata ronakbîrî

**Abdullah Keskin:** *Beri her tiştî em dixwazin, hûn xwe ji xwendevanan re bidin nas kirin. Kî ye Mehmed Uzun?*

**Mehmed Uzun:** Berî her tiştî, ez dixwazim we bi vê gava tarîxî pîroz bikim. Ev gav li ber dilê min pir ezîz e û derketina *Rojnameya Welat* bûyereke tarîxî ye. Ez ji bajarê Siwêregê, 1953, me. Zaroktiya min li gora şertên bajarekî biçük ê kurdîbihurî. Min dibistana yekemin, navîn û lisê li wir xwendin. Paşê min li Enquerê, li **Yüksek Teknik Öğretmen Okuliyê** dest bi xwendinê kir. Sala 1972-an, ez hê 19 salî bûm, hatim girtin û bi qasî du salan li girtigehêñ eskerî yên Diyarbekirê û Enquerê mam. Dî sala 1976-an de, roja Newrozê, min û hin ronakbirêñ din ên kurd, me bi hev re, dest bi weşandina kovara Rizgarî kir. Ez berpirsiyarê kovarê bûm. Ji ber vê yekê, ez hatim girtin û bi qasî 8 mehan li girtigeha Enqere mam. Bi dû berdana min re, min dev ji Turkiye berda û derketim derveyî welêt, 1977. Ji wê rojê û vir ve ye, ez li derveyê welêt, li Swêdê dijîm. Ev yekemin care ku ez, piştî 15 salan, li Turkiyê me.

Li derveyî welêt, min niviskarî û rojnamevanî kiriye. Heta niha min çar roman bi zimanê kurdî nivisîne. Min çar kovar û rojnameyêñ kurdî idare kirine. Min li rojname û kovarêñ swêdî nivisîne. Ez endamê Yekitiya Niviskarêñ Swêdî, Pen-Kluba Swêdî, Yekitiya Rojnamevanêñ Cihanê me. Di van rêxistinêñ edebî û çandî de, ez bi aktivî dixebeitim.

**A.K.:** *Zimanê kurdî ev 70 sal in qedexe bû. Gel ji xwendin û nivisandinêñ kurdî dûrketiye. Îro kurdî serbest e. Li çand û zimanê kurdî derbêñ xedar standine. Pirsa zimêñ dê çawa bê çareser kirin?*

**M.U.:** Rewşa zimanê kurdi, iro ne ew rewş e ku meriv bikaribe pê qayil be. Zimanê me perçiqiye, peritiye, qurmiçiye, ji avahî û dewlemendiyên xwe hatiye miçikandin. Sebebêن vê yekê diyar in. İro, li ser sebeban peyivîn êdî ne hunereke mezin e. Hunera mezin iro ew e ku em bikaribin bi zimanê kurdi binivisînin û bixwînin. Ez di wê baweriyê de me ku eger em bi kurdî bixwînin û binivisînin, zimanê me dê, di demeke kin de xwe bigihîne katêن gelek bilind. Zimanê kurdi xurt û dewlemend e. Eger ew ne zêdeyî zimanêن cîranan be, ne kêmî wan e. Bi tenê em bikaribin û hewl bidin ku bi zimanê kurdi bixwînin û binivisin. Bingeh û hîmîn esasi yêن zimanê niviskî yê kurdi temam in. Giramêra kurdi heye. Qayidêن nivisin û xwendina kurdi hene. Celadet Ali Bedir-Xanê gorbehîst ev hemû, bi xebateke bêhempa, ava kirine. Lê, hin kêmâni û qelsiyêن zimanê niviskî hene. Ew jî dê bi xwendin û nivisinê, hêdî hêdî ji holê rabin. Em divê gelek bala xwe bîdinê ku zimanê kurdi bikin zimanê perwerî û xwendinê. Em divê kar û xebatêن xwe yêن civakî, siyasi, çandi, edebî û ronakbirî bi kurdi rexînin. Herkesê ku dikare bi kurdi binivise, divê dest pê bike û binivise. Di vî warî de, kurd divê kampanya vêkin û pir bixebeitin.

Ez hebûna devok û zaravayêن kurdi ne mîna kêmâni û qelsiyekê zimanê kurdi dibînim. Ji bervajiyê, ew dewlemendiyêن zimanê me ne. Em divê alikarî lê bikin û teşwîk bikin ku bi devok û zaravayêن kurdi bête nivisin. Her çiqas bi wan were nivisin, zimanê kurdi de ew çend dewlemend û bi ber be.

Herçi kêmâni û problemêن zimanê niviskî ne, jê re civîn û konferansên îlmî û akademîk divêن. Di vî warî de, li deryeyî welat tiştêن baş çê bûne. Em divê wan tecruban veguhêzinin welêt û li welêt xebata îlmî ya li ser zimêن ges bikin. Ne bi lez û bez, lê bi plan û program. Bi hev re, bi hevkariyeke têkûz. Ji ber ku ziman, ê me hemûyan e. Pêşketina zimêن, pêşketina me hemûyan û welatê me ye.

**A.K.: Ronakbîrê Kurd çawa tê nasîn, hûn çawa tarîf dîkin?**

**M.U.:** Gelo ronakbîrê kurd kî ye? Bersivên vê pîrsê texlit bi texlit in. Em dikarin gelek analîz û lêkolinan li serê bikin. Li gora min, bi kurtî, ronakbîrê kurd ew kes e ku bi awayekî di nav tevgera welêt de ye û li hember ziman, çand, ciwat û welatê xwe xwedîyê berpirsiyarên ehlaqî ye. Berpirsiyarên ehlaqî pir girîng in. Gava rewşa zimanê min ê bav û kalan evçend kambax be ez ê çawan jê rû badim û bi zimanekî din binivîsim? Ez ê çawan besdarî li avakirina edebiyata modern a kurdî nekim, çawan ez ê xwe ji avakirina tevgera ronakbîrî, felsefi, çandî û edebî ya mili bidim alî? Li gora kîjan pirensibêñ ehlaqî ez ê van yekan bikim?

Em dizanin; xwende û ronakbîr ne eynî tişt in. Ronakbîr ew kes e ku bîr bi ronahiye dibe û ji bo ronahiye dixebite. Ronakbîrê kurd divê bîr bi ronahiya welêt bibe û li gora qûweta xwe, di warê xwe de, bixebite û biafirîne. Avirandin pir girîng e. Di warê asîrinê de em ne xurt in. Em divê vî alîyê xwe xurt û tekûz bikin.

Kêmaniyêñ me û ronakbîrêñ me pir in. Ronakbîrêñ me yên ku di medresan de perwerde bûne, gelek bala xwe didin ser ziman, çand, edebiyat û tarîxa kurdî. Bi sed salan e ku bi xêra van ronakbîran, ziman, çand û edebiyata me hatiye parastin. Lê dinya van ronakbîrêñ me pir teng e.

Haya wan zêde ji cihanê û tevgerêñ cihanê nin e. Xebatêñ wan zêde ne îlmî û bi metodêñ îlmî ne. Peywendîya wan û pêşketina medeniyetê nin e, eger hebe jî, ew pir qels e. Li lê milê din, ronakbîrêñ me yên ku di xwendegeh û uniwersitan de perwerde bûne, gelek bala xwe didin ser idolojiyan, pêşketina tevgerêñ sîyasî, felsefi û çandî yên cihanê. Pencera wan a ku li cihanê vedibe, fireh e. Lê belê, bala wan ne li ser hebûnêñ me yên bingehîn, ziman, çand, edebiyat û tarîxa Kurdi ye. Haya wan jê yan hîç nîn e, yan jî pir

kêm e. Ji bo xwendin û nivisîna kurdî xwe zêde naêşînin. Vê yekê mîna mesela xîret û şerefê nabînin. Ew edebiyata me ya klasîk nizanîn û nas nakin. Huwiyyeta wan a neteweyî ne xurt e. Yanê naveroka kurdayetiya wan qels e.

Em divê van kêmaniyên xwe ji holê rakin. Me ronakbirêñ milî, lê di eynî wextê de navneteweyî, divêñ. Em divê reh û rêçen xwe baş bizanibin, lê di eynî wextê de peywendiyên me yên cihanê xurt bin; hem klasîk, hem nûjen bin û bikêr û bi berbin.

**A.K.:** *Hûn di romanên xwe de kîjan rastnivîsê pêk tînin?*

**M.U.:** Ez di romanên xwe de, di niviskariya xwe ya kurdi de, qaydeyên "Hawar"ê bi kar tînim. Bi rêberiya Mîr Celadet Bedir-Xan, kovara Hawarê hê di salêñ 1930 an de qayde û pirensibêñ nivisîna kurdî, bi tipêñ latîni anîne pê. Eger kêmaniyên wan hebin jî quşûrêñ wan nîn in. Em herkes bi serê xwe nikarin rabin li gora daxwaza dilê xwe û li gora rewşa devoka xwe qayde û pirensîban ava bikin. Bi ya min, ew şâşıyeke mezin e. Hedef û armanca me divê ew be ku em zimanê niviskî standardize bikin, devok û zaravayan nêzî hev bikin. Eger em rabin bi serê xwe qeyidene nû bînin pê, hîngê em ê bîbin sebebê serêşî, teşqelete û geremolêñ nu. Çima?

**A.K.:** *Ev 10-15 sal in, hûn ji welêt dûr in. Hûn nû vedigerin welêt. Di nav van 10-15 salan de gelek tişt hatin guhertin. Rewşa welêt çawa ye? Hûn karin bînin zîmîn?*

**M.U.:** Welatê ku min sala 1977-an de li pey xwe hiştîbû û yê iro ji hev pir cihê ne. Iro pêla şîûra milî, bêpayan, bilind e. Kurdayeti ji xebata kesan û komên biçûk derketiye, bûye neteweyî û girseyî. Bi alikarî û rêberiya rojname û kovarêñ mîna we, zimanê kurdî ji nû ve vedije. Weşanxanêñ kurdî avabûne û gelek berhem, bi kurdî û tirkî, diweşînin. Rojnameya Welat xwerû bi kurdî, her hefte, diweşe. Tevgera neteweyî, pêla şexsiyet û huwiyyeta kurdî, qat bi qat bilind dibe. Ev hemû gavêñ

tarixî ne.

Ev hemû berhemên xebata 70 salan a bi xwîn û xwîdan in. Bi sedan û hezaran şexsiyet û şêhidên welatê me bi heviya van rojan, çavvekîrî çûn diyarê rehmetê. Keda wan di berhem û eserên iro de pir e.

Lê em divê tişteki ji bir nekin; bi qasî ku ez dibinim, xelk tî û birçîye zanîn, ilim, felsefe, ziman, çand û edebiyatê ye. Ev pêla neteweyî divê bi van were dagirtin, neqîşandin. Zanîn, ilim û xebatên îlmî mîna nan û avê ye, ji bo me pêvist in. Ez bi dîtina vê pêşketinê pir mesûd û bextîyar bûm.

**A.K.:** Li welatê me demeke nuh dest pêkiriye. Ci ne faktorên vê dema nuh?

**M.U.:** Rast e, bi qasî ku ez jî dibinim, li welêt dem û heyameke nû dest pêkiriye. Kurd radîbin ser piyan, bi hêyecan li xwe vedigerin, li hebûn, tarîx û kokêن xwe hûr dîbin, bê tirs doza masêن xwe dikin, bi kurdbûna xwe ser bilind dîbin. Hûn dizanîn, di van rojan de, romana min a siyemin "Sîya Evinê" li Stembolê, bi kurdî weşîya. Di civînek-du civîn û şevan de, xort û keçen kurd dihatin ba min da ku ez romanê jî bo wan imze bîkim. Riyê wan bi ken û hêyecan bû jî çavên wan çîrûsk disirin. Ev ruhekî nû ye; ruhekî jîr, xurt, xort, têgêhiştî û modern. Tecrubêñ tarîxî yêñ mileten din jî nişanê me daye; eger miletekî xwe bi vê ruhiyetê gîhandî be, ew êdi zû bi zû winda nabe. Heye ku riya bîdestxistina doz û masan pir dirêj be, lê ev ruhiyeta nû dê li ser vê riyê gelek problem û meseleyêñ me çareser bike. Welê dixuye ku civata kurdî bi her awayî diguhere, xwe nû dike û ev ruhiyeta ku ez qalê dikim roj bi roj bêtir derdikeve pêş û dibe hakim. Berê malbat, eşîr, navçê û herêm û mensatêñ wan li ser her tiştî bûn. Lê nuha, di vê heyama nû de hebûn û dozêñ neteweyî derketiye ser her tiştî.

Her mîna ku min li jorê jî got, em divê vê pêşketina pîroz bi berhem û eserên îlmî, felsefi, çandî, hunerî û edebî dagirin û bixemilinin. Em divê li hev xwedî

derkevin, hevûdu biparêzin, bi dijminatî li hev nenêrin û di peywendiyên xwe yên bi hev re de pir demokrat û bîhfereh bin. Em divê ji bir nekin ku zerare me yekî, zerara me hemûyan e.

**A.K.: "Siya Evînê"** nuh derket. "Rojek ji rojê Evdalê Zeynikê" "Mirîna kalekî rind" û pirtûkên we yê din wê kengî derkevin? Hûn nuha li ser çi dixebeitin?

**M.U.:** Belê "Siya Evînê" nû derket. Ew gihişt welêt û xwendavanên kurd. Ma çi dikare kefxweşîyeke ji vê bêtir bide min? Min romanên xwe, ji welatê xwe bi 4000 km dûr, bi kurdî dinivisin. Ji bo welat û miletê xwe, ji bo xwendavanên kurd. Min ew nivisîne, lê xwedîyê wan gel û welatê min e. Ew yadigareke biçük in ku min bi rez û rezdarî pêşkeşî ziman û edebiyata kurdi kirîne. Eger di rabûna vê pêla neteweyî û pîroz de alikariyeke min a biçük jî hebe, ez ê xwe bextiyar his bikim. Ez dixwazim romanên min ên din jî bêñ weşandin. Lê çawan û kengê, ez bi vê yekê nizanim.

Ez nuha li ser antolojiyeke edebiyata kurdi dixebeitim. Ji 3-4 salan û vir ve ye ku ez tevî bi qasî 20 hevalên niviskar, zimanzañ û pispor, li serê dixebeitim. Ev xebata fireh li ber xelas bûnê ye. Ez bawer dikim ku eger ew biweşe û bigîhê destê xwendavanên kurd, kitapxana kurdi dê bibe xwedîyê esereke nû ya bingehîn. Piştî vê xebatê jî, min dil heye ku ez dest bi nivisîna romana "Bîra qederê" bikim. Ev roman dê li dora jiyana Celadet Ali Bedir-Xan bête hûnandin. Ev bûn 7-8 sal ku ez li serê dixebeitim û lê dikolim. Lê nuha, êdî ez bawer dikim ku ez ê bikaribim dest bi gava nu bikim; nivisîna romanê.

Rojnama **WELAT**, hej. 5, Adar, 1992

## Hunera Romanê û romana kurdî

**Pirsiyar 1-** Wekî em dizanin, di Kurdistana Bakur de bingeha romana kurdî te daniye. Gelo çima, kengî çawan te dest pê kir? Ji ku ev fikir hate hesê te?

**Mehmed Uzun:** Eger em çavê xwe, hema weha ji ser re, li tarixa xwe ya du sed salên dawîn bigerînin, berî her tiştî em ê şer bibînin. şer, şer û disan şer. şerekî bêwest û bêrawest. Eger ser li derekî rawestiya be jî, li derekî din dest pê kiriye. Jiyana kurdan, bi her awayî, bi şer û pêveçûnê ve hatiye rapêçandin. Realita jiyana kurdan ev e. Bêguman, sebebên vê yekê hene. Ji ber ku em hemû li ser sebeban, car bi car, peyivîne û me ew nivisîne, ez naxwazim li vir dîsan dubare bikim. şerekî evçend dûr û û dirêj li kîjan aliyê dinê heye? Li kîjan aliyê dinyayê, mileteki heye ku, digel şerekî evçend dirêj û fedakariyeke evçend bêhempa, negihîştiye miraz û xwestekên xwe? Sebeb çi ne?

Felaket û misûbeta herî mezin ku dikare bi welat û mileteki biqewime, windabûna jiyana civakî, aborî, çandî, felsefi û edebî ye. Gava wenatekî ji van aliyêni jiyane yên bingehîn bêpar be, gava mileteki ji van aliyan neçar-û jihevketi be, biserketin, ez nebêjim xeyal e, lê pir û pir dijwar e. Civatek bi van aliyan dewlemend û şen dibe û li dinyayê bi van aliyan tê nasîn. Ev ali rûmeta civatekê ne. Em divê pir vekirî û bi misogerî bibêjin ku reh û kaniyên biserketina civakî û siyasî, dewlemendiya jiyana civakî, aborî, çandî, felsefi û edebî ye.

Em qebûl bikin yan nekin, kurd bi hin wesfîn xwe nas in; ne bi bajarvaniyê, lê bi koçeri û gundiyyê; ne bi felsefe û ilim, lê bi şer û xweparastinê; ne bi edebiyata xwe ya niviskî, lê bi edebiyata xwe ya devkî, ne bi kitabxane û zanîngehîn xwe, lê bi pêşmerge û hêzên xwe

yên çekdar, ne bi dîşiplîna "kreavîtet"ê, lê bi xurtî û mîraniyê... Ne hewce ye ku meriv dirêj bike. Ev weşif, yên civatêن kevnare û girtî ne. Berî niha bi du şed-sê sed şalan, civatêن pêşketî jî, bi van wesfêن xwe dihatine nasîn. Lê êdî ne iro.

Kurd, li gora lêkolinan, di navbera 20-25 milyonî de ne. Di nav vê hejmara yekcar pir de çend filîsophen ku bi kurdî dilebitin hene? Çend mîmar, ressam, dengbêj û nivîskarêن navneteweyî hene? Çend avahiyêن ku di qata cîhanê de bin, hene? Çend kitabxanêن neteweyî, tarixî hene? Iro di dawiya sedsala bistan de, çend roman, piyes û berhemên nûjen ên kurdî hene?.. Ma miletteki dikare, bê van, bi ser keve û jiyanêke serfiraz ava bike?

Zor û zordariya dewletêن serdest li aliyeķi. (Ew li ber çavan e.) Lê kurdan çiqas hewl dane ku jiyanâ kevnare biguherînin, aliyeñ jiyanê dewlemend bikin û reh û kaniyêن civatê û xebata siyasi geş bikin?

Di destpêka 1980-an de, serê min bi van pirsiyaran tijî bû. (Armanca min bi van pirsiyaran ne ew bû ku ez rexne li hin kes û hêzan bigrim yan wan gunehkar bikim.) Hertim min ji xwe ev dipirsîn û dixwest bersîva van bidim. Ez dikarim bibêjim ku li mileki pirsine weha rê li nivîskariya min vekirin. Lê li milê din jî, xwendin, evîn û hezkirina edebiyatê rê lê vekir. Meriv nikare, bi tenê, bi daxwaz û armancêñ siyasi, civaki bibe nivîskarê edebî û berhemên edebî biafirîne. Hingê çêtir e ku meriv nivîsar û kitabêñ siyasi binivîse. Ji bo avakirina berhemên edebî, meriv divê, berî her tiştî, ji kitêban, edebiyatê, cihana edebî û xwendinê hez bike. Meriv divê bibe pardarê wê cihana taybeti ya edebiyatê. Eger yek ji min bipirse û bibêje "li ber dilê te tiştê herî ezîz ci ye", ez ê bibêjim, "edebiyat e."

Edebiyat û bi taybeti jî roman, cihaneke taybeti ava dike û xwendevanan dibe wê cîhanê. Gelek aliyeñ vê cîhanê bi cihana reel ku em tê de dijîn, dimîne, lê ne ew bi xwe ye. Cihana edebî ya romanê rê li xwendevan

vedike ku ew hîn bêtir bîr bi xwe, bi der û dora xwe û bi cihaneke çêtir, xwestir bibe. Cihana romanê, ji aliyê hiş, pejn, bîr û zaninê, ji cihana reel berfireh û kûrtir e. Lî di eynî wextê de, pêwendîya wê bi cihana reel re jî xurt e. Ew hem xweser e, hem ji bo cihana ku em tê de dijîn, mesaj e. Belê, mesaj... Lî mesajên wisa ku ew bi xewn, xeyal, îmaj û bûyer û lehengên çêkirî ve rapêçayî ne. Ew bi ravekirin, agahî û zanînên cuda û dewlemend hatine neqîsandin û kemilandin. Armanc bi vê yekê ew e ku çaxa xwendevan romanek dixwîne hem xwe tê de bibîne û bibêje, "belê, eynî mîna jiyanê ye" û hem jî xwe bêtir perwerdekirî û zane his bike da ku nêrin û hisêñ wî/wê yên li ser her aliyêñ jiyan û cihanê dewlemendtir bibin.

Loma, bi baweriya min, em kurd pir hewcedarı hunera romanê ne. Xwendin û nivisîna romana kurdî dê me hemûyan dewlemendtir bike, cihana me ya hundirîn çêtir bike.

**Pîrsiyar 2:** *Tu dikarî vê meselê hinekî vekî Çima romana kurdi?..*

**M.U.:** Roman, di man'a fikrî de humanist, şoresger û rexnegir e. Ew humanist e, ji ber ku her tiştê ku bi insan û insaniyetê ve gîredayî ye, ne dûrî romanê ye, her tiştê romanê ji bo insan û çeyiya insan e. Hermîna ku bi latîni hatiye gotin, "Homo sum, nihil humani a me alienum esse puto" (Ez insan im, tiştên insanı ne xeribî min in.) Ew şoresger e, ji ber ku roman zarok û berhema demêñ guherîn û şoresan e. Ew rexnegir e, ji ber ku armanca romanê, fahmkirina rewşê û bilindkirina pêla bîr, zanîn, guherîn û pêşvexistinê ye.

Çima ez weha li ser romanê dipeyivim?.. Ez nivisîn û xwendina romana kurdî pir girîng dibînim. Ji her wextê bêtir iro hewcedarı bi nivisîn û xwendina romana kurdî heye. Civata kurdî iro, bi her awayî, di nav guherînêñ mezîn û bingehîn de ye. Dan û standinêñ civakî, pêwendiyêñ aborî, adet û ûsilêñ çandî, pîvanêñ fikrî û hisî... ev hemû bi lez diguherin.

Ez spasdarê we me ku hûn min mîna "hîmdarê romana kurdî li Turkiyê" dibînin. Ev, ji bo min serbilindahî ye. Lê eger min dest pê nekira ji, hinên din dê dest pê bikirana. Ji ber ku wext hatiye. Wexta nivisîna romana kurdî hatiye, - digel ku kurd pir li pey miletên din mane. Û ez divê bibêjim ku ji romanên min pê ve ji romanên ku bi zaravayê kurmancî hatine nivisîn hene. Meriv divê nemaze behsa sê romana bike; "Şivanê Kurd" ya Erebê Semo, "Gundikê Dono" ya Mahmut Baksi û "Zeviyênen Soro" ya Nurî Semdin.

Tarixa edebiyata cihanê navê pênc nivîskaran, mîna rîber û hîmdarê hunera romanê, berpêşî me dike; Cervantes (ispanyol), Grimmelshausen (alman), Daniel Defoe (îngiliz), Alain-René Le Sage (fransız) û Jonathan Swift (îngiliz). Cara yekemîn van nivîskaran dest bi şeveke nû ya vegotinê kirine û roman afirandine. Romanên wan li ser wesfîn civakî, tarîxî û çandî yêñ welatêñ wan ava bûne. Bi vî awayî, wan romana neteweyî anîye pê. Û di ser ya neteweyî re ji, wan berhemîn yekemîn yêñ romana navneteweyî ava kirine û li gora xwe hin hêjahiyêñ nû li edebiyata cihanê zêde kirine. Ma qehreman û lehengêñ romanên wan, mesela Don Quijote yan Robinson Crusoe yan ji Gulliver ne nasêñ me ne ji?

Eger em li wan hal û merc, dewr û demêñ derketin û avabûna van nivîskaran û berhemîn wan binihêrin, em ê bibînin ku ew hemû zarok û berhemîn rewş û demêñ guherîn û şoreşan in... Herwekî ku nas e, roman li Awrûpê derketiye, ew hunereke Awrûpi ye. Çaxa nivîskarêñ ku min qal lê kirin, romanên xwe nivisîn yan ji dest bi nivisînê kirin, Awrûpa, bi her awayî, di nav guherîneke bingehîn û şoreşger de bû. Jiyan û pêwendiyêñ civakî bi temamî digiuherîn; dewra axa û began û feodalîzmê xelas dibû û dewreke nû, ya burjuwazî û kapîtalîzmê dest pê dikir. Mîrekîyêñ Awrûpayê ji hev diketin û Awrûpa ber bi dewletêñ neteweyî diçû. Tixûbêñ teng û girtî hildiweşîyan, agahî

û zanîn zûtir vediguhezin civatê. Hewcedarî bi enformasyon û agahiyê hin zêdetir dibû. Pêla xwendinê bilind dibû, xwenda zêde dibûn. Hînbûn û perwerdeyî, ji bo pêşketina civatê, girîngiya xwe îspat dikir. Meriv ji pêwendiyên eşirtî, malbatî û binemaliyê xelas dibûn û şexsiyeteke nû ya indivudalist werdigirtin. Gotin û guhdarîkirinê cihê xwe berdida xwendin û nivisînê...

Û ji van guherîn û şoreşen civakî yên nû re şêweyên nû yên edebiyatê diviyan.

Welatê kurdan, nemaze perchê Turkiyê, iro di nav guherîneke weha bingehîn de ye. Guherînên ku Awrûpayê berî niha bi 300-350 salan derbas kirine, iro xwe gîhandiye cem kurdan. Ne hewce ye ku meriv li vir qala van guherînên bingehîn bike. Lê kurd hew dikarin qîma xwe bi pêwendiyên kevnare bînin. Ew nema dikarin qîma xwe bi şêweyên kevnare yên vegotin û edebiyatê bînin. Parastina şêweyên kevnare jî gelek girîng in, lê insanê kurd baş guheriye, bi awayê kevn nafikire, najî û hîs nake. Jê re şêweyên nûjentir divênu ku ew xwe pê ifade bike, xwe tê de bibine, cîhana xwe ya nefsi û hîsi dewlemendtir hîs bike.

Girîngiya romana kurdî di vir de ye; ew dikare bibe "dengbêja nû ya van guherînan". Romana kurdî dikare alikarî li insanê kurd bike ku ew hêjayî û xweşiyên jiyanê bibine, şexsiyeta kurdî hîn çêtir nas bike, pêwendiya xwe û tarîxa xwe hîn xurtir bike, bêtir bîr bi guherînan bibe, ji bo jiyanâ nûjen ya civakî xwe hazir bike, bi xwe bawer be, hîs û pejnên insanî û neteweyî hîn baştir binase, hîn xurtir di nav civatê de bilebite, cîhana xwe ya hundirîn kûrtir bike, nêzîkahî li cîhana derive bike, dinyayê hîn çêtir bizanibe.

Û li milê din jî, romana kurdî dikare zimanê kurdî yên niviskî pir pêşve bibe û dewlemend bike. Formaromanê, ji hemû formen din yên edebî û hunerî bêtir, ji bo pêşvebirina zimanân, musaid e. Îmkanen wê hîn pirtir in. Ziman dikare tê de, mîna lehiyekî, biherike, xwe fireh û kûr bike, şewe û úsliben curbetur

biceribîne. Xwendevan jî dikare, piştî hînbûna xwendina kurdî, bi hêsanî û kêfxweşî, pêwendiyekê xurt bi zimanê xwe re bîne pê. Û ya herî girîng jî, xwendevan dikare, bi alikariya xwendina dirêj ya romana kurdî, êdi bi kurdî bifikire.

Em divê xwe nexapinin û tiştekî pir vekirî bibînin; di nav vê aloziya guherinan de, eger zimanê kurdî nebe zimanê nivisin û xwendinê, nivîskar û xwendevanên kurdî pir zêde nebin û eger zimanê kurdî ronensanseke têkûz derbas neke, tu pêşeroja zimanê kurdî li Turkiyê nîn e. Ew ê winda bibe. Dewr û dewran guheriye. Berê civata kurdî girtibû. İro ew vebûye û zimanê tirkî bi deh kanalên xwe yên televizyonê, bi radyo û dehhezarân kasetên xwe yên şstranan, bi dehan rojname û kovarên xwe, bi sîstema idarî ya dewletê ketiye nav civata kurdî û zimanê kurdî dixwe. İro li gundan jî zarok bi tirkî dipeyivin. Diyêن wan ku bi tenê çend gotin tirkî dizanîn, ji ber tesîra telewizyonê, bi zarokêن xwe re bi tirkî dipeyivin. şivanê kurd iro li serê çiyan, mîna berê li bilûra xwe naxîne û stranên kurdî nabêje. Ew bi teyba xwe ya biçûk, bi tirkî, li kaseta dengbêjên ku bi tirkî dibêjin, guhdarî dike... Berî niha bi demeke dirêj, Celadet Ali Bedir-Xan di kovara HAWAR'ê de, 1932, di warê ziman de weha gotibû; "Miletên bindest heyina xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi qeweta du çekan diparêzin. Ol yek. Zman dudo. Lê heke ola miletê serdest û bindest yek bibe, hingî çek yek bi tenê ye û bend tenê zman e." Lê eger ziman jî here, hingê evçend eş, ked, xebat, cefa û fedakarî ji bo çi?..

Ji ber vê yekê jî, nivisin û xwendina romana kurdî, iro, ji her carî girîngtir e. Kurd divê hewl bidin ku bi dehan, sedan, hezaran nivîskar derxin. Hejmara roman û berhemên kurdî yên edebî divê, yekcar, pir zêde be. Bêguman iro gelek asteng li ber xwendin û nivisîna zimanê kurdî hene. Ev diyar in. Lê em divê hewl bidin. Destpêk her dijwar e. Lê wekî din jî rê û çare nîn e.

Yek ji hêvî û daxwazên min ên herî mezin ew e ku di pêşerojê de gelek nivîskar û romannivîserên kurdî derkevin û romana kurdî ewçend bi pêşve bibin ku ne bi tenê kurd, herweha hemû cîhan pê serbilind bibe.

**Pirsiyar 3:** Romana te ya çaremîn "Rojek ji Rojêñ Evdalê Zeynikê" li ser jiyan û dewra Evdalê Zeynikê ye. Di xebata te ya edebî de cih û rola Evdalê Zeynikê ci ye?

**M.U.:** Evdalê Zeynikê yek ji lehengên min ên cîhana zarotiya min bû. Carina Evdalê Zeynikê şevêñ zarotiya min dineqîşandin. Li mala me, ji bav û kalan mayî, bilûreke spehî hebû û bavê min pir xweş lê dixist û pê re digot. Strana Qulingo û feleka xayin ji wan rojan yadigarî min in.

Ji mêj ve bû ku min dixwest romaneye destanî, bi zimanê destanê binivîsim. Mebes û armanca min bi vê romanê ev bû; min dixwest hin bûyer û lehengan li dora mefhûmên mîna, evîn, însaniyet, hîsên însanî, biratiya miletan, serdestî û bindestî, hêz û quweta stran û hunerê, dostî û ihanet... bicivînim. Pêşî min haziriyêñ xwe li ser destana "Siyabend û Xecê" kirin. Min gelek celebêñ gotina vê destanê civandin û li gelek dengbêjan, nemaze yên Suriyê, guhdarî kirin. Lê paşê, min dev jê berda. Ji lewre min nihêrt ku ez ê nikaribim ew hawayê însanî ku min dixwest salix bida, bireşînim ser romanê û rewşa dewr û demêñ mîrekiyêñ kurdan, mîna bergeheke romanê, bidim.

Min nihêrt ku Evdalê Zeynikê, mîna dengbêjekî kurd û figurekî mîtolojîk, baş li mebes û armancêñ min tê. Loma min romanê li dora şexsê wî yê efsanewî hûnand. Hermina ku di romanê de jî tê gotin, Evdalê Zeynikê bav û bapîrê dengbêj û çirokbêjîn kurdan e. Tesîra wî li ser strana kurdî û edebiyata devkî pir zêde ye. Min xwest, ez hem bi hênceta Evdalê Zeynikê romana ku min dil dikir binivîsim û hem jî Evdalê Zeynikê, dengbêjiya wî, zar û zimanê wî ji nû ve "aktualize" bikim. Lê li vê derê ez divê tiştekî ku min li gelek cîhêñ din jî gotiye, dubare bikim; romana "Rojek ji Rojêñ

*Evdalê Zeynikê*" ne otoboyografiya Evdalê Zeynikê ye. Ji çend stranên wî pê ve, hema çi bigire, hemû roman çêkirî/lihevanî ye.

Lê belê, di vî warî de tiştê herî girîng ev e; bi ya min, nivîskarê kurd divê bi edebiyata xwe ya devkî û ya klasik re pêwendiyek xurt dayine. Û ev pêwendî divê di berhemên wî/wê de baş xuya be. Eger edebiyata Ewrûpayê iro evcend xurt û têkûz e, yek ji sebeban jî ev e; dan û standina edebiyata iro bi ya do re pir xurt e. Bi zimanê edebiyatê ji vê pêwendiyê re dibêjin intertextualité. Yanê pêwendî û diyaloga nivîsaran. Di nivîsar û berhemên iro de sî, tahm, deng û pejnên do hene. Nivîsar, nivîskar, leheng, bûyer, tecrube, ceribandin, bir, bawerî û fikirên do alikari li nivîskarê iro dike da ku ew berhema xwe biafirîne. Xwendevan jî, bi vî awayî, do dinase, iro dibîne û bir bi sibê dibe. Loma jîedebiyata Ewrûpê ji rojê Homeros û vir ve hem yekgirtî ye hem jî her berhem tê de xweser e. Gelek nivîskarêñ ewrûpî berhem û romanên xwe li ser destana Odyssén ava kirine. Bi vê şeweyê, wan ev destan ragîhandine roja xwe û eserên xweser jî afirandine. T.S. Eliot, şahîre navdar ê xwediyê xelata Nobelê, li ser adet û úsilêñ kevnare û nûjeniyê weha dibêje; "Tu şahîr, tu hunermend bi serê xwe tenê man'eyeke têkûz nade. Man'eya wî ya têkûz, nasîn ûzanîna wî bi pêwendiyêñ wî yêñ bi şahîr û hunermendêñ mirî re miyeser e." Yanê meriv dikare qîmet û hêjahiya şahîr/nivîskar û hunermendê iro bi alikariya yêñ do binase. Yêñ iro û yêñ do mîna helqeyêñ zincîreke dirêj in. Zincîr, tarîx e. Bi tarîxê re pêwendî û di nav tarîxê de bûyin, ji bo her tiştî, pêwist e.

Ji herkesi bêtir kurd û nivîskar û hunermendêñ kurd divê di vê bir û şî'ûrê de bin. Tarîx, wextêñ tarîxi, bûyer, tecrube û şexsiyetêñ tarîxi yêñ curbecur divê hertim li nik nivîskar û hunermendê kurd be. Her mîna nivîskar, divê berhem û eserên wî/wê jî bibin helqeyeyeke metîn ya zincîra tarîxê. Nûjenî, înkarkirina

rabirdûyê nîn e. Ji bervajiyê, nûjenî û avakirina berhemên nûjen bi tenê dikare li ser himên têkûz yên rabirdûyê werin pê. Loma jî, gava deng, pejn, hîs, tecrube û gotinê dewrêن bihûrî di nav berhemeke nûjen de hebin, hingê ew berhem hîn bêtir dewlemend, edebî û hêja ye. Meriv pê hîn bêtir dema nû jî fahm dike.

Gelek deng ji dewrêن bihûrî li oda min a xebatê, li ba min in. Ew têن û dîbin mîvanê min. Evdalê Zeynikê jî yek ji wan e. Min ew ezimand û bi hênceta wî û dengê wî min dil kir ku berhemeke nû yadigarî xwendevanan û kitabxana kurdî ya tarîxî bikim...

**Pirsîyar 4:** *Ji "Rojek ji Rojêن Evdalê Zeynikê" pê ve, em ê kîjan berhem û romanêن te yên nû bibînin?*

**M.U.:** Ev bûn nêzîkî sê salan ku ez li ser antolojiyekê dixebeitim, "Antolojiya Edebiyata Kurdi, 1900-1992". Komeke fireh ya nivîskar, şahîr, zimanزان û edebiyatnasên kurdî jî alîkarî li vê xebatê dikin. Di vê Antolojiyê de hemû perçeyên welêt û hemû zaravayên kurdi hene. Hem şahîr, hem jî nivîskarêن pexşanê tê de ne. Ew bi tîpêن latinî ye. Herkesî, bi qasî xwe, alîkarî li vê xebatê kir. Ev xebat li ber xelasbûnê ye.

Piştî Antolojiyê, min dil heye êdî dest bi romana "Bîra Qederê" bikim. Ev roman ê li dora jiyana Celadet Ali Bedir-Xan bê risandin. Ji 1985-an û vir ve, xebata min li serê heye. Lê heta niha min xwe hazir hîs nedikir. Ez bawer im, niha, ev fikir û xebat êdî kemiliye û hatiye qata nivisînê.

**Pirsîyar 5:** *Gelo gotineke te ya dawîn ji bo xwendevanêن me heye?*

**M.U.:** Jixwe min gotina xwe dirêj kir. Hûn bijîn. Hewcedarî bi weşanêن kurdî, mina kovara we, pir û pir e. Eger em bixwazin ronesansekê di warê zîman, huner, çand û edebiyata kurdî de binin pê, ev ê bi alîkariya weşanêن mina ya we be. Ji bo kovara we, ez umrekî dirêj dil dikim û serfiraziya we dixwazim. Gelek spas...

Kovara **Berhem**, hej. 2, 1992

## Nivîskarî û Xwendevanî

**1- Heta niha çar romanên te derketin. Bêşik ev serfiraziyeke mezin e. Lê gelo ji bo xwendina romanên kurdî eleqa xwendevanan çawan e? Tu çawan dibînî, ji kerema xwe re dikarî hinekî behs bikî?**

**Mehmed Uzun:** Berî her tiştî ez divê li ser serfiraziyê çend gotinan bibêjim... Li gelek cihêن din jî heval, dost û xwendevanên kurd min piroz dikin ku min çar romanên xwerû kurdî nivisîne û weşandine. Ez spasî we û hemû hevalên din dikim. Lê eger gotin were ser serfiraziyê, ev serfirazî, ya gelê kurd e. Ez, mina lawekî milletê kurd, bi karê xwe, yanê bi karê ku ji min tê, rabûme. Lê belê da ku ez di karê xwe de bi ser kevim, hewcedariya min pir bi ziman, çand, adet û ûsil, gel û welatê kurdî heye. Eger ew nebin, bi iştimaleke mezin, ez hiç im, ez ê nikaribim eser û berhemên nû biafirinim. Tarixa keserkûr, çanda rengin, folklora dewlemend, zimanê zelal, jiyana bindest, liberxwedana bedew, kêf û henekên civata sade... ev hemû milên gelê kurd, jî bo min, kahniya nivisin û afirînê ne. Ew şewk û heyecaneke bêhempa didin min da ku ez dilopeke nû li edebiyata kurdî zêde bikim. Lê, pirî caran, ez pir li ber xwe dikevîm û şerm dikim ku ez nikarim hîn bêtir bixebitim, hêjatir û dewlemendtir binivîsim, zêdetir eser û berhem yadigarî gelê kurd bikim... Ji ber ku gelê kurd ku ev zêdeyi 150 salan e ku bi dil û can li ber xwe dide, ji bo mafêن xwe yên neteweyî û insanî dikoşe, hêjayî eser û berhemên pir bedew û bilind e. Loma jî eger di romanên min de behsa serfiraziyê bibe, ew, ya gelê kurd e û xwediyê wan jî, dîsan, gelê kurd e.

**Herçî eleqa û xwendina romanan e, mixabin zêde**

haya min jê nîn e. Weşanxane û komên belavkirinê romanêñ min belav dîkin û bi xwendevanan digihînin. Ez baş nizanim ka ew çiqas û çawan belav dîkin. Lê carina hevalêñ gerînende yên weşanxanêñ ku kitêbêñ min weşandine û belav kirine, li min digerin û bi kêfxweşî behsa name û telefonêñ ku ji wan re hatine, dîkin. Ev, milê pratîk ê rewşa iro. Lê belê, milekî din ê meselê heye ku em divê tu carî ji ber çavan nerevînin; nivisîñ û xwendina kurdî nû ye, hê di destpêkê de ye. Ev jî rastiya me ya kirêt e.

Herweki ku tê zanîn, sê sitûnêñ bingehîn ên edebiyatê hene; niviskar, xwendevan û rexnegir. Çaxa ev hersê ling hebin meriv dikare, di maneya fireh de, qala edebiyatekê bike. Eger em Kurdistanâ Iraqê nehesibînin, meriv dikare bibêje ku kurd û welatê kurdan, hema çi bigire, ji van hersê stûnan jî bêpar maye. Bi gotina Seydayê Ehmedê Xanî "bazar qewî kesad" bûye. Ji sedsalan û vir ve ye, kurdî bi tenê di medresan de hatiye xwendin. Ew nebûye zimanê dibistan û xwendegehan. Tradisyonike têkûz a xwendin û nivisîna kurdî li welêt çênebûye. Welat ji bo derve, girtî maye. Û di ser de jî, welat hertim di nav şer de bûye. Di rewşeke weha kambax de meriv nikare bi hêsanî û bi kêfxweşî behsa tradisyonâ xwendin û nivisîna kurdî bike. Loma jî ev gotinêñ zérîn ên Ehmedê Xanî ku li ser zimanê kurdî hatine gotin, heta iro jî di cîh de ne; *Ger dê bibûya bi derbê menqûs/Nedîma wehe bê rewaç û mexsûs/Mehbûb e, bi kes ne namîzade/Lew bextesiyah û nemirad e...*

Ji bo ku tradisyonike weha wêre pê, xebateke pirali, xurt û kûr divê. Bi gotineke din, ronesanseke têkûz divê. Eger xebateke weha pirali û rengîn çênebe, em ê nikarîbin, di vê roja me ya nû de ku şoreşen teknolojik, bi leza birûskê, li pey hev têñ, xwendin û nivisîna kurdî bikin perçeyekî esasî yê jiyana kurdan. İro, hê jî, meriv dikare bibêje ku ji bo % 95'i kurdan, xwendin û nivisîna nameyeke kurdî jî pir dijwar e. Lome ji vê

yeke jî, ji ber sebebêñ diyar, nabe. Lê xebat, teşwîk û hewldana xwendin û nivisîna kurdî divê. Eger partiyêñ me yên siyasi, rêkxistinêñ me yên civakî, komêñ me yên çandî û edebî û weşanêñ me bi vî karî jî rabin, em ê bibîñin ku edebiyata kurdî dê, di demeke kin de, ji texmînêñ me jî bêtir bi pêş keve.

**2- Gelo romanêñ te di nav welêt de belav bûne?**

**M.U.:** Heta niha romana min a siyemîn **Siya Evînê** ji aliyê weşanxana Dozê û kurtelêkolîna min **Destpêka Edebiyata Kurdi** ji aliyê weşanxana Beybûnê hatine weşandin. Yên mayî jî niha ji bo weşinê hazir dibin.

**3- Kevneşopiya (tradisyon, gelenek) edebiyata me ya romanê gelekî nû ye. Lewma trexneyêñ edebî jî, merîw dikare bêje ku hema-hema tune. Tu bi xwe vê kemasîyê çawan hîs dikî?**

**M.U.:** Em dev ji tradisyonâ nivisîna romanê berdin, heta niha adetekî edebiyata niviskî jî, ji ber sebebêñ nas, di nav kurdan de tune bûye. Edebiyata devkî, di her rewş û mercî de, ji xwe re hin rê û awa dibîne da ku bijî û jiyana xwe bidomîne. Lê edebiyata niviskî ne wisan e. Berî her tiştî, bi gotina kurdên Soran, jê re şaristanî divê; çapxane, wesanxane, kitabxane, salon, xwendegeh, rêkxistin, kovar, rojname, weşan û h.w.d... Edebiyata niviskî li bajaran bejn davê û şax dide. Gava li bajaran jiyana civakî û çandî bi pêş keve, hingê edebiyata niviskî jî xurt û dewlemend dibe. Bajarêñ kurdan tu carî imkan û gavêñ weha bi dest nexistine. Dijminêñ kurdan jî, pir bi zanistî, hewl dane ku bajarêñ kurdî, ji aliyê tevgera ronakbirî û çandî, kavil bikin. Wan rê nedaye ku bajarêñ kurdî bibin navenda tevger û bizava çandî, entellektuelî û edebî ya kurdî... Ji ber sebebêñ weha, edebiyata niviskî, bi giştî, pir li paş maye. Eger qal were ser romana kurdî, jixwe ji çend romanen pê ve tu romanêñ kurdî nîn in. Ez vê yekê di jiyana iro ya kurdî de kîmanîyeke pir mezin dibînim. Ez hertim ji xwe dipirsim; Çima iro bi sedan nivîskar û bi hezaran berhemêñ nûjen ên kurdî dê nebin? Ez pir bi

vê tunebûnê diêşim...

Herwekî ku min li jorê got; yek ji sitûnên bingehîn ên edebiyatekê, rexne û rexnegirî ye. Eger li welatekî rexne û rexnegirî heye û jiyana çandî û edebî bi rexne û rexnegiriyê tê xemilandin, hingê qata zanîn, têgihiştin û ronakbîriya wî welatê jî bilind e. Danasîn, rexne û rexnegirî, riya dewlemendî û pêşketinê ye. Ew neqş û rengê jiyaneke serfiraz e. Rexne û rexnegirî, pira navbera xelk û ronakbîran, xwendevan û nivîskaran e. Rexnegir, qasit û elçî ye. Ew, berheman werdigire û radigihîne xelkê. Wezîfa rexnegir, wezifeyeke pîroz e.

Jî aliyê teoriyê ve ev, weha ye. Lê gava meriv li realita jiyana civakî û çandî ya kurdî dinihêre, mixabin meriv tiştekî berbiçav nabîne. Jî ber ku jiyana edebî ya kurdî ne xurt e. Heta jiyana edebî xurt nebe, roman û çeşnên din ên edebiyata nûjen nekevin nav xelkê, hingê rexne û rexnegirî dê çawan hebe û pêşketî be. Pêşî berhem û eser divê hebin da ku paşê rexne û rexnegirî jî werin hole. Pêşî em divê hewl bidin ku hejmara nivîskar, hunermend û ronakbîrên kurd zêde bin û berhem û eserên kurdî ges û dewlemend bin. Çaxa ev geşî û dewlemendî were pê, hingê rexne û rexnegirî jî diyar be. Tiştê ku em iro di warê rexne û rexnegiriyê de dikarin bikin, ev e; eser û berhemên ku bi hezar zehmetî derdikevin û xwe digihînin me, bidin nasîn û wan bi xelkê bigihînin; bi dostî û biratî alikarî li hev bikin; dinyayeke ne li ser kîn û rikê lê li ser germî, coş û afîrinê ava bikin.

Ez dixwazim, ne mîna şîretekê, lê mîna tecrûbeyeke basid, tiştekî li gotinên xwe zêde bikim; hem nivisina edebiyatê (hemû çeşnên wê) hem jî rexne û rexnegirî divê ilmî be. Edebiyat jî, eynî mîna kîmya, felsefe yan geometriyê ilm e. Teorî û qayideyên wê hene. Avahî û metodên wê hene. Gotin, term, salixdan û zimanê wê yê taybetî hene. Heta meriv serê xwe bi ilmê edebiyatê neêşîne û nekeve nav jiyana taybetî ya edebiyatê, ez ne bawer im, meriv bikaribe bibe nivîskarekî yan jî

rexnegirekî bikêr. Jî destpêka sedasala me û vir ve, bi taybetî welatên Ewrûpa û Amerikayê gelek bala xwe didin îlmê edebiyatê, bi hezaran akademî, enstîtusiyon û xwendegehêن edebî ava kirine. Loma jî edebiyata nûjen a van welatan, digel edebiyata welatên din, pir pêşketî ye. Diyar e; gava meriv bi qayide û metodan bizanibe, riya dirêj û dijwar jî zûtir û hêsanter tê birin... Eger em bi termekî ewrûpayî bibêjin, hingê hem afirîna berhemên edebî hem jî rexne û rexnegirî gelekî kontsuktiv (erîni) dibe. Bervajiyê vê yekê, tiştên destruktiv (nerîni) tînin pê ku bêkêr û bêsûd in. Bi xwendina çend kitêbêن basîd, bi mîjiyê partizanî, bi kîn û dijminahiya şexsî, ideolojîk û siyasi, meriv ne dikare nivîs û afirînen hêja bîne pê ne jî dikare rexne û rexnegiriyê bike. Baweriya min bi quweta îmanê, ilhama xwestekê nîn e. Heta meriv nebe xwendevanekî baş, meriv nikare bibe nivîskar yan rexnegir. Heta meriv mîna karkerekî, bi şev û roj, bi xîret û metod, nexebite, meriv nikare biafirîne.

Bi baweriya min, hewcedariya edebiyata kurdî pir û pir bi rexne û rexnegiriya îlmî heye. Ez bi xwe, mîna nivîskareki, kîmaniya vê yekê pir his dikim û pir hewcedarê rexne û rexnegiriyê me.

4- *Di romanên te de tiştîkî balkêş e ku tu, hin mîrxasên "kal", "rûsپî", "pîremêr" didî peyvandin. Wisa diyar e ku pevgirêdana nişen kevn û yên nûji bo te gelekî girîng e. Li gor dîtina te, ev pevgirêdan, yan jî pêwendî çîra pêwist e?*

**M.U.** - Gotina we rast e, di hemû romanên min de pîrejin û kalemêr hene. Eger em dîsan Seydayê Ehmedê Xanî bidin peyivîn, ev lehengên romanên min behane ne da ku ez bikaribim bergeheke tarîxî jî berpêşîxwendevanên xwe yên ezîz bikim. Herwekî ku tê zanîn, imkanîn hunera romanê pir in; meriv dikare pê gelek merc û rewşen cihê salix bide û daxwaz û mirazên xwe, bi gelek awa û şêweyên cihê raxîne ber xwendevanan. Çima em ê hunera romanê ji bo hişyarî û

têkûzkirina huwyet û şîûra neteweyî û tarixî bi karneyinin? (Bêguman, bi şertê ku em ji qayide û úsilên nivisîna romanê bi dûr nekevin...) Bi baweriya min, tarix ji bo kurdan, ne búyerênbihurî ne. Tarix, di eynî wextê de, iro ye jî. Kurdish bi xwe tarîxa xwe nenivisîne, nejiyane, şerh nekirine û hê jî gelek aliyêñ tarixa kurdî li pey sînor û qedexeyêñ dewletan veşartî ne. Kurd ewçend ji tarîxa xwe hatine bi dûrxistin ku búyer, pêwendî, şexsiyet û ditinêñ berî 40-50 salî jî, pîri caran, nayêñ zanîn. Dewsa tarîxa xwe, kurd, bi darê zorê, tarîxên cîranêñ xwe hîn dibin û bi wan dijîn. Tarîxa kurdî ne zelal e, di nav mij û dûmanê de maye. Gava meriv behsa şexsiyeteki tarîxi yê kurdî dike, mîna ku meriv behsa figurekî mîtolojîk bike. Ewçend dûr, ewçend nedîyar...

Bi baweriya min, tarix jî, eynî mîna nan û avê, divê bibe perçeyekî jîndar yê jiyana civakî ya kurdî. Çawan ku meriv bê nan û avê, hewa û bîhnê nabe, divê meriv bê tarîxê jî nebe û nikaribe bijî. Ji bo jîndarı, vejandin û veguhezandina tarîxê, roman rîyeke pir baş e. Bi alikariya romanê, vegotin, salixdan û taswîrên romanê, meriv dikare kirasê iro li tarîxê bike û wê veguhezîne mala xwendevanan, ser sifra wan... Eger meriv baş bala xwe bide gotin, bîr, hîzr, rabûn û rûniştinêñ kal, rispi û pîremêrên romanêñ min, meriv ê bibîne ku ew, gotin, bîr, hîzr, rabûn û rûniştinêñ Ehmedê Xani, Melayê Cizîri, Mîr Bedir Xan, Celadet Âli Bedirxan, Ihsan Nûrî û h.w.d. in. Bi hênceta salixdana qehremanêñ romanân, ez dil dikim, bi awayekî edebî, gotin, term, bîr, búyer û şexsiyetêñ tarîxi jî veguhezînim dema nû.

Em iro li ku ne û rûyê me ber bi ku ye?.. Gava meriv di nav pêşketin û herikîna tarîxê de li bersîva vê pirsiyarê bigere, ez bawer im, meriv ê bikaribe hêşantir cihê xwe bibîne û fahm bike. Hem pevgirêdana nîşan, hem ya deman û hem jî ya helqeyêñ zincîra tarîxê, ji bo pêşerojê, pir girîng in.

**5- Bêşik, di roman nivîsandinê de tecrubêñ te niha pirtir bûne. Di aliyê ziman da jî pêşketineke berbiçau bala meriv dikişîne. Mesela di navbera Kurmanciya romana TU û romana Rojek Ji Rojêñ Evdalê Zeynikê da ferq heye; di ya dawiyê da zimanê edebî gelekî pêşketitir û xweştir e. Tu bi xwe vê yekê çawan şirovedikî?**

**M.U.** - Jixwe eger ne weha bûya, min ê ji xwe û xebatêñ xwe şik bikira. Ji 1975-an û vir ve ye ku ez bi kurdî dinivîsim û ji deh salan bêtir e ku ez her roj bi kurdî dinivîsim. Carina bi zimanêñ din jî dinivîsim, lê zimanê esasi yê niviskî, kurdî ye. Eger tu ferq di navbera destpêkê û iro de nebûya, hingê min ê xebata xwe pûç, nerast û zexel bidita. Ji bo zimanê kurdî her divê weha be. Ji ber ku em xwendin û nivisîna zimanê xwe yê zikmakî ne di dibistan û xwendegehan de, lê bi xwe, li malêñ xwe hîndibin. Ronakbîrê kurd bi dû re dest bi nivisîna kurdî dike. Di destpêkê de, bivê-nevê, tesîra zimanê ku meriv pê dixwine û dinivîse, pir e. Zimanê xwendin û nivisînê, di eynî wextê de, zimanê fikirînê ye jî. Eger meriv bi zimanekî din bifikire, her, tesîra wî zimanî, hem di warê rastnivisînê û hem jî di warê formulekirinê de, li ser nivisîna zimanê zikmakî dibe... Li nik min, hin destnivîsên Celadet Âli Bedirxan hene. Ew, di salêñ 1920-an de, bi kurdî hatine nivisin. Lê bi kurdiyekê şas û kulek. Di navbera zimanê HAWAR'ê û wî zimanê de ferqekî pir mezin heye. Di vî warî de, tecrubêñ kes û nifşen kevn, ji bo min jî, mot á mot, rast in. Çaxa min jî dest bi nivisîna kurdî kir, mîjiyê min jî tirkî, lê nivisarêñ min bi kurdî bûn. Tê de ne tahma kurdî hebû ne jî awa û şêweyêñ nivisîna kurdî.

Berî niha bi çendekê, min yekemîn romana xwe TU, ji bo çapa Turkiyê, ji ber çavan re derbas kir. Di gelek rûpelên wê de, ez pir keniyam. Ez bi kurdiya xwe keniyam. Lê belê gava min romana çaremîn, Rojek ji Rojêñ Evdalê Zeynikê nivisi, ez bi hêsanî di nav

kûrahiyêñ zimanê kurdî de digeriyam. Min pê dilist, dengêñ ku min dixwest bireşînim nav romanê, bi hêsanî direşandin. Eger we lê nihêrtibe, hûn ê bibînin ku zimanê romana Evdal, zimanê efsane û destanan e. Bêguman, berî niha bi deh salan, min ê tu carî nikaribûya xwe bigihanda wî zimanî. Gotina min ev e; çaxa meriv li ser zimanê kurdî bixebite û vê xebatê ji bo xwe bike kar, hingê meriv dikare xwe bi dewlemendiyêñ zimanê kurdî bigihîne. Ronakbîr û têgîhiştiyêñ kurd ku hema piçeki bi zimanê kurdî dizanin, divê rahijên vî karê pîroz û li serê bixebeitin. Xebat, xebat û dîsan xebat... wekî din tu rê nîn in.

Lê ez divê vê yekê jî dîsan bi bir bînim; ez xwe mîna hosteyê zimanê kurdî nabînim û nahesibînim. Ez şagirtê zimanê kurdî me û pê gelekî kêfxweş û serfiraz im.

**6- Ji bo nêzikkirina zaravayêñ kurdî, nivîskar dikarin roleke baş bileyzin. Gelo dîtina te li ser vê yekê ci ye?**

**M.U.** - Gotina we ye, nivîskar dikarin, pir bi erînî, bi vî karî rabin. Lê belê, ji ber sebebêñ siyasi, dijwarî û zehmetiyêñ zaravayêñ kurdî pir in. Ji bo zimanekî yekgirtî wext divê. Di nav demeke kurt de, em nikarin xwe bigihînin vê armancê. Berî her tiştî, ji nû ve, piştî 70-80 salan, zarava divê dîsan hevûdu binasin. İro zarava pir ji hev dûr in û pêwendî di navbera wan de ne bi aheng e. Ji bo harmoniya zimanekî, divê bi hemû zaravayan bê nivisîn û bi hemûyan kitab, kovar, rojname bê weşandin û li ser hemûyan lêkolinêñ ilmî bête kirin. İro li Turkiyê di warê nivisîna zimanê kurdî de, kêm be jî, hin imkan hene. Ew divê baş werin bikaranîn. Berhem û eserên ku li perçeyêñ din ên welêt hatine weşandin, divê bi leza birûskê û bi rêk û pêkî werin weşandin. Ferhengên zaravayan divê çêbin. Kovar, rojname û nivîskarêñ perçeyan divê werin danasîn. û h.w.d... Di hemû van şixulan de, wezîfa nivîskar, bêşik, gelek girîng e. Nivîskar divê

zaravaperest nebe. Yekitiya zimên, ji bo wî/wê, divê esas be, bi awayeki basid, divê hin zaravayan ji hinê din biçûk yan jî mezin nebîne. Û ew divê di xebata nivîskariyê de metodine wisan bibîne ku bi berhemên wî/wê zarava nêzîkahî li hev bikin.

**7- Di destê te da xebatê nû hene, tu niha li ser çi dixebeitî?**

**M.U.** - Ji çend salan û vir ve ye, ez, tevî çend hevalên din, li ser *Antolojiya Edebiyata Kurdi*, 1900-1992, dixebeitim. Ew li ber xelasbûnê ye. Li milê din ez li ser romana xwe ya nû *Bîra Qederê* dixebeitim. Ev xebat giran bi pêş dikeve. Jixwe ez jî ecele nakim. Û min dil heye kulliyata William Shakespeare, hêdî hêdî wergerînim kurdi. Ez bawer im, eger em bikaribin Shakespeare yadîgarî kitabxana kurdi bikin, karekî baş ê, ji bo xwendevanê kurd, were pê.

**8- Tiştekî ku tu wek daxwaz an jî mesaj bigihînî xwendevanan hebe kerem bike.**

**M.U.** - Ez weşandina rojnameyên kurdi li Turkiyê bûyereke mezin dibînim û bawer im ku ew ê bikaribin karêن gelek giranbiha ji bo ziman, çand û edebiyata kurdi bikin. Ger rojnama we *Azadi*, ger *Welat* û ger yên din li ber dilê min pir ezîz in. Em hemû bi hev re, bi biratî, bi karê ronesansa ziman û edebiyata kurdi rabin. Û di vî karî de wezifa herî girîng li ser milê weşanêن me ye. Ez umrekî dirêj û bikêr, ji bo we, dixwazim...

- Gelekî spas ji bo bersîwên te.

Ez jî gelekî spasî we dikim. Hûn serfiraz bin.

Rojnama **Azadi**, hej. 22, 1992

## Edebiyata kurdî û romanâ kurdî

**1- Heta niha çend kitabêñ we derketine? Ew li Tirkîyê jî derketine?**

**Mehmed Uzun-** Heta niha pênc kitabêñ min weşiyane. Ji "Destpêka Edebiyata Kurdi" (weşanxana Beybûnê) pê ve yên din hemû li derveyî welêt weşiyane. Lê du romanêñ min, "Siya Evînê" û "Rojek ji rojên Evdalê Zeynikê" jî, bi dû re, li Turkiyê, ji aliyê weşanxana DOZ'ê hatine weşandin.

**2- Tu dikarî, ji bo xwendevanêñ me, hinekî behsa romanâ kurdî bikî?**

**M.U.** - Herwekî ku hûn jî dizanîn, edebiyata kurdî di warê gotin û vegotinê de dewlemend e. Edebiyata devkî pir xurt e, şîhîra klasik hem pir xweş hem jî pir fireh û kûr e. Lê mixabin pexşana (nesîr) kurdî ne ewçend xurt e. Ji ber sebebêñ nas, kurdan imkanêñ xwendin û nivisîna kurdî nedîtine. Zimanê kurdî nebûye zimanê perwerdeyî, dibistan û zanîngehan. Loma jî, îro di warê xwendin û nivisîna kurdî de zehmetiyêñ pir mezîn hene. Û gava zimanekî nikaribe li gora herikîna wextê xwe bi pêşve bibe, xwe nû bike, bêguman e ku ew ziman nikare teşnêñ nû yên edebiyatê jî ava bike. Roman teşneke nû ya edebiyatê ye. Ew şêweyê vegotina dema nû ye. Edebiyata kurdî, herwekî warêñ din ên nû, di warê romanê de jî pir li paş maye. Heta meriv dikare bîbêje; di edebiyata kurdî de warê herî zêde paştemayî, roman e. Îro meriv dikare romanêñ ku bi zimanê kurdî hatine nivisîn, bi tiliyêñ destan bihijmêre. Milletekî ku ji 20 milyonan zêde ye, îro bi tenê xwedîyê çend romanân e.

Eger meriv behsa romanêñ kurdî bike, divê meriv behsa romanêñ Erebê Şemo, Eliyê Evdirehman, İbrahim Ehmed, Rehîmê Qazî, Husêñ Arif, Mihemed

Mukrî, Mahmut Bakşî û Şahînê Bekirê Sorekli û h.w.d. bike. Di kurte-lêkolîna min "Destpêka Edebiyata Kurdi" de hin agahî li ser van nivîskar û berhemên wan hene. Loma ez naxwazim li vir behsê dirêj bikim. Gotina kurt ev e; tarîxa romana kurdî pir nû ye û ew ne dewlemend e. Ez bi xwe vê yekê kêmanîyeke pir mezin dibinim. Zimanekî mîna zimanê kurdî ku evçend perçiqiye û evçend li paş maye, dikare bi hunera romanê di demeke pir kurt de pir bi pêşte bikeve, xwe nû bike û dewlemediyên nû bi dest xîne. Ji ber ku roman, warê ceribandina ziman e, avakirina şêwe û stilên nû ye. Roman, riya herî baş a pêwendîya xwendevanan e. Bi alikariya romana kurdî, kurd dikarin hem edeta xwendina zimanê kurdî ava bikin û hem jî jiyanekê nûjen a ronakbirî bînin pê.

**3- Temaya bingehîn a romanêñ we iñsanê kurd û jiyanâ wî ye. Gelo navêñ mîna Memduh Selîm Beg, Evdalê Zeynikê hîtabî kîjan aliyêñ iñsanê kurd dîkin? Tu dixwazî di şexsêñ qehremanêñ weha de tîpoloziyeke çawan rêberî xwendevanêñ xwe biki?**

**M.U.** - Rast e, hin romanêñ min li dora şexsiyetêñ nas ên kurdî ava bûne. Nas yan jî nenas, lê ez dikarim bibêjim ku romanêñ min li dora "problematîka" ronakbirê kurd derin û têñ. Ji mêt ve ye, bala min her li ser ronakbirêñ kurd, tarîx û pêwendî, xebat û tecrûbe, qayide û xusûsiyetêñ wan e. Li hemû dinyayê, hertim, ronakbir bûne rêberêñ medeniyetê û tevgerêñ çandî, edebî, siyasî û civakî. Wan nivisîne, ava kirine, xelkê xwe perwerde kirine û li gora bernamêñ xwe ew bi rê xistine. Li ba kurdan jî ev, her, weha ye. Lê bi baweriya min, bir û zanîna tarîxa ronakbirân û ronakbiriyê li ba kurdan ewçend ne xurt e. Û milletekî ku tarîxa xwe baş nizane, şexsiyetêñ xwe baş nas nake, bi tarîx û berhemên ronakbirêñ xwe re pêwendîyeke xurt nyine pê, ew millet nikare xwe jî nîr, asteng û dijwariyan rizgar bike. Mîna millet û iñsan, kurd xurt û jîr e, ji bo mirin û kuştinê yekta ye. Lê ne ji bo xwendin, eser û

berhem, parastina tarîx, medeniyet û kitabxanê. Ji Ksenefon û vir ve, herkes behsa vê rastiyê dike. Bi baweriya min, di roja iro de divê ev rastî bê guherandin û aliyên xwendin, felsefe, edebiyat, çand, şuur û zanînê bê xurtkirin û têkûzkirin.

Memduh Selim Beg û Evdalê Zeynikê du şexsiyetên kurd in. Yek zane, bîrewer û ronakbir, yek jî dengbêjeki navdar e. Yek bi xebata siyasi, xwendin û nivisînê mijûl bûye, yê din bi gotîn, stran û çîrokê. (Ji me çend kesî navê Memduh Selim Begî bihîstibû?) Tu tekili û pêwendiyên wan bi hev re nîn in, lê herdu jî navê tarîx û civata kurdî ne. Jiyan, berhem û xebatê wan dikare, ji bo insanê iro, bibe tecrube û nimûneyeke baş. Xwendevanê/a kurd ê/a iro dikare bi alikariya wan hem tarîxa xwe û hem jî xwe baş binase. Û hem jî pêşeroja xwe. Ji ber ku merîvê tarîxa xwe, rabirduya xwe nas neke, kor e û nikare pêştya xwe jî bibîne...

Bêguman e ku ez roman dînîvisim, ne tarîxa leheng û qehremanan. Ji lewre ez nikarim taswîr û saloxdana qehremanan bikim. Qehremanên romanên min, bi her aliyên xwe, mîna me ne. Digel meziyetên wan ên baş, kîmanî û qisûrên wan jî hene. Ew insan in. Û tarîx jî tarîxa însanan e.

**4 - Hûn romanên xwe bi zaravayê kurmancî dînîvisînin. Gelo romanên we bi zaravayê din jî derketine?**

**M.U. -** Naxêr, ew hê bi zaravayê din ên kurdî neweşiyane. Lê "Rojek ji rojêن Evdalê Zeynikê" transkrîbeyî soranî bûye û niha jî hevalekî wê transîkrîbeyî dimili (zazayı) dike. "Siya Evînê" jî transkrîbeyî soranî dibe û haziriya yê din jî dibin.

Hûn dizanin, pêwendî di navber zaravayê kurdî de ewçend xurt nîn e û imkanên veguhezandinê jî ne zêde ne. (Bi tenê li Kurdistanâ Iraqê ev imkan bi dest ketine.) Di vî warî de jî kurd hê di destpêkekê de ne. Em divê eser û berhemên xwe vebiguhezinin ser zaravayê xwe yêncur. Pêwendî divê di navbera zarava û devokêñ

kurdî de xurt û jîndar be. Ji bo yekitiya ziman û edebiyata kurdî jî ev yeka hanê pir pêwist e. Digel sebebêñ din, ji ber vê sebebê jî, min, tevî gelek hevalêñ din ên nivîskar, zimanzañ û edebiyatnas, antolojiyeke edebiyata kurdî ya nûjen (1900-1992) amade kiriye. Tê de hem nivîskarêñ ku bi zaravayêñ curbecur dinivîsinin û hem jî perçeyin ji berhemêñ wan hene. Bi vî awayî, me hewl daye ku zarava û devok nêzîkî li hev bikin... Lê belê, hîn pir xebat divê...

**5- Li gora ci hûn babet û mijarêñ romanêñ xwe hildibijêrin? Hûn wan çedikin yan jî hûn ji tiştên bûyî jî perçenin werdigirin?**

**M.U.** - Berî ku ez dest bi nivisîna romanekê bikim, pêşî ez meshûmêñ (concept) romanê hildibijêrim. Gelo roman ê behsa kîjan meshûm, hîs û pêwendiyêñ insanî bike? Pêşî ez vê yekê tesbît dikim. Piştî ku ev mesele di serê min de gihişt zelaliyeke pêwist, hingê ez dest bi lêgerîna leheng û bûyerêñ romanê û şêwe û stîla nivisînê dikim. Ev jî, ji bo min, wexteke dirêj digire. Gava min ev yek jî temam kir û xwe bi zelaliyekê gîhand, hingê ez dest bi xwendin, lêgerîn û xebata pratîk a hazirkirina nivisîna romanê dikim. Piştî van hemû tiştan û hazırlıyan jî, ez dest bi nivisînê dikim. Yanê, bi gotineke din, çend gav, dem û merhaleyêñ nivisîna romana min hene. Di nav vê heyam û xebata nivisînê de, mijar, babet, leheng, pêwendî, bûyer jî dikemilin û diyar dîbin. Bêguman rewşa ziman, çand û welatê min, pêwendiyêñ min ên şexsî, felsefî û ronakbîrî, bûyerêñ qewimî... ev hemû tesîr li tespîtkirin û diyarbûna mijar, babet û lehengan dikin.

Hin ji bûyer, pêwendî û lehengêñ romanêñ min rast in, ew hebûne, jiyanê û qewimîne. Lê hinêñ wan jî çêkirîne. Lê di vir de qayideyek heye ku ez dixwazim di xebata xwe de pir bala xwe bidimê; roman, esereke fiktîv, yanê çêkirî ye û ew li gora ûsila eserêñ fiktîv ava dibe. Ji ber vê yekê jî, divê bûyer, pêwendî û lehengêñ romanê, ger ew rast bin, ger çêkirî bin, li hunera

romanê werin. Jixwe ferqa hunera romanê û tarîxê yan jî ya romanê û sosyolojiyê di vir de ye. Di romanê de tarix jî heye, lê ew ne tarix e; sosyolojî jî heye, lê ew ne sosyolojî ye û h.w.d... Roman hîtabî hîs û pejnên merivan dike bi xwendevan re pêwendiyeke hisî tîne pê.

Ez di romanênen xwe de, ji ber sebebênu ku min li jorê qal kirin, perçeyên jiyanêni jibîrbûyî, eserêni rizayî, bûyerêni bihuri, stran û destanêni windabûyî bi kar tînim. Ez wan jî direşinim nav romanênen xwe. Di romanênen min de ji rûpelên *Zend-Avesta*, *Mishefa Reş*, *Quran*, *Hedîsen Pêxember*, şêxê *Senan*, *Mem û Zîn*, *Dîwana Melayê Cizîri*, *Hawar*, *Ronahî*, *Riya Teze* perçenin hene. Gelek şexsiyetêni kurd, bi gotinênen xwe, di romanênen min de hene. Sebebênu vê yekê gelek in; roman, ji bo min, pêwendiya nivîsan e. Nivîsan lehî ye, berhem cowêni wê ne. Romana kurdî divê rabirdûya windabûyî, ji nû ve, vejîne û wê yadîgarî xwendevanê kurd bike Û di ser her tiştî re jî ez romanênen xwe mina helqeyeke biçük a zîncîreke dirêj, qehîm û kevnare dibînim. Eger iro romanênen min hatine pê ew bi xêra yên berî min in. Ew nebûna, ez hiç nedibûm...

**6- *Li Tîrkiyê gelek nivîskar û edebiyatnas we û nivîskarêni din ên kurd nenasin. Hûn vê bi ci girê didin?***

**M.U.** - Kambaxiya rewşa Tîrkiyê, zor û zilma li ser gelê kurd û ziman, çand û edebiyata kurdî li ber çavan e. Di rewşeke evçend xedar û nexweş de, nivîskarê kurd ê çawan û bi ci riyan bikaribe xwe bide nasin? Eger em ev çend salêni dawîn bidin lî, bi hêsanî meriv dikare bibêje ku ziman, çand û edebiyata kurdî di hemû tarixa Komara Tîrkiyê de qedexe bûye. Kurdan fersend û îmkan nedîtine ku berhem û eser bifirînin û xwe bi xwendevan û gelê xwe bidin nasin. Eger bala we lê be, hûn dibînin; hemû nivîskarêni kurd, ez jî tê de, li derveyî welêt karibûne kîrhatî û karker bin. Ji ber ku li welêt şertêni vê yekê nebûne. Loma jî ne ecêb e ku xwendevanêni kurd û tirk li Tîrkiyê nivîskar û

hunermendêñ xwe nas nakin.

Lê ûro di vî warî de hin imkan çêbûne; rojname û kovarêñ kurdî li Tirkîyê diweşin, weşanxanêñ kurdî ava bûne, hin dezgeh û sazgehêñ kurdî yên çandî û edebî çêbûne. Kovara we jî tê de, berpirsiyariyeke mezin li ser milê van dezgehan e. Ew divê, zûtirîn wext, lê bi plan û bernâme, eser û berhemêñ kurdî derxînin û bi gelê kurd bigihînin, niviskar û hunermendêñ xwe bidin nasîn û ji bo xebat û karêñ wan ên çandî û edebî çîh û war amade bikin. Kurd bi xwe divê van karêñ xwe bikin û ji kesî tu alîkarî û piştgirtî nepêñ. heya meriv bi xwe tune be û ne xebatkar be, kes alîkarî jî nake...

**7- Di edebiyata tîrkî de, şexs û şexsiyetêñ kurdî mîna kesen hov, nezan, keleş û h.w.d. têñ nasîn û taswîrkirin. Lê di van salêñ dawîn de ev nêrîn diguhere. Gelo di edebiyata kurdî de jî, mîna ya turkî, nêrînêñ weha hene?**

**M.U. -** Berî her tiştî ez dixwazim nêrîneke xwe ya li ser nivisînê bibejim; nivisîna edebî tu carî divê li gora îdeolojî û dîtinêñ resmî nebe û li gora qayideyên îdeolojiyan neafire. Ev îdeolojî dikare ya çînêñ serdest yan jî çînêñ bindest bin, her eynî rewş e. Nivisîna ku li gora îdeolojiyên resmî hatine pê, mixabin, ne edebiyata bedew û hêja ye, ew bi tenê nivîsarêñ propaganda û ajîtascona wê demê ne. Ji faşizmê heta komunîzmê, gelek îdeolojiyên curbecur û li dijî hev, xwestine li gora nêrînêñ xwe, edebiyatekê bînin pê. Di dem û heyamêñ xwe de, heye ku ew bi ser jî ketine. Lê gava ku desthilatiya van îdeolojiyan ji holê rabûye, edebiyata wan jî hêdi hêdi winda bûye. Aleman ûro Thomas Mann û Herman Hess dixwînin, ne niviskarêñ ku berdevkiya hîtler dikirin. Rûs ûro Puşkin, Tolstoy û Dostoyewski dixwînin, ne propagandistêñ Stalîn...

Li Tirkîyê jî, bi avabûna Komara Tirkîyê re, Kemalîzm bi îdeolojiya desthelat û hemû civat xit bin nîrekî totalîter. Vê îdeolojiyê jî xwest li gora xwe edebiyatekê bîne pê, -bêguman bi destê berdevkêñ xwe.

Di vê edebiyata "îdeolojîk" de, mîna her tiştî, kurd jî bêrevajî ne. Kemalizm û her celeb meriv û dezgehên wê edenî, lê kurd wehşî ne. Ew çeyiya kurdan dixwazin, lê kurd wan fahm nakin û li dijî "çeyiyan" derdikevin... meriv dikare weha dirêj bike. Ci qîmet û hêjahiya wê edebiyatê heye? Ci pêwendîya vê edebiyatê bi însaniyetê heye?.. İro rûmeta kemalîzê e mîna berê ye, bi taybetî jî di nav ronakbirêne pêşverû de. Loma jî edebiyata kemalizmê iro ne mîna rûmetekê, lê mîna şermekê tê dîtin. Lê hê jî zirara vê edebiyata neînsanî li ser merivan pir zêde ye. Edebiyata kurdî û nivîskarêne kurd divê di i warî de jî gelek tişt bikin.

Eger em werin ser edebiyata kurdî û nivîskarêne kurd, divê kurd xwe ji şâşî û çewtiyên ku nivîskarêne kemalist kirine, biparêzin. Nivîskarêne kurd divê, bi tenê, di xizmeta ziman, çand û edebiyata welatê xwe û însaniyetê de bin. Nivîskariya serok, îdeoloji û komikan şixulê rojane ye û feyda vê celeb nivîskariyê ji xwedîyan re jî nîn e. Însaniyet, xweşî û serfiraziya merivan, wekhevî û biratiya ziman, çand û edebiyatan divê hîmêne esasî yêne edebiyata kurdî û nivîskarêne kurd bin. Gava nivîskarê urd dijminahî li ziman, çand û edebiyata tirkî bike, ew jî dibe "nivîskarekî kemalist" ê kurd. Me divê hay ji vê rewşa kirêt hebe û berhemên me divê bibe pira biratî, wekhevî û dostiya ziman û çandan.

**8- Hin nivîskar romanên xwe li gora merc û şertên xwe yêne siyasî û civakî dinivîsinin. Mesela nivîskarekî islâmî romanên xwe li gora pîvanên islâmî dinivîse. Ev yeka ji bo komunistekî yan jî ataistekî jî derbas dibe. Merc û şertên we yêne çandî û şexsî çiqas tesîr li romanên we dikin? Pîvanên "universalizma" Mehmed Uzun ci ne?**

**M.U. -** Ev pirsa we, pirsa jorîn temam dike. Bersîva min jî dê bersîva jorîn temam bike. Herwekî ku mingot, bê guman e ku rewşa rojane ya siyasî, şexsî, civakî û çandî tesîr li nivîskar dike. Û heta derecveyeke

ev tesîr di nav eser û berhemên nivîskar de jî dixuyin. Lê bi baweriya min, bi tenê divê hewqas be, ne zêde. Ez bi xwe ne li dijî "edebiyata çîn û ideolojiyan" im. Ji bervajiyê, ez van jî mîna dewlemendîyeke jiyana çandî û edebî dibînim. Milletekî ji gelek ditin, kom û grûban tê pê. Zimaneki ji ji gelek zarave û devokan tê pê. Hebûn û çalakiyên wan dewlemendî ye. Lê eger gotin were ser hêjahi û kalita wan a edebî, hingê şikêñ min pir in. Ez nikarim li kesî tawsîye û şîretan bikim ka ew ê çawan binivîsîne. Lê ez dikarim ji bo xwe bibêjim; ez tu carî naxwazîm bibim "nivîskarê ditin û grûban" û li gora wan ditin û grûban binivîsim. Ez di xizmeta ziman, çand û edebiyata kurdî de me, bi kêfxweşî xizmetkariya wan dikim. Û pêşketina wan serfirazî û kêfxweşîya min a herî mezîn e. Di ziman, çand û edebiyata kurdî de ne bi tenê ditinek yan jî grûbek, gelek ditin, grûb, çîn û tebeqe hene. Ew hebûnen hemû kurdan in. Ez ji bo hemûyan dînivîsim. Ez dixwazîm, bi qasî xwendevaneke nûjen, seydayekî gundê herî dûr, bi qasî xwendevaneke "çep", xwendevaneke "îslamî" jî bibin xwendevanê romanêñ min.

Her mîna we, carina li derin din jî ji min dipirsin ka ideolojî û dîtinêñ min ci ne, ez bi kîjan kom û grûbi re me. Helbet, li gora min, dîtinêñ min ên şexsî hene û di jiyana xwe ya şexsî de jî hin tiştan dikim. Lê ez nikarim berhemên xwe bikim qurbanî van dîtinêñ şexsî. Ev ê karekî gelek basîd be. Nivîskariya min divê li gora qayideyên edebiyatê û ji bo çeyî û rindiya ziman, çand, edebiyata kurdî û insaniyetê be. Ji ber vê yekê jî hemû grûb û komên kurdî dostêñ min in. Çeyiya wan her daxwaza min e. Ez hebûn û pêşketina wan mîna pêşketina gelê kurd dibînim.

Herçî "universalîzm" e, ez ji demeke dirêj e, li derveyî welêt, di nav ziman û çandêñ cihê de dijîm. Pêwendiyêñ min bi ziman û edebiyatêñ cihê re hene. Gelek nivîskarêñ ku ji ziman, welat, çand û dîtinêñ cihê têñ, heval û dostêñ min in. Ez bi van pêwendiyân gelek

kêfxwes im, ji ber ku ew gelek tiştên nû hînî min dikin û alikarî li min dikin ku ez bikaribim di nivîskariya xwe de "pencereyên nû" vekim. Universalizm ji bo min, pêwendîya ziman, çand, edebiyat û adetên cihê ne; nêzîkî li cihanê kirin e; cihanê ber bi xwe rakêşandin e; insaniyet e, perçeyeki insaniyetê bûyin e. Par min ceribadinek, bi navê "Welatê Xerîbiyê" nivisi. Li wir, ez hinekî behsa pirsa we jî dikim û dibêjim; "hevûdusîna ziman û çandêن cuda û dan û standina tecrubêن insanî yêن adet û úsilêن cuda dikare bibe sebebê guherînêن bi heyecan û hêja û bibe kahniya avahî û afîrinêن dewlemend... Ez wisan bawer im ku dîtin, ideal, şêwe û tevgerêن nû, pîrî caran, ji koçen mezînnasîna ziman û çandêن nû, dijîtiyêن çadî û civakî, tevliheviya ruhî û civakî û guherînêن mezin têن pê... Ev berpirsiyari, bîr û hûsêن navneteweyî ku ji guherîn, afîrandin, nasîn û têkiliya çandî dizêن, di eynî wextê de, bingehê şêweyêن jiyîn û fikirînê demokratik, insanî û rengîn e."

**9 - Hûn dikarin hinekî behsa xebatêن xwe yêن nû bikin?**

**M.U.** - Ji demeke dirêj e ku ez li ser romanekê dixebeitim; **Bîra Qederê**. Ez û romanê rabûne hev, her roj şer û pevcûna me ye. Ez pir dil dikim ku di vî şerê dijwar de bi ser kevim. Û heta ez bi ser nekevim, tu reheti jî, ji bo min, nîn e. Lê biserketin jî hê dûr e... Digel vê xebatê, hin xebatê din jî hene, lê ez naxwazim serê we bi wan biêşinim. Jixwe gava ew derkevin, hûn ê wan bibînin...

Tevî spasên xwe, ez biserketin û serfiraziya we, ji dil, dixwazim. Hûn bijin.

Kovara Nûbihar, hej. 9, 1993

## Edebiyata devkî û edebiyata nûjen

**1- Li ser cih û girîngbûna edebiyata devkî (stran, kilam, çîrok, destan, gotinêن pêşîyan û hwd) di nav çanda kurdî da tu ci difikirî?**

**M.U.** - Min di gelek cîhêن din de jî gotiye, edebiyata devkî, folklor û zargonina kurdî gencîneyeke bêhempa ye. Li ba kurdan edebiyata devkî pir xurt e. Di kitêba min "Destpêka Edebiyata Kurdi" de beşekî taybetî li ser edebiyata devkî ya kurdî heye. Di vir de, li derekî weha tê gotin; "zordariya sedsalan, bêpariya zanîn, perwerdeyî û ilmê, koçerî, eşirtî û girtibûn welê kiriye ku edebiyata devkî bûye şêweyê esasî yê vegotinê... Ji her netewe û gelî bêtir, kurdan bawerî bi gotina devkî aniye û bi edebiyata devkî û folklorê girêdayî mane. Her lêger û xebata ku li ser edebiyata kurdî çêbe, divê xwe bigihîne edebiyata devkî û lê hûr be. Ev şêwe û awayê vegotinê ne bi tenê rojêن bihuri û rabirduyê bi bir tîne û pê girêdayî ye. Ji bervajiyê, bi awayekî gelek balkêş, tevî tekiliyên bi rojêن bihuri re, ew modern e. Yanê ev awayê vegotinê hertim xwe nû dike, vedijîne û gotina nû ya iro jî li vê edet û úsila tarixî zêde dike. Bi vî terhî, di warê şexsiyet, qerekter, çand, edet û úsilêن neteweyî de, yekitiyeke, diasporayeke kurdî tê pê... Bi alîkariya gotina devkî, li milekî, ji sedsalan û vir ve, çîrok, stran, kilam, destan, rîwayet û gotinêن kurdî vediguhezin nîşen nû û bi vî awayî 'kontinituet'iya wan tê parastin, li milekî din jî, bûyer û pêşketinêن nû û nûjen jî tên vegotin û ew jî li yêن kevn zêde dibin... Edebiyata devkî şêwe û awayê vegotina çandî ya xelkê ye... Ev edebiyata devkî ya dewlemend, bêguman, ji bo

edebiyata niviskî û pexşana (nesîr) kurdî jî bingeh û hîmê esasi ye. Edebiyata niviskî li ser vî hîmî ava bûye û şax daye."

**2** *Di vî warî da li ser kar û xebatên ku heyâ iro hatine kirin, ditinê te ci ne? Bi dîtina te, xebatkarên çand û vêjeya kurdî, ji bo berhevkirin, parastin û newindabûna van hebûnên me tiştên ku ketiye ser mile wan bi cih anîne?*

**M.U.** - Yek ji wezifêñ me yên herî girîng, iro, ew e ku em bikaribin gencîneya edebiyata devkî, tevî hemû çeşnên wê, bidin hev û wan binivîsin û çap bikin. Edebiyata devkî iro jî, ji bo edebiyata nûjen çavkaniya herî giranbiha ye. Di warê berhevkirin û weşandinê de, li Kurdistanâ Iraqê, Yekitiya Sowyetê ya kevn, nemaze li Ermenistanê û li Ewrûpayê gelek tiştên hêja çêbûne, gelek eser û berhemên biqîmet derketine. Lê li Turkiyê, ji ber rewşa siyasî, hema ci bigire, hîç tiştekî çênebûye. Lê iro ew yasax û qedexeyêñ li ser zimanê kurdî li Turkiyê rabûne. Rojnameya Azadî jî tê de, iro rojname û kovarên kurdî derdikevin. Ev, pêşketineke gelek girîng e. Kurd divê vê pêşketinê baş bi kar bînin û xwe bigihînin xezîneyêñ zargotina kurdî. Li mileki, ev eser û berhemên ku li derveyî welêt divê bi lêhûrbûneke zanistî û çapeke bedew bêñ weşandin, li mileki jî di nav xelkê de gencîneyêñ edebiyata devkî, tevî varyasyonan, bêñ berhevkirin û çapkîrin.

**3- Bi dîtina te, ji vir pê da mirov ci dikare bike? Pêşniyarêñ te ci ne?**

**M.U.** - Turkiye divê bibe navenda çap û weşanên kurdî. Berhevkirin û çapkîrina berhemên edebiyata devkî jî kareki hem pir dijwar hem jî pir ciddî ye. Piraniya kesen ku heta niha bi vî karî rabûne, ne bi awayeki ilmî, lê bi evîn û eşqa welatparêziyê ev kar kirine. Bêşik karê ku wan kiriye, pir hêja ye û ez pir

qîmet didimê. Lê ji ûro û pê ve, ev kar dê çîma bi metodêñ hîn ilmîtir neyê pê? Ez nizanîm ka çiqas realist e, lê enstitû û weqfîn ku niha li Turkiyê têñ damezrandin, bikaribin bi vî karî rabin, wê riya herî baş be. Bêguman kes û şexis jî dikarin vî karî bimeşînin, - ku heta niha weha bûye. Lê xebateke yekgirtî û hevkariyeke têkûz dê vî karî hîn baştı, xurtir û dewlemendit bike.

**4-Te bi xwe di vî warî da tiştek kiriye? heger di vî warî da xebatêñ te hebin, tu dikari behsa wan bikî?**

M.U. - Herwekî ku hûn dizanîn, ez ne folklorist im, romannûser im. Di warê civandin, sinifandin û weşandina folklorâ kurdî de tu xebatêñ min nebûne. Lê perçen berhem û eserên edebiyata devkî hemû romanêñ min neqîsandine. Meriv dikare bibêje ku piraniya romana min a yekemîn **TU** folklorîk e. Romana min a duwemîn **Mirina Kalekî Rind**, bi piranî, li ser edet û ûsilêñ kevn e. Perçene ji "Cembeliyê Heqarê û Binevşâ Narîn" û hin tiştêñ din di romana min a siyemîn **Siya Evînê** de hene. Romana min a çaremîn **Rojek ji rojêñ Evdalê Zeynikê** jixwe, bi temamî bi zimanê destanê hatiye nivîsin û ji aliyekî ve, li ser dewlemendî û bedewiya edebiyata devkî ye... Min li derekî din jî, bi kurtî, li ser vê meselê, weha gotibû; "Bi baweriya min, nivîskarê kurd divê bi edebiyata xwe ya devkî û ya klasik re pêwendîyeke xurt dayine. Û ev pêwendî divê di berhemêñ wî/wê de baş xuya be... Nivîsar, nivîskar, leheng, bûyer, tecrube, ceribandin, bîr, bawerî û fîkrîn do alîkarî li nivîskarê iro dike da ku ew berhema xwe biafirîne. Xwendevan jî bi vî awayî do dinase. iro dibîne û bîr bi sibê dibe... Tarîx, wextêñ tarîxi, bûyer, tecrube û şexsiyetêñ tarîxi yêñ cihê divê hertim li nik nivîskar û hunermendê kurd be. Her mîna nivîskar, divê berhem û eserên

wî/wê jî bibin helqeyeke metîn a zincîra tarîxê. Nûjenî, înkarkirina tarîxê nîn e.. Ji bervajiyê, nûjenî û avakirina berhemên nûjen bi tenê dikare li ser himên têkûz yêن rabirduyê werin pê. Loma jî, gava deng, pêjn, hîs, tecrûbe û gotinêن dewrêن bihuri dî nav berhemeke nûjen de hebin, hingê ew berhem hîn bêtir dewlemend, edebî û hêja ye."

Dî romanêن min de, hertim, perçe, gotin, rêz, serpêhatî ji edebiyata devkî, klasikêن kurdî, kovar û rojmameyêن tarîxî hene. Geh ji devê lehengêن romanan geh ji devê xwediye wan bi xwe. Edebiyata me ya nûjen dê li ser ya devkî û ya klasik ava bibe..

Roj. **AZADI**, 30, tebax, 1992

# HÊZ Û BEDEWIYA PÊNÛSÊ

## Mehmed Uzun

...Herçiqas Mehmed Uzun bi helbestan dest bi nivîskariyê dike û helbestên xwe di bin navê *M. Ferzend Baran* de di kovara xwe "Rizgariya Kurdistan" de diweşîne jî, ew hêdî hêdî ji helbest-nivîsandinê bi dûr dikeve, giraniyê dide ser nivîsandina essay û romanê. Romana wî ya pêşî "Tu" di sala 1974'an de derdikeve. Piştî wê *Mehmed Uzun* li dû hev "*Mirina Kalekî Rind*" (1987), "*Siya Evînê*" (1989), "*Rojek Ji Rojêñ Evdalê Zeynikê*" (1991), kurdiya piyesa nivîskarê Îngilîz yê bi nav û deng *Herold Pinter "Zimanê Çiyan"* (1990), "*Destpêka Edebiyata Kurdi*" (1992), "*Mirina Egîdekî*" (1993). Ji çend salan vir ve jî ew li ser romana xwe ya bi navê "*Bîra Qederê*" ku ji xebat û jiyana Celadet Bedir-Xan pêk tê, dixebite.

*Mehmed Uzun* bi van pirtûkan nayê ser, bêî ku ew ferqiyeta ideolojîk têxe navbera partî û rîkxistinên kurdan, ji bo ku bibe mînaka yekîtî û biratiya kurdan, çi bigire di piraniya kovar û rojnameyên kurdan de dinivîsîne. Em carna *Mehmed Uzun* di nava rûpelên *Armancê* de dibînin, carna di nava rûpelên *Kurdistan Pressê* de, carna *Berbangê*, carna *Welat*, carna *Berhem*, carna *Azadi*, carna *Nûdem* û hwd. Ev pirtûka ku di destê we de ye ji wan nivîsaran pêk hatiye. Weşanxaneyî me bawer e ku wê bi weşandina vê berhemê cihekî vala dagirtibe.